
# YAR Û MIRAD-I

*Mirin xweş e, bi mêr û mêrxasîyê*

WELÎ SEBRÎ



rosna

www.arsivakurdi.org

# YAR Û MIRAD - I

*Mirin xweş e bi mêr û mêrxasîyê*

**Welî Sebrî**

Roşna I Roman

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

**Weşanxaneya Roşna**: 70
**Roman**: 3

Welî Sebrî
Yar û Mirad - I
Çapa yekem, Diyarbekir, 2021

**Edîtor-redaktor**: Roşan Lezgîn
**Mîzanpaj**: Weşanxaneya Roşna
**Berg**: Şemal Medya
**Wêne**: Luqman Ehmed

**Çapxane**: Berdan Matbaası
Davutpaşa Cad. Güven Sanai Sitesi C Blok No: 239
Topkapı / İstanbul
Tel: 0 212 613 12 11

**ISBN**: 978-605-74847-3-4

*Ji derveyî danasînê bê destûra nivîskarî û weşanxaneyê*
*bi tu awayî nayê kopyakirin û belavkirin!*

**Adres**: Elazığ Cad. Diyar Galeriya, C Blok, No: 9
Yenişehir / Diyarbakır
Tel: 0 412 223 03 69
rlezgin@hotmail.com

www.arsivakurdi.org

*Mirin xweş e, bi mêr û mêrxasîyê...*

www.arsivakurdi.org

**Welî Sebrî** di sala 1956 da ji gundên Gimgimê li Kovikê hat dinê. Li gundê xwe dest bi xwendina sereta kir lê ji ber erdheja sala 1966an her du sinifên dawîn li Tetwanê temam kirin. Hemin li wir xwendingeha navîn jî xwend û paşê çû li bajarê Mersînê xwendingeha mamostatîyê xwend. Di sala 1975 da mezûn bû û wekî mamosta dest bi kar kir. Li Ruhayê, li bajarokên Hîlwan û Wêranşarê 6 sal mamostatî kir. Paşê tayina wî derket Îzmîtê û 6 jî li wir wezîfe kir. Lê di dema cûntaya leşkerî ya 12 îlon 1980 da ketiye ber tehqîqatê û ceza lê hatiye birîn. Ji bo ku neyê zindankirin, di sala 1987an da derket Awrûpayê û Li Hollandayê wek penaber bicih bû. Li Hollandayê jî 17 sal di karê perwerdeya zarokan de wek mamosta xebitî. Bi navê Roza Hêlîn keçeka wî heye û niha li Hollandayê dijî.

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

# I

*Daw û doza min hiqûqê miletê kurd e.*
*Ez ê bi kîjan wijdanî 'mefkûra xwe ya millî' terk bikim?*
**Xalid Begê Cibrî**

Şevek ji şevan, şevezengî...

Li çiya û banî, deşt û zozan, newal û neqebên vê herêmê bêdengî bû. Hîv nebû ronahîyê bide. Tu yê bibêjî bila hema wiha di xuyangê da stêrkek, du stêrk hebin û biçirûsin, nebûn. Demsal payîz û meha kewçerê bû. Belê, li vê navçeyê bêdengî û bi ser bêdengîyê ra jî mij û dûmanê girtibû. Ji şevan şeveke sawdar bû. Çiya û banî ji hîvê û hîv jî ji şevê xeyîdîbû. Ne zûrezûra guran ne jî oreora hirçan bû. Erê, herçiqas zûrezûr û oreor nebe jî ji ber viqîna rovî yan jî, weşaqek car hebû bêdengîya şevê xirab dibû. Di kûrahîya vê şevê da dengê herî xweş û balkêş xulîn û xuşîna avê bû, ava ku bi ser kevir û zinaran da girtibû û diherikî. Helbet, pirs in û pirs jî nînin neyên kirin. Heke ji zarokan zarokekî hûrîk li ser viqîna rovîyê ji dê û bavê xwe pirsek bikira, bersivek wisa ji wê pirsê ra werdigirt:

- Berxê mino, rovîyê dil girtiye. Zarîn û zivîna wî jî ji ber wê yekê ye!...

Bila pirs û meraqa wî zarokî li alîyekî be, li vî warî tu çiya û banî nebûn bi nav û nîşana xwe nebin. Ji wan yek jî bi navê xwe, Warê Dîhar bû. Warê Dîhar, wek nîkila dîkekî bi ser mêrg û zevîyan ra girtibû û bilind dibû. Ji wê bilindahîyê ku tu dabiketayî û bihatayî xwarê, dihatî Rasta Kalê. Rasta Kalê, cîyekî rast û dûz

bû. Gundîyan xet li nav daristanê xistibûn, ji xwe ra kiribûn zevî û diajotin. Di hatinê da Warê Pisîkan li alîyê rastê û Gola Maran jî li alîyê çepê diket. Bi wan xilxil û baxirên xwe va Gola Sar? Gola Sar jî di navbeyna her du alîyan da dima. Ji şênîyên vê herêmê ra Gola Sar zîyaretgeh bû û salê carekê du caran qîz û bûk, zarok û zêçên hûrik, kal û pîran berê xwe dida vê zîyaretê û dihatin. Di hatinê da jî kela xwe lê dibirîn, duayên xwe dikirin, digirîyan, hêsirên çavan dibarandin, banga Xizir û Xwedê dikirin û loqme didan. Ji çavkanîya golê aveke sar û zelal diherikî û dikişîya. Cîyekî xweş û pir balkêş bû. Li vê herêmê çiya nebûn bi dar û ber, kelem û qorîyên xwe nebin. Li pişta berojan û di cîyê rût da kevirên reştabanan, zinarên mezin û cî bi cî jî gûnî hebûn. Di daristanê da cûre bi cûre dar û her darek jî bi navê xwe bû. Ji Qorîya Elî Axa (ji Warê Pisîkan wê da û li alîyê Gestemerdeyê diket) bigire heta Gola Maran dar û daristan û di daristanê da jî ka îcar kîjan dar nebû ku te yê qal nekira û negota; mazî, kenêr, gangol, gijik, sepik, antûve, berzî, mamox û hwd. Di nav qorîyê da ne tenê dar û ber, lê di nav dar û beran da jî lawir û ajal dijîyan; gur, hirç, keftar, rovî, pezkovî, xezal, kevroşk, weşeq, wawik û hema wekî din jî êdî her çi ku hatibe aqilê te ji xwe ra lê zêde bike bibêje û bibêje… Qey çiya hebûn ku bi teyr û tilûrên xwe nebin? Na. Hebûn û bi têra xwe jî hebûn; darkutik, başoke, kund, sûsik, qertal (helî, derûş), baz, kew, bet, şalûr, bilbil, pepûk, qijik, qumrî, tûtî, teyrên beratan, ordeg, dîksilêman û di havînan da jî legleg û qulingan berê xwe dida vî warî û dihatin.

Rîya zozanên Bîngolê ji nav qorîyê ra derbas dibû, ji nav qorîya Warê Dîhar ra. Erê, derbas dibû, lê bi berwarî û di nav dar û ber, kevir û zinaran da... Heke te berê xwe bida zozanan û biçûyayî ne hindik, lê tu ji gelek û gelekî kaş û kendalan ra derbas dibûyî û li pêşîya te jî hema tenê qîyame û qîyame... Werhasil, hatin û çûyîna vê rê ne hêsan û bi zehmetî bû. Di devê rê da cî

bi cî komên sincan û li vir û wir jî tek û tûk qûrç hebûn. Bila komên sincan li derekê hebin û li ser wan jî çîrok û meselok nebin, dibe? Na, nedibû û miheqeq çîrokek du çîrok hebûn. Ê de ka êdî kê gotiye û çima gotiye nayê zanîn, lê dihat gotin ku di nav sincên şîlanan da cin û perî bi cî bûne û gava yek ji ber ra derbas bibe, bi cinan dikeve, pê ra jî ji xwe diçe û dixeriqe. Ka îcar di vê rê da, di rîya berwar û ji ber van sincên şîlanê ra kî derbas nebûye ku tu yê nebêjî. Di derbasbûnê da ka îcar kî saw negirtiye û ji ber dengekî sivik hilneceniqiye, kî? Rastî û nerastîya vê çîrokê çi ye, nayê zanîn. Hinekan ji xwe ra kiriye babet, li ser axifîne û di vî warî da jî her yekî gotina xwe kiriye.

Dibêjin, demsal havîn e û dem jî dema zozanan. Ji jinan jineka çê û bedew, di vê rê da berê xwe dide qîyame û ji xwe ra dixwaze derbas bibe û here Warê Şehîd. Ji çûyînê ra yek rê heye û ew rê jî ev e. Piştî nîvro ye û bi texmînî pez yan hatiye danan yan jî hê nehatiye. Heke pişta merîyan li rojê be, sîya merîyan jî li ber merîyan dikeve. Jinika çê, jinika bedew, jinika bi zend û bend ji alîyekî va li sîya ber xwe mêze dike, ji alîyekî va jî bi lez û bez e. Xwe bi xwe jî diaxife û dibêje:

- Qîzê, de nesekine! Nesekine û bilezîne. Zû bike, zû!...

Bila çiya ji çiya bilindtir be, lê bila ji wî çiyayî ne sira zozanên Bîngolê bifilite ne jî bililîne, dibe? Na. Tê, lê hem jî xweş û xweş tê. Ma bîlasebeb hatiye gotin ku ba tê ji baranê xirabtir e. Ba ku hat nabêje ev xêlîya bûkê ye û ev jî laçika dorbimorî... Dixwaze bila li serî û dixwaze bila li dorgerdenê be, dema ku lê xist, tîne û dibe, dihejîne. Nebêje çima hejîya, lê tu bibêje çavo tu kor bibî, çima te sîya li ber xwe dît. Bi bayê şerq û xerbê ra laçika dorbimorî diheje û dilê wê jî bi tirs û xof e. Di encamê da êdî her çi ku bûye û qewimîye, di wê gavê û demjimêrê da ye. Hema wiha ji paş sincên devê rê dengekî sivik tê guhê wê. Ji tirsan qidûm lê dişikê û di wê hengamê da hema bi carekê çok dide erdê û bi

dengekî zîz û bilind diaxife û dibêje:

- Wîîî Xwedê, Xwedê!...

Jê ra edî gotin nîne û nemaye. Tu bibêje bila Xwedê rihê merîyan bigire, lê bila gotinê ji devê merîyan negire. Di devê merîyan da gotin ku bûn wesle-wesle meriv êdî nikare biaxife, bêzar û bêziman e. Ji wê dîlberê ra êdî peyv wenda û hevok jî peritî ne. Mixabin, êdî ew ne ew e. Çavtirsî ye. Ji xwe dûr e. Wek çawa teyrek ji refê xwe biqete, di rewşeke wisa da û bêhêvî ye. Rewşa wê xirab e. Ji rewşa wê ra tu nabêjî rewş. Erê, herçiqas hatibe gotin heke Xwedê derd da derman jî pê ra ye. Lê de tu were ji wê bipirse, ji wê dîlbera bi zend û bend. Derdê wê giran û dermanê wê jî nîne. Dibin li ser zêwîyan digerînin, pîr û rayber nahêlin berê wê nedin û nebin. Jê ra benik jî girêdidin û tasan jî datînin, lê dema ku nebe nabe. Tu jê ra tasan jî daynî nabe, hemaîl û niviştan jî çêbikî, dîsa nabe. Werhasil, xirab ku lê hat, tê. Dema ku nebe jî nabe. Tu yê berê xwe bidî ewlîyayan û dua bikî, loqme bidî, kela xwe li zîyaret û dergehan bibirî jî nafîle û nabe. Mixabin, ji wê demê bigire heta roja mirinê êdî ew ne ew e. Meriv ku jin be, çê be û bi navê xwe yê eslî be, lê rabin û navlêkek bêyom li merîyan bikin, ji merîyan ra hem êş hem jî mirin e. Erê, wele! Êş e, lê çi êş! Heke ew navlêka ku jê ra rewa dîtine bêyom nebûya kesî jê ra nedigot “jinika kerr û lal”. Werhasil, ya ku bêzar û bêziman e jî ew, ya ku ronedî û malxirab jî dîsa ew bi xwe ye. Erê û erê! Wele, dor bi dor e û roj ku hat jîyan êdî namîne û bi dawî dibe. Jinika kerr û lal, ne bi wî navê xwe, lê bi êş û azar, derd û kulên xwe jîyaye. Pişt ra? Pişt ra jî wek her kesî xatirê xwe ji vê dinyayê xwastiye û bûye koçber. Li gor çîrokbêjan ev çîrok çîroka wê bi xwe ye. Gotin e û her kes gotinên xwe dike, dixwaze bila di xêrê da û dixwaze bila di xirabîyê da be. Ê de ev gotin jî gotinek ji gotinên Hecî Xusrewê me ye: Em ê dev ji mirîyan berdin û berê xwe bidin zindîyan! Ji bo xatirê xatiran em ê



www.arsivakurdi.org

bibêjin, bila îcar jî wekî te be, Hecî. Di quntara çiyan da kelem û di nav keleman da jî cî bi cî zinarên bilind û rû bi hene (hinetîtk) hebûn. Û bi wê hebûna xwe jî ji wan zinaran her yek helînek ji hêlîna bazên çiya û qertelên zozanên Bîngolê bû. Li vê herêmê nêçîra lawir û ajelan nedibû, kesî berê xwe nedida gur û hirç, rovî û wawikan, li xezal û pezkûvîyan nedixistin û nedikuştin. Ji biharan biharek nebû ku kewên nîkilsor dernekevin ser kevir û zinaran, per nedin hev û nekin qibeqib. Ji van belanên bilind roj nebû ku kalekala pezkûvîyan neyê. Li vî warî jîyan xweş û bi ya dilê merîyan bû. Bi wê delalîya xwe xezalên vê navçeyê, çindik lê dixist û dibezîyan. Ji destpêka biharê bigire heta beranberdanê roj nebû ku birên pez, kerîyên kar û berxan li van piştan, newal û neqeban belav nebin û neçêrin. Bi wê xêr û bereketa xwe ev ax, axa Kurdistanê bû.

* * *

*Şam şekir e, welat şîrintir e!...*

Nîvê şevê bû. Deng e, ku hat bêdengî namîne, dixwaze bila şev û dixwaze biroj be. Di rê da, di rîya berwar da xîç û kevirên hûrik dipekîyan û dişemitîn. Pir derbas nebû dengê fîtikê hat. Di ser dengê fîtikê ra jî êdî çend hûrdemjimêr derbas bibûn nedihat zanîn, lê îcar jî dengê peyayekî hat. Tarî bû, te nedikarî di bejn û balê da rêwîyê şevê bidîta û di derbarê wî da tiştekî bigota.

Peyayê ku ji jor da daketibû û dihat, axifî û got:

- Tu ji min bawer bike!...

Dest bi axaftinê kir, lê hevoka xwe temam nekir û di nivî da hişt. Xwedîyê deng, pir derbas nebû carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û wiha got:

- Demsal payîz e û em jî li vî çiyayî û li çolê ne. Pirs ne sar û

serma ye, lê rê! Di vê tarîyê da, di tarîya şevê da rê li ber me wenda û çûyîn jî bi zehmetî ye. Dema çav pêşîya xwe nebînin lome ji lingan nayê kirin ku meriv bike. Dil ku dilan nas bike çav jî çavan, lê ka... Li vî çiyayî, çiyayê qedirzan çav ji çavan ra xerîb ketine. Heke tu ji min bipirsî, ez dibêjim mayîna me ya vir ji çûyînê çêtir e. Hela hela, qey tu dibêjî ez nezanim. Ez jî dizanim ku dema meriv bide rê û here, rê li ber merîyan dihele; dixwaze bila berf û baran û dixwaze bila ba û bahoz be. Na! Ne hindik, lê em gelek û gelekî rê hatine. Ê yanî! Şûşar, Tekman û Xinûs li kû û Gimgima xopan li kû? Ezîzê min, ê de rêwîtî ye û rêwîtî jî nîne merîyan newestîne. Ji rîya vî çiyayî ra jî meriv nikare bibêje rê ye. Asê ye û merîyan ditevizîne, ufff!... Ê de hela tu guh bide min û ez ê ji te ra çi bibêjim. Dibêjim tu were em ê li vir, di hênikayîya vî çiyayî da, li ber dengê vê avê, ava ku di cihokê da diherike, rawestin, bêhna xwe bigirin heta ku sibeh li me zelal dibe. Ev fikrê min e. Na, na! Ne tenê ez, lê tu jî wekî min niha hem tî hem jî birçî yî. Tew tew, hal û ehwalê min? Na, ne bîne bibe, ne jî bi tevra bike. Rewşa min ne rewş e. Gotin ku hebûya jixwe min ji vê rewşa xwe ra dikir... Dîsa dibêjim, ji me ra ya herî baş ew e ku em ê şeva xwe li vir derbas bikin. Min wiha got, Şamran. Nizanim ka tu çi dibêjî?...

Ê de dema ku wî bigota Şamran, Şamran û nehîre? Ji alîyekî va dibû hîrehîra wî, ji alîyekî va jî bi simê xwe va erd pîkol dikir. Îşev? Îşev erd pîkol nekir, lê hema wiha bi dengekî sivik hîrîya û sekinî. Di tarîya şevê da camêrê ku di qilafetê xwe da xuya nedikir, ji berîka xwe çeqmeq derxist, vêxist û di ronahîya wî da li dorhêla xwe nihêrî. Dît, li devê rê û li ber sincên şilanan in.

Li hespê xwe vegerîya, kenîya û got:

- Weeey!... Ma îcar tu dibînî em li kû ne, Şamran? Hela hela! Ka îcar çi îşê me li ber van sincan heye, heyran!?

Li ser hev pişkîya û pişt ra jî hat ser axaftina xwe ya berê.



www.arsivakurdi.org

Belê, hat ser axaftinê û got:

- Na, vê gavê ez nizanim ka li vir, di quntara vî çiyayî da dema min û te dê çawa derbas bibe!? Ez vîya nizanim, lê tiştê ku ez dizanim û dikarim ji te ra bibêjim jî di laşê xwe da ez ji hevda ketime û ji vir heta wir nikarim gavek biavêjim, herim û werim...

Carekê din çeqmeqê xwe vêxist û di ronahîya wê da li koma sincan mêze kir. Hem mêze kir hem bû tîqetîqa wî, kenîya û got:

- Şamran, dibêjin di nav sincan da cin û pêrî hene. Ê de madem ku hene bila qet jî hebin. De were, heyran. Were, em ê ji xwe ra li vir rawestin û bêhna xwe bigirin.

Li alîyê rastê û di devê rê da zinarekî mezin hebû. Di bêdengîya şevê da hespê xwe li pey xwe kişand û derbasê wê derê bû. Rêwîyê şevê, dixwast zînê hespê xwe dayne. Lê berîya ku dayne jî, destê xwe di bin zînê ra dirêj kir, ber bi piştê bir û dît bi xwêdan e. Dev ji zîn berda, lê di guhê hespê xwe da jî kir pistepist û wiha got:

- Ê de bibêje, Şamran. Bibêje, gelo tu jî ji cin û perîyan ditirsî, yan na?

Ken e, dema ku pêşkarê merîyan bû, meriv dikene. Siwarê hespê Şamran hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Lo! De yê min evdalî jî qerf û henek in. Heta ku ez tinazê xwe bi te nekim û nekenim îcar dikarim rehet bikim? Na. Şamran û ji cin û perîyan bitirse? Na, ne ji cin û perîyan ditirse ne jî ji neyarên vî welatî. Heke meriv ji guleyên wan bêbavan netirse, ji cin û perîyan hay hay natirse. Wey, qey nayê bîra te!? Em li Deşta Mûşê û nêzikê Ava Muradê bûn. Hêr û hovan, wekî gurên devbixwîn dor li min û te girtibûn. Neyarên har û hêr ku dor li merîyan bigirin îcar bi ser merîyan da gule û barûd wek tavîya baranê lênake û nabare? Dibare, lê xweş û xweş jî dibare. Di wê rojê da, di roja oxirmê giran da, yê ku qewet dabû simên xwe

ne ez, lê tu bi xwe bûyî. Hem te qewet dabû simên xwe hem jî te min ji nav lepê wan teresbavan girtibû û xilas kiribû. Heke mesele xilasî be, car heye rev jî îcab dike. Çawa îcab kiriye meriv wisa tevdigere, Şamran. Ji gotinan gotinek e. Dibêjin, hesp dibeze, siwarê hesp pesnê xwe dide. Bila ev gotin li alîyekî be, li ser resenîya hespan gelek û gelekî gotin hene û dixwazim bi te ra jî parva bikim. Ji wan yek ev e: Hespê çê siwarê xwe di rê da nahêle. Na, nabe ez heqê te bixwim. Di rê û rêwîtîyê da min evdalê Xwedê nedîtîye tu aragî bikî û di nîvê rê da min bihêlî. Na, nebûye û nîne û ji ber vê yekê jî ez spasdarê te me. Gotin in û ji wan yek jî ev e; siwarê hespê xelkê timî peya ye. Ez ne bawerim ku ji vê gotinê ra şirove îcab bike. Îcab nake, ji ber ku mebest zelal û vekirî ye. Gotin? Gotin û biqedin? Na. Eha, ji te ra; bûk li ser hespê ye, kes nizane qismetê kê ye. Ê na, ev qet nebû! Çima? Nebû, ji ber ku xort im. Heke gotin wisa bûya min îtîraz nedikir; zava li ser hespê ye, kes nizane qismetê wî kî ye û ji kîjan warî ye? Eha, meriv wisa dibêje! Ma ne wisa ye, Şamran? Tu yê bibêjî di vê hevokê da ka kî zava ye? Tew, îcar ev jî pirs e!? Zava ez im, ez. Hesp? Hesp jî tu yî, heyran. Kî? Kî dîlber e û dîlber jî vê gavê li min wenda û ne xuya ye. Ê de karê me kurdan ew e, Şamran: Xebat û kêf û şer e…

Şamran, ji hespan hespek bezok bû. Ne tenê di şer da, lê bi herdu goyên xwe yên vît û dêla bilind jî resenek ji resenên bi navûdeng bû. Hespek wiha bêqisûr nedibû qismetê her kesî. Bezok bû, çaxa ku radibû pêdarê te digot qey birûsk e. Di dawetan da bi xelat û di cirîtan da jî ji ser wî ra hesp nebû. Ka îcar kê û kê nebû ku pesnê wî nede? Helbet, dema ku hesp navdar be, her kes qalê dike û tîne ziman. Tenê qalê jî nake. Hem qalê dike, hem stiranan diavêje ser hem jî li ber deng û meqamê wê stiranê govendê digire û digerîne. Dor bi dor e.

Ger ku yek bistrê û biqedîne yek jî dikeve dorê û wiha dibêje:

*Şamran, Şamran, Şamran e*
*Ca kuro lawo, Şamran e*
*Şamran, hespê mêran e*
*Ha kuro lawo, Şamran e*

*Şamran hespek resen e*
*Ha kuro lawo, Şamran e*
*Bila carekê ranebe pêderê*
*Ca kuro lawo, Şamran e*

Qey deng heye ku li şevan negire û belav nebe. Ax, dilo! Dilo bila tu dil bî û tu yê ji şeng û şayîyê xweş nebî. Di payîz û zivistana wî welatî da şev û dirêj nebin, nekudînin? Qey qîz û xort hebûn ku bi hebûna hespek wek hespê Şamran xem û xîyalên xwe nexemilînin? Mirad e, hêvî dikirin ku rojekê ji rojan bibe qismet û ew jî li hespek wek hespê Şamran siwar bibin, berê xwe bidin nav êl û eşîran û zozan bi zozan bigerin. Çima, na? Di çax û bengî xwe da li ber miradan bûn. Rind jî ew bûn û bedew jî dîsa ew bi xwe bûn. Qîz bûn, lêbelê ezebên bêqisûr bûn. Ji bedewîya wan ra gotin nebû te yê bikira. Çavreş, bi birî û bijangên qeytanî bûn. Di sing û berên xwe da qerqaş û di bejn û balê da wek tayek ji ta ya rihanê be, zirav û tenik bûn. Ka îcar kîjan kezîzer nebû bi kofîya serê xwe nebe? Bisk û gulî, kofî û kitan xemla wan delal û dîlberan bû. Li dor enîya wan dîlberan temezîyên rengîn û di lixwekirinê da jî bi fistanên xwe yên gulgulî bûn. Laçikek nebû dor bi morî nebe. Bi taybetî li dor laçikên bûkan gûşîyên morîyan û di nav gûşîyên da jî cî bi cî pûlên zîvîn hebûn û dibiriqîn. Qey roj hebû ku delal û dîlberên Serheda şewitî dernekevin ser xanîyan, guh nedin dengê nalan û di hezkirinek bêhempa da li benda hespek wek hespê Şamran nebin? Qet tu şik

nîne ku yê wan dîlberan hem ji xem û xîyal, hem jî ji hezkirinê dihat. Belê, wele ji alîyekî va xîyal dikirin û ji alîyekî va jî di dilê xwe da diaxifîn û digotin:

- Qismet e û qismet jî nayê zanîn. Min dixwast bila îro were, lê nehat. Kî dizane belkî jî îşev tê. Di hatinê da? Di hatinê da jî dengê nal û hîrîna wî li demê digire û dibe para şevê. Li benda te me, zû were. Kî dizane, belkî jî?...

Li ser navûdeng û rindîya vî hespî ka îcar kê û kê çîrok negot? Bi wê çîrokê ka îcar kîjan dayîkê nelorand û hûrika ber wî dilî nebir û nekir xew? Di meha kanûnê da şev û dirêj nekudînin? Li ser tenduran germî, dilovanî, hezkirin, şayî û xweşî hebû. Çirokên wan rezdaran? Çîrokên wan reng bi reng û bi ya dilê min û te bûn. Destanek biqedîya yek jî di dorê da bû. Di nav wan zarokan da ka îcar zarok hebû ku dilê wî wek yê çûçikan lênede? Di çavên wan da meraq û di axaftinên wan da jî cûre cûre pirs hebûn. Bila di axaftina wê dayîkê da navê Bozê Rewan (hespê Memê Alan) derbas bibe û li ser wî jî pirs nebin!? Bila di nav wan destanên Kurdî da navê Hedwan (yê Dewrêşê Evdî) û Daybelqiran (yê Sîyabend) derbas bibe û pirs û meraq bi hev ra nebin!? Di şevberîka wan zarokan da bila navê wan hespan derbas bibe û navê hespê vî xweşmêrî, xweşmêrê ku niha di tarîya vê şevê da bûye rêwî, derbas nebe!? Derbas dibe, lê xweş û xweş jî derbas dibe. Dayîk in û dayîk jî nînin ji ber xwe va neafirînin, neximilînin û nebêjin. Heke li welatekî hesp hebin nalbend jî hene û zînçêker jî. Hêvî ye, ka îcar kê nedixwast ku rojekê hespekî wek hespê Şamran bi siwarê xwe va berê xwe nede wan û neyê? Li Diyarbekira xopan û Mêrdîna şewitî, ka kê zîn çênekir û nexemiland ku tu yê nebêjî? Ji wan zînçêkiran ka îcar kê nedixwast tiştên ku wan bi destê xwe çêkirine û xemilandine nebin para hespek wek hespê Şamran. Jîyan e, jîyan jî nîne tê da xem û xîyal nebin.

Ew xem û xîyal bila li alîyekî bin, niha jî xişîn bi pelên daran ketibû. Ji alîyekî va xulîn û xwuşîna avê û ji alîyekî va jî xişîna dar û beran bû, ax dilê min yo yo dilê min yo! Rêwîyê şevê, pişta xwe dabû zinar. Helbet, dema ku meriv biweste pişta xwe dide zinar û keviran jî, dide dar û beran jî...

Di tarîya şevê da destê xwe ber bi hespê xwe va bir, histûyê wî mist da. Hem mist da, hem jî axifî û got:

- Lo! Wele, min rê dît, lê min evdalê Xwedê bi qasî rîya vî çiyayî rîyekî çetin nedît; berbijêr û bi zehmetî bû. Di hatinê da tewişîm û ji ketinê ra jî hema hema hindik mabû. Ger ji hefsarê serê te nebûya Xwedê dizane ka niha bi dirêjayî li ber kîjan dar û ber, kevir û zinarî bûm. Jîyaneke belaş û bedilhewa!...

Singê hespê xwe mist da. Hesp û ji mistdanê hez nekin? Di wê gavê da hespê Şamran, simê xwe li erdê xist. Ê de nal e, nal li salan jî dikeve û li xîç û keviran jî. Ji ber dengê nalên hespê wî di tarîya şevê da ji teyran teyrek per vekir û firîya. Quntara vî çiyayî jî wek serê wî bi mij û dûman bû. Xumînî bi dar û beran ketibû û deng hey diçû lê zêde dibû.

Destê wî li ser singê Şamran û peyvên wî jî tene tene bûn, got:

- Ger zilm û zordarî, feqîrî û tengezarîya dinyalikê nebe, jîyan li vî warî pir û pir xweş e. Ev fikrê min e, Şamran. Ez wisa difikirim...

Ji alîyekî va axaftina xwe domand, ji alîyekî va jî hilkişîya ser zinar û cî girt. Bêhnek da xwe şûnda jî axifî û got:

- Erê, ne min got li vî warî jîyan xweş e. Xweş e, lê ez nikarim vê gotinê ji bo rewşa me ya navxweyî bikim û bibêjim. Berjewendîya êl û eşîran, cûdayîya ol û zavan bûye asteng û nahêle em bi hev ra kar û xebatê bikin û bi miradê xwe şa bibin. Neyarê bav û kalan nabe dostê lawan! Heta em nebin yek, hevdu qebûl nekin û bi hev ra kar û xebatê nekin em nikarin bi miradê xwe şa bibin û rûyê rehetîyê bibînin. Ev rastî rastîya me ye û em nikarin ji vê rastîya xwe birevin. Werhasil…

Rêwîyê şevê, egîdek ji egîdên vî welatî bû, welatê Kurdistanê. Ji berîka xwe kîsê titûnê derxist û ji xwe ra cixareyek pêça, vêxist, bêhnek jê girt û ji kûr va kişand. Bîstekê xwe da bêdengîyê û deng nekir. Cixareya xwe kişand şûnda jî ji zinar şeqitî û hat xwarê. Li kêlekê û hema wiha li alîyê rastê darek hebû, darek bi çiqil. Hişk bû. Dest avêt çiqilekê, ber bi xwe va kişand, şikand û anî li ber zinarê mezin danî. Yên zirav bi destan û yên mayî jî dan jûnîyên xwe û şikandin. Ji wan darên ziravok û qalin agirê xwe dada û gurr kir. Agir e, ji alîyekî va dike gurpegurp û ji alîyekî va jî ronahîyê dide. Rêwîyê şevê, pîçek xwe germ kir û dû ra jî rabû. Di rabûnê da jî çû, ji cemê xurcik (heqîb) kerîyekî nan û çend cî jî şekir derxist û anî. Şekirê ku di destê xwe da girtibû, da Şamran. Pê ra jî kenîya û got:

- Ê de çi hebe, ew e. Li gel min çend cî şekir û kerîyek nan heye. Heke ji xwarinê tiştêkî din hebûya min qet nedigot na û dida te. Lê ez çi bikim, nîne. Hespê Şamran û ji şekir hezneke? Eha, ji te ra şekirê şîrîn. Lê divê tu jî vê gotinê ji bîr nekî, ha! Şam şekir e, welat şîrintir e!…

Hespê Şamran bi lêvên xwe va şekir girt, kir nav dev û diranên xwe û hêra. Wî hêra û camêrê delal jî gezek du gez li nanê destê xwe xist. Na, zêde nexwar. Kerîyê ku ji nan mabû ber bi hespê xwe va girt û xwast bidiyê. Hespê Şamran û bixwe? Na, nexwar. Nexwar, lê kir hîrehîr û pê ra jî serê xwe hejand. Li ser vê yekê camêr, axifî û wiha got:

- Erê, lo! Xuya ye tu dixwazî di tarîya vê şevê da serî li min evdalê Xwedê bigerînî! Ma ne wiha ye? Dizanim ji birçîbûnê zêdetir tu tî yî û ji min avê dixwazî. Wexta ku meriv tî be, xwarin zêde nayê bîra merîyan...

Tuka xwe daqurtand û carekê din hat ser axaftina xwe ya berê. Di berdewamîya axaftinê da jî wiha got:

- Ê de şev e, ha! Îcar di tarîya vê şevê da ez ê çawa xwe bi-

gihînim ser avê û çawa ji te ra avê bînim, Şamran!? Eha, av li wê piştê û rê jî li ber min wenda ye. Tu ji min avê dixwazî û ez jî neçar im. Ê erê, ha! Bi dengê xwe av heye, lê ez feqîrê Xwedê nizanim ka cihok li kîderê ye. Heke di vê qorîyê da rê hebûya min nedigot na, dida pêşîya te û te dibir ser avê. Ê erê, lo! Ez jî dizanim wiha nabe. Na, Şamran! Na, nikarim te wiha tî û bê av bihêlim. Lê, dîsa jî dibêjim xemgin nebe. Xemgîn nebe, heke derî tev girtî bin, yek jî miheqeq vekirîye. Ew derî jî derîyê xêrê û çareserîya pirsgirêka min û te ye. Ê de baş e. Ka hela tu jî hinekî bi hedûra xwe be, heyran. Bi hedûr be, heta ku min ji vê avê ra rîyek dîtiye…

Di cemê xurcik da kedik û hebanek hebû, jê derxistin, anî û danîn ser zinar. Dû ra jî li hespê xwe vegerîya û got:

- Şamran, tu tî yî û naxwazim te bê av bihêlim. Te bê av nahêlim, lê nikarim te bi xwe ra bigrim û bibim jî. Ez dibêjim tu were li vir bimîne û neke hîrehîr. Ez bawer nakim gur û hirçên vî çiyayî berê xwe bidin te û werin. Lê dîsa jî nayê zanîn û nikarim di vî warî da tiştekî bibêjim. Gur û hirç û li van çiya û banîyan nebin! A ji ber wê yekê jî ez naxwazim te bi vê darê, dara mazîyê va girê bidim. Ê de dîsa jî çi dibe çi nabe, bila hefsar li histûyê te be. Ka hela bisekine ez ê hinekî din daran li vî agirê me bar bikim û bila gurr bimîne. Sebrîyê bavê min, timî digot “Gur û xwe li agir bigirin? Na, gur tu car xwe li agirê gurr nagrin û nayên!” Ez bi xwe jî ne bawerim ew ê berê xwe bidin vî agirî û werin. Lê bila be, dîsa jî em ê agirê xwe gurr bikin. Cinawirên ku li çol û çiyan dijîn, ne niha, lêbelê di zivistanê da, di berf û baranê da har dibin. Ji ber ku xwarin nîne û birçî dimînin. Erê, min gotibû bila hefsar di histûyê te da bimîne. Na! Bila, ew jî nemîne. Zîn û binzîn!? Bila ew bimînin, di hatinê da ez ê wan vekim û daynim. Eha, wa ye min da rê! Didim rê û ez ê biçim. Ez diçim, êdî tu û bextê xwe. Şevek ji şevên payîzê ye, Şamran. Demsal çi dibe bila bibe fî-

qîna bayê ye û xumînî bi kelem, dar û beran ketiye. Ji axaftinê zêdetir av girîng e. Ê de vê gavê bi xatirê te, Şamran. Heta ku bi ava kedikê vegerîyam û hatim...

Camêrê delal, ji nav agirê gurr darek qalin hilda û di ronahîya wî da çû ba hespê xwe. Dest li histûyê wî gerand û got:

- Ji bo avê diçim û tu jî miqateyê xwe be...

Û di pey ra jî xwe li dengê avê va girt û berê xwe da qîyame. Di destê wî yê rastê da pêtal û di destê çepê da jî kedik û heban hebûn. Xwe li dengê avê girtibû û diçû. Çû û di daristanê da ji ber çav wenda bû. Berê wî li cihokê bû. Cihok? Cihok jî di qorîya Warê Pisîkan da û li alîyê rastê diket. Rêwîyê şevê, ber bi jor hilkişîya û ji gelek kaş û kendalan ra derbas bû. Derbas bû, lê carê carek jî li pişt xwe zivirî û di mebestê da xwast hespê xwe bibîne. Na, nedixuya. Hespê xwe li pey xwe hiştibû, ji ber wê yekê jî xemgîn û bi teşqele bû. Hespê Şamran û bi serê xwe bimîne!? Na, nebû. Nêzikê cihokê bibû. Ava cihokê biaheng bi ser kevir û zinaran ra girtibû û dixulxulî. Wek çawa ji evîndaran evîndarek ji axîn û kesera dilê min û te ra bilorîne, bi wî awayî dixulxuland û diherikî. Li pişt xwe vegerîya û carekê din di tarîya şevê da ber bi hespê xwe va mêze kir. Mêze kir, lê tiştê ku xuya bike nebû. Ji bona ku jê ra avê bibê gihîştibû ser cihokê. Ava vê cihokê ji qelşa du zinaran diherikî û dikişîya. Dara ku di destê xwe da wek pêtal girtibû, di erdê da çikand, çok da erdê, dev kir avê û qurt bi qurt vexwar. Nekarî zêde vexwe, ji ber ku sar bû. Bi qasî ku vexwe vexwar û pişt ra jî dest û rûyê xwe şûştin. Hespê Şamran û ji bîra wî biçe!? Na, nebû. Li ber xuşîna avê bêhnek da xwe û pê ra jî guh da dengê şevê. Ê de dema ku meriv bi qisawet be, li cîyê xwe diqilqile, tê û tere û ne bi kêfa xwe ye. Herçiqas bi bedenê xwe va li wir be jî bi hiş û hişmendîya xwe ne li wir e. Rêwîyê şevê, yekem kedika xwe bi avê dagirt û pê ra jî devê wê zexim girêda. Li pişta wî şûtik, li serê wî jî kum û kefî



www.arsivakurdi.org

hebûn. Dest neavêt şûtik, lê kefîya ku li dora kumê xwe pêçabû vekir û li ber cihokê raxist. Negot şil û ziwa û li ber avê bi navê gîya êdî her çi hebe, bi destan rûçikand, kir kefîyê û girêda. Berîya ku rabe û bi rê bikeve jî carekê din dev kir avê û qurt bi qurt vexwar. Gîya û kedika avê ji erdê hilda, bi lez û bez berê xwe da dewsa xwe ya berê. Heke qisawet hebe meriv ecele dike. Di hatinê da berê wî li qîyame bû lê niha berjêr diçû. Di destên xwe da du pêtal girtibûn. Ne zêde, lê hema wiha çend gav avêtibûn neavêtibûn ji nişka va ji ber dengê ku hatibû hilceniqî û dest avêt xençerê. Dû ra jî rewşa êrîşê girt û wiha got:

- Law! Ka hela bibêje min, tu kî yî? Tu lawir î yan!? Çi zanim, belkî jî tu yan hirç yan jî keftar î? Hê ku min evdalê Xwedê berê xwe nedaye te û serê te bi vê xençera destê xwe nefirandiye, deng vede û bibêje. Bibêje min, ka tu kî yî?

Ji alîyekî va axaftina xwe domand, ji alîyekî va jî ber bi dengî va çû. Di ronahîya pêtalan da xençera ku di destê xwe da girtibû wek çawa stêrkek biçirûse, bi wî awayî diçirûsî. Li Warê Pisîkan, di rîya avê da pirs hebû, lê ji pirsê ra bersiv, nebû. Xwe bi xwe axifî û got:

- Heke ji pirsê ra bersiv nebe, ne hewce ye ku meriv wê pirsê bike.

Bi baldarî gavek du gavên din avêtin û dît, xwedîyê deng hespê wî bi xwe ye. Bi denegekî bilind kenîya û got:

- Wey, ê de hela tu were li min û hespê Şamran?! Errrik, bavo! Îcar tu û vir? Gelo qey bê min hedûra te nayê ku tu carê carek berê xwe didî min û têyî! Ne min gotibû, li benda min be, ez dereng namînim û têm. Ê de baş e. Bide pey min û em ê bi hev ra dîsa berê xwe bidin dewsa xwe ya berê. Min ji te ra hem ava cihokê hem jî gîyayê ber avan anîye. Ava te di kedikê da û gîyayê te jî di vê kefîyê da ye, ê de haydê...

Da pêşîya Şamran û piştî demekê jî gihîştin dewsa xwe ya berê. Li ber zinarê devê rê Şamran tehnek li siwarê xwe xist. Rê-



www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

wîyê şevê, ji milê xwe kedik û kefîya gîya danî, kişîya ser zinar û benê kedikê vekir.

Vekir şûnda jî kedika xwe kir bin çengê xwe û got:

- Li benda te me û fermo, Şamran. Ava te amade ye. Yekem tu ava xwe vexwe û dû ra jî alif tê. Alifê te? Alifê te jî gîya ye, gîyayê ber avan...

Ji kedika bin çeng av rijand kulmên xwe, fîtika xwe lê xist û hespê wî jî bi qasî ku vexwe, vexwar û pê ra jî bû hîrehîra wî. Rêwîyê çolê, ji cîyê xwe rabû, gîyayê ku anîbû li ber zinar vala kir û zînê hespê xwe danî. Zîn danî, lê bêleme hîşt. Hespê Şamran, li ser alifê xwe bû. Siwarê wî? Siwarê wî jî ji alîyekî va dest bi mistdan û tîmarê kir, ji alîyekî va jî axifî. Çi got? Çi bibêje, got:

- Ji şevan şevekê dirêj e, ezbenî. Bila ev agirê me gurr bimîne. Çer hebe dar jî hene û daristan jî. Kes nabêje ka çima te ji qorîya min dar dizîne û birine. Sar û sermaya vî çiyayî ne hindik, lê pir û pir zêde ye. Divê ez xwe germ bigirim. Erê, ha! Ne tenê ji bo xwe jî dibêjim, heyran. Heke em xwe germ negirin nexweşî ye û nexweşî jî nabêje ez hatim. Îşev em ê li vir bin. Çi demê ku tirîja rojê xwe da navçeyan û sibeh li me zelal bû, teze wê çaxê ji min û te ra rê vedibe û rêwî di rîya xwe da...

Egîdê Kurd, di navbeyna gîya û agir da ji xwe ra cî vekir, pişta xwe da zinar û rûnişt. Bi xulîn û xuşina xwe va ava cihokê ji şevê ra hem deng hem aheng bû. Rêwîyê şevê, hêdî hêdî ji ber xwe va lorand û dû ra jî dengê xwe bilind kir. Belê, ji alîyekî va lorand û ji alîyekî va jî stira û got:

*Weylê dînê çiya bilind in, te nabînim lê te nabînim*
*Wa kurmalê gul sor bûne naçilpînim*
*Gundî malîno ez ê ser dilê xwe û kewa kubar ra*
*De tu dilan nahebînim.*
*Lê lê dînê pezê gundê we zozanê me çêrandin, me çêrandin*
*Eman dîno xamberîra dûw gerandin, dûw gerandin*

*Hey lê dînê keçikê gundê we bedew in*
*Xortê gundê me helandin, me helandin…*

Erd jî wek ezman bi tarîya xwe bû. Li vî çiyayî û li ber agirê gurr ji xweşmêran xweşmêrek rûniştibû. Ronahîya agir dabû bejn û balê û rûyê wî yê bi xwirî. Egîdê Kurd, yekî bi navmil, dest û pê bû. Bi şal û şapikê xwe yê xakî bû. Bi kum û kefî û li ser enîya wî jî dewsek hebû. Di balê da yekî esmer û li ser xwe bû. Di mêzekirinê da tiştê ku yekem bala merîyan dikişand pozê wî yê kov bû. Belê, yekî pozberan, bi dev û lêvên tenik bû. Ji kesan kesekî beşerxweş û di rawêjîyê da jî te nedikarî li ser temenê wî tiştekî bigota.

Ber bi hespê xwe mêze kir û yekem got:

- Erê û erê, Şamran!..

Xulekî du xulek bêdeng ma. Ew bêdeng ma, lê xulîn û xuşîna avê û xişîna dar û beran ra jî te digot qey ji vî çiyayî ra senfonî ye.

Piştî demekê egîdê kurd dîsa vegerîya ser axaftina xwe ya berê û got:

- Bi vî navê xwe ez Navdar im, Navdarê Kurd. Min ji nas û dost, heval û hogirên xwe û wan jî ji min hez kir. Ka îcar ez ê ji te ra qala kê bikim û kê nekim. Bi navên xwe ew, di dilê min da her û her bi germîya xwe ne û ez jî ji wan dûr û bi hesret im!...

Hênijî û di pey ra jî serê xwe li hêla çepê, di ser milê xwe da tewand, çavên xwe da hev û di xem û xîyalên xwe yên borî da bû rêwî û bêdeng ma.

www.arsivakurdi.org

# II

*Mirineke bişeref ji jîyaneka bêşeref çêtir e.*

**Xalid Begê Cibrî**

Berî û berîstan, çol û çolîstan, bihar, havîn û payîz çûn, ma zivistan.

Li vê Serhedê, Serheda şewitî ne dem ew dem, ne jî bihar ew bihar bû. Bi gotinên wî kalî, kalê heştê salî, li vî warî tu car bihar nebûye û ew ê nebe jî. Rojek ji rojên havînê nebû te yê bigota, ê de hela tu were li min û kelekela vê havînê; germ e, lê çi germ çi germ! Errrik, bavo! Di xwêdanê da bûme av! Tu yê bibêjî bila li guçîlên daran pelek bimîne û zer bigire, nebû. Heke li ser gûlîyên xwe pelên daran li ba bûna û biweşîyana belkî, ew jî belkî te dikarî bigota demsal payîz e. Kambax be, rê û dirb, kevir û dar û berên Xwedê di bin berfê da wenda û ji ber pûk û tozikê, tozika vê berfê te nedikarî gavek biavêta. Li vê herêmê çiya û banî, kaş û kendal, newal û neqebek nemabûn ji berfê ra dîl nekevin. Îro? Îro, ne wekî pêr û betirpêr bi ba û bagêr, hewa vekirî û ezman çîksayî bû. Bi kaş û kendalên xwe va Çiyayê Qertewînê ji dûr va çîlspî dibiriqî û diçirûsî. Ji îhtîşam û zerafeta wî ra gotin nebû te bikira. Çiya bû, lê çi çiya çi çiya!... Di zivistanê da her bi ba û bahoz, berf û baran û di biharê da? Di biharê da jî ji gul û çîçegên wî te nedikarî gavek du gav biavita, ji vir heta wir bihatayî û biçûyayî. Helbet, çiya ne û çiya jî nînin bi kaş û kendal, newal û neqeb, dar û berên xwe va nebin. Meriv ku berê xwe bide Çiyayê Qertewînê û here îcar qala newalek wek Newala Gulan nake! Ger nekir qet nabe. Ê de pirs e û pirs jî ne

www.arsivakurdi.org

xerîb e; çima ne bi navekî din, lê Newala Gulan? Bila bersiva vê pirsê li alîyekî bimîne, lê tiştê ku dihat zanîn û te dikarî bigota jî bi hebûna xwe Newala Gulan, di havînan da mexelê pezê nêr, cîyê kar û berxan, di çêra wê da kavir û hogeçan qelew digirt û dûv digerand. Heke ji nezanîyê yek rabe û bibêje di wê newalê da, di Newala Gulan da şivan û berxvanan tu car ho nekirine, bobelatan bi ser xwe da tîne, vir û derewan dike. Rastî ne ew e, lê rastî ev e ku di wê newalê da ji alîyekî va şivan û berxvanan ho kirine û ji alîyê din va jî ji karan yan kareke xwe ya beş û yan jî ji berxan berxeke hilî daye guran. Di vir da? Di vir da edalet ew e ku dema te qala şivan û berxvanan kir, nabe tu qala gavan û golikvanan nekî. Ger te qalê nekir ew edalet, ne edalet e. Ga û gamêş, boxe û boxeçor, çêlek û mange, ker û mozik di garanê da bila werin ba hev, gavanê gund jî bila sibê zû rabe, lê xemsarîyê bike û berê wê naxirê nede çol û çiyan û nebe!? Na, nebû. Nebû û ser da jî ber bi gundîyan va mêze dikir, qure qure diaxifî û digot:

- Çêlekek bi şîr, ji deh mîhên bê şîr çêtir e.

Piştî vê hevokê jî navbeynek dida axaftina xwe, gewrîya xwe paqij dikir, tûka xwe dadiqurtand û carekê din dihat ser axaftinê. Belê, dihat ser axaftinê û wiha digot:

- Ê erê, wey!... Gavan ku gavan be, tu car berê naxirê nade asêyên beyhûde, lê dide Newala Gulan. Newala Gulan, cîyê ga û gamêşan e. Tu aragîyê bike, berê çêlekê nede newalê, lê tu rabe û bibêje ka şîr!? Yaxme nîne! Ez gavan im, gavan! Sibê radibim berê naxirê didim Newala Gulan, êvarê jî didim ber xwe, bêpirs û pirsgirêk tînim û teslîmê we camêr û canikan dikim...

Bila gavanê gund bi fexr û quretîya xwe be, ji bilî şivan û berxvan, gavan û golikvanan roj ku dihat îcar jî nazik û nazenînan berê xwe dida wê newalê, Newala Gulan. Ji alîyekî va berê xwe dida û ji alîyekî va jî dengê xwe bilind dikirin û bi ahengek sivik

û xweşik distiran û digotin:

*Newalo bi dar e*
*Domê domê domrîgê*
*Çavê gur li karê*
*Kar karika mixtar e…*

*Newalo bi av e*
*Domê domê domrîgê*
*Çavê gur li berxê*
*Berx berxika mixtar e…*

Qîzê, bila tu qîz bî û tu yê ji bo pel û pincarên çolê berê xwe nedî Newala Gulan û nestrî!? Na, nebû. Li vî welatî, li welatê qedîm êş û azar, belengazî û neçarîya dinyalikê hê ji pêsîra camêr û canikan neketibû. Heke meriv zikek têr û yek jî birçî be, berê xwe dide her derê; çiya bi çiya, belan bi belan, newal bi newal digere û di qismetê da jî wekî pel û pincar êdî her çi ku hebe berhev dike û diavêje tûrik, tûrikê li mil. Ê de tûrik e, di çûyînê da ku vala be, di hatinê da jî miheqeq dagirtîye. Xîzanî bû û ji kal û pîran gilî û gazin nedihat kirin. Heke zikê merîyan birçî be, çavê merîyan jî timî li rê û dirban e. Kalê heştê salî ku rastê qîzek ji wan qîzan bihata û îcar nedipirsîya? Belê, wele dipirsî. Dipirsî û digot:

- Qîza min, herçiqas hatibe gotin çavê li derîyan xwelî li serîyan! Lê eha, wa min ji te dîlberê pirsî û çû! Sosina min, ka hela bibêje di wê tûrikê te da çi heye?

Tûrik e û di tûrikê rengîn da ka îcar çi nebû ku te yê bi nav nekira û negota: kereng, so, ribês, qarî, kifkarik, mendik, heliz, gulik, sêbisk, sîrim, goştberxik, pirpar, gorêz, silmask, tirşo, pûng, tolik, zengilzava, soryaz, karîbelg, cehtirî û wekî din jî hema êdî çi ku hatibe aqilê te...

Bila bihara rengîn bi wan pel û pincarên xwe yên çêşîtdar li alîyekî be, di havînê da li vî warî hewa hênik, ezman çîksayî bû. Dema ku hîv ji çiyan difilitî û di riman da bilind dibû, deşt û zozan, mêrg û zevî, çem û kanî nebûn di wê zerayîyê da, di zerayîya hîvê da xerq nebin. Şivano şivanê mîyan, dorçîyo dorçîyê şêvê ka hela bibêje li belanê vî çiyayî û di şevîna pez da tu jî xerq bûyî yan na? Bila birê pez li şevînê be û gurrêxek-du gurrêx jî li ber nebin, dibe? Na, ne bê Qero ne jî bê Bazo dibû. Li vî belanî, li belanên Qertewînê ku meriv şivan be, li gel merîyan kulav jî heye, bilûr û keban jî. Şivano, şivanê şevê! Qey tu nabînî hîv di rimek du riman da bilind bûye û zerayîyê xwe daye deşt û zozan, newal û neqeb, kaş û kendalan... De ho bike. Ho bike, bîne û pezê xwe bike vê guherê. Di pey ra? Di pey ra jî dest biavêje dara bilûrê û ji me ra lêxe qeydê mîyan. Lêxe şivano, lêxe û bila ji şevê ra hem bibe deng hem jî aheng.

Ew çi xweşî bû wiha, çi xweşî! Ax, dilê min yo yo dilê min yo... Bila ji bilûra wî şivanî terane pêl bi pêl bilind bibe, li deşt û zozanan bigire û belav bibe, ji xwe ra em ê werin û li wê pirsê vegerin, pirsa ku li bersiva xwe digerîya. Çima ew newal bi navê xwe ne Newala Keviran, lê Newala Gulan e!? Meriv ji bo xatirê xatiran ranabe û hema wiha bîlasebeb nav nade tiştan û lê nake. Bila bi hebûna xwe ew newal bexçê gulan be, tu jî rabe û jê ra bibêje, Newala Keviran! Xwedê vê yekê qebûl nake, Xwedê! Eha, Deşta Mûşê çiqas bi laleyên xwe navdar be, Çiyayê Qertewînê jî ewqas bi newala xwe û di newalê da jî bi gul û çîçegên xwe yên rengîn navdar bû. Dem û dewran e, tê û derbas dibe. Heta roja îro wê newalê, Newala Gulan ji hebûna xwe tu tiştekî wenda nekirîye û wek xwe maye. Wek xwe maye û di sîya Qertewînê da ew ê wek xwe jî bimîne. Qertewîn? Qertewîn, di rewşa xwe da guharbar bû. Roj dihat bi kufîna xwe û roj dihat jî te didît bi mij û dûmana serê xwe ye. Car jî hebû xemgîn û te digot qey



www.arsivakurdi.org

bimbarek di şînê da ye.

Di zivistanê da Çiyayê Qertewînê û hêrs nebe!? Zû hêrs dibû. Agresîf bû. Bêhedûr bû û wek çawa ji hespan hespekî kumêt ji zînê xwe vala bibe û neyê zeftkirin... Vî çiyayî, çiyayê qedirzan bîlasebeb ba û bahoz ranekir û pê ra jî newal û neqebên kûr neda ber xwe û bi berfê tijî nedikir. Çawa hêrs nebe, nekufe û neqehire, çawa!? Di biharê da tu were bi wan gul û çîçegên xwe yên rengîn xwezayê bixemilîne, di havînê da ji berx û beranan ra bibe mexel, bibe war û wargeh, nebêje ev şênî, ev ne şênî û ji tevan ra bibe yar, bibe zozan, bibe seyrangeh û niha jî tu were bimîne wiha vîk û vala, xir û xalî... Çiya bila çiya be, lê bila ne hêrs bibe ne jî tozikê rake!? Helbet, hêrs dibe. Hêrs dibe, ji ber ku ne konek wek Konê Bavê Lalo lê ye, ne jî ji evdan evdekî Xwedê bi silaveke germ berê xwe daye wî û hatiye. Erê, wey!... Madem qedr û qîmet, xwezanî û hezkirin e, ka îcar ew dilovanî ji çi rojê ra ye, ji çi rojê ra? Wefa û wefadarî tiştekî ne erzan e ku tu yê bibêjî dev jê berde, tew qet ne bîne bîra xwe ne jî qalê bike. Her kî bi wefa ye, ew bav û bira ye. Erê, em ê werin hêrsa wî ya pêr û betirpêr! Ji tirs û xofa wî te nedikarî gavek du gavan biavêjî û ber bi wî va biçî. Dema ku çiya hêrs bûn ne li hêsirên çavan ne jî li bejn û bala merîyan mêze dikin. Lêbelê bi firqek; bi kevir û zinar, dar û ber û şikeftên xwe va ji mêr û mêrxasan ra timî sî û sitar, yar û mirad; ji hemû bizdonek, sîxur, xayîn, pûşt, zeftekçî, bênamûs, qebrax, zilimkar û xwefiroşan ra jî derîyê xêrê nebûn. Çiyayê Qertewînê, îro ne bi mij û dûmana serê xwe bû. Ji vê deştê, Deşta Entabê dema ku te çavê xwe lê digirt û mêze dikir, te nedigot çiya, lê te digot qey kifkarikek ji kifkarikên newala xwe ye, ji dûr va dibiriqe û diçirûse. Ê de însan e û şîrê xav mêtîye. Çi zanim, divê ji gotinên gotinbêjan bikevin şikê û bibêjin ne rast e. Ê de bila be. Madem ku ne rast e û qebûl nakin, eha! Eha, Kelha Zincîrê û bila ji xwe ra berê xwe bidin û jê bi-

pirsin. Kelha Zincîrê, roj dîtîne ji rojan xweştir. Roj dîtîne bi berf û baran, sir û seqem, ba û bagêr. Roj dîtîne xwîn dirije ji xwînê sor û sorgeweztir. Tu car vir û derewan nake, Kelha Zincîrê. Bi qasî ku bibîne, dîtîye û jîyaye. Riwayet e, dibêjin Kelha Qertewînê (Kelha Zincîrê), navê xwe ji wan zincîrên xwe wergirtiye. Wergirtiye, ji ber ku di navbeyna Kelê (Melezgir) û Çiyayê Qertewînê da hatin û çûyîn ne hêsan û bi zehmetî bûye. Êdî paşa ye, xan e, yan jî mîr û mîrek e, nayê zanîn, lê biryarê dide û ji hosta û zanayên xwe ra wiha dibêje:

- Hûn jî dizanin ku meriv ne dikare ji Kelê (Melazgir) berê xwe bide Qertewînê û here, ne jî ji wir dikare derbasî vî alî bibe. Na, wisa nabe û divê ji vê pirs û pirsgirêkê ra çareyek bête dîtin. Pêwistîya me bi rê heye, lêbelê rîya ku ez dixwazim jî bi dar û ber û keviran nabe. Ji hatin û çûyînê ra rîyek wisa çêbikin ku bila Çiyayê Qertewînê bi Kelê û Kelê jî bi Çiyayê Qertewînê va girê bide. Eha, wa yê min ya xwe got! Gotin ji min, çêkirin jî ji we. Êdî ji xwe ra hûn çawa çêdikin hûn dizanin...

Hosteyên dar û dîwaran, di nav xwe da tînin û dibin, li ser vê babetê dişêwirîn û di encamê da biryara çêkirinê didin, çêkirina pirê. Wey, pire! Pire, bila mala te pireyê bişewite! Ji zîncîran û pire!? Ê erê, wey! Çima, na? Eha, dema ku îcab kiriye meriv dikare ji dar û beran jî, ji kevir û zinaran, ji kindir û zincîran jî pireyan çêbike. Ê de tu bibêje bila mala wan hostayan hezar carî ava, rabûne û çêkirîne jî. Di navbeyna Kelha Qertewînê (Kelha Zincîrê) û bajarê Kelê da bi zincîran, zincîrên qalin û dirêj pire çêkirine û ji hatin û çûyînê ra jî êdî tu pirs û pirsgirêk nehîştine. A ji ber wê yekê jî bila kes nebêje, lê bila Kelha Zîncîrê bîne ziman û bibêje. Ji ber ku şahidê gelek û gelekî bûyeran e. Kelhek dîrokî ye, Kelha Zîncîrê. Şer dîtiye ji şeran dijwartir, pevçûn dîtiye û qal û qir... Rast e, kevir di cîyê xwe da giran e. Lê kevirên vî çiyayî, Çiyayê Qertewînê ji hemû keviran girantir in. Ji ber ku bibingeh

in, nivî li hewa be, nivî jî di bin erdê da veşartî... Kevir ku kevir in, ew jî dizanin ka îcar çi afat bi ser vî çiyayî da hatiye. Heke ji wan keviran kevirekî kerr û lal were ziman, tu ji Xwedê bawer bike qet tu eş û azarek nahêle neyne ziman û nebêje. Ew ê çi bibêje? Çi nabêje, yekem ji kûr va axin dikişîne, di pey ra jî xal bi xal dest bi axaftinê dike û ji min û te ra ne kêm ne jî zêde wiha dibêje:

- Çi bibêjim, ezîzno? Ka ez ê ji kû va dest pê bikim, ji we rêzdaran ra çi bibêjim û çi nebêjim!? Kevirek ji kevirên vî belanî me. Êşa me keviran êşa vî çiyayî û êşa wî jî êşa me hemûyan e. Derd û kul, êş û azar, xemgînî, şîn û şayî ku hebûye em bi hev ra parva dikin. Li vî belanî erd biheje em jî pê ra dihejin. Her çi xirabî li vî çiyayî hatibe kirin, em jî tê da ne û li me jî hatiye kirin. Heke di navbeyna merîyan da hezkirin hebûye ka îcar çi firq dike, ha tu gir û mezin bûyî, ha jî hûr û piçûk... Na, qet firq nake. Çiyayê bi ezamet timî ji me û me jî qet tu şik nîne ku di vê hebûna xwe da ji wî hez kir. Ez qala vî çiyayî dikim, Çiyayê Qertewînê. Ez qal dikim, lê!? Heke min gotibe 'lê!...' tu wer bizanibe ku têda hem lêlê, hem lolo hem jî qirêjî û pûştî heye. Çima? Ma 'çima' jî pirs e? Çiyayê ku em lê ne bi navê xwe, Qertewîn e. Lê de tu were li min û wan teresan, teresbavê Romîyan!... Bila Romî ji xwe û axa xwe tu car xêrê nebînin, ji ber ku rabûn û navê Qertewînê guhartin; heyla lê dayê, heyla lê wayê! Heyla lê lê dayê hela tu were li min û vê belayê. Qertewîn, navê vî çiyayî û Romîyan nav lê kir û Qertewîn jî bû; 'Katerîn Dağı.' Ne zêde, lê hema wiha hindik mabû ku jê ra bibêjin: Katerîna, Katerîna Dağı Ê yanî! Romî ne û lome jê nabe. Mala Romîyan bişewite!... Cinsîyet ku mê bûye mêyan dikin nêr û nêran jî dikin mê. Çi sosret çi sosret; 'Katerîn Dağı!' Ê de normal e, heyran. Normal e, ji ber ku lingê Romîyan li kû derê ketibe li wê derê gîya şîn nebûye û ew ê nebe jî. Ez nabêjim, lê tu bibêje. Çiya bi navên xwe çiya ne.

www.arsivakurdi.org

Ji vî navî xirabtir, ji vê êşê jî dijwartir êş heye ku ez ê ji we ra qalê bikim û bibêjim. Çiya bi esalet û giranîya xwe çiya ne. Kevirek ji kevirên vî çiyayî me û ez ê çawa li ber xwe nekevim û çawa xemgîn nebim!? Madem ku çiya çiya ne, ê de bila ji ber vê zilm û zordarîyê ne bikufin û ne jî hêrs bibin... Hey lo lo, hey lo! Nebêjin qantir nazê, roj ku hat ew jî dizê! Bi kevir û zinar, dar û ber û şikeftên xwe va me ne carekê, lê me pir û pir caran ji mêr û mêrxasan ra hembêz vekirîye û em ji wan ra bûne sî û starî. Di zagona me da pûştî, qelaşî û bêbextî nîne. Me tu car xîyanet nîne. Em nizanin ka xîyanet çi ye, tiştekî çawa ye. Em ne qehpe ne ku qehpetîyê bikin! Durûtî ji me dûr e. Ji ber ku em ne Romî ne...

Bila bi giranî û esaleta xwe çiyayê birûmet li dewsa xwe be, di pêr û betirpêr da berfa ku barîbû ne li xanîyan pace, ne jî derî û kulekek hiştibû. Ji ber xişm û xezeba berfê, ba û bagêrê kesên ku xulek du xulekan bikaribin ji malên xwe derbikevin, nebûn. Zivistan ku zivistana Serhedê be, ê de teze tu were li min û vê berf û vê tîpîyê. Bi wê xumexuma xwe ne dibêje şev ne jî roj; dibare, dibare û dibare… Baran e û nayê zanîn. Car heye di pişkan da lê dike û dibare, car jî heye lepelep... Berfa pêr û betirpêr!? Na, te jê ra nedigot berf e, lê te digot qey xişm û xezeba Xwedê ye, lêkiriye û dibare. Heke berf û baran bi wê xişm û xezeba xwe be, kalo û nekufe!?

Hem dikufe hem jî jê lome û gazinên xwe dike û wiha dibêje:

- Ax, gundo! Gundo tu bişewitî. Ê de hela tu were li min û vê xişm û vê xezebê. Na, bavo! Ne baran e, lê tu dibêjî qey afatek ji afatên Xwedê ye, lêkiriye û dibare. Tu dibêjî qey roj roja mahşerê ye û qîyamet rabûye. Tu yê bibêjî bila hema wiha xulek du xulekan navbeynê bide, nîne. Ê de hela tu were li min û vî gundî! Na, bavo gund nîne! Tu dibejî qey erd qelişîye û tê da wenda bûye: wax, wax, wax ne xanî ye, ne gom, ne kadîn, ne jî ji qela-

xan qelaxek maye. Qey di vî gundî da lod nebûn? Lod hebûn ji lodan bilindtir. Ka îcar li kû ne û di kû da çûne! Wel, wel, wel barîye, lê çer jî barîye! Tu dibêjî qey kefenek ji kefenê mirîyan e, bi ser vî gundî ra girtiye û pêçaye. Kalo, nemire bihar tê pîrê nemire kivar tê! Na, bavo çi bihar û çi hal...

Di wê ba û bahoz, berf û baranê da kal û hêrs nebe û nebêje, dibe? Di berdewamîya axaftinên xwe da jî bi awirên çavan li jina xwe mêze dikir, eyar dida dengê xwe û wiha digot:

- Ê de hela tu were li min û vê jinikê? Jinik, jinik! Ji bo Xwedê û pêxember ka hela bibêje min, gelo ka tu agir û şewat î yan, tu pêt û bîzot î? Wey, bavo! Rabûye ji min feqîrê Xwedê ra dibêje here ji lodê gûrzek gîya bîne, bide ga û gamêş, çêlek avis e û bike ber çêlekê. Ê de tu tu be, tu yê were dîn nebe. Na, bavo! Na, ne dikarim ji cîyê xwe bilivim ne jî di vî ba û bagêrê da dikarim berê xwe bidim lodê û herim. Ê de jinik jî jinik e, heyran. Nabêje wîîî, mêrik mêrik! Ma te aqilê xwe bi nan û penîr xwariye tu di vî ba û bahozê da berê xwe didî lodê û terî! Na, nere. Nere, bila ba û bagêr parikî sivik bibe, dû ra. Ger ku bigota, di vê berf û baranê da îcar tu yê çawa herî lodê, çawa gîya bînî û çawa bidî terş û mal? Min fam dikir, lê jinik û bibêje. Bigota, mêrik! Lo, de li ber sobê ji xwe ra pal bide, heta ku vê berf û baranê navbeynek daye. Na, bavo! Jinik û bibêje...

Li derva ku ba û bahoz bûya, nedihat wê wateyê ku di hundir da her tişt berkemal e. Camêrê bi hêrs, li ber sobê pal dida erdê û pê ra jî vedigerîya ser axaftina xwe ya berê û digot:

- Wax, wax, wax pezê feqîr di gomê da tî û birçî ma! Tîpî ye, rê nade ku ez ji xwe ra berê xwe bidim lodê. Ger bihîşta diçûm ji lodê min qefşek du qefş gîya dianî û di dangî da radixist, lê...

Ê yanî!... Zivistan zivistana Serhedê bû û te nedikarî ji berfê, ba û bahozê lome û gazinên xwe bikira. Pîrika Xecê ku Pîrika Xecê ye, ê de bila di wê ba û bagêrê da ji bo xortê malê li çokê

xwe nexîne û nebêje “Ax, berxo! Berxo, bila koranî di çavên min da were, koranî! Eha, di vî ba û bahozê da rabûm û min berê te evdalî da wî gundî, gundê du roj ji vir dûr. Eha, bi ser çûyîna te ra heft roj derbas bûne. Heft rojên xedar ji min ra bûn, heft sal. Bêhedûr im, berxo. Bila koranî di çavên min da were, koranî! Bûm sebeb û rabûm min te bi rê kir û şand!...” Xwe bi xwe diaxifî, xemgîn dibû û dû ra jî di tûrikê wê da êdî çiqas çêr û xeberên nexweş hene ji ba û bahoz û ji vê berf û baranê ra dikir û dikir. Çawa neke, zikê birçî û bi berfê têr bibe?

* * *

*Zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane!*

Ev bibû çend roj ku ne dawî li xumexuma baranê ne jî li vîzevîza ba û bahozê hatibû. Îro, ji pêr û betirpêr xweştir bû. Di berbangê da ew jî ne zêde, lê hema wiha di pişkan da carekê du caran rêşandibû û di pey ra jî vê baranê, barana zivistanê dewsa xwe dabû zelalîya rojê. Li vê deştê, Deşta Entabê mij û dûman nebû, heta ku çav bigire û bibîne her der çîlspî dibiriqî û diçirûsî. Eger gotin li ser Çiyayê Qertewînê û di derbarê wî da be, tu dikarî bibêjî ku bi wê zerafet û îhtîşama xwe çiyayê qedirşînas, ne bi hêrs û xezeba pêr û betirpêr bû. Ê de hêrs e û hêrs jî tiştekî siruştî û guharbar e. Helbet, car dizane. Car heye însan bi xwe jî bi hêrs û hêrsdarîya xwe ye. Ê de ev jî nayê wê wateyê ku ger tiştekî ji însanan ra normal be, ji çiya û banî, deşt û zozanan ra ne normal û tomet e. Di vê dinyayê da ka îcar çi heye ku wek xwe bimîne û neguhere? Na, diguhere. Diguhere, ji ber ku îro wek duh nîne û sibê jî ne wek îro ye. Belê, hêrs e û hêrs jî wek xwe namîne, pêda pêda dadikeve û ji holê radibe. Di rewşa xwe da çiyayê xoşewîst, ji diltengî û tengavîyê dûr bû. Di encamê da

te dikarî bigota ku ne wek rojên bihurî bêhnteng, lêbelê ji rewşa xwe razî û xweşhal bû. Çima xweşhal? Xweşhal bû, ji ber ku ne bi tenayîya serê xwe bû, ji mêrxasan du mêrxasên vî welatî berê xwe dabûn wî û hatibûn. Îcar çiya hene ku bi hatina egîd, lewend, mêr û mêrxasan xweşhal nebin? Di vê sar û serma, berf û baran, ba û bagêrê da bila Kerem Begê Qolaxasî, ji bo azadîya welatê xwe berê xwe bide Çiyayê Qertewînê were û Çiyayê Qertewîn jî ji hatina wî û hevalê wî xweşhal nebe!? Ev jî gotin e!? Na, ne tenê Çiyayê Qertewîn û li vî warî kîjan çiya dibe bila bibe ji hatina egîd û mêrxasan tim û timî xweşhal in. Bi dar û ber, kevir û zinarên xwe va Çiyayê Qertewînê bi xwe jî dizanî cîyê ku Kerem Begê Zirkî lê bûye, li wê derê hem bext û bextewarî û hem jî şad û kamranî heye. Na, na! Ne tenê ez û te, lê dinya alem jî dizane ku heke çiyayê qedîm ji hatina Kerem Begê Zirkî razî nebûya, ne ji wî ra hembêz vedikir û ne jî di şikeftên xwe da cî dida wî û hevalê wî. Ê erê, wey! Ger ku meriv bi mêr û mêrxasîya xwe be, ji merîyan ra cî jî heye, sî û starî jî. Çiya û ji merîyan ra bêbextîyê bikin? Na, tu car nebûye û ew ê nebe jî.

Heke Kerem Beg ji van çiyayên qedirzan biketa şikê, jixwe ne berê xwe dida wî ne jî dihat. Wek çawa meriv berê xwe bide mala xwe û were bi wî awayî berê xwe dabû Newala Gulan, Kelha Zincîrê û hatibû. Niha? Niha jî li ber devê şikefteke wî hatibû ser çokan, wekî çawa şêrek li nêçîra xwe bigere bi wî awayî cî girtibû, destên wî li ser dara mawizerê û berê wî jî li hevalê wî bû. Di şer da bûn. Axa welatê wî hatibû zeftkirin. Xwîn rijîyabû. Namûs hatibû binpêkirin. Ji vê yekê ra û bêdengî? Na, nedibû. Bêdengî mirin û mirineke wiha jî ne qebûlê Kerem Begê bû. Li vî welatê qedîm êş û azar, hêsirî, neçarî, zeftek, qal û qir hebû. Li vê herêmê, herêma xopan gund nemabûn vala nebin, bajar nemabûn hilneweşin. Ji ber zilm û zordarîya hêzên Ûris û Daşnaksutûn rev hebû, berxwedan û xweparstin, şer hebû. Hatibûn,

www.arsivakurdi.org

lê bi çek û sîlehên giran berê xwe dabûn vî welatî û hatibûn. Qor bi qor hatibûn. Tabûr bi tabûr berê xwe dabûn axa pîroz, bi ser gund û bajaran ra girtibûn, dabûn ber top û tifingan. Ji ber kiryarên wan yên gemar û qevçil mirin hebû, mirina zarok û zêçên hûrik... Şev û rojên dayîkên vî welatî bi şîn, zarîn û zivînên wan ne hema wiha bîlasebeb bû. Li vê herêmê, herêma Serhedê şênî nemabûn li rê û dirban nekevin, berê xwe nedin xerîbîyê û nebin mihacir. Ji alîyekî va xela rabibû û ji alîyekî va jî koçberî bû. Roj rojên oxirmê giran bû. Roj rojên xîretê bûn, xîreta lawê bavan. Li vî warî, warê mêrxasan te nedikarî qala tirsê, tirsa dilê şervanan bikira. Sengeran egît dîtibû, yek ji yekî çêtir û yek ji yekî çalektir. Li ser vê axê şer û mirin hebû. Ne tenê Kerem Begê Qolaxasî, lê bilî wî jî gelek û gelekî lawê bavan berê xwe dabû qada şer. Belê, em ê werin vî çiyayî? Li Çiyayê Qertewînê Kerem Beg û hevalê xwe, di kozikên xwe da bi cî bibûn. Ê de pirs e û tê kirin. Di kozikên van mêrxasan da ka îcar qet çi hebû? Çi hebe? Sar û sermaya zivistanê, berfa çiya, wêrekî, berxwedan, şer û şervanî hebû.

Qet tu şik nîne ku ya herî girîng jî kurd û kurdperwerî û helwesta azadîyê hebû. Ji alîyê neyarên xwe va hatibûn dorpêçkirin. Cîyê ku lê bûn ewle û ji metirsîyê dûr bû. Ji ber wê yekê jî vê gavê nedixwastin di vir da wê da bilivin, werin û herin. Her bi baldarîya xwe bûn û mêrxasê ku bi Kerem Begê ra jî bi navê xwe Navdar bû, Navdarê Kurd. Di kozikê da her bi coş û kelecan bû. Guhê wî li axaftina Kerem Begê û çavê wî jî li reşan bû, reşên serbazan. Ji alîyekî va gule ajot ber xizneyê û nîşan girt, ji alîyekî va jî kir miremir, axifî û ji ber xwe va wiha got:

*Bê min neçe zozanan*
*Berê xwe nede Şuşar û Tekmanê*
*xemgîn e Gimgim..*

www.arsivakurdi.org

*Bê min*
*bêhn neke gul û sosinan*
*neçirpîne.*

*Axa te pîroz e*
*xezalên warê te*
*pezkûvî*
*kewên ribat*
*bide alîyekî, bide alîyekî*
*mêrek te bi sed mêran e.*

*Biharên te wek biharên berê*
*bi gul*
*bi sosin*
*bi nergîs*
*bi beybûn*
*sor û şîn*
*li benda min be.*

*Li ber Birca Diyarbekirê min ji te hez kir.*

*Warê min:*
*K U R D I S T A N*
*ji*
*te…*

Kî dizane ka çima wî wer got? Çima kir miremir û wisa axifî? Em nizanin belkî jî di wê gavê da bi bejn û bala xwe ya zirav zerîya wî, hesreta ber wî dilî ji ber çavê wî ra wek xem û xîyalek hatibû û derbas bibû. Ji vî şerê bêbav nebûya bi melêvê va digirt û bêder li ba dikir.



www.arsivakurdi.org

Ji vî şerê qevçil ku nebûya ji ser bêderê bi selik û sengeran ka dikişand, dibir û di kadinê da bi cî dikir. Heke ji vî şerê gemar nebûya ji mêrga berderî bi xizagan gîya dikişand, dibir û di paş malan da dida ser hev û dikir lod. Heke ji vî şerê xwînî nebûya li gundê xwe, li gundê kavil û wêrane wek kar û bar êdî her çi ku li ber destê wî hebûya dida hev, dû ra jî hazirîya dawetê dikir û ji xwe ra dizewicî. Qet tu şik nîne ku ji vî şerê qirêj nebûya Navdar, bi miradê xwe şa dibû û zarokek du zarokên wan dibûn, kî dizane belkî jî heft... Ger axa welatê wî nehatiba zeftkirin, bi destê zerîya xwe va digirt, di miradxwazîyê da berê xwe dida zîyaretan, duayên xwe dikirin û di vegerê da jî ji karan yan karek beş yan jî ji berxan berxek qerqaş dikir qurban. Belê, wele! Evîn e û evîn jî bila serê xwe bixwe. Dil e û dil jî rezîl û riswa ye. Di nîşangehê da ji van xem û xîyalên xwe yên bêmirad dûr bû, nîşan girt û pêli tetikê kir. Ji ber dengê çaplîyê teyrek firîya û ji ber zinarê kêlekê jî kevroşkek reben rabû, kevroşkek zikbelek. Ji bilindayîya berfê nedikarî rê bigire. Bîstekî sekinî li dora xwe mêze kir. Li belanên vî çiyayî dengê sîlehan û di bin giranîya laşê wî da jî dengê berfê hebû. Dilê wî bi tirs bû, livîya û ji ber çavan dûr bû. Çû, lêbêle bi tirs û giranî çû. Li vî çiyayî berf hebû û di nav berfê da tirs. Li vî çiyayî wêrekî hebû û di nav wêrekîyê da jî navê du egîdan: Kerem Beg û Navdarê Kurd. Bêguman Kerem Beg, ji camêran camêrekî bi ezmûn bû. Deng li Navdarê Kurd kir û got:

- Lo, lo lehengooo, lehengê delal! Romî dibêjin “Su uyur düşman uyumaz!” (Av radize, neyar ranaze!). Ne bi gotinên Romîyan, lê ez bi gotinên bav û kalên xwe mezin bûme. Ji bîr neke ku neyarê bav û kalan tu car nabin dostê lawan! Bi zanebûn tevbigere ku tu rê nedî xeta û xeletîyan. Ka hela wiha li pişt xwe vegere û baş dêna xwe bide alîyê rastê û di wê kortikê da, hema wiha di paş wê şepeyê da reşek dilive, tê û tere û li ecelê xwe

digere. Leheng! Ka hela pîçek xwe wiha bide alîyekî. Bide alîyekî ku ez bikaribim di pozê bavê bavê wî teresî!...

Navdarê leheng, xwe da alîyê çepê û ji hedefê dûr ket. Di nîşangehê da Kerem Begê Qolaxasî, dest avêt çaplîya bazinzer û ji ber Navdarê leheng ra nîşan girt û pêli tetikê kir. Ji ber dengê modolîyê qijîn bi Kelha Zincîrê ket û bi reşê xwe va laşek ji laşên neyarên vî welatî gêr bû. Li vî çiyayî qedirşinas bilî Kerem Begê Qolaxasî kesê ku biaxife û deng vebide, nebû. Li Navdarê Kurd vegerîya û jê ra wiha got:

- Dema ku ecelê bizinê tê, tere nanê şivan dixwe. Ji bo Xwedê, ka hela ji zana û nezanan bila yek destê xwe bide ser wijdana xwe û ji min evdalê Xwedê ra bibêje. Bibêje, ka hela çi îşê van teresan li vê axê ketiye û berê xwe dane me û hatine? Eha, hat û li belayê xwe geriya! De here, here ku tu axayî!...

Ji alîyekî va dest avêt rext û gule derxist, ji alîyekî va jî axaftina xwe domand. Belê, axaftina xwe domand û wiha got:

- Tu bavê bavê min biyo, Navdar! Ne teze, lê di berê da hatiye gotin, berxê mala bavê min bi çar gurçik in û heta mêran nekujin tu car bi silametî ranabin ji qada meydanê. Min carekê li ser qesemê û sê teleqan sond xwariye, heta ku ez kok li van bêbavan neynim, rabûna min nîne ji qada vê meydanê. Nîne û ew ê nebe jî. Mêr be û mêr bisekine, çê be û çê bixebite. Şîar, şîara min û te ye, lawiko: Yan mirin yan serkeftin!...

Ji cîyê xwe livîya û di pey ra jî xwe da ber zinar. Xwe da ber zinar, pê ra jî axiftina xwe domand û got:

- Ez Kerem im, Kerem!... Heyfa min nayê bi kuştina mêran, di berê da ji me ra edet e. Lê heyfa min tê wê heyfê, di wê komkujîyê da, di komkujîya Ermenîyan da tu were sing bide ber wê zilm û afatê û xwedî li wan derkeve, lê bila ew jî vê yekê nebînin, bi refên Ûrisan ra berê xwe bidin te û li birîna serê te bigerin. Ji ber zilm û zordarîya van teresan Serhed vala bû, tê da

kesek nema. Zilm û zordarîya van bêbavan bû wek agir û şewata Xwedê, bi dil û cegerê dayîkan ket. Di helwesta azadîyê da me carekê serî danîye vê rê û ji rê û veger!? Na, nîne û bila Xwedê neke. Bi navê Êzdanê Dilovan min carekê sond xwarîye û heta ez...

Di vir da hevoka xwe temam nekir û di nîvî da hişt. Di nîvî da hişt, ji ber ku bi reşên xwe va zeftekçî ji berê zêdetir xuya bibûn. Li vî warî, warê mêrxasan şer encax bi hela-helaya Kerem Begê gurr dibû, hem gurr hem jî germ... Herdu şervanên kurd zêde ji hev dûr nebûn. Teqrîben di navbeyna wan da bîst gav yan hebûn yan nebûn. Bi îşaretên destan berê xwe dan neyarên xwe, nîşan girtin û di pey ra? Di pey ra jî dengê çek û sîlehên wan çiya û banî helanîn. Te digot qey roj roja mehşerê ye. Modolîya destê Kerem Begê malê romê bû, barûda xwe dirijand û guleyên xwe xweş diavêt.

Bi sê dengan kir gazî û got:

- Navdarooo! Ê de hela tu were li min û van bêbavan mêze bike! Tu dibêjî qey axa welatê min ji xwe ra kirine rîya avê, tê da tên û terin. Lo lehengooo, lehengê delal! Leşkerê Mosqof giran e, qor bi qor berê xwe dane me. Çê be, çê bixebite. Bi orta çaplîya xwe va bigire û revê pê xe!...

Ji alîyekî va axaftina xwe domand û ji alîyekî va jî gule ajot ber xizneyê. Di berdewamîya axaftina xwe da jî wî, wiha got:

- Tu bavê bavê min biyo, Navdar! Eger dijminê te mêşek be ji dîwar, nabe tu hesabê wî nekî. Neyar e, neyarê xwe li ber çavên xwe ne mezin bike û ne jî piçûk bibîne... Tenê dikarim bibêjim çavên ku dijminê xwe nas nekin, bila birijin. Navdarooo, Navdarê Kurd! Rovîyekî şîyar çêtire ji şêrekî xewar. Çavên xwe veke û şîyar bimîne...

Li pêy vê axaftinê jî nîşan girt û pêli tetikê kir. Di kozikê da Kerem Begê Qolaxasî bila were ser çokan, nîşanê bigire û lê

bila li qapaxa serî nexîne û hilneyîne? Na, nebûye û nabe jî.

Dîsa gule ajot ber xizneyê, pê ra jî deng veda û got:

- Em ji miletan miletekî mazlûm in. Xwedê jî dizane ku çavê me tu car li axa kesî nebûye û ew ê nebe jî. Heke ji min bihata? Ji min bihata min tu car rê nedida şer û nedibûm sedemek ji sedemên kuştina lawê bavan. Lê de tu yê werî çi bikî ku yên berê xwe dane axa vî welatî û hatine ne dost û bi hebûna xwe zeftekçî ne. Zeftek karê wan û zordarî jî hunera wan e. Bi çavê neyartîyê berê xwe dane me û hatine. Ji bilî şer û berxwedanê jî wekî din ne tu rê û ne jî tu çare ye. Xwedê jî dizane ku em ji miletan miletekî dadwer û xêrxwaz in. Em ne zeftekçî ne ku em ê berê xwe bidin axa welatan, gund û bajaran bidin ber top û tifingan, mal û milkê xelkê talan bikin, erz û eyalê wan li ber lingan bibin. Xwedê jî dizane ku em ne zorba ne. Tu jî dizanî ku em ne ew kesen ku zilmê bikin ji wan in. Bi zilm û zoradarîya xwe yên ku berê xwe dane vî welatî û hatine bi hêzên xwe va Ûris û Ermenî ne. Tiştekî xwezayî ye û dema ku yekî berê xwe da te û neheqî li te kir, ji vê yekê ra bêdengî mirin e û jê ra bêdeng namînî. Xwe diparizî û êdî her çi ku îcab kirîye, dikî. Heke li derekê neheqî hebe, li wê derê şer jî heye û berxwedan jî. Di encamê da zêr zane, zor zane, devê tivingê mor zane...

Li ser hev pişkîya û pişt ra jî dîsa hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftina xwe ya berê, kenîya û got:

- Lawiko, lawikê delal! Ez jî nizanim ka ez ê li hember kîjan neyarê xwe şer bikim û kîjanî jî nekim. Heke neyarê me yek bûya ji min ra ne xem bû. Lê belê ji belayan tu belayek nemaye berê xwe nede me û di ser me da neyê: xela û cela, sar û serma, dagirkerî, belengazî, koçberî, nexweşî, birindarî, mirin û êdî ji xwe ra lê zêde bike, bibêje û bibêje. Werhasil, derdê me giran û rewşa me jî yeman e. Ez bawerim, min serma girtiye û ji ber vê yekê jî bûye pişkepişka min. Ev rewşa min e, lê ez nizanim gelo

ka tu çawa yî?

Carekê din pişkîya û dû ra jî çaplîya ku di destên xwe da girtibû, ber bi neyarên vî welatî va girt û bi kar anî.

Piştî vê axaftinê jî ji Navdarê Kurd ra dest hejand, bang lê kir û got:

- Li vî çiyayî, çiyayê qedirşinas ji bîr neke ku her mêrekî me bi sed mêran e. Ger te lêxist vê gotinê ji bîr neke û bi wî awayî lêxe. Dema ku te lêxist bila ji ber hela hela te egîdî, zinginî bi Kelha Zincîrê bikeve. Dema ku te lêxist bila ji ber dengê te xweşmêrî, qîjîn bi Newala Gulan bikeve û deng vebide. Ji ber hêrsa te lewendî bila newal û neqebên vî çiyayî ji cendekan, cendekên van qebraxan reş girêbide, reş... De lêxe bavê mino, lêxe!...

Xulekî du xulekan sekinî û li dorhêla xwe mêze kir. Navdarê Kurd, di sîperê da û bi mawîzera destê xwe bû. Herçiqas meriv di qada şer da be jî car heye ya bi xem û xîyalek xwe ye, yan jî li ser tiştekî kûr kûr difikire. Di wê gavê da şîretên Kerem Begê hatibûn bîra wî. Keremê Begê Qolaxasî, ji wî ra wiha gotibû:

- Şervano, şervanê delal! Ji bîr neke ku talûke talûke ye. Firsend e û firsend jî timî bi destê merîyan nakeve. Di qada şer da tu car ecele neke. Ecele neke û li firsendê bigere. Dema ku te bi dest xist jî wek çawa şêrek bi ser nêçîra xwe ra bigire bi wî awayî rahêle çek, berê xwe bide neyarê xwe û li histûyê wî siwar bibe. Tu car rê nede, nehêle bila ji nav lepên te bifilite û bireve. Tu car ji bawerîya xwe xweşmêrî nekeve şikê. Tu ji neyarên xwe netirse, lê bila ew ji te bitirsin, ew. Li cem me dibêjin, wek şêran bikuje û wek mêran jî veşêre. Ez ji kuştinê ra dibêjim ‘erê’, lê ji veşartinê ra jî, na. Na, ji ber ku veşartin ne karê min e. Di şer da ne tenê kuştin, lê divê edalet û merhemet jî hebe. Ger di şer da yekî xwe avêt ber bextê te û teslîmê te bû, nekuje. Êdî tu û bextê xwe...

Li vî çiyayî ji dengê Kerem Begê xweştir deng, nebû. Goti-

nên wî xas, beşera wî xweş û moralê wî jî di cî da bû. Fena siwarê dawetê berê xwe dabû qada şer. Di kozikê da pêli tetikê kir, pê ra jî axifî û got:

- Lehengo, lehengê delal! Mirovên bêwelat mîna çûkên bêper û bask in. Şer e û ev şer jî li taxa me ye. Mixabin, ax jî bi zarîn e û axîn jî… Yên ku berê xwe dane me û hatine bila vê yekê baş û baş bizanin, em kurd in û kurd jî ne xulamê bavê tu kesî ne. Bila carekê bêhna barûdê nekeve pozê egîdan, dema ku ket, teze tu were li min û vê dîlanê. Dê weledê xwe diavêje, dê!...

Li ser hev kuxîya û pişt ra jî hat ser axaftina xwe ya berê, got:

- Ez Kerem im, Kerem. Min mêr naskir mêr bûn û min egîd jî naskir, egîd. Lê min ji ser Navdarê Kurd ra ne mêr û ne jî egîd naskir. Ew, şêrek ji şêrên oxirmê giran e û tu car ji mirinê natirse. Ew ji mirinê natirse, lê bila mirin ji wî bitirse. Tu bavê bavê min biyo, Navdar! Di zagona min û te da bi gotina Mîrê Zirav, mirineke birûmet ji jîyaneke bêrûmet xweştir e. Ji me ra xulamtî mirin e û ew jî ne qebûlê min û te...

Hinek kes hene hema tenê bi virevir, fexr û quretîya xwe ne û wekî din jî tu havileke wan nîne. Kerem Beg, ne ji wan kesan bû. Erê, bi helahel û axaftinên xwe bû û ew jî ne hema wiha bîlasebeb... Şer bû. Di şer da giringî bi moral hebû. Li gel wî qewl û qirar çi bûye, gotin û kiryar jî ew bû.

Pêli tetikê kir û pê ra jî ji Navdarê Kurd ra wiha got:

- Heta ku di vî can û cesedê min da xwîna germ û di destê min da jî çaplîya bêdîn û bêîman hebe, bi rehetî kesek nikare bi ser min da were, derbas bibe û here. Helbet, şer e û di şer da mirin jî heye. Di vê rê da, di rîya azadîyê da ji mirinê ra dibêjim ‘erê’, lê ji radestîyê ra jî na, na û na!... Tu bavê bavê min biyo, leheng! Lêxe, lê xweş û xweş jî lêxe. Lêxe ku bila di dîwanên giregiran da rabin û rûnin, lê bila nebêjin Kerem Beg ne layîqê wî navî ye. Ez Kerem im, berxo. Di zagona min da û radestî? Na,

nîne!...

Ji ber xwe va dest avêt dûrbînê û li dorhêla xwe mêze kir. Di wê mêzekirinê da ka îcar çi bibîne baş e!? Wek çawa di payîza paşîn da qijikên reş bi ser mêrg û zevîyan ra bigirin û werin, eynî bi wî awayî refê neyaran bi ser berfê ra girtibûn, berê xwe dabûn wan û dihatin.

Di kozikê da ber bi Navdarê leheng serê xwe rakir, deng veda û got:

- Lo, lo egîdo! Em du tayê bi tenê ne. Çê be, çê bixebite û bila ji me ra nekin serhevde û nebêjin, sîlehên xwe danîn û teslîmê neyarên xwe bûn. Berxwedan e, berxwedan jî ji me ra hem nav hem jî nîşan e. Axir, şer e û şer jî li ber derîyê me ye. Gotinek ji gotinên bav û kalan e, ga dimire çerm dimîne, mêr dimire nav dimîne! Bes, bila ew navê ku li ser me ye, nelewite. Bila li ser dara wê mawizerê destê te û li ser tetikê jî tilîya te egîdî necemide. Tu dua bike bila Xwedê me rûreş û şerpeze neke. Ê de bila werin. Hatin hebe dîtin jî heye. Çer hebe me carekê gotiye, mirineke birûmet ji koletîyê çêtire! Bila neyarên me vê yekê ji bîr nekin ku heta jana dilê dayîkên me li ser vê axê hebe ji me ra sekin û ji wan ra jî tu car rûyê rehetîyê nîne û ew ê nebe jî. Ne carekê, lê me di rîya ax û azadîyê da pir û pir caran bedel daye û em ê bidin jî. Gelo ma ji serxwebûn û azadîyê bi rûmettir wekî din ka tiştek din heye ku em ê xwe pê bixapînin? Na, nîne!...

Li pey vê axaftinê jî deng li Navdar kir. Hem deng lê kir, hem jî îşaret da û got:

- Were, lê zû bike û bi baldarî were!...

Pir derbas nebû Navdarê leheng, ji cîyê xwe livîya û hat. Dema hat Kerem Begê Qolaxasî, dûrbîna destê xwe da wî û got:

- Eha, tu li vê dûşê va bigire û mêze bike! Mêze bike çawa berê xwe dane me û tên... Ê de bila werin!…

Navdarê Kurd, bîstekî di dûrbînê da li refê neyaran mêze kir.



www.arsivakurdi.org

Ji alîyekî va mêze kir û ji alîyekî va jî xwe bi xwe kenîya û kir miremir. Destê wî li ser dara mawizerê û guhê wî jî li axaftinên Kerem Begê bû. Kerem Beg axifî û got:

- Li ser vê axê, axa welatê min ka kê hespê xwe nebezandiye ku ez ji te evdalî ra nebêjim; leşkerên Roma Reş, Ereb, Ecem û û... Niha? Niha jî li Serheda şewitî Ûris û Ermenî ne. Li Başur Întgilîz û li Rojavayê welat jî Frensî ne. Neyar neyar e, berxo. Bi rengê xwe çi dibe ew dizane, dixwaze bila reş û dixwaze spî... Şer e û di şer da jî dîn û îman, îzan û însaf nîne. Ne min got, ji şer rev nîne û bes, bila mawizera ku di destê min da ye li min serî negerîne. Na, sitemkarî ne karê mêran e. Ne karê mêran e, lê de tu yê werî çi bikî ku carekê ji xwe ra kirine kar û bûne sedemek ji sedemên her xirabîyê. Ji niha û şûnda em nizanin, lê şert û şûrtê mêranîyê dizane. Tiştê ku ez ê lê zêde bikim û bibêjim nîne, Navdar. Em ê bi hev ra bimînin û bi hev ra jî bibînin!…

* * *

*Em ê bimînin li ser vî erdî û hûn ê bimirin bi vî derdî!*

Kerem Beg, ji mêrxasan mêrxasekî bi navûdeng bû. Ji destê Navdarê leheng dûrbîna xwe girt û tê da li refê neyaran mêze kir. Ji alîyekî va mêze kir, ji alîyekî va jî xwe bi xwe kir miremir, axifî û wiha got:

- Ê de hela tu were li min û van qebraxan! Çawa ketine rêzê, çawa xwe li ba dikin û tên! Tu dibêjî qey berê xwe dane dîlanê, dixwazin di vir ra derbas bibin û herin. Lê qet haya wan jê nîne ku dîlan jî li vir û meydan jî dîsa li vir e. Ê de werin, lawo! Qor bi qor û tabûr bi tabûr werin. Niyet e û ez jî bi niyeta we dizanim. Dema ecelê kûçik tê tere belê dîwarê mizgeftê dike. Ê yanî! Yê

we jî ecelê we hatiye. Heke ecelê we nehata ne we berê xwe dida axa vî welatî ne jî hûn dihatin û li belayê xwe digerîyan! Madem wisa ye, ê de fermo. Şer e û ji vî şerî êdî ne rev û ne jî veger…

Mirin bêdengî ye. Dengê mirinê hê bi giranî xwe nedabû rûyê kaş û kendal, newal û neqebên vî çiyayî. Ji şerê duh û pêr ra te nedikarî bigota, şer e. Hema wiha carekê du car nîşan girtibûn û di encamê da jî leşkerek du leşker hatibûn kuştin. Ê yanî! Kuştina teresek du teresî jî ne elameta şerê gurr bû ku te yê bigota bav weledê xwe nas nake. Ji gotinên vî mêrxasî wisa xuya dikir ku şerê wî û qebraxan teze dest pê dike. Helbet, şer e. Gava ku şer giran bû, teze tu dikarî bibêjî roj roja oxirmê giran e û dê weledê milê xwe diavêje. Navdarê leheng, di kozikê da bêdeng û li benda îşaretê bû, îşareta Kerem Beg.

Dît, leheng li cîyê xwe diqilqile, tê û tere, kenîya û got:

- Ê de tu jî hinekî bi hedûr be, heyran. Romî dibêjin “Sabrın sonu selamettir!” (Dawîya sebrê silametîye). Ji bîr neke ku roj teze roja te ye û dibêjim hêdî bi hêdî. Bi hedûr be, ji ber ku her tişt di dema xwe da xweş û bi wate ye...

Dem e, tê û derbas dibe. Hatibûn û di hedefê da, di hedefa herdu xweşmêran da sekinibûn. Navdarê Kurd, îşareta ku dixwast ji Kerem Begê bigire, wergirt û di pey ra… Di pey ra jî pêli tetikê kir, zinginî bi çiya û banîyan ket û her çû deng lê zêde bû. Herduyan bi hev ra neyarên xwe dabûn ber mîratê, agir û şewata Xwedê bû ji modolîya destê Kerem Begê dibarî. Bi ser neyarên xwe ra girtibûn, lê xweş û xweş jî girtibûn. Tu yê bibêjî bila hema wiha misqalek emanê bidin, nedan. Dengê Kerem Begê bilind bû, got:

- Tu bavê bavê min biyo, leheng! De lêxe, lêxe û revê pêxe!...

Xwîn ku rijîya ax jî dilewite, berf jî. Ji ber êrişa van herdu mêrxasan xwîn rijîyabû. Li vî çiyayî bêdengî, bêdengîya berîya mi-

rinê bû û ji ber teqîna du tivingan xirab bibû. Ji ber êrişek wiha bêwext ka îcar kî tirs û xof nedigirt ku ew jî negirin? Wek cewrikên kûçikan kiribûn kastekast û ji wan her yek bi alîyekî va pekîyabûn. Vî çiyayî şer dîtibû, lê şerek wek vî şerî? Na, nedîtibû. Ji ber ku neyarên vî welatî bi çek û sîlehên giran berê xwe dabû wan û ew jî du tayê bi tenê bûn. Lê bila be. Qet tu şik nîne ku Kerem Beg, bi serê xwe kelha mêran bû. Ew, peyayê roja oxirmê giran û li gel wî jî şervanekî cegerpola hebû. Di warê çek û çekdarîyê da yek ji yekî çêtir bû. Kerem Beg, ne tenê di şer da, lê di nav êl û eşîran da jî her bi maqulî, giranî û xanedanîya xwe dihat nasîn. Hem mêr û mêrxas bû hem jî ji camêran camêrekî bi esalet. Îro jî wek çawa şêrek bi ser nêçîra xwe da bigire bi wî awayî berê xwe dabû neyarên vî welatî û Çiyayê Qertewînê ji wan ra kiribû gor û gorîstan.

Li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Lo, delalooo!... Kî çi dibêje bila bibêje, pîvana serkeftinê bilindayîya avê ye. Av ku rabû masî berê xwe didin morîyan, eger kişîya jî morî berê xwe didin masîyan û dixwin…

Navbeynek da axaftina xwe û di nîşangehê da nîşan girt û pêli tetikê kir. Piştra rextê xwe vekir, danî kêleka xwe û got:

- Belê, bi têra xwe neyarên me hene û yek ji yekî xirabtir e. Ji dîroka sê miletan zilm û zordarî û ji dîroka me mazlûman jî tenê hêsirên çavan, êş û elem, jan û keder barîye û dibare. Ji vê yekê ra çav kor û ziman lal e. Gelek û gelekî nimûneyên balkêş hene meriv dikare di vî warî da bide. Ereban mal û milk, erz û eyalê me ji xwe ra helal dîtine û ji ber wê yekê jî êş û azar nemaye dane me. Yên ku li ber şûr ketine mirî û yên ku nehatine kuştin û tabîye wan bûne jî nekarîne xwe ji ber zilm û zorê xilas bikin. Wek çawa îro dilê dayîkên vî welatî bi zarezar be, di wê demê da jî ew hewar û gazî, zarîn û zivîn hebûye. Ne hindik, lê pir û pir jî bedel dane. Ziman hebûna miletan e, Navdar. Ziman, rûmet

e. Kesên ku di wê demê da tabîyê wan bûne, ne tenê ji bawerîya xwe, lê di eynî wextê da jî ji zimanê xwe bûne. Wek ceza? Wek ceza jî her kê ku nexwastîye bi zimanê wan biaxife, serê zimanê wan avêtine ber meqesê... Ê de tu were hesab bike, çi zilm, çi zilm! Meriv ku xwedîyê dewlet nebe, her kî were, tehnek li merîyan dixîne û bi wî awayî derbas dibe û diçe. Li ser vê axê, axa pîroz, her kî hespê xwe bezandiye êş û azar, derd û kul nemaye ku dîtiye. Niha? Niha jî ez nabêjim, jixwe her tişt eyan û beyan li ber çav e…

Roj, hê ji girê Qertewînê neqûlibîbû û neçûbû ava, lêkiribû, hûrik hûrik berf dibarî. Navdarê leheng, li pişt xwe zivirî û bîstekî ber bi jor mêze kir. Di wê mêzekirinê da ka îcar çi bibîne rind e!? Ji jor da jî bi reşên xwe va koma neyaran berê xwe dane wan û tên. Li Kerem Begê Qolaxasî vegerîya û got:

- Ne tenê ji jêr va, lê ez dibînim wa ne ji jor da jî berê xwe dane me û tên. Helbet, tên û bila werin. Mesele ne hatina wan e, lê ev bûye demekê li bindest û di nav wan leşkeran da yekî qirase bala min dikişîne. Belê, hem qirase hem jî yekî bi pirpirk e. Bi texmîna min serleşker e. Min carekê du car ber bî wî va nîşan girt, lê… Hema wiha li paş wê şepeyê ku li pêşberî me ye. Na, êdî naxwazim wî bikujim. Nakujim, lê dixwazim dîl bigirim. Yên ku ji alîyê jor da bêrê xwe dane vî alîyî û tên, hê ji vir dûr in, heta wê çaxê jî ji min û wî qebraxî ra Xwedê kerîm e. De bi destûra cenabê te, Keko…

Li benda bersivê nema, hema ji cîyê xwe livîya û çû. Çû, lê wek çawa pilingek bi dizîka berê xwe bide nêçîra xwe û here bi wî awayî da rê û çû…

Dema ku nêzikê neyarê xwe bû jî hema ji ber xwe va dest avêt xençerê, kişand û bi dengekî bilind axifî. Belê, bi dengekî bilind axifî û got:

- Radeeest!!!

Xençera wî ji polayê bû. Te digot qey di destê wî da Zilfiqarê Elî ye, diavêje û dibire. Dema çavên fermandar li xençerê ketin, hiş ji serî çû, reng avet û ji kûr va zarîya. Navdar, bila Navdar be û di şer da jî bi ser xwe da bobelatan bîne û xwe şerpeze bike? Na.

Ji alîyekî va axifî, ji alîyekî va jî bi pêsîrê va girt, hejand û got:

- Nelive, lawo! Nelive û li cîyê xwe bimîne!

Tivinga wî ji dest girt û axaftina xwe jî domand. Di axaftina xwe da çi got? Çi bibêje, got:

- Nelive law, nelive! Heke tu bilivî, tu bi destê xwe mezela xwe dikolî!

Bi van gotinên xwe qet tu şik nîne ku Navdarê leheng, tirs û xof kiribû dilê wî. Serleşker û bilive? Na, ne livîya ne jî axifî. Ew neaxifî, lê lehengê kurd axaftina xwe domand û ji wî ra wiha got:

- Em herdu jî li qada şer in û ji me yek azadîxwaz û yek jî zef-tekçî û leşkerê dagirkeran e. Ez ê ji te pirsan nekim. Naxwazim ji te bipirsim û bibêjim ka tu kî yî û ji kû yî. Heke ji te bipirsim jî tenê dixwazim bersiva vê pirsê ji te werbigirim, çi îşê te li ser vê axê heye û bi te xêr e, qebrax?

Gotin û şîretên Kerem Begê hatibûn bîra wî û ji ber vê yekê jî nedixwast zêde di ser dîlgirtî da biçe. Hema tenê pirsek ji wî kiribû. Bersiva ku wî bida, nebû. Ka îcar feqîrê min dikarî çi bigota? 'Lehengo! Min kir, lê tu neke!...' Bersivek wiha jî ne qebûlê Navdar bû. Heke bersiv nebe meriv bêdeng dimîne. Ê jixwe ew jî bêdeng bû. Di carekê da xwe di nav lepên şêrê kurd da dîtibû, rahêle şûr çi û dest biavêje çek çi! Na, ne karîbû rahêle çek, ne bilive û ne jî jê birevê. Dema ku dîl hatibû girtin jî ne zêde, lê hema wiha tenê gotineke bi êş ji dev û lêvên wî pekîyabû: "Axxx!..." Îcar di rewşeke wiha da meriv fermandar be çi, şah û paşa be çi! Ne tenê gotin, lêbelê hêvî jî li merîyan diçilmise û wenda dibe. Lehengê kurd, fermandarê bi pirpirk dîl girt şûnda, herdu destên wî dan ser hev û bi şalê xwe va zexim girêdan.



www.arsivakurdi.org

Berîya ku bide pêşîya xwe û bibe, deng li Kerem Begê kir û got:

- Begooo, begê min! Wek gurên devbixwîn çawa dor li merîyan bigirin bi wî awayî nêzikê te bûne û xwe ji wan bêbavan biparêze. Di rê da me û ji bona min jî qet meraq neke. Min ji cenabê te ra çawa gotibû, wer jî bû…

Kerem Beg bi dengê Navdar ra ji kêleka zinarê lê bû serê xwe rakir û ber bi jor mêze kir. Belê, refên neyaran nêzikê wî bibûn. Ji rext çend fîşengên din derxistin, danîn kêleka xwe û li benda lehengê kurd ma. Bi hazirîya xwe bû, lê nişan negirt. Ji ber ku Navdar li bin dest û di hedefê da bû, di hedefa neyar da. Ev şer ne şerê êl û eşîran bû. Li hember tabûrek leşkerên bêbav berxwedana du egîdên cegerpola bû.

Di rê da Navdar, serleşkerê dîlgirtî hejand û jê ra wiha got:

- Ji van pirpirên te xuya dike ku tu fermandar î. Deng li hevalên xwe bike û ji wan ra bibêje, bila çekên xwe bi kar neynin, bicehimin û ji vir dûr bibin. Heke tu neqîrî û bi dengekî bilind ji wan ra nebêjî tu wer bizanibe ku serê te ji ser cendekê te çû, êdî tu û biryara xwe!...

Li benda bersivê nema û îcar jî bi zimanê Osmanîyan axifî. Bi devokek xilûxwar axavî û wiha got:

- Fermandar! Heke sen sonunin xirab û kotî olmesini istemiyorsen hemen eskerlerine sölersin, ateşî durudursinler û bureden defolip gitsinler!... (Ger tu naxwazî tiştekî xirab bi serê te were, hema ji leşkerên xwe ra bibêje bila dev jî gulebarandinê berdin û ji vir bicehimin û herin!)

Serê fermandar li ber wî tewandî bû. Dilê wî? Dilê wî bi tirs û xof, qidûm lê şikestî û ji rewşa wî ra te nedikarî bigota, rewş e. Di laşê xwe da ji hevdaketî, derûnîya wî xirab û ji kesan jî kesekî bêçare û bêhêvî bû. Di rewşeke wiha da ka îcar kî dikarî bi dilovanî biaxife. Jê ra xirab lê hatibû. Ji alîyê kurdekî va dîl hatibû girtin.

Piştî vê bûyerê xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da wiha got:

- Ê de hela tu were li min û vî pêxwasî, di destê xwe da xençer girtiye! Ger biavêje histûyê min, histû namîne. Nekuşt, lê!... Xençera xwe biavêta histûyê min niha li ser vê berfê, berfa spî ne zindî, lê bi vî cendekê xwe va li vî çiyayî raxistî dimam û îşev! Îşev jî dibûm para guran û ji laşê min yê qirase tu yê bibêjî bila hema wiha pirtikek bimîne, nedima. Nekuşt, lê dîl girt! Çima gelo, ka çima!? Erê, mexseda wî! Mexseda wî çi ye?...

Pirsên wiha bêbersiv ji xwe kiribû. Kiribû, lê jê ra bersiv û hebe? Na, nebû û bi wan pirsên xwe mabû. Çi bû û çi qewimî nayê zanîn, lê fermandarê bi pirpirk li mêrxasê kurd vegerîya û bi zimanê Kurdî axifî. Wek çawa ji sar û sermayê dev û diranên merîyan bike çeqeçeq û meriv nekaribe bi zelalî biaxife, bi wî awayî dest bi axaftinê kir. Belê, bi tirs axifî û yekem got:

- Keko!...

Di çûyîna xwe da Navdar, bi lez û bez bû û ji bilabilayê ra dema wî nebû. Fermandarê dîl, xwastibû bala wî bikişîne xwe û ji ber wê yekê jî gotibû “Keko!” Lêbelê ‘Keko’ jî bêdeng bû. Bêdengî, malmîratî ye. Di rewşa wî da bêdengî, ji mirinê jî xirabtir bû. Eger kêr merîyan bibire tirs û xof jî çîrke bi çîrke merîyan dihêre. Bersiv ji ‘Keko’nehatibû û ev jî ji wî ra bibû, dilêşî. Fermandar, tevlihev bû, nedizanî ka çi bibêje û çawa tevbigere. Yê wî pirs bûn. Carekê din pirsî û got:

- Şervano! Firsend di destê te da ye, çima tu ranahêlî xençerê û min nakujî, lê!?...

Navdarê leheng, bi kurtî bersiva wî da û got:

- Ez nikarim bersiva pirsên te bidim, tu van pirsên xwe ji Kerem Begê bike...

Ax, lê de ev bersiv jî ne bersiva pirsa wî bû! Fermandar, xwe bi xwe axifî û got:

- Hela hela, Kerem Beg! Ew jî kî ye? Ez qala kuştinê dikim, ew qala Kerem Begê dike. Herhalde Kerem Beg, yan mîr e yan

jî serokeşîr.

Helbet, axaftin in û axaftin jî nînin bala merîyan nekişînin. Fermandar ne kurd bû, lêbelê bi zimanê Kurdî dizanî û dikarî biaxife. Ne tenê bi Kurdî û bi zimanê Osmanîyan jî. Ew li benda bersiva pirsa xwe bû, lê...

Fermandarê dîl dît ji Navdar bersiv nîne û nayê îcar jî bi Tirkî pirsî û got:

- Niye beni öldürmedin, kardeş? (Çima te ez nekuştim, bira?)

Navdarê Kurd, bersiva wî bi şiklekî din da û got:

- Yürü lan, qeşmer! Sori yok! (Bimeşe, qeşmer! Pirs nîne!)

Dîl di xwêdanê da bibû av. Lehengê Kurd, bersiva pirsên wî neda, lêbelê axifî û wiha got:

- Serbazên ku xwe li vî alîyî va girtine û tên hevalbendên te ne û tu jî fermandarek ji fermandarên wan î. Deng li wan bike, bila dev ji gulebarandinê berdin û dawîyê lê bînin. Wekî din jî tiştê ku ez ê ji te bixwazim nîne û dengê xwe bibire. Ez ne bersivdarê pirsên te me. Kerem Beg dizane û encax ew dikare van pirsan bibersivîne. Tu deng li hevalên xwe bike û hew…

Ji alîyekî va got û ji alîyekî va jî tehn lêda. Şer bû û di vî şerî da mirin, qîrîn, belengazî, hewar û gazî hebû. Şer bû û di vî şerî da li hember refên neyaran mêrxasîya du şervanan hebû. Kerem Beg, li ber devê şikeftê û li ber zinarekî bilind sekinîbû. Destê wî li ser dara mawizerê û çavê wî jî li rê bû, li rîya Navdarê leheng. Wî bi xwe jî dizanî ku heta ew li ber çavê xwe lehengê kurd nebîne, ne dikare rahêle çek ne jî dikare bi ser neyarê xwe ra bigire û bide ber mîratê. Çer fikirîbe, wer jî bû. Pir derbas nebû Navdarê leheng, bi yekî qirase û bi pirpirk ra ji alîyê çepê va xuya kir. Herdu jî ji metirsîyê dûr û li cîyekî ewle bûn. Ji wî ra dem êdî ew dem bû û mêrxasê bi navûdeng, rahîşt mawizera bêdîn û bêîman, ber bi leşkerekî nîşan girt û pêli tetikê kir. Dû ra? Dû ra jî Xwedê dizane ka êdî çend car li ser hev nîşan girt û çend leş-

ker li ber bayê guleyên xwe xist, gêr kir û anî xwarê. Divê meriv carînan navbeynê bide, lêbelê Kerem Beg û navbeynê bide? Na, nebû. Wek çawa di biharê da tavîya baranê lêbike û bireşîne bi wî awayî di ser neyarên xwe da girt, gule li ser guleyan barand. Ji leşkeran yekî gule xwar û pişt ra? Pişt ra jî bi wê derbê ra xij bû û hat, hema wiha nêzikê wî û li ber zinarekî mezin sekinî. Ji cîyê xwe livîya, ber bi termê wî çû û di pey ra jî dest avêt laşê wî, ber bi xwe va kişand û anî. Li ber termê leşker, li alîyê rastê û di qebzê da şeşagirek hebû. Ji qilif kişand, da tenişta xwe û carekê din li neyarê xwe zivirî û da ber guleyan. Di sar û sermayê da destên bê lepik û necemidin? Helbet, dicemidin. Yên wî jî pir û pir cemîdîbûn. Ji serê xwe egala xwe vekir û pê destên xwe pêça û di wê navbeynê da Navdarê leheng, ji alîyê çepê va bi dîlgirtî ra xuya kir. Navdar, hê bi wê hêrsa xwe bû.

Carekê din tehnek li serleşker da û pê ra jî got:

- Yürü ulan, teres! (Bimeşe law, teres!) Ez dibînim tu hem bi zimanê Kurdî hem bi zimanê Osmanîyan dizanî. Wer xuya ye ku têkilîya te bi me kurdan ra hebûye. Miheqeq niha te nan û ava me jî xwariye û vexwariye. Meriv nanê yekî bixwe jê ra neyartîyê nake! Nan û ava ku dane ber te bila xenîmê te be. Wisa xuya ye ku tu ne mirovêkî dilsoz û pak î. Tu jî baş û baş dizanî ku di zagona dostanîyê da cîyê xîyanetê nîne, lê... Tu hem bi zimanê Kurdî dizanî hem jî ji kurdan ra neyartîyê dikî. Durûtî û neyartî ne karê mêran e, law! Welatê ku tu niha lê yî ne welatê te ye. Ez nizanim ka tu bi esil û feslê xwe kî yî. Ne girîng e û zêde min eleqedar jî nake. Eleqedar nake, ji ber ku neyar neyar e. Dixwaze bila Rûm, dixwaze bila Ecem an jî Ereb, Ûris û Eremenî be. Na! Ne girîng e, çi dibe bila bibe. Ev ax axa me ye û welat jî welatê me, li ser vê axê em tu neyarî naxwazin. Bila neyarên vî welatî vê yekê baş û baş bizanibin ku ev ax dibe gor û gorîstan, lê tu car ne dibe Tirkîstan, ne Erebîstan ne jî Hayîstan.

Ka hela bibêje çima te rahişt çek û berê xwe da axa vî welatî? Ji ber zilm û zordarîya we, kal û pîr neman neyên kuştin. Ji ber şopa we bêbavan her kî ku revîyabe, revîya. Yên ku man jî qelîyan û tune bûn. Koçberî û macirî ne qeder e, lê bû para me. Helbet, sedemê vê yekê jî hûn bi xwe ne. Erê, şer e. Lê ka riayet, ka qeyde û hiqûq? Qumandar! Tol e û tol jî tê hildan. Hesab e û roj ku hat hesab jî tê dîtin. Sûc e û sûc jî nîne bêyî ceza bimîne û neyê cezakirin!...

Fermandarê bi pirpirk bêdeng û ji tirsan lalome bû. Navdarê leheng, dît deng jê dernayê qîrîya û got:

- Leşker! Fermandarê we li ba min û dîlgirtî ye. Dev ji çek berdin û nebin sedemê qetla wî. Ger hûn dev ji gulebarandinê bernedin hûn wer bizanin ku ez ê ava serê serleşkerê we germ bikim û êdî hûn sax ez silamet!

Belê, Navdar bi hêrsa xwe û fermandar jî bi tirsa dilê xwe bû. Dema ku peyva 'kuştinê' ji bo merîyan hatibe kirin îcar meriv di tirs û xofê da namîne? Helbet, dimîne û fermandar jî ji wan kesan yek bû.

Dît, Navdar henekan nake û çav li serî sor bûne, deng bilind kir û got:

- Leşker! Ez fermandarê we, Xaço. Derhal çek û sîlehên xwe daynin û ji vir jî dûr bibin û herin!

Ne carekê, sê car li ser hev deng veda û gotinên xwe dubare kirin. Nêzikê Kerem Beg bûn û Navdar bi dengekî zîz û zelal axifî û got:

- Ez im, ez Navdar û li gel min jî...

Hevoka wî di nîvî da ma. Ji ber ku Kerem Beg, bi dengê wî va ji cîyê xwe livîyabû û ber bi herduyan mêze kiribû. Di hevdîtinê da Kerem Beg, bi dengekî şahî axifî û got:

- Weeey, tu her û her hebî, egîdê delal! Tu ronahîya her du çavên min î.

www.arsivakurdi.org

Piştî vê hevokê jî da pêşî û ber bi cîyekî ewle çûn.

Kerem Beg, li serleşkerê dîl vegerîya, bi zimanê Tirkî axifî û got:

- Biz esir... (em dîl...)

Firsend nedît axaftina xwe bidomîne. Ji ber ku Navdarê leheng xwe di nav axaftinê ra kiribû. Belê, xwe di nav axaftinê ra kir û got:

- Bibore, keko! Bibore ku min axaftina cenabê te di nîvî da hîşt. Serleşker, bi zimanê Kurdî jî dizane, ne hewceyê zimanek din e...

Wî axaftina xwe birî û Kerem Beg? Kerem Beg, bêdeng ma û bistekî xwe bi xwe fikirî. Pişt ra jî qundaxa tivingê danî erdê û yekem got:

- Belê...

Pişt ra jî serê xwe rakir û li fermandarê dîl mêze kir, jê pirsî û got:

- Navê te bi xêr?

Serleşkerê dîl, pirsa Kerem Begê bersivand û got:

- Navê min, Xaço ye...

Serleşker, mirovekî bi navmil, di qilafet da yekî bilind û qelew bû. Herdu destên wî li ber wî girêdayî û di mêzekirinê da tiştê ku yekem bala merîyan bikişîne saqê gîzmeyên wî yên dirêj bûn. Dûrbîn û sîleh ji destên wî hatibûn girtin û ew jî li gel Navdar bûn.

Kerem Beg, li çavên wî mêze kir, bi dengekî hêmin axifî û wiha got:

- Em li qada şer in û tu jî mirovekî dîl î. Lê dîsa jî ez dibêjim li gel min xwe ne wek mirovekî dîl, lê wek mêvanekî ji mêvanan bihesibîne. Dilê te bila rehet û beşera te jî xweş be. Heta ku tu li gel me bî ji me tu zirar û zîyanek nagihîje te... Têgihîştim ku tu bi Zimanê Kurdî dizanî û ev jî tê wê wateyê ku haya te ji me Kurdan heye û me ji nêzikî va nasdikî. Ez dibêjim êdî ne hewceyê gotinê ye. Ger pirseke te hebe tu dikarî ji min bikî. Bi rehetîya xwe be, fermandar. Belê, bi rehetîya xwe...

Li pey vê axaftinê Kerem Beg li Navdarê leheng vegerîya û bi wî ra axifî. Jê ra wiha got:

- Ji serî bigire heta binî mêvanê me sehbike. Baş sehbike û bila li ser camêr tiştekî xerîb nemîne. Hema êdî her çi hebe bigire û dayne alîyekî...

Deng ji çek û sîlehan hatibû birîn. Navdarê leheng dest li berîkên wî gerand û her çi li ser wî derketibe, hilda û di pey ra jî bir di şikefta ku niha li ber sekinîbûn da danî û derket.

Qehremanê kurd, piştî hatina Navdarê leheng li dîl vegerîya û jê ra wiha got:

- Me her çi ji te girtibe, emanet e. Meraq neke, em ê emanêtê te dîsa teslîmê te bikin...

Dû ra? Dû ra jî rengê axaftinê guhart û got:

- Fermandar, de hela mêze bike! Mêze bike, berfê çawa li van çiya û banîyan girtiye û bi carekê zeft kiriye. Ne zefteka berfê, lê zefteka neyarên vî welatî min diêşîne û acizîyê dide dilê min...

Piştî vê hevokê jî ji berîka xwe qutîya cixarê derxist û dest bi pêçanê kir. Ji alîyekî va pêça ji alîyekî va jî axifî. Li Navdarê leheng vegerîya, kenîya û got:

- Dibînim li vî çiyayî êdî ne deng ne seda ye. Lêbêlê bîstekî berê jî te digot qey gurên har in, berê xwe dane me û li me civîyane. Hêvî dikim ku ew ê carekê din nebin sedemê xirabîyê...

Ji titûna qutîyê du cixare pêçabûn. Ji fermandar nepirsî negot ka tu cixarê dikişînî yan na? Ji ber ku dema Navdar seh kiribû û ji ser wî kîsê titûnê derketibû. Kerem Beg xulekî du xulekan bêdeng ma û xwe bi xwe şêwirî. Li Navdar vegerîya û got:

- Ka de destê mêvanê me veke û bila camêr ji xwe ra cixareyekê bikişîne…

Navdar dudilî bû. Nedikarî tiştekî wiha qebûl bike. Lê ew xwedî biryar nebû û nedikarî ji Kerem Begê ra bigota, na. Herçiqas dilê wî nexwaze jî biryar biryara Kerem Begê bû û di en-

camê da ber bi fermandar çû û destên wî vekirin. Vekirin şûnda jî destê xwe da ser xençerê û di navbeyna Kerem Begê û fermandar Xaço da ma. Kerem Begê cixareya ku di destê xwe da girtibû, vêxist. Yeka vexistî da Navdar û pê ra jî got:

- Ka hela ji kerema xwe tu vê cixareyê ber bi fermandar bigire û bide wî...

Ji her sêyan yek bi axaftin û beşerxweş bû. Yek dîl, bi tirsa dilê xwe û di nav hêvî û tengavîyê da dihat û diçû. Navdar? Na, qet bawer nedikir Kerem Beg ewqas bi tolerans be. Di dilê xwe da bi hêrs bû, Navdar. Nedixwast Kerem Beg zêde azadîyê bide wî û wî wek mêvan bihesibîne. Ew dîl be jî di encamê da neyar nayar bû. Jê ra ewqas xweşbînî nedibû, hebe.

Tarîya êvarê xwe dabû rûyê berfê. Cixareya destê xwe kişandibûn. Şikeft li cîyekî ewle bû û li derva jî sir û seqem hebû. Zinginî ketibû dev û diranên serleşker, dest û lingên wî diricifîn. Ricifa wî jî çavên Kerem Begê nerevîyabû.

Li fermandar vegerîya û got:

- Hişkayî ye û pir jî sar e. De kerem bike, fermandar. Kerem bike, em ê bi hev ra derbasî vê şikeftê bibin û bila ji me ra bibe hem sî hem jî star…

Bi hev ra berê xwe dan tarîya şikeftê û derbasê hundir bûn.

* * *

*Cîyê ku tirs lê nebe meriv nikare qala wêrekîyê bike!*

Şikeft tarî bû. Bi baldarî gavên xwe avêtin û derbasê hundir bûn. Di derbasbûnê da Navdar çeqmeq vêxist û ronahî da hundir. Di encamê da ji xwe ra cîyekî ziwa peyda kirin, yekem Kerem Beg û di pey ra jî serleşkerê dîl çok da erdê û rûnişt. Navdar û rûne? Na, rûneништ û yekem li hundir çav gerand. Pişt ra jî hat

cem Kerem Beg, xwar bû û di guhê wî da kir pistepist û got:

- Keko! Hundirê vê şikeftê jî wek derva sar e, hem sar hem jî bi rutûbet. Bê agir nabe û pêdivî bi qirş û qal, dar û ber heye. Rast e, di şikeftê da hinek qirş û qal hene, lê ne bes in, têrê nakin. Ê de hela ez herim, li derûdorê çav bigerînim, eger min peyda kirin, ez ê hinek daran bînim. Ez terim, lê bila çavê cenabê te jî li ser vî teresî be. Îşê dinyayê ye, çi dibe çi nabe!...

Berîya ku ji şikeftê derkeve û here, Kerem Beg axifî. Belê, axifî û got:

- Erê, wele şikeft pir û pir sar e. Tu dev ji her tiştî berde û ji me ra agir dade, agirekî gurr. Em li benda te ne û spas, leheng.

Kuxîya û piştî kuxikê jî carekê din hat ser axaftinê û wek çawa nexwazî tiştekî ji bîr bikî, bi wî awayî axifî. Di axaftina xwe da jî wiha got:

- Ha, leheng! Tu yê pir dûr nerî û hema wiha li ber devê şikeftê û li ser destê çepê dar hene, darên qalin. Tu ji wan bîne û hew...

Navdar, ji şikefê derket û çû. Ji alîyekî va çû û ji alîyekî va jî guh da êvara vî çiyayî. Bêdengî bû.

Şikeft di tarîyê da bû û tiştê ku xuya bike nebû; ne çav û birû, ne li rûyan dev û lêv, ne jî dest û ling... Herçiqas di tarîyê da xuyakirina wan nebe jî deng hebû, dengê Kerem Begê. Ji deng û axaftinên wî ka îcar kî aciz dibû ku fermandar jî aciz bibe? Na, nebû. Fermandarê dîl, tu car nedixwast axaftina wî bi dawî bibe. Nedixwast, ji ber ku di axaftina wî da dilovanî, hezkirin, rûmet û asalet hebû. Xemgîn bû, fermandar. Derî li ser hatibû girtin, rê û dirb li ber wî wenda û bêhêvî bû. Encax, di sîya gotinên Kerem Begê da dikarî ji xwe ra li hêvîyê bigere. Ji ber çi sedemê bû nedihat zanîn, lê Kerem Beg jî vê gavê bêdeng bû. Tiştekî xwezayî ye, li kîderê hêvî hebe meriv xwe li wî alîyê va digire, piçûktî û mezinayî dixwaze bila bi qasê serî derzîyê be. Di rewşa xwe da femandar, merivekî bêkes, belengaz û bêhêvî bû. Lingên wî di

bin wî da tevizîbûn, ji bin xwe va kişandin û bi hêdîka dirêj kirin. Di bêdengîya Kerem Begê da bi awirên xwe va ji ber çavên wî ra Navdarê Kurd hat û derbas bû. Fermandarê dîl û ji wî aciz nebe? Jê aciz bû û tew nedixwast rûçikê wî bibîne. Lê tiştê ku ji dest were jî, nebû.

Di eynê demê da xwe bi xwe axifî û dilê xwe da wiha got:

- Law, Navdar!... Baş e ku tu ne li vir î. Bi çûyîna te dilê min rehet e. Dibêjim, bila çûyîna te hebe, lê bila vegera te qet nebe!

Dil e, çawa bixwaze wer dibêje. Wî jî di dilê xwe da, wer got. Bi ser bêdengîya Kerem Begê ra çiqas derbas bibû nayê zanîn, lê di tarîyê da carekê din dengê wî bilind bû. Tene tene axifî û got:

- Xaço Beg! Di sar û sermaya zivistanê da stargeha me ev şikeft e. Em li qada şer in û rewşa me jî li ber çav e. Herçiqas ev hal û wezîyet ne bi ya dilê min û te be jî, rastî rastîya me ye. Şer e û şer jî tunebûn, feqîrî û belengazî ye. Çi bibêjim, fermandar. Dinya bi hev ketiye û fizildûman e…

Carekê din dest avêt qutîyê û ji xwe û wî ra cixare pêça. Ji alîyekî va pêça û ji alîyekî va jî axaftina xwe domand. Bi dengekî xas û mûxlîs axifî û got:

- Heyran, ne bîstekî berê min ji te ra gotibû, li gel min tu ne dîl, lê tu mêvan î. Erê, tu mêvan î û ji te jî daxwazek min heye. Hêvî dikim ku ji niha û şûnda tu yê rê nedî xeta û xeletîyan. Heke tu vê xwazîya min li ber çav bigirî hem ji bo te hem jî ji bo me baş dibe. Qet tu şik nîne ku di gelek û gelekî xalan da bi xwe dikarim, ez dikarim xwe zeft bikim. Ez xwe zeft dikim, lê ka îcar Navdar!? Na, ne kefîlê wî me. Ne kefîl im, ji ber ku dinya rabe ser pîyan nikare wî zeft bike...

Gotin in û gotin jî nînin bala merîyan sivik û beşera merîyan xweş nekin. Dilê fermandar biêş bû, serê wî tevlihev û moralê wî jî ne di cî da û xirab bû. Bi diltengîya xwe bû, fermandar. Çawa

www.arsivakurdi.org

nebe? Hemû giranî li ser aqûbetê û aqûbeta wî di tarîyê da û ji pirsan jî pirseke bêbersiv bû. Bila ew bi wê tevlihevîya xwe be û em ê werin Kerem Begê. Di tarîya şikeftê da çavên xwe dabûn hev. Pir derbas nebû çavên xwe vekirin, xwe bi xwe axifî û got:

- Xwedê bila rihê merîyan bigire, lê bila merîyan neke dewsa vî fermandarî. Hêsîrî zehmet e...

Di tarîya hundir da vê gavê herdu jî bêdeng bûn. Herçiqas bêdengî ji bo yekî rehetî be, ji bo yê din jî tirs û xof, ta û paxav bû. Axaftinên Kerem Begê ji wî ra ronahîya dil bû, lê? Heke te nekarî bi yekî ra biaxifî, tu li xwe vedigerî û di dilê xwe da diaxifî. Wî jî wisa kir. Di dilê xwe da axifî û wiha got:

- Mîrê min, Begê min ez bi heyrana te me, ez bi qurbana te me! Meriv xwe nade bêdengîyê û qet nebe, bi çend hevokan axaftinê dike. Eha, cenabê te dest bi axaftinê kiriye, ma ne wiha ye?

Ka îcar çima tu wan peyv û hevokan li hev rêz nakî û nabêjî!? Xwezika te rewşa min belengazî jî li ber çav bigirta û di derbarê min da jî ne zêde, lê hema wiha gotinek du gotin bikra, lê!? Lo mîro! Ma te nedît? Te bi xwe jî dît Navdarê te ne carekê, lê pir û pir caran bi min lîst, bi hest û kesayetîya min. Wî lîst, lê tu nelîze. Bi heyrana te me! Tu yê bi min nelîzî. Nelîze, ji ber ku şan û şeref e û di şan û şerefê da jî cîyê lîstikan nîne. Dizanim tu camêrekî bi esalet î û esaleta te rê nade. Dizanim, mîro! Dizanim merivên bi esalet tu car bi hestê merîyan nalîzin. Na, ne bawerim tu yê bi min bilîzî. Çavê xwe veke û rewşa min bibîne. Ez ketime bextê te, Kerem Beg! Bêdengîya te ji min ra mirin e û bi wê bêdengîya xwe min nekuje. Biaxife, Kerem Beg. Biaxife!...

Axaftinên Kerem Begê ji wî ra hem hêvî hem jî temînat bûn. Dît Kerem Beg bêdeng e û xwast çend gotinan bike. Kir jî. Bi moraleke xirab axifî û got:

- Mîrê min, spasdarê cenabê te me. Ji niha û şûnda xeta û xeletî!? Na, ebeden nabe. Zaroktîya min di nav we kurdan da der-

bas bûye û ez ne xerîbê we me. Dîlgirtî me, lê ji alîyê cenabê te va jî wek mêvanek ji mêvanan hatime pêşwazî kirin. Ev jî ji mezinahî û rûmeta cenabê te ye. Rastî rastîya min e, çi bûye ew e. Ez ez ez nikarim ji vê rastîya xwe birevim...

Destpêka hevnasîyê bû. Piştî van gotinan Navdarê Kurd bi heybet derbasê hundir bû. Di hembêza xwe da wek şewat êdî her çi ku girtibe, danî û got:

- Ba rabûye ji baranê xirabtir e. Pir û pir jî sar e. Bilî zûrîna gur û wawikan wekî din jî bêdengî ye. Her tişt berkemal û tu xirabî nîne.

Çeqmeqê ku di destê xwe da girtibû, vêxist û xwast agir dade. Kerem Begê Qolaxasî, li cîyê xwe livîya, pê ra jî axifî û got:

- Navdar! Ka hela tu wî hesteyî ber bi min bigire û bide min. Bide ku ez ê bikarim pê cixarê vêxînim, heyran. Dû ra jî tu û agirê xwe...

Navdar, ber bi wî gavek avet, di destê xwe da hesteyê ku girtibû, da. Ji kîsê titûnê wî du cixare pêçabûn. Yeka vêxistî da Navdar û pê ra jî got:

- Leheng! Ka ji kerema xwe tu vîya bide fermandar û bila ji xwe ra cixareyekê bikişîne...

Navdarê Kurd, ji destê wî cixareya vêxistî girt. Girt, lê... Dudil bû. Nede jî nedibû, da.

Wan herduyan cixareyên xwe kişandin û wî jî darên ku bi xwe ra anîbûn yekoyek girt, da jûnîyên xwe û şikandin. Di şikeftê da jî dar hebûn, darên ziravok û hişk. Navdar, anîn dan ser hev û vêxistin. Pişt ra jî darên ku şikandibûn girtin û li agirê xwe bar kirin. Vê gavê bêdeng bûn, hem bêdeng hem jî tî û birçî... Kerem Beg? Kerem Beg, di exlaqê xwe da mirovekî rast û paqij bû. Gotinên wî ji dil û axaftinên wî jî wek şîr û şekir timî bi tam û hewes bûn. Ji mirovan mirovekî dilsoz, bi esalet û xwedîşexsîyet bû. Di kesayetîya wî da cîyê duritî, dek û dolaban nebû... Kesekî wêrek, vir û derew çi ye, nedizanî.

Li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Mala te lehengî ava, ji me ra te agir dada, tu pirs û pirsgirêk jî nehîşt. Tu her hebî, her û her!...

Dûra jî li fermandar vegerîya û got:

- Agirê me amade ye, fermandar! De ji cîyê xwe bilive û pêş va were…

Bang li fermandar kir şûnda jî ji ber xwe va axifî. Belê, ji ber xwe va axifî û wiha got:

- Dest û lingên me cemidîne û ji vê rewşa me ra dil digirî. Derd jî ne yek e ku meriv deyax bike; nan û av, sar û serma, zilm û zordarî û werhasil… Hema tu bibêje derd hezar û jê ra dil dizare…

Tîhna agir dabû dest û lingên wan û pê germ bibûn. Di alava agirê gurr da dirûv nebûn di tarîyê da bimînin. Êdî çav ji çavan ra ne xerîb bû. Di bejnê da Kerem Beg, mirovekî bilind û wek tayê rihanê zirav, bi simbêlek dirêj bû. Ronahîyê dabû birû û bijangên wî yên qeytanî û li rûyê wî şewle didan. Di çeprastîyê da li ser singê wî rextê fişengan hebû, li ser alîyê çepê û di bin şiwîtikê da serê xençerekê xuya dikir. Li ser navikê şalek rengîn û di rengê şimayê da jî çoxek ji destan çêkirî li xwe kiribû. Çiqas dest bi pêçana cixarê bikira Navdarê leheng û ji bîr bike? Na, nebû û ji wî ra jî dipêça. Îro? Îro ji cixarê bêpar hiştibû. Carekê din dest avêt cixaredankê, ji berika xwe derxist û sê cixare pêçan. Ya ku ji bo Navdar pêçabû, avêt ber wî û jê ra çav qirpand. Navdar, her bi awirên çavên xwe bû. Erê, herçiqas hêrs be û bi awirên çavên xwe be jî li hember Kerem Begê her bi rêz û rêzdarîya xwe bû. Ji axaftinê zêdetir guhdarî dikir û ji guhdarîkirinê jî sûd werdigirt. Bi awirên çavên xwe Navdar tirsa ber dilê fermandar bû. Fermandarê dîl, ber bi agir destê xwe vekir, çavên xwe kuta têhnê û di dilê xwe da axifî. Belê, di dilê xwe da axifî û wiha got:



www.arsivakurdi.org

- Ax!... Xwezika bila ne Navdar, lê bila bi axaftinên xwe tenê Kerem Beg li kêleka min bûya. Navdar li gel min nebûya bala min sivik û beşera min jî xweş dibû, xemgînîyê ewqas li min kar nedikir. Heke Kerem Beg jî li gel min nebe ka îcar ew ê rewşa min!? Belê, rewşamin!?

Tiştê ku ji bala Kerem Begê birevîya, nebû. Bi xwe jî dizanî ku awirên çavên Navdar ne hema wiha bêsedem in. Ji fermandar ra çavtirsî û hişdar bû. Dihat wê wateyê, heke tu rabî xeletîyan bikî, ez li ber pozê te me û tu car rê nadim te. Li gor dîtinên Kerem Begê tiştên ku Navdar dikirin, ne şaş û di cî da bûn. Navdarê leheng di navbeyna herduyan da rûniştibû û bi zanebûn devê tivingê ber bi fermandar girtibû. Piştî demekê Navdar cixareya ku Kerem Begê ji bo wî pêçabû ji ber xwe va hilda û pê ra jî bi çaplîya destê xwe, rabû. Di rabûnê da jî ber bi Kerem Begê mêze kir û got:

- Bi destûra cenabê te, dixwazim ji bo xulekî du xulekan derkevim. Dixwazim sehbikim ka li derva rewş çi ye û qet çawa ye?

Kerem Begê Qolaxasî di erênîyê da serê xwe hejand û rê da...

* * *

*Bayê eşqê li her kesî dixîne, lê her kesî nafirîne.*

Navdarê Kurd, ji ber tîhna agir rabû û di rabûnê da jî çû kêleka xwe da zinarê li ber devê şikeftê, cixaraya ku ji Kerem Begê girtibû vêxist û biqasî qederekê guh da dengê şevê û bêdeng ma. Li vî çiyayî hîv di ser girekî ra girtibû û ronahî dida. Zerayîyê dabû rûyê berfê û şewle dida. Çiya û banî kerr û lal, deng û seda nebû. Di wê mêzekirinê da hema bi carekê dergîstîya wî hat bîra wî. Ji alîyekî va cixareya ku di destê xwe da girtibû kişand û ji alîyekî va jî xwe bi xwe axifî. Di axaftina xwe da çi got?

Çi bibêje, got:

- Lo, lawo! Law, Navdar! Ne dem ew dem ne jî bihar ew bihar e. Ji bîr neke, tu di şer da yî. Ê de hela bibêje, ka îcar çi îşê te bi xem û xîyal û agirê evînê ketiye? Tu yekem here axa welatê xwe azad bike, axa welat... Tu here wê azad bike û paşê jî bila dor were evîna te. Dev jê berde û dem ne dema xem û xîyalên te ne! Qey haya te ji te nîne, Navdar!? Ma tu nizanî te bîranînên xwe di paşila wê da hişt, bîranînên ku lîme lîme peritî û ji xwe û hebûna xwe tu xêr û mirad nedîtibû. Tu jî dizanî ku dilê tirsonek singê gewr nabîne, lê ne te jê pirsî û ne jî wê got...

Belê, xwe bi xwe axifî û di pey ra jî ji xem û xîyalên xwe yên bêmirad dûr bû. Berîya ku jê dûr bibe jî xwe bi xwe kir miremir û wiha got:

*Nesekine, zû were*
*zû were şev bihurî li vî çiyayî*
*di biskên te da bihar û di dilê min da evîn*
*wek qedehek nîv tijî.*

*Ji şevan şevekê şermokî ye*
*dizanim yekem tu diçî û dû ra jî hîv*
*çi ku ma be, ew dimîne*
*di sîya vî çaplîyê da evîna min û te...*

Zêde li derva nema. Berê xwe da hundir, çû li cîyê xwe yê berê û li kêleka fermandarê dîlgirtî çok da erdê û rûnişt. Kerem Begê Zirkî di tunebûna Navdarê leheng da çend pirsên xwe ji fermandarê dîl kiribûn û bersiva wan pirsan jî hatibû dayîn. Qet tu şik nîne ku Kerem Beg di warê siyasetê da mirovekî têgehiştî û zana bû. Navê wî navekî giran bû. Ji maqulîya wî ra gotin û hebin, na. Ew, berxek ji berxên mala Mistefa Begê bû. Di bersivên xwe da fermandar ji wî ra qala çend navan kiribû. Kerem Beg ne xerîbê wan navan bû. Berxê mala Mistefa Begê li ser

wan navan nesekinî. Axifî û di axaftina xwe da wiha got:

- Dêmeg, bi eslê xwe tu Ermenî yî. Min qet bawer nedikir hûn ê rojekê bi hêzên Ûrisan ra berê xwe bidin vî welatî, werin û bi me ra şer bikin. Helbet, dizanim babet babeteke kûr e. Lê dîsa jî bi kurtî dikarim bibêjim ku neyartîya me ji we ra nebûye. Em ne Romî ne ku ji we ra neyartîyê bikin. Ji 1908an bigire heta 1915an tekekilîya we û Ittihad we Teraqqî pir û pir xweş bû. Di navbeyna we da tu pirs û pirsgirêk nebû û derê we ji Talat, Enwer û Cemal paşayan ra tim û timî vekirî bû. Di encamê da yên ku berê xwe dan we û koka we anîn jî disa ew bi xwe bûn. Heke tu ji min bipirsî ez dibêjim ew siyaseta ku we bi kar dianî siyaseteke şaş bû û di encamê da hûn bûn qurbana wê siyaseta xwe. Heta ku meriv dost û neyarên xwe ji hev safî neke nikare hêvîyê bide, rê bigire û ji xwe ra pêşerojê ava bike…

Li ser hev kuxîya şûnda carekê din vegerîya ser axaftina xwe. Ji nav agir darek nîvşewitî hilda, pê cixareya xwe vêxist û wiha got:

- Çi bibêjim, fermandar. Di vî şerê giran û bêperwa da yên ku mal li me şewitandine hûn û artêşa Ûrisan bi xwe ne. Ittihad we Teraqqî, Teşkîlatê Mexsûsa, bi hev ra berê xwe dan we û we jî bi hêzên Ûrisan ra berê xwe daye me. Bi wê siyaseta xwe ya şaş we hem mala xwe hem jî mala me şewitand. Îcar dibe meriv bi fesadîya Ûris, Fransiz û Înglîzan berê xwe bide cîranê xwe yê salan û bibe sedemek ji sedemên malwêranîyê? Meriv cîranê xwe yê qedîm naêşîne, lê mixabin we bi têra xwe êşand. Helbet, haya min ji gelek û gelek bûyeran heye û nayê înkarkirin ku ez ê rabim û inkar bikim. Di navbeyna me û we da ne carekê, lê pir û pir caran qal û qir, pevçûn çêbûye û qewimîye. Nabêjim baş e, lê dibêjim xwezika bila qet rûnedana. Ez ê werim vî şerî. Di vî şerî da wehşet, hovîtî, bêbavî û tawanbarî hebû û hê jî ew êş û êşdarî berdewam e. Di vî şerê bêbav da fesadî û alîkarîya dijmin

hebû. Ne rewa ye ku meriv bi fesadîya dewletên mezin rabe were û heyfa komkujîya sala 1915, di 1916 da ji me bistîne. Neyarê we ne em in, lêbelê Romî ne. Ger ji we were hûn berê xwe bidin wan. Lê we çi kir? We jî berê xwe da me, êş û elem, derd û kul nema hûn ê nedin...

Fermandar hem bêdeng hem jî xemgîn bû. Aqûbet e, nedizanî ka ew ê çi bi serê wî were. Herwiha gotinên Kerem Begê jî êdî ne wek yê berê bi merhamet bûn. Di axaftinên wî da êş û êşdarî hebû. Gotinên Kerem Begê berê xwe dabûn wî û bêhn li wî çikandibûn. Ê de te ku karîye tu were di sîya Navdarê Kurd da vê êşê, êşa ku li rewşa te bar bûye rake û ji gotinên Kerem Begê ji xwe ra hêvîyê bidoşe. Mixabin, axaftinên wî sar û vê gavê ne bi ya dilê wî bûn. Di rewşa xwe da fermandar, mirovekî bêçare bû. Li kêleka wî Navdarê Kurd rûniştîbû û carê carekê tilîya xwe ya nîşanekê dibir ser tetikê, dianî û dibir. Fermandarê reben, ka îcar dikarî jê ra çi bigota? Ew fermanderekî dîlgirtî bû. Rastîya wî rewşa wî ya xirab bi xwe bû.

Kerem Begê Qolaxasî ji cixareya destê xwe firtek girt kişand û yekem got:

- Belê û belê…

Pişt ra? Pişt ra jî li fermandarê dîl vegerîya û got:

- Ê de meraq e, fermandar. Min ji te nepirsîbû, lê ez ê niha ji te bipirsim. Bi eslê xwe tu kî yî û ji kîderê yî? Heke te xwast tu dikarî bersiva vê pirsê bidî. Lê dema ku te nexwast jî, tu dikarî jê ra bêdeng bimînî û nebêjî…

Jê pirs kir û xwe da alîyekî. Pirs ku ji merîyan hatibe kirin meriv bêbersiv nahêle. Ber bi Kerem Begê sere xwe rakir û yekem got:

- Belê, Mîrê min!...

Li pey vê gotinê jî gewrîya xwe paqij kir, hat ser axaftin û bersivê. Bi dengekî nizm axifî û got:

- Navê min Xaço ye, Xaço Koçeryan. Bi eslê xwe jî, ez ji Meletîyê me...

Kerem Beg, bi guhdarîya xwe bû û nedixwast bikeve navbeynê û axaftinên wî bibire. Navdarê Kurd, li cem Kerem Begê cixare nedikişand. Rabû û ji şikeftê derket. Bi çûyîna wî rih hat fermandar, beşera wî xweş û bala wî jî sivik bû. Li Kerem Begê vegerîya û got:

- Mirê min!...

Û sekinî. Dudilî bû. Bêqerar bû, fermandar. Dixwast pirsa xwe ji Kerem Begê bike, lê… Gelo mafê wî û pirsan hebû? Ew, merivekî dîl bû. Pirs ji desthilatdaran û bersiv jî di piranîyê da ji bindestîyan dihat. Piştî demekê pirsa ku dixwast bike, kir. Bi dengekî safî axifî û got:

- Mîrê min, bibexişînin! Destûr hebe dixwazim ji cenabê te pirsek bikim. Gelo cenabê te ji kîjan herêmê ye?

Yê wî ne zêde, lê hema wiha pirsek bû. Kerem Begê Zirkî qederekê xwe bi xwe şêwirî. Di pey ra jî axifî, bersiva pirsê da û got:

- Ez Kerem im, Keremê Qolaxasî. Ji min ra berxê mala Mistefa Beg jî dibêjin. Ez lawê Ehmed Begê me, Ehmedê Qolaxasî. Pirsên te hebin tu dikarî ji min bikî…

Pirs jî kin bûn û bersiv jî. Qala herêmê nekiribû. Kerem Begê Qolaxasî çavên xwe li tirafa agir girt û xulekî du xulek mêze kir. Di bersivê da wî qala Mistefa Begê kiribû. Ka îcar kî bû, Mistefa Beg? Mistefa Beg, li herêma Qereyazî û Xinûsê serokeşîrê êla Zirkan bû. Li Qiskanîyê bi cî bibû û dima. Di nav êl û eşîran da Mistefa Beg xwedîyê navekî xas bû. Gundê Qiskanîyê cîyê axa û begên Zirkan bû. Ji alîyê bavê va Kerem Beg nevîyê Mistefa Begê Zirkî bû. Bi navê xwe bavê wî Ehmed bû û dayîka wî? Dayîka wî jî bi wî nav, sekin û esaleta xwe Cewê bû.

Di sir û sermayê da li ber agir rûniştibûn. Derengîya şevê bû.



www.arsivakurdi.org

Li vî çiyayî ba û bagêr hebû. Li vî çiyayî sar û serma hebû, lê mixabin nan û av nebû, tî û birçî bûn.

Kerem Begê Qolaxasî, li fermandarê dîl vegerîya û got:

- Xaço Beg, rewşa me li ber çav e. Tu jî wek me hem tî hem jî birçî yî. Xwarin? Mixabin nîne û nikarim tiştekî bidime ber te. Hema tenê yek îkrama me heye, ew jî di helandinê da berf e, berfa sar û cemidî... Xwezika bila kerîyekî nanê me hebûya. Ger hebûya min îkram dikir, lê ez çi bikim ku nîne…

Pir derbas nebû Navdarê leheng jî hat. Xortekî esmer û tu heta bibêjî li ser xwe bû. Destên xwe vekirin û li ber agirê gurr hat ser çokan. Pîçek xwe germ kir şûnda jî ji ber agir kişîya, çû û li şûna xwe ya berê rûnişt. Li vî çiyayî û di vê şikeftê da her sê jî birçî bûn. Di rewşeke wiha da fermandarê dîl nedikarî bigota:

- Kerem Beg, ez li ber bextê te ketime! Camêro, ma tu nabînî ez hem tî hem birçî me. Ji cenabê te xwazîyeke min heye. Çer dikî bike, ji me ra nan û av, nan û av!...

Di vî warî da êdî gotin nemabûn ku Kerem Beg bike. Ger li mala Kerem Begê mêvan bûya, îcar Kerem Begê Qolaxasî nan û av nedida ber wî? Helbet, dida. Mêvanî ye û jê ra kar jî serjêdikir, berx jî. Mala wî mala xanedanan bû. Di malhebûna xwe da Kerem Beg mirovekî hejar nebû. Tu yê bibêjî bila di warê aborîyê da kêmasîyeke wî hebe, nebû. Derîyê mala wî ji her kesî ra vekirî bû. Herwiha, birayên wî Xakî, Nûsret û Saîd jî wekî wî her bi comerdîya xwe bûn. Evdal û Celal, kûrapên wî bûn. Hem mêr hem jî camêr... Kerem Beg zewicîbû. Navê xanima wî Hedê (Hedîye) û dayîka sê qîzan bû; Muhtesim, Xêyrîye û Xanim. Ew ji jinan jineka çê bû. Qet tu şik nîne ku di hezkirina mêrê xwe da tu qisûrek wê nedibû. Li wî gundî, li gundê Qiskanîyê ji wê ra nedigotin Hedîye, lê dema bang li wê dikirin jê ra digotin; Hedê. Hedê ji Qereyazîyê qîza Mûrad Axayê Dimilî bû. Mûrad Axa, li gundê Kose bi cî bibû û dima. Kerem Beg, niha li Çiyayê Qerte-

wînê û di şer da bû. Hedê? Hedê jî qet tu şik nîne ku bi hesreta wî bû. Belê, ew bi hesreta mêrê xwe û mêrê wê jî di şikeftekê-tarî da hem bi dîlekî ra bi axaftin hem jî tî û birçî û bêxew bû. Şer e, dema ku meriv berê xwe bide û biçe sengeran her bi tevdîr û tedarîk e. Di rêvebirîya vî fermandarî da desta çekdaran berîya ku berê xwe bidin vî çiyayî û werin, bi xwe ra erzaq û sîleh anîbûn û di şikeftekê da bi cî kiribûn. Fermandar tî û birçî bû. Heta niha ji Kerem Begê ra qala tiştekî wiha nekiribû. Qalê nekiribû, ji ber ku ne ji wî hatibû pirsîn ne jî wî xwastibû bibêje. Heke ji wî bihata pirsîn gelo ka îcar wî qalê dikir û digot yan na? Ger bigota jî ka îcar dikarî çi bigota!? Ew, hem berpirsyar hem jî rêvebir bû. Îcar wî dikarî raza leşkerîyê eşkere bikira!? Cîyê tevlihevî û dubendîyê bû. Xwe bi xwe axifî û got:

- Wijdana min qet rê nade min ku ez cîyê erzaq û sîleh û teqemenîyan bidim dest. Ji ber ku ez fermandar im. Lê ji alîyekî va jî em hem tî hem birçî ne...

Dûra li rûyê Kerem Begê mêze kir û di dilê xwe da wiha got:

- Mîrê min! Te camêrîya xwe nîşan da û niha jî dor hate min. Ji alîyê te va ne wek dîl, lê wek mêvanek ji mêvanan hatime pêşwazîkirin. Te destê min da vekirin û her çi ku hebe bi min ra parva kir. Bi min ra axifî û te hêvî da min. Ger ji te nebûya di destê vî pêxwasî da niha helak bibûm. Li gel min xatirê te heye û xatirê te jî wek vî çiyayî, Çiyayê Qertewînê bilind û giran e...

Fermandar di navbeyna wijdan û zagona leşkerîyê da hat û çû. Ne tenê di navbeyna wijdan û zagona leşkerîyê da, lê di navbeyna Navdar û Kerem Begê da jî hat û çû û wek çawa kevirek ji cîyê xwe bileqe, leqîya û di pey ra? Di pey ra jî gilêr bû, çû û li ber Kerem Begê sekinî.

* * *

Kerem Begê Qolaxasî û Navdarê Kurd, ne hema wiha bîlasebeb li vî çiyayî û bi tena serê xwe bûn. Li hember artêşa Ûris şerekî giran dabûn û di encamê da jî ji alaya xwe pekîyabûn. Erê, herçiqas ji alayê bipekin jî di encamê da li qada şer bûn û ji helwesta azadîyê dûr neketibûn. Li vî çiyayî û di vê şevê da, di şeva ba û bagêr, berf û baranê da ji wan ra pirsgirêka herî mezin xwarin û vexwarin bû û mixabin, ew jî nebû. Di tûrikê herdu mêrxasan da kerîyekî nanê tisî hebû, di zû da xwaribûn û jê tiştekî nehîştibûn. Fermandarê dîl rehet nebû û li cîyê xwe dihat û diçû û diqilqilî.

Pişt ra li Kerem Begê vegerîya, bi lez axifî û got:

- Mi mi mîrê min! Bi bi bi destûra te! Heke de des tûr hebe dixwazim ji bo destavê derkevim derva.

Ji alîyekî va got û ji alîyekî va jî cad kir ji cîyê xwe rabe. Rabû, lêbelê di rabûnê da jî hişê wî çû û tewişî. Birçî bû û çawa netewişe? Kerem Beg li Navdarê Kurd vegerîya û jê ra wiha got:

- Leheng, ka de rabe û bide pêşîya camêr. Pêdivî ye û bila ji xwe ra derkeve derva. Ji xwe ra hem hewa digire hem jî bala wî sivik dibe. De fermo, zû bibe û zû jî bîne…

Peyvên maqulan zêr in, zêr. Destûr da û di pey ra jî fermandarê dîl teslîmê Navdar kir. Ax Kerem Beg, ax!... Xwezîka te wî teslîmê Navdarê leheng nekira. Te hem teslîmê wî kir hem jî te ji wî ra çav qirpand. Eha, madem te jê ra çav qirpandîye, biqirpîne! Lê îcar çima tu bi tilîya nîşanekê serê xençera xwe nîşan didî? Xençer û bêwate be!? Na, dihat wê wateyê ku eger ew teşebisê revê bike, ne hewceyê gotinê ye ku ez ê bikim û bibêjim. Na! Ez nabêjim, ji ber ku tu bi xwe jî dizanî ka tu yê çi bikî. Navdarê leheng, fermandarê dîl da pêşîya xwe û ji şikeftê derketin. Ew ku derketin şûnda Kerem Begê Qolaxasî ji alîyekî va dest bi

pêçana cixareyê kir û ji alîyekî va jî ket xem û xîyalên kûr û ji xwe dûr bû. Di wê gavê da qey nas û dost, mêr û mêrxas nebûn neyên bîra wî; wek Xalid Begê Cibrî, Silêmanê Ehmed, Xalid Begê Hesenî, Ferzende Beg, Evdilbaqî, Îhsan Nûrî û hwd. Ew peyayên roja oxirmê giran bûn. Bi wê mêr û mêrxasîya xwe ji wan her yek niha li senger û di qada şer da bû. Di sar û sermayê da, di berf û baranê da ew jî tî û birçî bûn. Ka îcar kî dizane belkî jî ji wan egîdan birîndar, nexweş, dîlgirtî û cangorî jî hebûn. Şer bû û şer jî bi navê xwe malwêranî û kavilî bû. Bi hatina herduyan Kerem Beg, ji xem û xîyalên xwe yên kûr dûr bû. Bêhnteng bû û ji ber wê yekê jî di hatina Navdar û fermandar da ne serê xwe rakir ne jî livîya û deng kir. Bêhntengîya wî ne bilasebeb bû; li vî çiyayî tî û birçî, westîyayî û ser da jî ev bibû çend roj ku xew neketibû çavên wî. Vê gavê bêdengî bû û kesê ku biaxife nebû. Di rewşeke wiha xirab da Kerem Beg jî ku qise neke ka îcar kî? Di hatinê da fermandarê dîl, çer hatibe wer jî rûnişt û di pey ra jî serê xwe kir nav şeqê xwe û ji xwe dûr û dûr bû. Navdar? Navdar, li kêleka wî çok dabû erdê û wek berê dîsa bi awirên çavên xwe bû. Fermandar, bêhal û birçî bû, nedikarî li ser xwe bisekine. Bextê wî reş û rewşa wî jî li ber çav bû. Ji rewşa wî ra gotin nebûn te yê bikira. Bêdengîya Kerem Begê jî ji wî ra manîdar û bibandor bû. Qey Kerem Begê ji wî ra negotibû: ‘Fermandar, wek xwarin tiştê ku ez ê bidim ber te nîne. Nîne, ji ber ku tu jî dizanî tune tune ye...’ Fermandar li ser van gotinên wî xwe bi xwe şêwirî, di hişê xwe da bir û anî, wezinand û di encamê da biryara xwe da û di dilê xwe da wiha got:

- Na, nabe ez ê neaxifim û nebêjim. Rewşa min û Kerem Beg li ber çav e. Ew jî birçî ye û ez jî. Navdar? Navdar, bila ziqûmê bixwe! Bila ji birçîyan ra bimire û pêsîra min jî jê xilas be. Êş nema nede min, êş! Xortekî bêbav e, lê hem jî çer!...

Dilê wî bi tirs bû, lê bila be. Axifî û yekem got:

- Mîrê min!...

Di pey ra jî sekinî û deng nekir. Bi vî awayî dora axaftinê jî hatibû, Kerem Beg. Li fermandar vegerîya û got:

- Heyran, ez nizanim ka îcar çima tu car caran berê xwe didî min û ji min ra dibêjî, 'Mîrê min?' Ez bim wisa nabêjim, lê dîsa jî tu dizanî. Navê min Kerem e û ez bi xwe jî bi vî navê xwe hem kêfxweş hem jî serbilind im.

Herçiqas ziman li fermandar giran bibe jî axifî û gotina xwe kir. Belê, gotina xwe kir û got:

- Mi mi mîrê min!... Be be begê min, şev e û derengî ye. Êdî ez nikarim bêdeng bimînim. Berîya ku me berê xwe dida vî çiyayî û em dihatin, me bi xwe ra nan û av, derman û…

Axaftina xwe temam nekir. Xulekî du xulek bêdeng ma. Ji ber ku di navbeyna Xelîl û Celîl da mabû. Peyva ku nexwastibû bibêje jî, teqemenî bû.

Carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Wek erzaq xwarin û vexwarin, (…!), derman û hwd. Di wê şikeftê da hene. Li vî çiyayî şikeft nîne cîyê wê nezanim. Min xwast ez vîya bibêjim û êdî destûr destûra cenabê te ye…

Kesê ku zorê bide wî û van gotinan ji devê wî bigire, nebû. Na, ne kesî li wî tahde kiribû ne jî jê ra gotibû heke tu cîyê nan û avê nebêjî tu wer bizanibe kuştina te ji destê min e. Kesî li wî ferz nekiribû û wî bi xwe raza xwe eşkere kiribû. Di wê şikeftê da bilî xwarin û vexwarinê jî cebirxaneyek hatibû veşartin.

Kerem Begê Qolaxasî, zêde neaxifî û tenê got:

- Ê de baş e!...

Pişt ra jî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Ê de rabe, qurban. Rabe, emanetê camêr bîne. Emanet, emanet e û nabe em ê nedin. Em ê wê bidin û di pey ra jî rabin.

Navdar, ji cîyê xwe rabû û çû. Di hatinê da jî tiştên ku anibû li ber Kerem Begê, di rêzekê da danî. Ji ber xwe va yekoyek gir-



www.arsivakurdi.org

tin, lê nihêrî û di pey ra jî ber bi fermandar girt û da. Li ber wî demançe, xençer, dûrbîn û qewlikek mabû. Ji erdê qewlika reş hilda û girt û yên din jî ji Navdar ra hîşt. Jê ra jî çav qirpand û got:

- Tu wan bigire û bila li gel te bin…

Qewlika fermandar di destê wî da bû. Qederekê di destê xwe da anî û bir û di pey ra? Di pey ra jî ber bi wî va girt, da û got:

- Fermo, tu vîya jî bigire û em ê ji xwe ra rabin...

Heke meriv bi axîn û kesera dilê xwe bûye malê merîyan hebûye çi, nebûye çi. Fermandar ji destê Kerem Begê qewlika xwe girt, lê nekir berîka xwe. Jê wêneyek derxist û di pey ra jî ber bi Kerem Begê va girt û da wî. Kerem Begê Qolaxasî di ronahîya hesteyê xwe da li wî wêneyî mêze kir. Di wê wêneyê da sê zarok û xanimek hebû. Du zarok li kêleka wê û yek jî di hembêza wê xanimê da bû.

Herdu zarokên li kêlekê bi fistanê wê va girtibûn. Qederekê di destê xwe da girt, lê mêze kir û bi wê mêzekirina xwe ma. Na, nexwast di derbarê wêneyê da jê tiştekî bipirse. Ji ber ku dem ne dema pirsan bû. Di wê navbeynê da Navdarê Kurd vala nesekinîbû. Di kulmên xwe da çend car berf anîbû û pê agir vemirandibû. Kerem Beg ji cîyê xwe livîya û rabû. Di rabûnê da jî li fermandar vegerîya û got:

- De fermo! Ger tu jî amadeyî, em ê rabin û bi rê bikevin.

Fermandar rabû û di rabûnê da dîsa tewişî. Ne Navdar lê Kerem Begê Qolaxasî ket pîyê wî û rê neda ew bikeve.

Berîya ku ji şikeftê derkevin û herin Kerem Begê Qolaxasî devê xwe da ber guhê Navdar, kir pistepist û got:

- Ger livîya û niyeta revê kir tu dizanî tu yê çi bikî!...

Ji alîyekî va got û ji alîyekî va jî carekê din serê xençera xwe nîşan da. Pişt ra? Pişt ra jî Kerem Begê Zirkî da pêşî û ji şikeftê derketin.

* * *

www.arsivakurdi.org



Ji şikeftê derketibûn û di sir û seqema werzê da berê xwe dabûn navnîşana duyem. Berîya ku bi rê bikevin û herin Kerem Begê Qolaxasî bi meraqek berê xwe da termê serbaz, serbazê ku bi laşê wî va girtibû û ber bi xwe va kişandibû. Çû, lêbelê rastê kelexê wî nehat û vegerîya. Di vegerê da jî xwe bi xwe axifî û wiha got:

- Dev jê berde, Kerem! Yê ku çûye çûye û bi mirîyan ra nayê mirin…

Pişt ra? Pişt ra jî li herduyan vegerîya û got:

- Ê de nesekinin, heyran. Nesekinin, gavên xwe lez biavêjin, em ê ji xwe ra bi rê bikevin û herin…

Dûra li Navdarê leheng vegerîya û jê ra wiha got:

- Heyran, ê de hela tu jî xwe wiha bide alîyekî! Xwe bide alîyekî, ne ez û tu, lê fermandar rê dizane û bila ew xwe bide pêş. Şev e û ez hêvî dikim ku di vê sar û sermayê da qonaxa me ya duyem ji vir ne pir dûr be...

Navdarê Kurd her bi baldarîya xwe bû. Tilîya wî li ser tetikê û çavê wî jî li ser fermandar bû. Xwe da alîyekî û rê da wî. Navdar di derbasbûna wî da li pişt xwe vegerîya û yekem li şikeftê û dû ra jî di reşêşa baranê da li rewneqdarîya vî çiyayî mêze kir. Di mêzekirinê da jî di dilê xwe da axifî û wiha got:

- Çiyayo, çiyayê qedirzan!... Ez nizanim ka çima ewqas xemgîn î, pir esîrînî didî tu? Xemgîn nebe. Soz e, û sozê didim te. Agirê azadîyê ku carekê gurr bû êdî kes nikare pêşî lê bigire û bitemirîne. Her dibêjim: azadî, azadî û dîsa azadî!... Heta ku ez azadîya te li ber çavê xwe nebînîm ji min ra tu car sekin nîne û ew ê nebe jî. Navdar û ji çek û sîleh dev berde!?

Di dilê xwe da wî wisa got. Got, lêbelê di eynî wextê da jî fermandarê dîl, li cîyê xwe sekinî û ji nişka va li wî vegerîya. Ê de

mebest e û di mebestê da jî xwastibû ji wî ra bibêje: Navdar! Eha, em hatin û şikeft jî li vir e! Ê de Navdar û derfet bide!? Na, derfet nedabû ku camêr ji xwe ra merema xwe bibêje û biaxife. Ê erê, Navdar! Madem te derfet nedaye, nede! Lê çima ji ber xwe va dest diavêjî xençerê, hi!? Ma tu nizanî di sîya xençerê da meriv lalome ye û nikare gotinê bike. Birqa xençerê ji kî ra nebûye tirsa dil ku ji wî ra jî nebe? Dema ku çavên wî li xençerê ket hişê wî çû û ji kûr va kir axîn û zarîya. Bi zarîna wî ra Kerem Begê Qolaxasî jî, ji ber xwe va dest avêt şeşagirê.

Ji alîyekî va dest avêt û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Xêr e, çi bû û çi qewimî!?

Bersiva pirsê ne ji Navdar, lê ji fermandarê dîl hat. Tevlîhev bû, kir bilebil û got:

- Be be begê min! Şi şi keft li vî alîyê dikeve. He he hema wiha li ser destê çepê û di paş wê darê da ye…

Nekarîbû ji Navdar ra bibêje, ji Kerem Begê ra got. Fermandarê dîl li ser hev kuxîya û pişt ra jî hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Şikefta ku min dixwast ez ê nîşanê we bidim ne dûr e, hema wiha li vir û di paş vê darê da ye, di paş dara mazîyê da...

Berf bilind û çûyîn jî bi zehmetî bû. Hema wiha çend gav avetibûn neavitibûn ji nişka va ji paş şepeyê li pêşberî wan gurek derket. Bêhn e, xwe li reşê ser berfê va girtibû û hatibû. Dema çavên wî li van her sê camêran ketin devê xwe vekir, diranên xwe nîşan dan û pişt ra jî zivirî û çû.

Kerem Begê Qolaxasî li cîyê xwe sekinî, pê ra jî axifî û got:

- Ê da ka ez ê ji xwe ra berê xwe bidim wî reşî û herim. Herim û seh bikim ka ew çi ye!

Kerem Beg û nezanibe!? Na, dizanî. Dizanî, lê de bila be. Dîsa jî dixwast here û bi çavên serê xwe bibîne. Axir, xwe li wê dûşê va girt û çû. Çû û wek çawa texmîn kiribû, wer jî derket.



www.arsivakurdi.org

Reş, reşê serbazekî bû. Di bêdengîyê da xulekî du xulekan çavên xwe li termê wî va girt û mêze kir. Di dilê xwe da jî axifî û wiha got:

- Leşker! Ez nizanim ka te çi guneh heye!? Ez nizanim, lê encax Xwedê dizane û bila ew te efû bike!

Herduyên din ne zêde, lê hema wiha bi qasî gavek du gav ji wî dûr bûn. Kerem Begê Qolaxasî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Min ji te ra çi gotibû, Navdar? Min gotibû “Wek mêran bikuje û wek şêran jî veşêre!” Ez ji kuştinê ra dibêjim erê, lê ji veşartinê ra, na. Na! Ji ber ku veşartin ne karê min e. Niha ez nikarim vê gotinê dubare bikim, bi zanebûn nikarim. Kerem Beg û termê vî serbazî li erdê bihêle û teslîmê guran bike!? Xwedê heye, nabe û nikarim. Nikarim, ji ber ku ne wijdan ne jî merhamet rê dide min…

Xwar bû û carekê din li meyîtê serbaz mêze kir. Pişt ra jî li fermandar vegerîya û got:

- Dixwazim meyîtê vî leşkerî rakim û veşêrim, lê çawa!? Ne bêr e, ne jî tevir… Ger hebûna min jê ra çalek vedida û defn dikir, lê mixabin ez çi bikim ku nîne.

Fermandarê dîl, yekem histûyê xwe li ber xwe tewand û biqasî xulekî du xulek bêdeng ma. Pişt ra? Pişt ra jî li Kerem Begê vegerîya û got:

- Begê min! Şikeft ji vir ne dûr e, li wir tevir jî heye, bêr jî…

Piştî van gotinan Kerem Begê Qolaxasî rahişt termê serbaz û xwast ji erdê rake. Navdarê leheng rê neda û nehîşt. Di dilê xwe da jî hêrs bû, Navdar. Te digot qey niha xwe dixwe. Ger te ji wî ra bihîşta wî ne dest diavêt termê leşker, ne jê ra ax dikola ne jî dida axê û vedişart. Li ser berfê dihîşt û îşev jî dikir xwarina gur û wawikan. Ji ber ku ew ne dost, lê neyarê wî bû.

Belê, li Kerem Begê vegerîya û got:

- Keko! Ê de hela xwe wiha bide alîyekî! Xwe bide alîyekî ku

bikaribim rahêlim cendekê vî serbazî û...

Rahîşt, lêbelê Kerem Begê Qolaxasî rê neda û nehîşt. Ji alîyekî va xwar bû û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Na, heyran! Na, tu bi fermandar ra bimeşe û li ser min ferz e. Ferz e û divê ez ê wê bi cî bînim…

Rahîşt term, rakir û bi rê ketin. Gihîştin navnîşana xwe ya duyem şûnda Kerem Begê Qolaxasî termê wî li ber devê şikeftê û hema wiha li alîyê rastê danî. Danî şûnda jî ji pişta xwe şalê xwe vekir, li ser term raxist û rabû. Di rabûnê da jî axifî û wiha got:

- Miheqeq niha şikeft sar e û pêdivîya me jî bi dar û ber, qirş û qal heye. Wek şewat êdî her çi ku li ber çavê we ketibe bigirin, em ê ji xwe ra derbasê hundir bibin. Bê agir nabe…

Hevokên wan kin û bi kurtî bûn. Birçî bûn, di her sêyan da jî tu yê bibêjî bila mîsqalek mecal mabe, nebû. Navdarê leheng, ber bi wî mêze kir, pê ra jî axifî û got:

- Baş e, keko. Fermo, tu bi fermandar ra derbas bibe. Ew li ser min, ez ê peyda bikim û binîm…

Erê, wî wer got. Lêbelê ne Kerem Beg ji cîyê xwe livîya ne jî fermandar. Navdarê leheng di vir da wê da hat û çû û di encamê da wek dar û ber êdî her çi ku li ber çavê xwe dîtibe, girt û di pey ra jî derbasê şikeftê bûn, şikefta ku cebirxane tê da veşartî. Lehengê cegerpola, darên ku anibûn nedan serhev û dest bi vêxistinê nekir. Bi ronahîya hesteyê destê xwe yekem li hundir çav gerand û bi baldarî heta dawîya şikeftê çû.

Di vegerê da? Di vegerê da jî xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da wiha got:

- Lo!... De çi dibe çi nabe. Ê ne bav û kalan gotiye: Yekem kerê xwe bi singekî va zexim girêbide û dû ra jî teslîmê Xwedê bike. Poşmanî ye û poşmanîya dawîn jî pere nake. Xwedê bila merîyan ji tifaq û cûre cûre leyiztikan biparêze…

Pozê wî ne carekê lê di vî temenê sivik da pir û pir car şewitîbû. Nedixwast çavê xwe bigire, pê ra jî li xeta û xeletîyan biqelibe û rê bide xirabîyê. Hat şûnda çok da erdê, bi darên hişk va girt û xwast agir dade. Wî dest avêt daran û Kerem Beg jî axifî. Axifî û di axaftina xwe da wiha got:

- Na, Navdar! Na, tu vê gavê dev jî agir berde û bila bimîne. Meyît e û nabe li erdê bimîne. De rabin hê ku nebûya para guran, em ê herin. Herin, yekem wî veşêrin û dû ra jî agir...

Kerem Beg, piştî vê axaftinê jî li fermandarê dîl vegerîya û bi wî ra axifî. Belê, bi wî ra axifî û got:

- Em li benda te camêrî ne, fermandar. Tevr û bêr e û em jî nizanin ka li kîderê ne? De rabe! Rabe, ji me ra bîne ku em dereng nemînin.

Di şikeftê da zinarekî mezin hebû. Fermandar rabû û berê xwe da wir. Ji paş wî zinarî tevr û bêrek hilda, anî û di pey ra jî rabûn û derketin.

Li ber devê şikeftê û hema wiha li alîyê çepê dest bi kolana çalek kirin. Piştî wê kolanê jî Navdarê leheng, xwast dest biavêje termê serbaz û ji erdê rake. Kerem Begê Qolaxasî di vir da jî rê neda û nehişt, bi xwe rakir û danî çalê. Li ser termê wî serbazî şalê Kerem Begê disekinî, ji ser hilneda û hişt. Laşê wî dan axê, serê çalê bi berf û herîyê tijî kirin û girtin.

Di derengîya şevê da zerayîyê dabû girê çiyan û şewle dida. Bilî zûrîna guran wekî din ne tu deng ne seda bû.

Kerem Begê Qolaxasî, bi dengekî nizm axifî û got:

- Min kuşt û min veşart. Xwedê efû bike!

Di pey ra jî bi hev ra derbasî hundir bûn. Her sê jî bêxew, birçî û betilî bûn. Navdarê leheng pal da erdê, rahîşt darên hişk û agir dada. Yekem li ber tîhna agir rûniştin û xwe germ kirin. Pişt ra? Pişt ra jî dor hatibû xwarin û vexarinê û ew jî ji fermandarê dîlgirtî bû. Fermandar ji cîyê xwe livîya û rabû. Bi Navdar ra çû û

cîyê ku erzaq tê da hatibû veşartin nîşanê wî da. Li ber dîwarê şikeftê çalek û di wê çalê da erzaqê xwe veşartibûn, bi dar û ber û lekan jî serê wê girtibûn. Ji wir her çi derketibe anîn û li ber agir danîn. Ka îcar çi nebû; tas, misîn, kêr, titik, şekir û di lekan da jî nan û penîr û hwd. Navdarê leheng, ji erdê misîn hilda, derket derva û pir derbas nebû jî hat. Di misînê da berf anîbû. Şikeft û tê da kevir nebin? Çû sê kevir anîn, wek kuçik li dor agir danî û misîna xwe da ser. Xaçoyê File li ber tîhna agir germ bibû û dihênijî. Navdarê leheng ji alîyekî va bi qisawet û ji alîyekî va jî li benda kela avê bû. Kerem Beg? Wî jî destê xwe yê rastê kiribû bin serê xwe û li ser kêlekê xwe dirêj kiribû.

Bi bilqîna misînê ra Navdarê leheng deng li Kerem Beg kir û got:

- Keko, ê de rabe! Fermandar di titikan da hinekî tişt danîye ber me û av jî kelîya…

Kerem Begê Qolaxasî, di erênîyê da serê xwe hejand û di pey ra jî rabû. Di rabûnê da jî axifî û got:

- Baş e leheng. Mala te ava!

Rabû û li ber agir rûnişt. Erê, rûnişt û pê ra jî got:

- Eriiik, bavo! Tevizîme, lê xweş û xweş jî tevizîme...

Hevokên wî zelalîya rewşa her sêyan bû. Ka îcar ji wan kî netevizîbû, kî tî û birçî û bêxew nebû? Di rewşa xwe da yek ji yekî xirabtir bû. Fermandar di dirûvê xwe da wek şimayê zer, dilê wî biêş û xemgîn bû. Helbet te nedikarî tu yê rewşa wî û ya Kerem Begê bidî ber hev. Ji ber ku ji wan yek dîl û yek jî di rewşa xwe da merivekî azad bû. Erê, herçiqas tu tahde û neheqî li wî nehatibe kirin, wek mêvanek ji mêvanan hatibe pêşwazîkirin jî di encamê da dîlgirtî û mirovekî bextreş bû. Fermandarî dest bi vekirina titikên li ber xwe kiribû. Kerem Begê Qolaxasî kenîya û got:

- Na, wele. Wele, ez qet nizanim ka di wan titikan da çi heye?

Hêvî dikim ku tê da goştê berazan nebe!

Hem got hem jî kenîya. Xaçoyê File bersiv da û got:

- Begê min, wele ez jî nizanim. Nizanim, ji ber ku min hê nivîsên li ser titikan nexwendine û nikarim tiştekî bibêjim. Piştî vekirinê ez ê dest bi xwendina nivîsên li ser titikan jî bikim û ji cenabê te ra jî bibêjim.

Vekirina wan titikan temam kir şûnda jî ji nav agir darekî nîvşewitî hilda û di pey ra jî li nivîsan girt û herf bi herf xwend; E r î v a… Ji xwendina wî ra te nedikarî bigota xwendin e. Di ronahîya wê darikê da û xwendin? Na, ne mimkun û bi zehmetî bû.

Kerem Begê Qolaxasî, dît nikare nivîsan bibîne û bixwîne, got:

- Ne hewce ye, lo! Tu dev ji xwendina wan titik û mitikan berde. Ger di lekan da nanê te hebe,nan bide min û hew…

Fermandar ji lek nanekî gilover derxist û di pey ra jî danî ber Kerem Beg. Ji nav wan titikan titikeke din hilda û dest bi vekirinê kir. Li ser wê titikê jî resmê zeytûnan hebû.

Kerem Begê Zirkî li titika destê wî mêze kir û got:

- Heyran, ne min got dev jê berde. Tiştê ku te ji me ra derxistiye û daye ber me, bes û têra me dike.

Navdar, tasên ku derxistibûn yekem bi ava germ şûşt. Pişt ra jî bi ava kelî dagirt, yê wan da ber wan û ya xwe jî da ber xwe. Nanên ku derxistibûn hem hişk him jî kufikî bûn. Ê de bila be, nan nan bû û ji tunebûnê pir û pir çêtir bû. Kerem Begê Qolaxasî nanê xwe bi devê xençerê kerî kir. Di pey ra? Di pey ra jî di avê da kir û bi wî awayî xwar. Werhasil, piştî xwarina kerîyekî nanê kufikî îcar jî dor hatibû cixareyên Kerem Begê. Ji cixaredankê her yekî cixareyekê girtibû. Navdarê leheng cixareya ku ji Kerem Begê wergirtibû, bir û li ber devê şikeftê vêxist û kişand. Zêde li wir nema û derbasê hundir bû. Zû derbas bû, ji ber ku tu car nedixwast Kerem Beg bi serê xwe bimîne. Di hatinê da jî çû û dîsa li kêleka fermandarê dîl çok da erdê û rûnişt. Kerem Begê Qo-

laxasî li fermandarê dîl vegerîya û dest bi axaftinê kir. Di axaftinê da çi got? Çi bibêje, got:

- Xaço Beg! Di sala 1877an da di navbeyna Ûrisan û Osmanîyan da şer derdikeve. Em kurd ji wî şerî ra dibêjin“Herba 93yan”. Di wê demê da jî dîsa qomîteyên we Ermenîyan rehetî nedabûn me. Werhasil, li vî welatî şêlandin, kuştin, talan qet kêm nebûn. Sedemê alozî û tevlihevîyan ne em in. Yên ku proje danîbûn û li gor wê jî tevdigerîyan dîsa ne em, lê hûn bi xwe bûn. Xîyala we Ermenîyan Ermenîstaneke mezin bû. Kurd û vê yekê qebûl bikin? Na. Projeyeke wisa ji xeteran xetereke mezin bû. Axa vî welatî û li ser navê Ermenîyan were tesdîqkirin? Na, ne îşê aqilan bû. Hem jîyana me bi hev ra bû hem jî êşa me, lê… Me tu car ji we Ermenîyan ra negotiye ev ax axa me ye, tu îşê we bi vê axê neketiye, bar bikin û herin. Me negot, lê Romîyan ji we ra got. Na, heyran! Na, ne îşê aqilan e ku tu yê rabî û bibêjî bajarên kurdan di sînorê Ermenîstaneke mezin da ne. Heta ku li ser vê axê dagîrkerî, zeftek û tawanbarî hebe şer jî heye û berxedan jî....

Ji cixareya destê xwe mizek girt û di pey ra jî hat ser axaftina xwe ya berê. Tene tene axifî û got:

- Sefaretên Înglîz û Frensîyan bi fesadî rêxistinên we Ermenîyan dan pêş û di qada şer da kişê me kirin. Lê bi fîtne û fesadîya wan jî nema û îcar jî bi hêzên Ûrisan ra we berê xwe daye me û em jî nizanin ka hûn ji me çi dixwazin. Yên ku di sala 1878an da li Berlînê civîn li darxistibûn jî ne em, lê dîsa rêxistinên we Ermenîyan bi xwe bûn. Ez ê werim bendebûna te. Na, ne bêsedem ne jî ji te ra tiştekî xerîb e...

Navbeynek da axaftina xwe û li Navdarê leheng vegerîya. Belê, li wî vegerîya û jê ra wiha got:

- Ka ji kerema xwe tu dikarî ji min ra tasek avê binî?

Jê av xwast û pê ra jî gewrîya xwe paqij kir. Navdarê Kurd, di

tasê da av anî, da û wî jî qurt bi qurt vexar û tasa xwe danî.

Dem e, tê û dibihure. Zelalîya sibehê û berbanga rojekê nuh bû. Kerem Beg û fermandarê dîl ji bo bistekî be jî çavên xwe dabûn hev. Navdar û raze? Na. Agirê xwe gurr kiribû û di pey ra jî derbasê ber devê şikeftê bibû.

* * *

*Du gotin û kenek…*

Kerem Begê Qolaxasî ji cîyê xwe livîya û di pey ra jî ber bi Xaçoyê File mêze kir. Dît ku hê di xewda ye û bi xurexur e, dengê xwe nekir. Erê, dengê xwe nekir, lê di dilê xwe da jî axifî û wiha got:

- Lo! Wele, bîle û tile heke di vê berbangê da artêşa Ûris bi alîkarîya hêzên we va berê xwe nede me û neyê eha, va ye min soz da te û çû! Ji alîyê min va tu azad î. Belê, tu û azadîya xwe!

Li ser pîyan bû. Ber bi devê şikeftê çû û dît Navdarê leheng, kêleka xwe daye zinarê ber devê şikeftê, ji alîyekî va cixarê dikişine û ji alîyekî va jî di destên xwe da gogek ji berfê girtiye dişidîne, tîne û dibe. Bi dengekî hêmin axifî û got:

- Roja te baş û dema te xweş, ezîzê min. Wisa xuya dike ku te îşev qet çavên xwe nedane hev. Na, te çavên xwe nedane hev, lê te berê xwe daye berfa belanên vî çiyayî ji xwe ra lê mêze dikî. Ji alîyekî va mêze dikî û ji alîyekî va jî kûr û kûr difikirî. Dizanim, heyran. Dizanim di her mêzekirinê da ya xêr û xweşî û ya jî xem û xemgînî heye. Bes tu xemgîn nebe...

Navdarê leheng, bi dengê wî ra cîxareya ku di destê xwe da girtibû, bi dîzîka avêt. Dû ra jî li Kerem Begê vegerîya, bi rêz û îhtiram axifî û got:

- Rojbaş keko. Hêvîdarim cenabê te pelûyên çavan dabe hev



www.arsivakurdi.org

û ji xwe ra parikî rehet kiribe!?

Kerem Beg û nekene? Kenîya û got:

- Ê de hela tu were li min û Navdar! Navdar, çi dibêje? Lo, ji min û te ra rûyê rehetî û xew!? Na. Heta ku li vî warî zeftek, tawanbarî û dengê bênamûsîyê hebe, ji min û te ra jî ne rûyê rehetîyê heye, ne jî ew ê hebe. Na, ne tenê li vî warî jî. Li kîderê dibe bila bibe dema ku zilm û zordarî, neheqî hebe qet tu şik nîne ku li wê derê berxwedan jî heye û têkoşîn jî. Bila qet tu şik û fikara te egîdî jê nebe heta ku li ser vê axê zilm û zordarî, zeftek û dagirkerî hebe ji min û te ra jî sekin nîne û ew ê nebe jî. Egîdê min! Welat nîne bi navê xwe nebin: Îran, Tirkmenîstan, Erebîstan, Ermenîstan û hwd. Welatê me jî bi navê xwe Kurdistan e, Kur dis tan... Helbet, min wer zanîye û ez ê wer jî bibêjim.

Di pey ra? Di pey ra jî kanîya û got:

- Ê de hela wiha xwe bide alîyekî û rê bide min, heyran! Rê bide min ku ez bikarim ji xwe ra derbaz bibim û herim...

Navdarê leheng, xwe da alîyê rastê û ew jî derbas bû. Derbas bû şûnda jî carekê din li Navdar vegerîya û wiha got:

- Leheng! Camêr, di xew da ye û ez hêvî dikim ku tu yê zêde acizîyê nedî!...

Kerem Beg, ji ber çavan dûr bû şûnda Navdarê leheng xwar bû û ji erdê boçika cixarê, cixareya ku jê nîvî kişandibû, hilda û girt. Boçik şil bibû, ê de bila be. Vêxist, carekê din çend miz jê girt û kişand. Pişt ra? Pişt ra jî derbasê şikeftê bû, li ber darên hişk pal da erdê û rûnişt. Ê de Navdar e, wey! Dinya li dinê, mendo li jinê. Ji xwe ra hema wiha pal bide erdê û rûne, ne pirsgirêk e. Na, heyran! Ji alîyekî va darên hişk yên li ber agir girt, da çokên xwe û şikand û ji alîyekî va jî şikandîyên xwe li agir bar kir. Kî dizane belkî jî yê wî bi zanebûn bû. Tu were di hundir da darên hişk bide çokên xwe û bişikêne, lê bila ji ber şikandina te ne qirçînî bi daran bikeve ne jî fermandarê reben şîyar bibe!

Çawa? Şîyar bibû. Lê ne ji cîyê xwe livîya ne jî rabû. Nedixwast, ji ber ku di şikeftê da Kerem Beg, nebû. Bi Navdarê Kurd ra û têkilî? Na, Xwedê neke. Bi wî ra têkilî û danûstandin ne gengaz û bi zehmetî bû. Nedixwast bi wî ra were çav çavan. Bi hebûna xwe Navdar, qisasê serê wî bû. Navdarê Kurd, ji wî ra felek bû. Ji felekê rev û xilasî? Na, nebû. Li kû û di ku da çûbû, Kerem Beg? Çima xuya nedikir!? Kerem Beg ku li vir bûya fermandar û ji cîyê xwe nelive? Na! Qet nedigot na, hema bi carekê qilozê ser xwe dibû, di rabûnê da jî ji dil û can silav dida û bi wî ra diaxifî. Ger devê merîyan girtibe çavên merîyan diaxifin. Çav jî ku girtî bin, dil diaxife. Di dilê xwe da wî çi got? Çi bibêje, got:

- Delîl dayîka min fermandarî, delîl! Kerem Beg, madem ku tu radibî û diçî îcar çima tu ji min ra nabêjî, ê de rabe! Rabe û bi min ra were? Bi çûyîna te şikeft ji min ra bûye zîndan. Kerem Beg! Wek çawa gijgilêkek (bablîsok) rabibe, her tiştî bide ber xwe, kaşûberkaş bike û bibe, eynî di wî halî da me... Di vê şikeftê da tarî li min giran bûye û nayê kişandin, bikişînim. Zû were, Kerem Beg. Were, rewşa min bibîne û jê ra bibe derman. Heke tu li vir û li ba min bûya ne qirçeqirça daran ne jî awirê çavên vî bêbavî li min kar dikirin. Ax, camêro! Ma gunehê te bi min nayê ku tu min teslîmê vî bêbavî dikî, di pey ra jî derdikevî û diçî!? Ma tu nizanî, heyran? Tu nizanî Navdar, tirsek ji tirsên şevan e û tenê dizane xofê bide. Car heye dibe babîlosk û diguvîne û car jî heye tu dibêjî qey felek e, felek! Gotinek ji gotinên we kurdan e, Kerem Beg. Xençer bira ye û tiving jî pismam. Ax, Kerem Beg! Ez dizanim, ez; '… xişxişi xençer boynuma da lêlê…' Ez dizanim, Kerem Beg. Ez dizanim Navdar, çi bela û çi afat e. Bi tivinga destê xwe merîyan dikuje û bi xençerê jî dîl digire. Tirs ji mirinê xirabtir e, Kerem Beg. Qey tu nizanî tirs, çîrke bi çîrke merîyan dihêre û tîne xwarê. Navdar, dîn û dûr e. Çort e. Agirê kulê ye. Qît e. Di zagona vî bêbavî da û bexşandin? Na, nîne. Bi kurtî



www.arsivakurdi.org

Navdar? Navdar, hem xof e û hem pasevan...

Dilê wî bi tirs bû. Eha, ji ber wê yekê jî ne wî serê xwe rakir ne jî çavên xwe li çavên Navdar girt û mêze kir. Peyv di gewrîya wî da bibûn girêk. Çavên xwe dabûn hev û xwe komê serhev kiribû. Kişîyabû qaşikê xwe û bêdeng bû. Di hestê xwe da birîndar û bêhêvî bû. Dilê wî biêş û moralê wî jî hîç nebû. Wek çawa lehîyek rabe, dar û beran bide ber xwe, bigire û bi xwe ra bibe, di wî halî da bû. Di wê gavê da? Di wê gavê da li Çiyayê Qertewîn û di şikefteke tarî da bilî tirs, xemgînî û xwêdana sar wekî din jî tu tiştekî nebû. Wî bi xwe jî dizanî ku ji nav lepên Navdar xilasî nîne û meriv tu car îfleh nabe. Bi ser çûyîna Kerem Begê ra çiqas dem bihurîbû nedihat zanîn, lê bi dengê wî ra yekem Navdar û dû ra jî fermandar rabû. Bêhn hatibû wî û ji ber tofana Navdar xilas bibû. Di hatinê da Kerem Beg, li ber agir pal neda û rûnenişt.

Qederekê li ser pîyan hat û çû, di pey ra jî axifî û got:

- Şewq û şemalê xwe daye etegên çiyan û şewle dide. Baran nîne, lê hewa sar û hişkayî ye. Divê êdî em jî hazirîya xwe bikin û rabin…

Ka îcar çi hebû ku ew ê hazirîya çi bikin? Rextek du rext û çend jî sîleh… Ha! Yek jî bi wê hebûna xwe fermandarê dîl. Pir derbas nebû rabûn û ji şikeftê derketin. Di derketinê da dûr neçûn, li ber devê şikeftê û li ser pîyan bûn. Kerem Begê Qolaxasî qederekê li ser lingan hat û çû. Pişt ra? Pişt ra jî hat li kêleka fermandarê dîl sekinî, serê xwe rakir û li gir û belanên vî çiyayî, Çiyayê Qertewînê mêze kir. Bêdengî ji mikûrîyê dihat û Kerem Beg jî vê gavê bêdeng bû. Pişt ra li Navdarê leheng vegerîya û wiha got:

- Gotinek ji gotinên pêşîyan e, leheng. ‘Çi dibî bibe, lê mirovekî bijartî be...’ Qet tu şik nîne ku tu bi xwe jî ji wan egîdan egîdekî bêqisûr î...

www.arsivakurdi.org

Gotineke wisa kir. Çima îcab kiribû nayê zanîn, lê wî wer got. Gelo ka di mebestê da xwastibû çi bibêje!? Di pey ra jî ber bi fermandar mêze kir û yekem got:

- Belê û belê!...

Piştî gotina 'belê û belê' jî dîsa hat ser axaftina xwe ya berê û wiha got:

- Gelo di dinyayê da ka ji azadîyê xweştir wekî din çi heye ku meriv bikare qalê bike? Ger tu ji min bipirsî ez dibêjim ji azadîyê xweştir tu tiştek nîne. Em di şer da ne, fermandar. Şerê min şerê wetenî ye. Ji bo rizgarkirina axa welatê xwe min berê xwe daye sengeran û li qada şer im. Heke min bigota ba û bager, berf û baran, sar û serma ye, min ne berê xwe dida sengeran ne jî dihatim vî çiyayî û li hember hêzên dagirkeran min li berxwe dida û şer dikir. Tu jî wek min dizanî ku di rewşa xwe da kole, kole ye. Me tu car koletîya xelkê qebûl nekiriye û em ê qebûl nekin jî. Şerê me şerê azadîyê ye û tu jî di vî şerî da dîl ketî. Ne ji alîyê min va, lê tu ji alîyê vî qehremanî va dîl hatî girtin…

Axaftina xwe birî û bîstekî bêdeng ma. Di wê bêdengîyê da xwe bi xwe fikirî û di dilê xwe da jî wiha got:

- Du gotin û kenek!...

Dûra jî bi wî ra hat çav çavan û jê ra wiha got:

- Rîya min û te heta vir bû, fermandar. Ji alîyê min va tu azad î! Belê, tu û azadîya xwe!...

Ê de bila dilê merîyan dil be, lê bila ji ber axaftineke wiha xas û muxlîs ne biêşe ne jî şa bibe!? Li vî çiyayî, çiyayê rûsipî û li ber devê vê şikeftê sê kes bûn û ji wan her yek jî bi qinyata dilê xwe... Mesele ku dil be, dilê herî pak û paqij yê Kerem Begê bû. Wî, ya dilê xwe gotibû, ya dilê zêr… Meriv ku di qumaşê xwe da xas be, qet tu şik nîne ku di biryar û sekna xwe da jî çiftexas e. Dilê duyem dilê Navdarê leheng bû. Ji xortan xortekî delodîn bû, Navdar. Di hêvîya xwe da şikestî û di dilê xwe da jî xemgîn bû

vê gavê… Herdu hevokên Kerem Begê acizî dabû dilê wî û nedikarî qebûl bike û jê re bibêje, erê. Xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da wiha got:

- Hela hela!... Ê de hela tu were li min û van gotinan, gotinên Kerem Beg!? Qet tiştekî wiha dibe!? Dîlgirtî û azadî!?

Peyv hene bi bandora xwe şewata dil in, peyv jî hene şewatê didin dil û merîyan diperitînin. Tu bibêje bila gotinên merîyan di devê merîyan da nebin wesle wesle û di gewrîya merîyan da nebin girêk, zehmet e. Werhasil, car heye di sîya peyvan da meriv şa û paşa ye û car jî heye sêwî û histûxwar... Cîyê ku fermandar lê bûye ne hewce ye ku tu yê dûr û dûr herî. Dîl û dilê xwe!? Divê meriv ji dilê wî bipirse. Tu were ji çiftexasê mêran peyva azadîyê bibihîze, lê dilê te bila ne wek yê çûçikan lêde û ne jî bipirpite, dibe!? Dema ku peyva azadîyê ji dev û lêvên Kerem Begê pekîyabû, fermandar û bikare xwe zeft bike!? Na! Hema bi carekê xwar bibû û xwastibû here destên wî. Kerem Beg û rê bide? Na, rê nedabû û nehîştibû. Rê nedabû, ji ber ku pêwistîya wî bi destmaçkirina kesî nebû. Bila meriv dîl be, peyveke wek peyva ‘azadîyê’ bibihîze û netewişe? Helbet, ditewişe. Bi hîsên wiha xeltomelto bû fermandar. Di rewşeke wisa tevlihev da ka îcar fermandarê reben dikarî çi bike û çi bibêje!? Wek çawa teyrê dewdew fêrî gotinekê bibe û dubare bike, bi wî awayî fermandarê dîl, di dilê xwe da gotina ku dixwast bike, kir û got:

- Azadî, azadî, azadî!...

Helbet, dilê wî bi gupegup û qidûm jî lê şikestî bû. Hatibû ser çokan û herdu destên xwe jî ber bi Kerem Begê vekiribû. Xwastibû biaxife, lê…

Sedemê tevlihevîya wî ji Kerem Begê ra tiştekî ne ecêb bû. Bû alîkar, bi milê wî va girt û ji ser berfê rakir. Ji alîyekî va rakir û ji alîyekî va jî axifî û jê ra wiha got:

- Na, heyran! Rabe û tiştekî wisa îcab nake. Ne min ji te ra go-

tibû tu ne dîl, lê tu ji mêvanan mêvanekî min î. Ji niha û şûnda? Ji niha û şûnda jî tu ne mêvan, lê tu ji dostan dostekî qedîm û ji camêran jî camêrekî azad î…

Ji ber gotinên wisa resen ka îcar kî bi coş û kelecan nîne ku fermandar jî nebe? Erê, ew bi coş bû, lê Navdar? Navdar jî di dilê xwe da tevlihev û di sekna xwe da jî xortekî bêqisûr bû.

Kerem Begê Qolaxasî xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da wiha got:

- Çîrokên hemû bindestîyan wek hev in. Di çîroka kê û kê da êş û elem, kul û keder, gilî û gazin nîne ku meriv nebêje?

Erê, wî wisa got. Lê Navdar? Navdar, matmayî bû û nedikarî gotinên wî bipejirîne. Tu here neyarê xwe dîl bigire, bîne û teslîmê Kerem Begê bike, lê bila ew jî rabe û azadîyê bide; tewlolo, tew lo, haylolo hay lo!... Qey îşê aqilan bû!? Dev qebûl bike jî dilê merîyan tiştekî wiha qebûl nake. Ji Kerem Begê ra ka îcar wî dikarî çi bigota? Keko, neyar neyarê min e. Min dîl girt û anî teslîmê te kir. Emanet e û ez ji te emanetê xwe dixwazim û bide. Bide ku bikaribim bidim ber mîratê!... Ger ku min nekarî bidim ber mîratê jî didim ber xençerê, ka îcar ji kê ra çi…Wechê wî tal bibû û nedikarî qebûl bike. Qederekê di navbeyna Xelîl û Celîl da hat û çû. Di encamê da? Di encamê da guh neda dengê dil, xwe bi xwe axifî û got:

- Kuro, lawo Navdar! Bi hedê xwe be û biryar biryara Kerem Begê ye. Ew, dikare bikuje jî û azad jî bike, îcar ji te ra çi!? Tiştê ku tu yê bibêjî nîne. Ji biryarê ra rêz bigire û hew…

Fermandarê bi pirpirk, hê bi coş û kelecan bû, ji bandora gotinên Kerem Begê xilas nebibû. Ber bi Kerem Begê serê xwe rakir, di rakirinê da axifî û wiha got:

- Ez ketime bextê te! Tu yê min bêwar nehêlî. Min ji hebûna xwe bêpar neke. Heke te min wek heval û hogir qebûl kiriye jixwe qebûl kiriye, ku nekiriye jî min wek xulam û xizmetkarekî

qebûl bike. Çer dikî bike, lê min bi tena serê xwe nehêle. Dixwazim bi cenabê te ra bim. Mayinek wisa ji min ra hem şan hem jî şeref e…

Yê wî xwazîyek bû. Kerem Beg, li ser vê xwazîya wî qederekê xwe bi xwe fikirî. Fikirî, lê nekarî biryarê bide. Na, ne karî bibêje erê ne jî na. Sulh û aramî nebû û ka îcar wî dikarî çi bigota? Ne li gund bû ne jî di nav êl û eşîra xwe da. Li qada şer bû. Ger bibira jî îcar heta kîderê dikarî bi xwe ra bigirta û bibira!? Piştî van axaftinan dengê Kerem Begê bilind bû. Axifî û got:

- Sehera serê sibê û roj roja xêrê ye. Rewş berkemal e û dibêjim rêwî di rîya xwe da. Rêka me dûr û çûyîna me jî bi zehmetî ye. Lê bila be, her tişt bi gavek piçûk dest pê dike û di encamê da rê jî li ber merîyan dihele û diqede...

Berîya ku bi rê bikevin Kerem Begê Qolaxasî ji Navdarê leheng ra wiha got:

- Leheng! Berîya ku ez ê biryarek wisa bidim, min dikarî ji te pirs bikira û fikrê te bigirta. Lê min nepirsî. Di vî warî da tu yê dilmandî nebî. Wer îcab kir. Heke min ji te pirs bikira, min dizanî ka tu yê çi bibêjî. Ji biryareke wisa ra dilê te ne razî bû û te qebûl nedikir... Nerazîbûnê rê dida dubendîyan. Dubendî? Dubendî jî ji alîyekî va barê merîyan giran dike û ji alîyekî va jî bi îtîbara merîyan dilîze û kesayetîya merîyan erzan dike…

Di vî warî da peyva ku Navdarê Kurd bikira û bigota, nemabû. Fermandar bi coş û kelecan bû. Berîya ku bi rê bikevin ber bi Kerem Begê mêze kir û pê ra jî axifî. Belê axifî û di axaftina xwe da jî wiha got:

- Di vê şikeftê da ne tenê erzaq, lê di sandiqan da çek û sîleh jî ji alîyê me va hatibûn veşartin. Nizanim gelo ka pêdivîya we pê heye yan na? Ger cenabê te gotibe, erê…

Axaftina xwe dirêj nekir û bi kurtî birî. Kerem Beg bêdeng bû. Qederekê derbas bû û carekê din bi hev ra derbasê şikeftê bûn.

Di tarîya şikeftê da fermandar bi petalek nîvşewitî cîyekî nîşan da. Berîya ku Navdar û fermandar bi hev ra dest bi vedanê bikin Kerem Begê Qolaxasî, axifî. Belê, axifî û got:

- Qet nizanim gelo ka pêwistî bi vedanê heye yan na? Giranî ye û qet nizanim ka di vê berf û baranê da em dikarin bi xwe ra bigirin û bibin yan na? Ê de hela bikolin, çi niyet û çi qismet...

Bilî fermandar herdu jî bi meraq bûn. Navdarê leheng û fermandar, bi hev ra cîyê ku teqemenî tê da hatibûn veşartin, vedan. Di vedanê da rastê sê sandiqan hatin û di her sêyan da jî wek cebirxane gule û barûd û çend jî demançe hatibûn bi cî kirin. Di vê berf û baranê da birin jî bi serê xwe pirs û pirsgirêk bû. Ka îcar di rewşekê wisa da te dikarî çi bibira? Pirs ne hebûn, lê birina wan bû. Kerem Begê Qolaxasî li Navdarê leheng vegerîya, ji alîyekî va kenîya û ji alîyekî va jî axifî. Belê, kenîya û pê ra jî got:

- Eha, ji te ra îş derket! Hem jî çi îş, çi îş! De te ku karîye tu were îşê fermandar ji te ra derxistiye, safî bike. Te berê xwe da wî û ew dîl girt û wî jî bi hebûna vê cebirxanê li te ceza birî, Navdaro! Ê de di vê berf û baranê da şelagê giran bide pişta xwe, bide pey me û bine. Ji te ra qewet be xorto! Qewet be…

Navdar û nekene? Kenîya û got:

- Erê, min got teqemenî, lê min negot bila ewqas zêde be. Min digot qey cebirxane di yek sandiqekê da hatiye bi cî kirin û veşartin. Dibînim ne wisa ye. Ger tenê yek sandiq bûya min ne heta Hîzanê, lê min digirt û heta Fîzanê dibir. Giran e û em jî nikarin gişkan bi xwe ra bigirin û bibin. Divê ya em cîyê vê cebirxanê biguharînin û veşêrin, yan jî!?

Hê bi axaftin û gotinên xwe bûn ji derva deng hat.

* * *

Kerem Begê Qolaxasî bi wî dengî ra rahişt tivinga xwe û ji şikeftê derket. Ew derket û li pey wî jî lehengê kurd û fermandar. Li ber devê şikeftê û di paş zinarekî mezin da bi cî bûn. Ji alîyekî va bêdeng û ji alîyekî va jî ji wan her yek bi baldarîya xwe bû.

Xaçoyê File, nêzikê Kerem Begê bû, bi dengekî nizm axifî û got:

- Begê min! Nizanim gelo ka pêwistî bi min jî heye, yan na? Ger hebe yan tiving û yan jî şeşagirek bidin min û ez jî dixwazim bi we ra…

Hevoka wî di nîvî da ma û wî nekarî axaftina xwe bidomîne. Nekarî, ji ber ku Kerem Begê Qolaxasî xwe di nav axaftinê ra kiribû. Li ser xwazîya wî Kerem Begê Zirkî bersiva wî da û got:

- Na, fermandar! Na, vê gavê pêwistî bi alîkarîya te nîne. Hela tu jî ji wir rabe û were cem min! Were, xwe bide vî alîyê û ji talûkeyê dûr bisekine. Bes, tu xwe biparêze. Na! Na, tu qet meraq neke. Heke pêwîstî bi te hebe ez ê wê jî ji te ra bibêjim...

Yên ku berê xwe dabûn vî alîyê û dihatin nêzikê wan bibûn. Tiştê ku yekem bala Kerem Begê bikişînê axaftinên wan bû. Ji alîyekî va berê xwe dabûn vî alîyî û dihatin û ji alîyekî va jî di navbeyna xwe da bi Zimanê Kurdî diaxifîn. Kerem Begê Qolaxasî, yekem îşareta bêdengîyê da. Dû ra? Dû ra jî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Bila çavê te egîdî li ser min be û tu min biparêze!

Pişt ra jî li ser milê rastê livîya, xwe da ber zinar û guh da dengê hatûyan. Belê, yên ku ji jor da xwe berdabûn û ber bi jêr dihatin ne xerîb, lêbelê nas û dost û lehêngên Alayîya wî bûn. Bi dengekî bilind bang li wan kir û got:

- Lo, lo lehengnooo! Lo, bira! Ez im, ez. Ez Kerem im, Keremê Qolaxasîîî!

Bi dengê Kerem Begê ra Navdar ji cîyê xwe livîya û rabû. Rabû û di rabûnê da jî li fermandar vegerîya û got:

- Rabe! Rabe, yên ku berê xwe dane vî alîyî û tên ne xerîb, lê heval û hogirên me ne.

Her du bi hev ra ji cîyê xwe rabûn û di pey ra jî ber bi Kerem Begê çûn. Bi qîrîna wî, yên ku berê xwe dabûn vî alîyî û dihatin bi lez û bez, bi coş û kelecan bûn. Deng bila dengê Kerem Begê be û ji ber dengê wî jî bila meriv ne şa bibe ne jî bifire, dibe? Bi rev berê xwe dabûn wî û dihatin. Hatin şûnda jî li ber wî ketin rêzê û bûn yek qor. Di hejmarê da duwanzde peyayên çeleng bûn. Ev bibû çend roj ku li ser şopa wî bûn, çiya û banî nehiştibûn nedin ber xwe, li wî û Navdarê leheng negerin. Di sir û seqema zivistanê da her yek bi pel û potên xwe yên kevin û peritî bûn. Di rêzê da kesê ku biaxife û gotinê bike, nebû. Na! Neaxifîn, lêbelê li benda axaftinên Kerem Begê sekinîn. Kerem Beg? Kerem Beg jî, vê gavê bêdeng bû. Te dikarî li rûyê her lehengî êş û azar, belengazî û feqîrîya dinyalikê bidîta û bixwenda. Werhasil, pêrîşanî bû û pêrîşanî jî nîne bala merîyan nekişîne. Kerem Begê Qolaxasî her bi wê meraqa xwe bû û bêguman di meraqa wî da jî aqûbeta heval û hogirên wî hebû.

Bi ser bêdengîyê ra pir derbas nebû axifî û di axaftina xwe da wiha got:

- Ev bûye çend roj ku em li vî çiyayî û di şer da ne. Haya me zêde ji bûyeran nîne. Helbet, meriv meraq dike û ez jî bi wê meraqa xwe me. Naxwazim axaftina xwe zêde dirêj bigirim. Dirêj nagirim, ji ber ku çi agahî hebe û ew jî li cem we ye. Li benda agahîyên we me û fermo, hûn û gotinên xwe…

Egîdên ku niha li vî çiyayî ketibûn rêzê ne xerîb, lê di piranîyê da ji eşîra wî, xizim û lêzimên wî bûn. Belê, di hejmarê da duwanzde leheng bûn û ji van yek ji êla Cibran, du çekdar ji eşîra Cemdan û yên mayî jî ji eşîra wî û Zirkî bûn. Kerem Beg sero-



www.arsivakurdi.org

keşîrê Zirkan û berpirsîyarê alayîya xwe bû.

Ji pismamên wî yekî zerik gavek pêş da avêt, sekinî û yekem got:

- Belê, Begê min!...

Wer xuya dikir ku qet naxwaze behsa bûyerên xwînî bike. Na, ne dixwast qalê bike û ne jî li ser xeberên wisa reş biaxife. Ka îcar ji van duwanzdeh lehengan kî dixwast ku Kerem Beg bi dayina agahîyên nexweş biêşe û dilgiran bibe? Na, kesî nedixwast. Lêbelê Kerem Begê Qolaxasî bi xwe ji wan pirsîbû û nedibû bersivê nedin. Dara azadîyê bi xwazîyan şîn nedibû û êdî rastî çi bûye meriv wê dibêje. Pismamê wî yê zerik gavek du gav avêtibû û derketibû pêş. Serê xwe li ber xwe tewand û nexwast bi Kerem Begê ra were çav çavan û xeberên nexweş bide. Erê, bi wî ra nehat çav çavan, lêbelê ji devê wî çend peyvên ku meriv tu car naxwaze bibihîze, pekîyan.

Dilê wî biêş bû, axifî û got:

- Begê min! Tu yê bibêjî bila şerê gemar û qevçil emanê bide me, nebû. Ji alîyê hêzên dagirker va ne ji alîyekî va, lê em ji herçar alîyên xwe va hatibûn dorpêçkirin. Ji Begê xwe ra bibêjim, di destê wan da makînelî û mîtralyoz û di destê me da!? Di destê me da jî çaplî û çaplîyên me jî malê romê ne, ne guleyên xwe xweş diavêjin ne jî barûdên xwe dirijînin. Tu ji Xwedê bawer bike, wek çawa di meha nîsan û gulanê da reşêşa baranê lê bike û bibarîne bi wî awayî bi ser me da girtibûn. Axir, ji me bîst û yek lehengên cegerpola û ji wan? Ji wan jî ez nizanim, lê encax Xwedê dizane ka çend kes li ber guleyên me ketin û di pey ra jî tot bûn. Di encamê da ew şikîyan û revîyan, me jî şopa cenabê te gerand û xwe li newal û neqebên vê heremê va girt. Erê, wele Begê min! Me ne newal û neqeb hîşt ne jî çiya û banî. Ez ê ji Begê xwe ra çi bibêjim û çi nebêjim. Êş bû û ew êş jî li me barî. Dêmeg, Xwedê jî li enîya wan wisa nivîsîye. Dibêjim, hezar rehme li gora wan be. Ew nemirên vî welatî ne û wan bi mêr û mêrxasîya xwe

li ber xwe da û...

Bi xemgînî axaftina xwe qedand û dû ra jî bi gavek paş va çû. Di qada şer da ji hev dûr ketibûn, her yek di alîyekî da pekîyabû û çûbû.

Ji alîyê Çulîyê (Qereyazî) va berê xwe dabûn vî çiyayî û hatibûn. Hatibûn, lê bi zahmetî û gîyankêşî...

Lehengê ku ji eşîra Cibran bû, ber bi Kerem Begê va serê xwe rakir û got:

- Şikir, şikir ji Xwedê û vê gavê ra ku me carekê din hevdu dît. Bi dîtina cenabê te em xweşhal in û herwiha, qisawetên me jî neman û bi dawî bûn. Bila Xwedê bi te ra be, Keko. Xwedê...

Na, axaftinên xwe neqedandibû. Qundaxa modolîyê danî ser berfê, gotina xwe dubare kir û got:

- Şikir, şikir ji Xwedê ra ku me carekê din cenabê te dît û qisawetên me bi dawî bûn. Şikir ku şikir!...

Piştî vê axaftinê jî nemirên Lîwaya 3yan nav bi nav rêz kirin. Li ser van agahîyan Kerem Beg û xemgîn nebe!? Ma ev jî gotin e. Zêde neaxifî û hema tenê got:

- Bila cîyê wan bihuşt û Xwedê bi rehma xwe şad bike...

Gotinên xwe kir, lê bi êşa dil. Dû ra? Dû ra jî pirsî û got:

- Hatin e û di hatinê da nizanim gelo ka we li ser rîya xwe kesekî, tiştekî xerîb dît yan na? Hûn hatin, lê ka îcar heval û hogirên me yên din di kîjan alîyî da çûn? Hêvî dikim ku haya we ji wan jî hebe!?

Ji lehengan yekî qamkinik bersiva pirsa Kerem Begê da. Xort, ji eşîra wî bû. Axifî û di axaftina xwe da jî wî ji Kerem Begê ra wiha got:

- Begê min! Cîgirên Lîwaya me di piranîyê da berê xwe dan deştê, dan pey dagirkeran... Werhasil, wan berê xwe da deştê, me jî berê xwe da çiya û banî, newal û neqeban…

Ew bi axaftin û Kerem Beg jî bêdeng û bi guhdarîya xwe bû.



www.arsivakurdi.org

Piştî axaftinên wî jî xortekî tenik û rûbixwirî, dest bi axaftinê kir. Ji eşîra Cemdan bû û pel û potên wî li ser wî lîme lîme disekinîn û dihatin xwarê...

Gewrîya xwe paqij kir û got:

- Bego, Begê min!...

Bistekî sekinî, li dorhêla xwe çav gerand û mêze kir. Pişt ra? Pişt ra jî bi dengekî nizm axifî û wiha got:

- Belê, dema ku me berê xwe da vî çiyayî û em hatin, di rê da bi têra xwe me dît û dît. Ka îcar me çi nedît ku ez ê ji Begê xwe ra nebêjim. Li ser berfê xwîn, kincên peritî, pêlavên lingan, lepik, gore, hestî û…

Xwast axaftina xwe bidomîne, lê yê ku li kêleka wî sekinîbû, bi dizîka qorê wî niquçand. Niquçand û xwast bibêje, bi kurtî bibire û dûr û kûr nere... Wî axaftina xwe da birîn û ji nişka va yekî simbêlboq jî ji rêzê derket û bi awirên çavan berê xwe da Xaçoyê File û ber bi wî çû. Çû, lê ne bi niyetek paqij. Kerem Beg û wî nas neke? Nas dikir. Mirovekî çort, hêr û tevlihev bû. Yê wî qet nedihat zanîn, hema bila çavê wî li kesên bi pirpirk nekeve. Ne tenê bi pirpirk jî, lê bila li ber çavê xwe yekî bi cil û bergên fermî, nebîne. Dema ku didît, bi dîzîka va berê xwe dida, jê ra hem çêr û xeber dikirin hem jî dida ber kevir û daran û lê dixist. Ma tu dibêjî îcar wî berê xwe nedabû Kerem Beg? Çawa? Bila Kerem Beg carînan bi cil û bergên xwe yên fermî be û camêr jî berê xwe nede wî? Di Alayîyê da carekê berê xwe dabû wî û xwastibû kincên wî yên fermî li ser wî biçirîne û lîme lîme bike. Simbêlboqê me, di wê rojê da berê xwe dabû wî û wek çawa di arenayê da çavên boxekî li pêştimala sor bikeve û êrişê bibe ser, bi wî awayî berê xwe dabû Kerem Beg. Çavê Kerem Begê li ser wî bû. Dema ku ji cîyê xwe livîya û berê xwe da fermandar, Kerem Begê Qolaxasî dengê xwe bilind kir. Belê, dengê xwe bilind kir û got:



www.arsivakurdi.org

- Hey, Boro!... Boro, te wiha berê xwe daye wî alîyî û tu dixwazî di kû da biçî, hi? Li cîyê xwe bimîne!... Di vir da wê da ne bipirpite ne jî here û were!...

Pişt ra jî li desteya çekdaran vegerîya û bi wan ra axifî. Berîya ku biaxife jî di hîşê xwe da bir û anî û xwast navek bide. Di dilê xwe da axifî û got:

- Di vî danasînê da nabe ez ê jê ra bibêjim, Xaço. Nasname ye û bila nasnameya wî jî vê gavê eşkere nebe. Na, fermandar! Na, tu car naxwazim tu yê ji ber navê xwe yê rasteqîn zirar û zîyanê bibînî. Çawa îcab kiriye meriv bi wî awayî tevdigere. Çawa minasîb bûye bila wisa be…

Pişt ra li Xaçoyê fermandar mêze kir û di dilê xwe da jî axaftina xwe domand. Belê, axaftina xwe domand û wiha got:

- Fermandar! Bi paşnavê xwe tu Koçeryan î. Danasîn e û ez ê ji heval û hogirên xwe ra bibêjim, camêr bi navê xwe, Koçer e û ji ber vê yekê jî tu yê dilmandî nebî. Ez ê paşê bi te ra biaxifim û bibêjim ka çima...

Simbêlboq kişîyabû şûna xwe ya berê. Kişîyabû lê hê bi awirên çavên xwe bû û te digot qey Navdarê duyem e.

Piştî demekê wî dengê xwe bilind kir û ji koma çekdaran ra wiha got:

- Birayên ezîz, çekdarên delal!

Camêrê ku hûn dibînin ne xerîb û ji dostan dostekî min e, hem dost û hem jî mêvan. Ji ber vê axaftina me min firsend nedîtibû ez ê camêrê delal bi we bidim danasîn. Dostê min, bi navê xwe Koçer e. Koçer, jî Meletîyê ye û vê gavê bi me ra ye. Çiqas rêza we ji min ra hebe, bila ewqas jî ji wî ra hebe. Bêrêzîyê naxwazim û her kes bila bi hedê xwe be. Belê, bi hedê xwe…

Axaftina xwe da birîn, li Xaçoyê fermandar nihêrî û jê ra çav qirpand. Pişt ra jî li Navdarê leheng vegerîya û di hûzbara hemû çekdaran da jê ra wiha got:



www.arsivakurdi.org

- Leheng! Ez Koçerî dispêrim te. Ew babokê te ye û tu yê miqateyê wî bibî. Bilî te di vî warî da yê ku berpirsyar be, nîne. Bila çavê te li ser wî be û çi pedivîya wî hebe bi cî bîne. Her kes bi rêza xwe û her kes bi giranîya xwe. Ha we li min rêz girtiye ha li wî, firq nake û eynî ye…

Ezman çîksayî û roj jî di du bejnan da bilind bibû. Heta çav bigire û bibîne herder zelal û vekiribû. Kerem Begê Qolaxasî, bi dengekî milahîm axifî û got:

- Hûn pir û pir westîyane. Di vê sar û sermayê da ewqas rê, ewqas zehmetî û serda jî tî û birçîtî. Zêde li ser pîyan nemînin û derbasê şikeftê bibin, li wê derê agir jî heye û xwarin jî. Ji xwe ra demekê rawestin, bêhna xwe bigirin û dû ra? Dû ra jî em radibin û didin rê...

Piştî vê axaftinê jî deng li lehengê zerik û Navdar kir, bi wan ra axifî. Ji van her du egîdan ra jî wiha got:

- Niha hûn derbasê hundir dibin û bibin alîkarê hev. Navdar! Tu cîyê xwarinê dizanî. Wek xwarin û vexwarin êdî her çi hebe bidin ber hevalên xwe. Di misînê da avê germ bikin. Ha, Navdar! Bila ew nan û ava xwe bixwin û îstirehet bikin û tu? Tu jî teqemenîyên ku ji sandiqan derketine bigire û di nav wan da dabeş bike. Em jî vê gavê li derva ne. De fermo...

Ew, derbasê hundir bûn. Kerem Begê Qolaxasî jî piştî çûyîna çekdaran li fermandar vegerîya û got:

- Resimê ku te dabû min, tê da sê zarok û xanimek hebûn. Min ji te nepirsîbû û niha dipirsim, çend zarokên te hene?

Fermandarî bersiva pirsê da û got:

- Zarok bila xulamên te bin, Kerem Beg. Du lawik û keçek min hene, lêbelê haya min ji wan nîne û ez nizanim ka niha li kîderê ne!? Belkî hene û belkî jî li ber pêla Romîyan ketine û nînin!...

Kerem Begê Qolaxasî lê vegerand û got:

- Ne min ji te ra gotibû, tu azad î. Ka îcar çima tu qebûl nakî û naçî? Ji alîyê min va tu dikarî berê xwe bidî wan û biçî. Biçe û di çûyîna te camêrî da tu astengî nîne û ew ê nebe jî. Di kîjan alîyê da te xwastiye tu dikarî di wî alîyê da biçî. Ji te ra rîya Meletîyê jî vekirîye û rîya Rewanê jî, tu û biryara xwe…

Bersiva Kerem Begê da û got:

- Dizanim, Begê min. Dîl bûm, wek mêvanek hatim pêşwazî kirin û pişt ra jî azadîya min hat. Merivekî azad im û ji ber wê yekê jî li hember cenabê te serbest diaxifim, biryarê didim û ji biryara xwe jî razî me. Vê gavê naxwazim ji cenabê te dûr bibim û di derekê da herim. Kerem Beg! Roj in û roj jî nayên zanîn. Di niha da nikarim tu gotinê bikim. Ne dikarim di erênîyê da ne jî di neerênîyê da tiştekî bibêjim. Dizanim tu camêrekî biesalet î, Kerem Beg. Ji ber wê yekê jî ne dudilim. Xwazîya mayînê ji min û bila qebûla wê jî ji cenabê te be…

Wî ya dilê xwe got û Kerem Begê jî guhdarî kir. Pişt ra lê vegerand û got:

- Çi bibêjim, fermandar. Tu bi niyet û qirara xwe yî. Xuya ye tu dixwazî bi min ra bimînî. Her kes bi navê xwe delal e, fermandar. Min ji te nepirsî, bi te ra neşêwirîm û min navlêkek li te kir û tu yê dilmandî nebî. Wer îcab kiribû. Li gel min tu bi navê xwe yî û ji navê te jî ne aciz im. Ne min got, her kes bi navê xwe delal e. Belê, ji bo demekê wer îcab dike.

Serê xwe rakir, ber bi wî mêze kir û pê ra jî got:

- Ê de ka hela ji kîsikê titûna xwe ji min ra cixareyekê bipêçe, heyran.

Wî dest pêçanê kir û Kerem Beg jî axifî. Di axaftinê da çi got? Çi bibêje, got:

- Belê, fermandar. Nizanim ka di derbarê vê navlêkê da tu çi difikirî û dikarî çi bibêjî? Lê tu xweş çûyî, giran hatî!?

Li Kerem Begê vegerand û got:

- Bila be. Çima, na? Paşnavê min, Koçeryan e; ha Koçer bûye û ha Koçeryan. Na, firq nake û qedîya…

Kerem Beg, bi gotina wî ya 'ha Koçer bûye û ha Koçeryan...' kenîya. Belê, kenîya û got:

- Baş e, lê dîsa jî li gel min tu bi wî navê xwe, Xaço Koçeryan î. Belê, hem bi esl hem jî bi navê xwe. Reng, ziman û bawerî hebûn e, herkes bi hebûna xwe ye û di vî warî da gotin ji min zêde ye. Ev navlêk ji bo ewlekarîya te bû. De fermo, em ê derbasê hundir bibin…

Piştî vê suhbetê Kerem Begê da pêş û derbasê şikeftê bûn. Çekdarên ku di hundir da rûniştîbûn, bi hatina Kerem Begê û Koçeryan rabûn û ji wan ra cî vekirin. Bi wê aseleta xwe Kerem Begê Qolaxasî rûnişt û pê ra jî got:

- Fermo, rehema Xwedê li mirîyên we be û spas. Ji xwe ra rûnin û bi rehetîya xwe bin.

Boro, wek her gavî dîsa bi awirên çavên xwe bû. Kerem Begê Qolaxasî, çok da erdê û dît fermandar hê li ser pîyan e.

Deng lê kir û got:

- Birayê Koçer! Ê de kerem bike û ji xwe ra rûne. Rûne, hem xwe germ dikî hem jî berîya ku em bi rê bikevin kerîyekî nan dixwî…

Pişt ra jî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Nizanim gelo ka te karê xwe daye hev yan na? Karê cebirxanê…

Navdarê leheng, ne bi axaftin, lê di erênîyê da serê xwe hejand û bersiva pirsê da.

Kerem Begê Zirkî, piştî vê bersivê jî li lehengekî vegerîya û bi kurtî got:

- Zero! Ji bo bîstekî ez ê bi Navdarê leheng û Koçer ra derkevim. Heta wê çaxê xwe amade bikin û di hatinê da jî li ser xêrê em ê bi rê bikevin…



www.arsivakurdi.org

Di pey ra jî derketin, bi hev ra berê xwe dan tûmek bilind û hilkişîyan. Di rê da? Di rê da Kerem Beg axifî û wan herduyan jî guhdarî kir. Di axaftinê da zêdetir berê xwe da Navdar û bi wî awayî axifî. Belê, axifî û di axaftina xwe da jî wiha got:

- Li vî çiyayî her çi bûye, bûye û derbas bûye. Ji îro û şûnda fermandar di navlêkê da, Koçer e. Heta ku xwastîye ew ê bi me ra be. Ji me ra ya herî giring ne mayîn, lê ewlekarîya wî ye. Çer min negot, di vî warî da tu berpirsyarî. Acizîyê naxwazim, zirar û zîyan û êşê naxwazim. Haya me ji nasnameya camêr heye, lê bila haya kesî jê nebe...

Bi axaftinên wî ra derketibûn serê tûm. Roj di bejnan da bilind bibû û ronahî dida. Hewa sar bû. Ji bo bîstekî çavên xwe li gir û belanan girtin, axifîn û mêze kirin. Piştî qederekê jî berê xwe dan şikeftê û vegerîyan. Zero, li derva û li benda Kerem Begê bû.

Zero, bi hatina Kerem Begê ra ber bi wî çû, axifî û got:

- Begê min! Ji bo birêketinê em hemû amade ne û li benda rêwerzdana cenabê te ne…

Kerem Begê Qolaxasî, axifî û yekem got:

- Belê…

Dû ra? Dû ra jî ferman da û jê ra got:

- Zero, em derbasê hundir nabin. Tu û Navdar, hûn bi hev ra derbasê şikeftê bibin. Ger çekadarên roja oxirmê giran jî amade ne, derkevin û bidin pey me…

Qehremanên kurd bi şelagên xwe va derketin. Di rê û rêgehê da bûn yek rêz. Ji gir û kendalan derbas bûn, berê xwe dan deşta Kelê, ber bi Mele Mistefa...

Dema ku te ji dûr va li Çiyayê Qertewînê mêze dikir, te digot qey ji ber şerê bêbav û dengê guleyan qefilî û betilîye. Tofan û xezeba dagîrkeran dîtibû, ji ber hewar û gazîyê betilî û bêzar ketibû.

Navdarê Kurd di dawîya refên çekdaran da cîyê xwe girtibû

û bi gavên xwe yên lawaz bû. Bi serê namlu û qundaxa modolîyê va girtibû û tivinga xwe jî dabû paş histûyê xwe û dimeşîya. Ji Çiyayî Qertewînê dûr bibûn. Navdarê Kurd, qederekê li cîyê xwe ma û pê ra jî li rêça lingan mêze kir. Dû ra? Dû ra jî li pişt xwe va vegerîya, çavên xwe li belanên Qertewînê girt û mêze kir. Çiyayê Qertewînê di tixûbê Dutax, Patnos û Kelê (Melazgir) da bû. Li rojhilatê wî Çemê Mûradê û li başûrê wî jî Girê Sor hebû...

Ber bi Çiyayê Qertewînê serê xwe rakir, xwe bi xwe kir miremir û wiha got:

*Em du tayên bi tenê bûn û du jî tivingên me*
*me berê xwe dabû çiyayê bilind, çiyayê rûsipî*
*ne ji kêfa vî dilî ra, dilo, ji ber vî şer î, şerê xwînî*
*li wê derê, li ber Kelha Zincîrê*
*li jorê Newala Gulan*
*me tiving berda, gule barand, deng veda*
*em qêrîyan û me got:*
*- Ev çiya, çiyayê qedirzan e*
*dost xîyanetê nizane*
*her bi bext û ne bêbext e.*

Pişt ra jî gavên xwe bilez avêtin û da dû lehengan.

# III

*Lo lawo, dilê dayîka te hewara vî gazîyê...*

Berbanga sibê û destpêka rojekê teze bû. Navdarê leheng bi hîrîna hespê xwe va şîyar bû. Dema ku şîyar bû jî wek çawa meriv çavên xwe li valayîyê bigire û mêze bike, bi wî awayî li dorhêla xwe mêze kir. Navçe bi mij û dûman, di zelûlîyê da bû. Demsal payîz, hewa sar, çiya û banî xalî û bêdengî bû. Lehengê delal şeva xwe li quntara vî çiyayî û di sir û seqema werzê da derbas kiribû. Di vê demsalê da çiya û banî û bi sir û seqema xwe nebin, ew jî li Serhedê!? Di vê şevê da, di şeva vî çiyayî bilind da serma girtibû û pê tevizîbû. Ne tenê serê wî, lê gewrîya wî jî biêş û diêşîya. Pî û baskên wî li wî şikîyayî bûn, ranedigirtin. Hewl da ji cîyê xwe bilive û rabe, lê... Na, nekarî. Yekem bû pişkepişka wî, di pey ra jî li ser hev kuxîya û bi kuxikê ra jî reng avêt, sor û mor bû. Xwe bi xwe axifî û got:

- Reşbînî, malwêranî û xweşbînî jî malşênî ye. Madem ku rastî ev e û wisa ye, nabe meriv xemgîn bibe û li ber xwe bikeve…

Dû ra? Dû ra jî li hespê xwe vegerîya, kenîya û wiha got:

- Tu ha! Ê de hela tu were li min û hespê Şamran? Na, wele! Wele, ne qet xema wî ye ku Navdarê leheng serma girtiye û bi arsimê ketiye. Meriv ku di sir û seqema vî çiyayî da bimîne îcar nexweş nakeve? Helbet nexweş dikeve. Dema ku nexweş ket jî wek min ditevize û nikare rabe ser pîyan. Mixabin, rewşa min ne rewş e û bi arsimê ketime. Min serma girtiye û sermaya vî çiyayî jî merîyan helak dike. Na, ne hewceyê gotinê ye ku ez ê di vî

warî da bikim û bibêjim. Ji ber ku her tişt eyan û beyan li ber çavan e, her tişt... Ne dikarim ji cîyê xwe bilivim û rabim, ne jî dikarim ji xwe ra gavek du gav biavêjim, herim û werim. Lo! De yê dizane dizane û yê nizane jî baqê nîskan e. Îcar ez ê ji te ra çi bibejim û çi nebêjim? Ya ku Xwedê anîye serê min bila neyne serê gurên vî çiyayî. Di rewşa xwe da ez ne baş im, lê hêvî dikim ku tu yê baş bî...

Ji cîyê xwe livîya, cad kir ku rabe, lê... Ber bi hespê xwe mêze kir, kenîya û pê ra jî got:

*Lo lo pismamo çima tu deng nakî*
*Serê xwe carek bilind ranakî*
*Leşkerê dijmin li çiyayê jor in*
*Weke xweşmêra ji hev bela nakî…*

Dît ku kuxik rê nade bistre, axifî û got:

- Xuya ye îşev me herduyan jî para xwe ji sir û seqema vî çiyayî girtîye; ez nexweş im û tu jî bêdeng. Ê de hela bibêje ka îcar çi bûye û çi qewimîye ku te wisa xwe daye bêdengîyê? Ka îcar ew tu nebûyî, dema ku min navê te bi lêv dikir hema bi carekê hîrîn bi te diket û dibû hîrahîra te, lê niha? Niha jî dibînim bêdeng û bêseda yî. Min hal û ehwalê xwe got. Erê, min got û dor jî dora te ye?

Wek çawa meriv bi tayê bikeve û bilerizîne di wî rewşê da bû, Navdar. Carekê din cad kir rabe, lê...

Bêhal û bêmecal bû. Kesekî nas û nenas jî nebû berê xwe bide û jê alikarîyê bixwaze. Li vî çiyayî yek ew û yek jî hespê wî bû. Meriv ne tenê ken û henekên xwe, lê dema ku îcab kiriye êş û azarên xwe jî parva dike. Li hespê xwe vegerîya û got:

- Şamran, dayîka min ji jinan jineka çê û bedew bû. Di temenê xwe da mezin û ji porsipîyan jî porspîyek bû. Pir û pir ji min hez dikir. Lê car jî hebû berê xwe dida min, gilî û gazinên



www.arsivakurdi.org

xwe rêz dikir, tu yê bibêjî bila dawî lê bîne, nebû. Yaw, eha!... Te ji xwe ra karek daye ber xwe û dikî. Lêbelê tu jê ra lawaz mayî û te nekarîye tu yê di wextê da biqedînî. Ê erê, ha! Te aragî kiriye û di wextê da jî te nekariye tu yê karê xwe bidî hev û temam bikî. Kar e û kar jî nareve. Ger ku îro nebûye sibê û dusibe jî heye, temam dikî û diqedînî. Ê de tu were ji Naza dayîka min ra bibêje, heyran. Na, heta berê xwe nede min û bi min ra şer neke, dilê wê û rehet bike!? Hêrs dibû, ji alîyekî va berê xwe dida min û nifir dikir, ji alîyekî va jî dest bi şîretan dikir û te digot qey ji giloka hirîyê şûjin hildaye û di zikê min ra dike. Na, bavo! Dawî û li şîretên wê dayîkê were? Na, nebû. Nifir? Te ha, bi têra xwe!... Bi qasî ku were bîra min ji wan nifiran yek wisa bû: Lawo, lawo tu yê li ber lehîya Gulanê herî! Şaş nebim ji wan nifiran yek jî wisa bû: Kero, lawo!... Ez hêvî dikim ku tu yê bibî hestî û têkevî ber vî destî! Şamran, ê da hela tu were li min û vê nifirê, ha! Berê xwe dida min û bi wê hêrsa xwe, digot: Weyla lê dayê, dayê hela tu were li min û vî belayî!... Kero, lawo! Ez hêvî dikim ku tu yê li serê heft çiya bî û gula kumê te jî her tim ji min va xuya be! Ê de lome jê nabe û ew jî jinan jineka wîsa bû. Dema ku dor dihat şîretên wê jî wê, yekem ji Melayê Cizîrî çarînek dixwend û dû ra? Dû ra jî derbasê şîretên xwe dibû û te digot qey niha min dide ber top û tivingan.

Destpêk e û di destpêkê da wisa digot:

*Xelko li min kir şîretê*
*Ew dîlbera zêrrîn kemer*
*Min dît di halê xefletê*
*Hat der ji burcê wek qemer*

Eha, ji te ra çend şîretên wê: Lawo, mêr be û mêr bisekine! Lawo, çê be û çê bixebite! Lawo, bila pozê te bişewite, pozê te! Lawo, bila xelk û alem nebêje Navdarê Nazê, kapê xwe qetan-



www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

diye û ji rê derketiye. Lawo, bila der û cînar pê nehesin û nebêjin Navdarê Nazê, dîn bûye û bi çol û çiyan ketiye! Lawo û lawo! Dema ku diqehirî? Ê yanî, di tûrikê wê da gotin û nebin? Heke te rê li ber wê negirta û negota, ê de êdî bes e, wey! Tu ji Xwedê bawer bike ji berbangê bigire heta nîvê şevê wek çawa şalûl û bilbilek bixwîne bi wî awayî dixwend, dixwend û dixwend. Belê, wele dixwend û digot:

- Kero, îcar tu jî ji yê xwe ra jî dibêjî kar e? Ji destê te nayê, ji destê te! Na, bavo! Na, tu ne tu çekî. Xwedê rabûye bejn û bal daye te, lê aqil û feraset nedaye te! Dizanim, lawo. Dizanim, tu jî pişk li bavê xwe çûyî. Eha, anika tu qencî û tu lewend î, lê sibê!? Sibê ku tu hatî vê emrê min ka îcar tu yê çi xwelîyê li serê xwe bikî, çi xwelî?

Navdar, hê li dewsa xwe bû. Axaftinên xwe domand û got:

- Dêmeg, di gotinên xwe da dayîka min ne neheq bûye. Tu dibêjî qey wê ji kitêba pîroz xwendiye û gotiye. Ez jî dizanim ku ez hê nehatimê wî emrî, lê ne dikarim ji cîyê xwe bilivim û ne jî rabim. Rewşa ku niha tê da me ne bi ya dilê min e, ezbenî. Tevizîme û ji mecal ketime. Hal û ehwalê min ev e, Şamran. Tu dibêjî qey dinya li min hatiye xezebê. Qidûm li min şikiyaye, êş û azar nemane berê xwe nedin min û li min bar nebin. Îşê aqilan e, Navdar û bikeve vî halî!?

Êrê, axifî û wîsa got. Got, lê di vî warî da ne neheq bû. Êş, êşa canê wî bû. Ew bi axaftin bû û di wê navbeynê da hespê wî hat û li ber wî sekinî. Navdar, destê xwe ber bi serê wî bir, mist da û got:

- Ji vê rewşa min ra gotin pûç û bêwate ne. Gilî û gazin? Di avê da ez ê gilî û gazinên xwe bikim çi û nekim çi, Şamran. Axaftin li ser rewşa min û rewşa min jî li ber çavan e...

Pişt ra serê xwe rakir û li hespê xwe nihêrî. Ji rindîya hespê wî ra gotin û hebin? Na. Rind jî ew û resen jî dîsa ew bi xwe bû.

Li pişta wî zînek ji zînên Mêrdînê û di devê wî da jî gemek ji gemên Diyarbekirîyan disekinî. Heke di pesnê da te gotinek jê ra bikira te dikarî bigota:

Hesp e, lê çi hesp çi hesp! Ji ser Şamran ra, hesp!? Na, nebûn. Ger van gotinên ku te jê ra kirin têrê nekirin, bila şagirdek ji şagirdên Evadalê Zeynikê ji me ra qalê bike û bibêje. Ne yek jî, lê bila du dengbêj bi hev ra bin. Ji wan yek bila dayne û yek jî rake. Bila ji wan dengbêjan yek bistire û yek jî guhdarî bike û bibêje; ha hî hî hîii, dirêj û dirêj bike. Heke têrê nekiriye jî bila carekê din lê bar bike û bibêje; tew, tew, tew bila mala te camêrî ava be û tewînê bide. Stiran e, bila bistrin. Stiran jî li ser hespê Şamran e, bila bi aheng be, bila bi meqam û deng be. Bila stiran li ser resenîya wî, li ser bez û çûyîna wî, li ser reng û rengdarîya wî be. Şevên meha kanûnê dirêj û dirêj dikudînin. Ger şevek têrê nekiriye bila ji dotira şevê ra jî ew dengbêj, dengbêjê dilan ji şevberîkê ra xwe amade bikin. Lo, lo siwaro! Siwarê hespê Şamran, ê de bes e û menale. Stiran e û stiran jî li ser hespê te ye. Stiran, afirandinek gelêrî û lîrîk e. Tamdar e û dema ku te lê guhdarî kir hem tu jê tam hem jî hewesê digirî. De rabe! Rabe, Navdar. Hespê te çê ye û hespê çê merîyan di rê da nahêle.

Destê xwe da erdê û pê ra jî got:

- Duayek ji duayên pîrika min e, ya dîwana serê sibê û derîyê xêrê, tu bibe alikarê min û min şerpeze nekî!...

Qinyata dil e, got û pê ra jî rabû. Rabû, lê bi zehmetî. Di rabûnê da jî kir ‘ax û puff’ û got:

- Weeey, bavo! Ê de te kariye tu were bi deyax be. Sar û serma ye, sar û serma jî ya zozanên Bîngolê û hema bi carekê merîyan diperitîne û tîne xwarê.

Gavek du gav avêt, hat û çû. Ê de mebest e û di mebestê da jî dixwast hinekî germ bibe û di pey ra jî were ser hemdê xwe.

Dem bû û dixwast êdî bi rê bikeve. Dest avêt hefsarê serê hespê xwe û di pey ra jî li pişt xwe vegerîya û li çiyayê paş xwe va mêze kir.

Ji alîyekî va mêze kir û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Çiyayo, çiyayê bilind! Îşev mêvanê te bûm, lê qet gunehê te bi min nehat û te negot, Navdar, rêwî ye û rêwî jî ser seran û ser çavan ra hatiye. Lê te bi carekê berê xwe da min û min tevizand. De bi xatirê te. Bi xatirê te û nikarim zêde li vir bimînim, ji ber ku rêwî di rîya xwe da...

Xwe li hêla çepê va girt, dixwast ne bi siwarî, lê pêyatî bimeşe û biçe. Êdî heta kû ku çûye. Gavên wî sist bûn, hespê wî yê zîrek jî serî dabû ser wî û li du wî dikişiya. Niha li rastê bûn, li Rasta Kalê. Li wê derê Navdarê leheng, rêgeha xwe guhart û berê xwe da nav qorîyê. Çûyîn e, ku meriv çû miheqeq xwe digihîne derekê. Bi hespê xwe ra Navdar, niha li serê girekî bû. Li wî girî dema ku te li rastê, rasta li ber xwe mêze dikir te digot qey xalî û xalîçeyeke rengîn e li ber lingên te raxistine. Di mêzekirinê da ji wê bergehê ra gotin nebû te yê bikira. Li ber bergeheke wisa dilveker û xweşik ka îcar kî şaş û metal nedima ku Navdar jî nemîne. Li rastê mêrg û li her sê alîyên wê jî bi dar û ber û baxirên xwe va çiya û li alîyê rastê jî bi dirêjahîya xwe va golek hebû. Gol, lê çi gol çi gol... Navdar û bilive? Na, nelivîya. Te digot qey çavên xwe li bihuştê girtine û mêze dike.

Li hespê xwe vegerîya û got:

- Na, heyran! Ne ez, lê ji xwe ra tu lê mêze bike û tu bibêje, tu! Ji cîyan cîyekî çi xweş û çi xweş e. De bide pey min! Bide pey min û em ê ji xwe ra berê xwe bidin wê golê. Di wê mêrgê da tu bi kêfa xwe û ji min ra? Ji min ra jî Xwedê kerîm e.

Pir û hindik rê girtin û di encamê da bi wê çûyîna xwe, çûyîna lawaz gihîştin ser golê. Navdar bi kêf bû. Axifî û got:

- Şamran! Ê de were, heyran. Were, ez ê wê zînê li pişta te ye, daynim. Tu jî dizanî ku heta tu bi wê gema dev û hefsarê his-

tûyê xwe bî, tu ne azadî. Azadî xweş e û bi azadîya xwe be.

Hespê Şamran û li cîyê xwe bisekine, na. Kir tepinî û xwast hema bi carekê berê xwe bide hêşinayîya mêrgê û here.

Navdar, dest li histûyê wî gerand, mist da û got:

- Çi bû, lo? Hela parikî bi sebir be, wey! Ne mêrg direve ne jî hêşinayîya wê. Bisekine heta ku min gem û hevsar ji serê te hildaye, heyran. Ne bike hîrehîr ne jî serî li min bigerîne. Jixwe nexweşim û rewşa min ne rewş e. Bisekine, lo! Hindik ma, wey! Dû ra? Dû ra jî tu, mêrg û azadîya xwe...

Hespê wî berê xwe da mêrgê, çû û wî jî ji bo qederekê serê xwe danî ser zîn û lingê xwe dirêj kir. Xwêdaneke sar li ser enîya wî kom bibû. Di kefika destê xwe da xwêdana enîyê paqij kir û pê ra jî ber bi tûmek mêze kir. Tûm bi kelha xwe bû. Royê bi ser ra girtibû û di riman da bilind bibû. Cîyê ku lê bû bi navê xwe, Gola Sar bû. Bi kelha xwe tûmê ku li hember wî jî bi navê xwe, Kelha Gola Maran bû. Gola Sar, ji şênîyên vê herêmê ra zîyaretgeh, cîyê dua û miradxwazîyê bû. Sîya kelhê xwe dabû nîvê mêrgê û pêda pêda ber bi jor hildikişiya. Bi qasî qederekê rawestîya. Di pey ra jî ji cîyê xwe livîya, berê xwe da ava golê û li wir jî dest û rûyê xwe şûşt. Tî bû. Hat ser jinûyan, dev kir avê û qurt bi qurt vexwar. Nekarî zêde vexwe. Ji ber ku av jî av bû, avek sar û te digot qey cemed e. Vê golê navê xwe ji ava xwe girtibû. Navdar li ber golê û li ser avê bû. Herçiqas bala wî sivik bibe jî hê bi wê êşa canê xwe bû. Xwe bi xwe axifî û got:

- Tav jî tava payîzê ye û ne bi ya dilê min evdalî ye. Ger tava havînê bûya dida hestîyên min û ewqas ricif nediket dilê min. Ji min ra ya herî baş ew e ku ez ê rabim û ji xwe ra agirek dadim. Germ dike û rehetîyê dide...

Rabû û ji der û dorê hîn qirş û qal, dar û ber anî û pê agir dada. Ji cixareya ku demekê berê pêçabû mizek girt, lê nekarî bikişîne. Li ser hev kuxîya û bû kuxekuxa wî. Ne tenê kuxîya jî.



www.arsivakurdi.org

Rûyê wî tal bû, madê wî lihev ket û hema dikir ku verişe. Cixareya ku vêxistibû di destê xwe da zêde negirt û avêt. Di avêtinê da? Di avêtinê da jî axifî û got:

- Laneta Xwedê bila li te û heft bavê te be, cixare! Ev çi ye te wiha malik li min şewitandiye û pergala min belav kiriye. Li ser vê zîyaretê ez sond dixwim ku ez ê carekê din ne berê xwe bidim te ne jî te bikişînim. Bila wehd û tobe be, ku ez ê carekê din destê xwe dirêjê te cixareyê bikim.

Li ser zîyaretê sond xwar, di pey ra jî ji berika xwe kîsê titûnê derxist û di destê xwe da demekê lê mêze kir. Dudil bû, xwe bi xwe axifî û got:

- Yaw, erê! Min li ser vê zîyaretê sond xwar, soz jî da ku ez ê te nekişînim. Di vê dinyayê da cixarekêş? Na, ne tenê ez im. Vê titûnê, titûna Mûşê biavêjim jî dibe û neavêjim jî. Na! Na, baştir ew e ku neavêjim û bila bimîne. Çi zanim belkî, rastê camêrekî tirayakî têm û didim wî...

Di encamê da pêsîra xwe jê xilas kiribû û dilê wî jî pê rehet bibû. Li ber tîna agir bû, Navdar. Serê wî li ser zîn û çavên wî jî geh li hespê wî geh li rindîya bergehê bû. Hespê wî? Hespê wî jî di mêrgê da geh bi rev û geh bi repîya xwe bû. Navdar xwe bi xwe kenîya û got:

- Erê, wele! Wele, di vê mêrgê da kêf kêfa te ye. Tu li wir bi kêfa xwe û ez rebenê Xwedê jî li vir bi êşa canê xwe me…

Di pey re jî çavên xwe dan hev û ji xwe dûr bû.

Jîyana wî? Jîyana wî jî wek yê her kurdekî bi teqûreqa xwe bû. Navdar û rehetî! Na, nebû. Ne rûyê rehetîyê dîtibû ne jî rojekê bi şad û kamranî. Ka îcar ji kîjan kurdî ra hebû ku ji wî ra jî hebe!? Neyarên hov û rûyê rehetîyê bidin merîyan!? Na, xîyal bû. Wî bi xwe jî dizanî ku heta welatê wî rizgar nebe ne tenê ji wî ra, lê ji tu kesî ra rûyê rehetîyê nîne û ew ê nebe jî.

Kulê tu kul bî û bikevî mala neyarên vî welatî. Eha, salek du

sal berê Teşkîlatê Mexsûsa û Ittihad we Teraqqîyê berê xwe dabûn Ermnîyan û kok li wan anîbûn. Ji zilm û zordarîya Roma Reş ne tenê Ermenîyan, lê Kurdan jî bi qasî êşa wan êş girtibû. Gotinek ji gotinên Roma Reş e: ‘Zo’ çûn, niha dora ‘Lo’yan e! Navdar kesayetîyekî têgihîştî û ji xwezanan jî xwezanek bû. Mirovên nezan gotinên erzan dikin, lê gotinên Navdar ne erzan û di cîyê xwe da bûn. Ji ber ku li gel girêgirên welatê xwe mabû û hînê gelek û gelekî tiştan bibû. Bêguman ji wan kesan yek jî bi wî navê xwe yê ezîz, Mîrê Zirav bû (Xalid Begê Cibrî). Ax, de niha ne li gel wî bû! Bi serê xwe, ji wî dûr û li vî çiyayî bû. Belê, niha li ber vê golê û bi qasî ku bêhal be, bi ewqas jî bi zarîna dilê xwe bû. Xwast ji cîyê xwe bilive, lê... Serê xwe rakir û di pey ra jî ber bi mêrgê va mêze kir. Hespê wî li dora kevirekî mezin dihat û diçû. Xwe bi xwe axifî û got:

- Di vê dinyayê da tu tiştek nîne ji azadîyê xweştir û bi rûmetir be.

Di pey ra? Di pey ra jî xwêdana ku li enîyê kom bibû paqij kir, serê xwe danî ser zîn, çavên xwe da hev û di bûyerên xwe yên borî da rê girt û carekê din bû rêwî...

www.arsivakurdi.org
www.arsivakurdi.org

## IV

*Ey dîlberê wey dîlberê*
*Feryad ji destê keserê*
*Avek ji ava kewserê*
*Wêran ez im malim xirab*
**Feqîyê Teyran**

Ji Çiyayê Qertewînê epey dûr bibûn. Demsal ne havîn, lê zivistan... Zivistan jî zivistana Serhedê û her bi ba û bager, berf û baran û tîpîya xwe bû. Di rê û rêgehê da te nedikarî ji berfê gavek du gav biavita, ba dihat ji baranê xirabtir bû. Li vê deştê, Deşta Kelê hewa sar û sert bû. Simbêlê van xweşmêran ta bi ta bûz girtibû û ji pûkê, pûka vê berfê te nedikarî birî û bijangên wan bidîta. Di vê tofanê da, di tofana werzê da rê û rêwîtî!? Na, ne îşê aqilan bû. Ne îşê aqilan bû ku di rojekê wiha dijwar da te yê berê xwe bida kaşan û bidîta xewnê şaşan. Lê bila be, ew mêr û mêrxasên welatê xwe bûn û ji wan ra tu pirs û pirsgirêk nebû, ha berf û baran bûye û ha ba û bager... Destê sibê ji Çiyayê Qertewînê dabûn rê, ji Newala Gulan ra derbas bibûn û berê xwe dabûn kambaxa vê deştê, Deşta Kelê. Dû ra? Dû ra jî di rêvebirîya Kerem Begê Qolaxasî da ji ser Alyarê ra berê xwe dabûn Dîynugê û derbasê gund bibûn. Heke biharek ji biharên vê Serhedê bûya, Ava Muradê û rê bide? Na, rê nedida. Bîlsebeb nehatiye gotin, Ava Muradê rabûye û haya qulingan jê nîne. Ê yanî! Te bi dengekî bilind bikira hewar û gazî û bigota:

*Ji kul û kesera dilê min û te ra*
*bihar e, lê xweş û xweş bihar e*

*nexape bi bayê xapik*
*netirse ji bayê kûr, bayê şûr, bayê har*
*netirse ji xwe*
*ji welatê jêrîn qulingan berê xwe dane vî warî*
*wa dîsa hat li me bû bihar*

Belê, ger ku te bi vê helbestê, helbesta D. Gimgimî dengê xwe bilind bikira jî dîsa çem, Çemê Muradê bû û zû bi zû rê nedida. Rê nedida te ku tu yê ji xwe ra derbasê axa Dîynugê bibî û di pey ra jî berê xwe bidî mala Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî. Demsal ne bihar û zivistan bû. Ji ser Ava Muradê ra bêpirs û pirsgirêk derbas bibûn û di pey ra jî berê xwe dabûn mala wî camêrî, camêrê bi rûmet. Na! Ne bi zehmetî, lê bi rehetî derbas bibûn. Ji ber ku Ava Muradê, bi qaşe bû û ji ser ra tanqek ji wan tanqên Ûrisan jî derbas bibûya, ne deriz lê diket ne jî dişikiya. Di hejmarê da pazde kes bûn, pazde dil û bilî yekî jî bi tam û temamî çarde çekdarên roja oxirmê giran... Belê, berê xwe dabûn mala Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî û Seyda? Seyda, merivekî xweşsuhbet, nasekî ji nasan û dostekî qedîm bû. Belê, wele! Wele, camêrekî xanedan û derê qonaxa wî ji her kesî ra vekirî bû. Camêrekî esilzade û kurdperwerekî hêja bû. Na, ne xerîbê Kerem Begê bû. Hem dost, hem pismam û hem jî ji eynî eşîretê bûn, ji êşîreta Zirkan.

Di hevdîtinê da Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî, bi wî ra hembêz anî û got:

- Lo, pismamo! Pismamê delal, ka îcar ev çi rewş e? Çi hal e ku di vê sir û seqem, ba û bagêrê da te berê xwe daye me û tu hatîyî. Tu hatîyî, lê tu ser seran û ser çavan ra hatîyî. Wey, mala mino! Weyyy, ku wey! Ê de hela li ser pîyan nemînin û derbas bibin. Fermo, heyran. Fermo...

Çekdar hê li derva û derbasê hundir nebûne, Seydayê delal

û dengê xwe bilind neke? Dengê xwe bilind kir û ji xanima malê ra wiha got:

- Husna Xanim! Ji mêvanên ezîz ra doşeg û balgîyan bişîne. Husna, zû bike mêvanên ezîz birçî ne. Husna, çend telt sergîn û hinek jî ji daran bike leganê û di vî alîyê da bişîne... Husna, tu yê zû bikî û ava çayê bidî ser! Husna! Av û legan û sabûnê di vî alîyê da bişîne û bila mêvanên me, mêvanên ezîz dest û rûyên xwe bişoyên. Husna û Husna!...

Piştî van gotinan jî Seydayê qedirbilind, berê xwe da çekdaran, hal û xatirê wan pirsî û xêrhatin li wan kir. Seyda, ne xerîbê hal û ehwalan bû. Wî jî dizanî ku li welatê wî şer û pevçûn heye. Wî bi xwe jî dizanî ku li welatê wî zeftek heye û zeftek jî zefteka Ûrisan e... Ma Seydayê delal, nedizanî? Wî bi xwe jî dizanî ku di rewşeke wisa xirab da dê weledê milê xwe diavêje û bav weledê xwe nas nake. Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî û haya wî ji bûyeran nebe? Merivekî zana û xwedîyê îtîbar bû. Bi giregirên welatê xwe ra têkildar û xwedîyê pêwendîyên xas bû, Seyda. Ka îcar ji kî û kê ra têkilîyên wî nebû ku te yê negota? Bila li vê herêmê bi navûdengê xwe Silêmanê Ehmed hebe û têkilî û pêwendîyên wî jî bi wî ra nebe? Bi wê esaleta xwe ya bilind Silêman Beg, destebirakê wî û hezkirinek bêhempa di navbeyna wan da hebû. Belê, em ê werin têkilîya wî û Şêx Seîdê Pîran. Şêx, hevalek ji hevalên wî yê medreseyê bû. Bi hev ra xwendibûn û ne xerîbê hevdu bûn. Pirs û gotinên Seyda, ji azînê bûn. Azîn jî ku çi bûye, ew e. Piştî xwarin, vexwarin, suhbet û bêhnvedanê Kerem Begê Qolaxasî, destûra rabûnê ji Seyda xwast.

Belê, destûra rabûnê jê xwast û wiha got:

- Mala te camêrî ava. Me nan û ava xwe xwar, bêhnek da xwe û bi destûra cenabê te jî êdî em dixwazin ji xwe ra rabin û bi rê bikevin...

Seydayê dilovan, ji çûyîneke wisa ra razî nebû. Nerazîbûna



www.arsivakurdi.org

xwe anî ziman û bi çend hevokên xemgîn wisa got:

- Na, wele! Wele, qet nebû. Qet ne meriv hema wiha şevek du şev li mêvanîyê dimîne û di pey ra jî bi rê dikeve û tere. Dibêjim ecele nekin, werin îşev li vir û li gel me bin. Sibê? Sibê jî Xwedê kerîm e...

Ji vîya zêdetir ka îcar wî ji Kerem Begê ra dikarî çi bigota? Kerem Begê Qolaxasî, di suhbeta xwe û wî da xal bi xal her çi ku bûye û qewimîye, jê ra gotibû û anîbû ziman. Herwiha, di derbarê aqûbeta lewendên alayîya xwe da jî Kerem Begê Qolaxasî, wek xemgînî êdî her çi ku hebûye bi wî ra parva kiribû. Nedikarî zêde bi ser wî da here û bibêje; 'tu bi Xwedê û pêxember dikî tu yê nerî û bimînî!...'

Werhasil, Seydayê bi rûmet, destûra rabûnê da û got:

- Qet nebû, lê dîsa jî dibêjim hûn û biryara xwe, destûr jî destûra we ye. Çi bibêjim, dêmeg wer îcab kirîye. Hûn ne xerîb in û ji malê ne. Mal mala we ye, hûn rabin jî mala we û rûnin jî dîsa mala we ye. Xwedê bi we ra be. Rîya we vekirî û ji we ra oxira xêrê... Şerê we şerekî pîroz e, sekna we bi rûmet, daw û doza we jî daw û doza vî miletî ye. Em bi berxwedana we şa û bi hizr û ramanên we jî her bi hêvî ne. Bila şûrê we tûj û bextê we vekirî be!...

Husna Xanim, berîya ku ew rabin, bi rê bikevin û herin di hazirîyê da wek xwarin êdî her çi ku di malê da hebûye kiribû kebanê û kebana xwe jî danîbû hewlîyê. Ê de rêwîtîye û li ber wan jî rîyek dûr û dirêj hebû. Rabûn, xatirê xwe ji Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî xwastin û bi rê ketin. Di rê û rêgehê da jî ji ber Kêranlixê ra derbas bûn, ji ser Nordinê ra berê xwe dan Mele Mistefayî û ji wir jî xwe li Şerwanşêxê girtin û êdî her çi qewet ku hebûye, dan lingan. Erê, wan qewet dabû lingan, lê Navdarê Kurd jî di gavên xwe da lawaz, ji rêzê dûr ketibû û pir û pir jî li para mabû. Di duh û pêr da xwe cemidandibû û ji Kerem Begê

ra jî negotibû, rewşa min ne rewş e û ez nexweş im. Ji ber vê tozikê, tozika berfê nedikarî pêşîya xwe bibîne. Bêhal bû. Çav li serî tarî bibûn, bibû hilkehilka wî û te digot qey niha difetise. Ba û bagêrê bêhn lê çikandibû, dest û lingên wî cemidîbûn û ji taqetê ketibû. Nedixwast ji koma çekdaran biqete û para bimîne, lêbelê xwastek tiştekî û çûyîn jî tiştekî din bû. Ê helbet, helbet dema ku di merîyan da taqet nebûye meriv para jî dimîne û ji heval û hogirên xwe dûr jî dikeve.

Carekê derketibûn rê û ji vê rê jî veger nebû. Rê ye ku çûyî nivî dibe û diqede. Nêzikê gundekî bibûn. Hewar û gazî bû, roj nebû ji malekê meyîtek du meyît ranebin. Roj nebû zarokên hûrik nemirin û dayîk di şînê da nebin. Şer bû û şer jî afat û xezeba Xwedê... Xela û cela rabibû, neçarî û belengazî hebû. Li bajaran rewş çi bûye, li gundan jî ew bû. Kerem Begê Qolaxasî, li cîyê xwe sekinî û di pey ra jî li pişt xwe zivirî, di wê toz û dûmanê da bi meraqek li dû xwe nihêrî. Di mêzekirinê da ka îcar çi bibîne baş e!? Navdarê Kurd, ji rêzê dûr ketiye, hewl dide were, lê!... Na, ne dikare gav biavêje ne jî rê bigire.

Li koma çekdaran vegerîya û got:

- Birano! Li benda wî dimînim û em ê bi hev ra werin. Hûn? Hûn jî li benda me nemînin û ji xwe ra rê bigirin û herin. Na, gund ne dûr e û wa ye xuya dike!...

Ber bi lehengekî gavek avêt û pê ra jî wiha got:

- Zero! Tu bide pêş. Bide pêş, lê bila çavê te jî li ser Koçero be. Bes, tu miqateyê wî bibe û ez jî dereng namînim û xwe digihînim we.

Koma çekdaran da rê û Kerem Begê Qolaxasî jî berê xwe da Navdarê leheng. Çû, lê bi lez û bez berê xwe da wî û çû. Xwe gihand û bi dengekî bilind axifî û got:

- Navdar! Navdar, ka hela bibêje çi bûye û çi qewimîye? Çima tu ewqas lawaz î? De rabe, lo! Rabe û destê xwe bide min…

Navdar û rabe!? Bikaribûya jixwe radibû. Dît, bersiv nîne ji berê zêdetir dengê xwe bilind kir û got:

- Ê de rabe, ha! Ez ji kî ra dibêjim, lawo!? Ez ji te ra dibêjim, ji te ra! Ê de rabe, ha! Qet nizanim ka çima tu wisa dikî!?

Navdar, ji qidûman ketibû û nedikarî rabe. Kerem Begê Qolaxasî, her du destên xwe ber bi wî va dirêj kirin, lêbelê Navdar û destên wî bibîne? Na, ne destên wî dîtin ne jî karî bi destên wî va bigire. Te digot qey kerr û lal e. Ne dengê Kerem Begê bihîztibû ne jî bersiva wî dabû. Nekarîbû serê xwe rabike û li çavên wî mêze bike.

Kerem Begê Qolaxasî, dît rewşa wî ne baş e, hema li ber wî çok da û got:

- Leheng! Ka hela tu destê xwe bide min, destê xwe...

Dît, dest jî nade. Hêrs bû, dengê xwe bilind kir û got:

- Lo, lawo! Ez ji kî ra dibêjim, hi!? Ji te ra dibêjim, ji te ra! Min niha ji te ra çi got!? Ne min got, destê xwe bide min û min jî zêde hêrs neke. Kuro, ez ji kî ra dibêjim, hi!? Lawo! De destê xwe bide min, malava!

Dît, haya wî ji wî nîne û qet ne xema wî ye ku ka te çi gotiye. Vê carê jî xwe bi xwe kir miremir û got:

- Ê erê, dibe. Dibe, lê de bi ewqasî serhişkî jî nabe!

Di pey ra? Di pey ra jî bi milê wî va girt û ji ser berfê rakir. Rakir, lêbelê Navdarê Kurd ji taqetê ketibû û nedikarî gav biavêje. Ji Kerem Begê ra gotinên ku bike, nemabû. Li ber wî çok da, wek çawa meriv ji ber xwe va dest biavêje şelag û hilde bi wî awayî Navdarê leheng rakir, da pişta xwe û di pey ra jî serî da ser çekdaran. Di bin lingên wî da berfek sist û li pişta wî jî giranî hebû, giranîya lehengekî. Li pişta merîyan giranî ku hebûye, meriv bixazî nexwaze; gav in û gavên merîyan jî lawaz dikevin. Di gavên xwe da ew lawaz û Navdarê leheng jî bêhnteng û bi kufîna xwe bû. Kîjan çekdar nîne ku bi pel û pot, cil û bergên xwe

yên peritî nebûne ku Navdar jî nebe. Şal û şapikê wî li ser wî lîme lîme bûn. Ji berfê rû û rûçikê wî wenda û tu firqa wî û çekdarên din nebû. Birû û bijangên wî yên qeytanî rengê xwe ji berfê girtibûn û çîlspî... Çekdarên roja oxirmê giran derbasî gund nebibûn û li benda Kerem Begê mabûn. Di vî ba û bagêr, berf û baran û di rîyek wiha dûr û dirêj da mecal û di yekî da bimîne? Na, nebû. Li ber gund bûn û ji berf û baranê, mij û dûmanê te nedikarî ji avayîyan avayîyeke bidîta. Ji xeynî ewtîn û kastekasta kûçikan wekî din jî bêdengî bû. Te digot qey gundê kavil, kerr û lal e. Bi navê xwe gund Şêrwanşêx û êl jî Êla Hesenan bû. Gund, gundê Xalid Begê bû, Xalid Begê Hesenî. Werhasil, ji wî ra navnîşan ne navnîşanek xerîb bû. Diçû, lê bi xemgînî berê xwe dabû mala dostê xwe û diçû. Çawa xemgîn nebe? Aqûbet e û aqûbeta çekdarên Alayîya wî, sedemek ji sedemên acizî û bêhntengîya wî û tu yê dil bibêjî ne dil ne jî mejîyê wî rehet bû. Kerem Beg, berpirsîyarê Alayîya xwe bû, rindî jî ji wî dihat pirsîn û xirabî jî. Di encamê da şerê ku dabûn û didan şerekî bêbav û xwînî bû. Çekdarên Alayîyê ji hev pekîyabûn û her yek di alîyekî da çûbû. Pirs e û pirs jî ev bi xwe bû. Di kû da, di kîjan alîyê da çûbûn û rewşa wan çi bû? Werhasil, pirs bûn û pirs jî ji wî ra vê gavê bêbersiv bûn. Çaxa ku jê ra bersiv nebûye teze tu were li min û vê êşê? Hem diêşîne hem jî merîyan çîrke bi çîrke diçeliqîne. Bi hêvîyeke bilind xwe li gundê Şêrwanşêxê girtibû û hatibû. Di vê gavê da? Di vê gavê da qisawet ku li wî barnebûya giranîya Navdarê leheng ji wî ra ne tu pirs û pirsgirêk bû. Bi Alayîya xwe dema ku ew li alîyê Qertewînê û di şer da bû, Xalid Begê Hesenî jî bi Alayîya xwe va berê xwe dabû Deşta Lîzê, Çiyayê Bilêcanê û çûbû. Şer, ne tenê li vê taxê bû û ji alîyê Mûş, Bedlîs û Kanîreşê bigire heta Erzirom, Ezirgan, Qers, Agirî û tixûbê Gurcîstan û Ermenîstanê gurr û berfireh bibû. Eşîr bavê eşîran e û di vî şerî da, di şerê qirêj û xwînî da mêrxasên vî we-



www.arsivakurdi.org

latî li hember neyarên xwe destana mêrxasîyê nivisîbûn û dinivîsin. Kerem Begê Qolaxasî, bi giranîya Navdarê leheng hatibû ba çekdaran û dîsa bi alikarîya wan jî lehengê bêhal, ji pişta xwe danîbû. Danî şûnda jî qederekê çavên xwe li gundê Şerwanşêxê va girt û lê mêzekir.

Ji alîyekî va lê mêze kir û ji alîyekî va jî xwe bi xwe axifî û got:

- Êl westîyaye. Êl betilîye!

Dûra jî bi baldarî li qonaxa Xalid Begê Hesenî mêze kir. Ji dûkêşê dûyek reştarî bilind dibû û dikişîya. Bi ewtîna kûçikên malê ji hundir xortekî çeleng derket û di pey ra jî li dorhêla xwe mêze kir.

Keremê Qolaxasî, deng lê kir û got:

- Lo, lo xortooo!... Xortê delal, ka hela were ba apê xwe. Ê de nesekine û zû were, ha!

Deng lê kir û li benda wî ma. Navdarê Kurd, di pîyê Koçer û Zero da bû. Nexweş bû û vê gavê di rewşa wî da guhertinek, nebû. Bi banga Kerem Begê ra zilamekî tenik û rûbixirî, xwe li wî va girt û hat. Hat, lê bi tirs û xofa dil...

Kerem Begê Qolaxasî, dît bi tirs e, destê xwe da ser milê wî û got:

- Berxo! De tu were em ê yekem bi navê te dest bi vê axaftinê bikin. Ji apê xwe ra yekem tu navê xwe bibêje. Piştî navê te jî ez ê ji te delalî çend pirsan bikim.

Bi vê axaftina xwe xwast tirsa dilê wî birevîne. Revand jî. Tirsîyabû. Çawa netirse? Ji serî bigire heta lingan her yek di berfê da wenda, ne rûyê wan xuya dikir ne jî birû û bijangên wan... Serda jî bi çek û sîleh û ne Hesenî bûn. Piştî axaftinên Apê Kerem encax karî serê xwe rabike û bi wî ra were çav çavan.

Ji alîyekî va li çavên wî mêze kir û ji alîyekî va jî bersiva pirsê da û got:

- Navê min, Hesen e û ji vî gundî me.

Di temenê xwe da Hesen, duwanzde salî yan hebû yan tu-

www.arsivakurdi.org

nebû. Kerem Begê Qolaxasî, jê pirsî û got:

- Dêmeg, navê te Hesen e û tu bi xwe jî ji vî gundî yî. Yanî, Hesenê Hesenî. Hesenê min! Ka hela ji apê xwe ra bibêje, li vî gundî ji mêran kesekî heye yan na?

Axaftin e û hema wiha ji ber xwe va û bi zanebûn jê pirsîbû. Roj, roja mirin û mayînê bû. Ne tenê Xalid Begê Hesenî, lê ji vî gundî mêr nemabûn xwe li sengeran negrin û nerin.

Hesenê Hesenî, bersiva apê Kerem da û got:

- Na, Apo! Di vî gundî da û mêr!? Ji mêran kesê ku berê xwe nede şer û nere nîne. Ne bavê min e, ne apanên min ne jî xal û pismamên min. Hemûşkan berê xwe dan sengeran û çûn. Min jî dixwast ez ê bi wan ra herim, lê nehîştin. Gotin, tu hê tifil î û mezin bibe. Mezin bibe, rojekê dor tê te jî. Apo! Wele, hema hemûşkan rahîşt çek û sîleh, berê xwe dan çiyan û çûn. Çûn, lê hê venegerîyane. Na, ne ez dizanim ne jî kal û pîr dizanin ka çi wextê ew ê berê xwe bidine zarok û zêçên xwe û vegerin.

Piştî bersiva xortê ture Kerem Begê Qolaxasî da pêşîya çekdarên roja oxirmê giran û berê xwe da mala dostê xwe yê ezîz. Dostek ji dostên wî yê qedîm û ortaxê daw û doza vî miletî bû, Xalid Begê Hesenî. Ji hev ra wek bira, di rojên tengavîyê da jî timî li gel hev û alikarê hev bûn. Mala Xalid Begê Hesenî mala wî û wî jî berê xwe dabû mala xwe.

Carekê din ber bi Hesenê Hesenî mêze kir, kenîya û got:

- Te got ji mêran kesek nîne, ma ne wiha bû!?

Hesen, di temenê xwe da zilamekî sivik bû. Hem sivik bû, hem bi rêz û rêzdarîya xwe û hem jî biaqil...

Bersiva apê Kerem da û got:

- Na, apo! Li gund ji mêran bêtir jin, zarok û zêçên hûrik û kal û pîr mane. Li vî gundî xortên ku hebûn dan pey ap û xalan û berê xwe dan qada şer. Ew, çûn. Min jî xwast, lê rê nedan û nehîştin. Bi hesreta bavê xwe me û min pir û pir jî bîra wî kiriye. Tê



www.arsivakurdi.org

nayê ez nizanim, lê encax Xwedê dizane!? Gotinek ji gotinên bavê min e, Apo. Digot: Çêjikên guran ji merîyan ra nabin bav û bira.' Rast e...

Kerem Begê Qolaxasî, li ser axaftina wî xemgîn bû. Destê xwe li serê wî gerand, porê wî mist da û got:

- Lawiko, lawikê delal! Tu were hesret û kovana vî dilê xwe sivik bike. Bavê te mêrxas e û tu jî lawê wî yî. Bavê te, ne bîlasebeb berê xwe daye sengeran û çûye. Mebesta me tevan ew e ku hûn ê li ser vê axê, axa pîroz bi azdîya xwe bijîn. Welatê merîyan ji merîyan ra rehm û can e. Welat ji merîyan ra sî û starî ye. Roj in, tên û derbas dibin. Helbet, helbet ev welat welatê me ye. Bila qet tu şik û fikara te lewendî jê nebe ku axa welatê te di bin zefteka tu neyarî da namîne û li benda rojên azad e. Ew roj jî ne dûr in. Ew roj rojên cejnê ne, cejna min û te. Xemgîn nebe, rojên xweş û geş li benda te ne. Meraq neke, berxê min. Bavê te jî tê û pismam û lezimên te jî. Bi hêvî be, berxo. Her bi hêvî...

Pişt ra? Pişt ra jî bi dengekî nizm axifî û got:

- Ê de bide pêşîya me, heyran. Bide pêşîya me û me bibe mala apê xwe, Apê Xalid.

Di gavên westîyayî da berê xwe dan qonaxa giregirekî kurd û derbasê hewşê bûn. Di hewşê da şal û şapikên xwe ji pûka berfê daweşandin û di rewşeke qefilî û betilî da derbasê mêvanxanê bûn. Mêvanxane xalî û di hundir da kesekî nebû. Ji derva derbasê mêvanxanê bibûn, germ bû û tê da sobe dişixulî.

Xortê ture, ber bi Apê Kerem mêze kir, axifî û got:

- Apo! Wele, gavekî berê amojina min li mal bû, lê niha ji ne xuya ye. Ê de kerem bikin û em ê herin mala me...

Kerem Begê Qolaxasî, kenîya û got:

- Lo! Wele, min pir û pir ji te hez kir! Tu her hebî, Hesenê min! Heke tu dikarî here li amojina xwe bigere. Dema ku te dît jê ra bibêje mêvanên te hene, bila zû bike û were. Ha, Hesen! Em li

www.arsivakurdi.org

benda te ne û tu yê bi lez û bez herî û zû jî vegerî…

Hesenê Hesenî, hema bi carekê rabû û di pey ra jî ji mal derket û çû. Hundirê odê mezin, berfireh, xweş û balkêş bû. Di hundir da du sekû û di ortê da jî wek kutek sê stûn hebûn. Sekû, bi dirêjahîya xwe û li hember hev bûn. Ji wan sekûyan yek li ber dîwarê pacê û yek jî li pêşber wî bû. Sobe? Sobe jî di orta herdu sekûyan da bû. Li ser sobê misînek mezin hebû. Misîn ji sifirê, bi bilqîn û tê da av dikelîya. Dema ku tu derbasê odê bibûyayî tiştê ku yekem bala te dikişand stûn bûn, stûnên ku ji wan her yek wek kutekekî ber bi kêranan bilind dibûn. Wekî din? Wekî din jî kulavên xoresanî, balîfên rengîn û xalî bû, xalîya ku li erdê û ji destan hatibû çêkirin û hunandin…Di derbasbûnê da li ser destê rastê, li rûyê dîwar du xalîçe û di navbeyna herduyan da jî qirmeyek hebû. Mêvanxane hewadar û rehet bû. Di derbasbûnê da Kerem Beg, rûneniştî. Li çekdaran vegerîya û got:

- Hûn li min mêze nekin û bi rehetîya xwe bin. Ez ê ji bona…

Hevoka xwe temam nekir û ji mêvanxanê derket. Navdarê leheng, di rewşa xwe da bêhal û perîşan bû. Ji lehengan Zero, piştî çûyîna Kerem Begê Qolaxasî ji cîyê xwe rabû, pişta wî da balîfê, bi lingên wî va girt û ber bi tîna sobê dirêj kir. Çek û sîlehên çekdaran li kêleka wan bû. Li ser kulavên rengîn cîyê xwe girtibûn û bi rehetîya xwe bûn. Di hundir da bilî zarîna Navdarê leheng, wekî din jî bêdengî bû. Di berf û baranê da ne hindik, lê gelek û gelekî rê hatibûn. Hem tî û birçî, hem jî bêhal û betilî bûn. Bi ser çûyîna Kerem Begê ra pir derbas nebibû ji derî va xuya kir, li ser milên wî qatek nivîn, lihêf û balîfek hebû. Bi hatina wî va çekdarên betilî rabûn ser pîyan.

Bi destê xwe îşaret da û got:

- Rûnin û bi rehetîya xwe bin.

Qata nivînan danî şûnda jî hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Ez bi heyrana we me! Di her hatin û çûyînê da qet nabe ku

www.arsivakurdi.org

meriv rabe û rûne. Çima? Ji ber ku ne ji min ra ne jî we ra rûyê rehetîyê dimîne.

Erê, wî wer got. Got, lê ka îcar kî di vî warî da guh dida wî? Li gel Kurdan edet û tore çi bûye, ew bû. Nivînên ku bi xwe ra anîbû dixwast li goşeyê mêvanxanê ji bona Navdarê Kurd, rabixîne. Ji lehengan Zero, hema bi carekê ji cîyê xwe qilda û dû ra jî ber bî va çû. Di çûyînê da jî axifî û wiha got:

- Ev çi ye tu wiha dikî, Keko!? Ji kerema xwe ra here rûne, wey! Ne di rê da te hîşt em bibin alîkarê te û şervanê nexweş ji te bigirin û ne jî... Niha jî tu radibî û terî, lê ne tu dibêjî ji we yek bila bi min ra were û ne jî… Ji kerema xwe ra rûne û ev kar, ne karê te ye.

Zero, nivînên ku Kerem Begê bi xwe ra anîbû li kuncikê odê raxist. Di pey ra? Di pey jî çû cem şervanê nexweş û bi alîkarîya Koçeryan hem nexweşê xwe şêlandin, hem rakirin, hem jî bi hev ra anîn û di nav nivînan da bi cî kirin. Hundir germ bû. Lê bila be, ardû ardû bû û Kerem Begê Qolaxasî, hewl da here û bîne. Ê de ew ku rabe îcar çekdar û rûnin? Na, nebûye û nabe jî. Dît, çekdarên betilî li cîyê xwe dilivin, tên û terin; hema ji kêlekê kûrsîyek ji kûrsîyên Diyarbekirîyan ber bi xwe va kişand, li ber sobê danî, cî girt û rûnişt. Na, ne livîya ne jî xwast carekê din bilive. Di odê da kesê ku biaxife û gotinê bike, nebû. Hemû şervan bi porê xwe yên gijgijî û tu yê bibêjî bila hema wiha di mehê da carekê gûzan li rîyên wan bikeve, nebû. Rîyên wan dirêj û ber çavan jî xal bi xal reş bû.

* * *

*Şêr şêre, çi jin e çi mêr e!*

Bêdengîya hundir bi hatina wê va xira bû. Xanima malê çer



www.arsivakurdi.org

derbasê hundir bû hema bi carekê berê xwe da Kerem Begê Qolaxasî, bi dengekî zelal û vekirî axifî. Di axaftina xwe da wiha got:

- Ê de hela tu were li min û vê bextewarîyê. Bextewarî ye, lê çi bextewarî! Kerem Beg hatiye. Hatiye, lê ji wir heta vir pêli çavên min kiriye û wer hatiye. Bi xêr û silamet, ser seran û ser çavan ra…

Dît li ser kûrsî rûniştîye îcar jî bi dengekî xeyîrî axifî û got:

- Wîîî!... Ka îcar çima tu ne li ser kulav û li ser wî kûrsîyê hişk î!? Ax, koranî di çavên min da were, koranî! Koranî were ku di hatina we da ne li mal û li derva bûm. A ji ber wê yekê jî ne min ji we ra doşeg û mînder anî, ne jî balîf û balgî…

Piştî vê gotinê jî rabû, xwast berê xwe bide alîyê malê û li ser stêr hema êdî çiqas balgî, mînder û doşeg hene, bigire û bîne. Erê, wê wisa hewl da, lê Kerem Begê Qolaxasî û rê bide? Na, rê neda û nehîşt. Dema ku derbasê hundir bibû jî kesê ku ji cîyê xwe nelive û ranebe, nebû. Hemû çekdar rabibûn ser pîyan û Kerem Beg jî bi wan ra.

Jina çê, piştî xêrhatina Kerem Begê îcar jî li çekdaran vegerîya û got:

- Hûn hemû ser serên min û ser çavên min ra hatine, birano. Kerem bikin, ji xwe ra rûnin û li rehetîya xwe mêze bikin. Mal mala we ye û hûn jî ne xerîb û li malê ne. Pêdivîya we jî bi çi ku hebûye...

Nekarî axaftina xwe bidumahîk bike, ji ber ku Kerem Begê Qolaxasî xwe di nav axaftinê ra kiribû. Kenîya û jê ra wiha got:

- Kilê! Ka hela bibêje çima te derê qonaxê wiha serpişt vekirî hiştiye û tu çûyî, îcar bi te xêr e, malava!?

Yê wî yarenî bû. Ji roja hevnasîyê bigire heta roja îro di navbeyna wan da têkilîyeke xurt hebû. Kerem Beg, dostek ji dostên wan û ne kesekî xerîb bû. Pir û pir caran berê xwe dabû Şer-

wanşêxê, hatibû vê malê û bibû mêvan. Ji hevnasîyê bigire heta roja îro Kerem Begê Qolaxasî, rojekê bi navê wê yê rasteqîn bang li wê nekiribû. Timî jê ra digot, 'Kilê' û bi wî awayî dest bi axaftinê dikir. Ê de Kilê jî, Kilê bû. Bi wê maqulîya xwe ji jinan jineka çê û gulek ji gula civatan bû, ji mezinan ra mezin û bi piçûkan ra jî piçûk…

Jina xaraw, bi fistanekê rengîn bû. Di rengê gewez da wê, piştekekê bi rêşî li ser ziravîya navikê girêdabû. Rêşîyên piştekê bi ser fistanê wê yê gulgulî ra girtibûn, dihatin xwarê û dadigerîyan. Bi wê kofîka serê xwe Kilê, ji jinan jineka çê û canikekê dinyadîtîbû. Xêrhatin li mêvanên xwe kir şûnda jî ji bo qederekê li cem Kerem Begê çok da erdê û li ber sobê rûnişt. Ê de teze derbasê hundir bibû, haya wê û ji nexweşê nav cî û nivînan hebe? Na, wê ne bala xwe dabû kuncik ne jî di wî alîyê da mêze kiribû. Ji kûr va nalîn û kalînek hat guhên wê û ber bi kuncik mêze kir. Di wê mêzekirinê da jî dît, nîvîn û di nav nîvînan da jî nexweşek heye. Ji nişka va rabû û berê xwe da koşe. Çû, lê bi dilekî peritî, ax û wax çû. Te digot qey agir û şewat bi kezeba wê ketîye û jan dide.

Li ber serê Navdarê leheng, çok da û bi dengekî kelogirî axifî û got:

- Way, la lê li min porkurê û min bêkesê! Bila dilê dayîka te ji te ra bigîre, berxo. Ka hela ji min porkurê ra bibêje çi bi serê te hatiye û çima tu wiha dinalî? Kekê mino! Ka hela bibêje, çima tu wiha bi zarîn û zivînî, dizarî!? Çima? Derdê te ku çi bûye tu wê derde xwe ji min porkurê ra bibêje, bav û bira. Ka hela tu êşa xwe lewendî ji min bêkesê ra bibêje, êşa te çi ye? Ma tu nizanî êşa te evdalî êşa min ronedî, min bêwarê ye. Êşa te êşa me tavan e, delalê min. Ma tu nizanî, berxê mino! Êşa te egîdî êşa dilê min mahrûmê, min nezan û min xêrnedîyê ye... Wa wey lê, wa wey lê ku wey lê! Ev çi zilm e, çi xirabî ye wiha bi ser te da

hatiye û pêşakarê te bûye, bav û bira! Ka de serê xwe rabike û ji min dayîkê ra bibêje ev çi rewş e, ev çi rewş?

Dûra jî bi hêsirên çavan û jana dil, ber bi Kerem Begê serê xwe rakir, jê pirsî û got:

- Çi bi vî berxê min hatiye, Kerem Beg? Çima ewqas ji kûr va dinale û zarezara wî ye? Birîna wî birîna çend gulan e? Di kû dera xwe da derb xwarîye û birîndar e? Çima çavên xwe venake û qet deng nake? Çima?...

Carekê din li Navdarê leheng vegerîya, bi şewata dil axifî. Axifî, lê bi dilekî kul, xem û kovan axifî û got:

- Bavê mino, ka de serê xwe rake. Berxê mino, ka hela derdê xwe ji min ra bibêje. Bibêje min, ka hela birîna te çiqas kûr e!?

Axifî, pirsî û çi bibêje bêfayde bû. Ji goşê lihêfê va girt, da alîyekî û lê mêze kir. Navdar, di xwêdanê da bibû av. Dît, axaftinên wê pere nake ji ber serê wî rabû û di pey ra jî bi kul û kederek ji mêvanxanê derket. Pir derbas nebû, carekê din bi legana destê xwe û paçek paqij va derbasê odê bû. Tiştên ku di destê xwe da girtibû li ber serê şervanê nexweş danî. Dû ra jî li Hesenê xwe vegerîya û jê ra wiha got:

- Min qida û belayê te gureto, Hesenê min! Ka de hela tu jî rabe! Rabe, here ji dayîka xwe ra bibêje mêvanên amojina min hene, dema wê hebe û dikare bila were û bibe alîkarê min…

Hê li ber serê Navdar bû. Hat, ji ser sobê misîna xwe hilda û bir, ava ku tê da bû di leganê da vala kir. Ji alîyekî va vala kir û ji alîyekî va nifirên xwe rêz kirin. Paçê ku di destê xwe da girtibû, di avê da şil kir û pê xwêdana enîya şervanê nexweş girt û paqij kir.

Di nifirên xwe da? Di nifirên xwe da ka îcar wê çi got? Çi nebêje, got:

- Neyarno, neyarno! Xwedê, tu car rehetî û serfîrazîyê neke para we! Hûn tu car ji zarokên xwe xêrê nebînin! Agir bi mala

we bikeve! Destê we ranegre û lingên we bişikê! Xwedê, tofana xwe bi ser we da bîne! Hêvî dikim ku zilm û zordarîya we yê bibe belayê serê we û hûnê pê helak bibin! Warê we reş be û qafilqeda li we bikeve! Bila dûyê ocaxa we vemire û warê we reş be!...

Dil e, ka îcar çiqas bi nifiran rehet dibe? Ê de rehet nebe jî ji kul û kesera dilê xwe ra wê got û got. Hesenê xwe şand şûnda jî ji ber serê Navdarê leheng rabû û hat cem Kerem Beg. Di hatinê da jî li wî vegerîya, li ser hev pirsên xwe rêz kir û got:

- Bibêje, Kerem Beg! Ka bibêje, birîna berxê min çiqas kûr e? Bi çend guleyan birîndar e? Birîna wî hatiye dermankirin yan na? Kê derman kir? Ji destê min porkurê ka çi tê û dikarim çi bikim? Heywax, malik li min şewitî!...

Wek çawa tu gule biajoyê ber devê tivingê û pêli tetikê bikî bi wî awayî Kilê, pirsên xwe ji Kerem Begê kiribû. Kerem Begê Qolaxasî, bersiva wê da. Di bersiva pirsan da jî wiha got:

- Na, Kilê! Na, leheng ne birîndar e. Ne birîndar e, lêbelê kesirî û bêhal e. Nexweş e û ez jî wek te qet nizanim ka sedemê êşa canê wî çi ye? Na, nizanim.

Berîya ku ji mêvanxanê derbikeve û here çend gotinên din jî kir û got:

- Erê û erê! Tu bibêjî bila qeda li dinyayê bikeve, qeda! Êş û elem, kul û keder neman berê xwe nedin me û nebin para me. Afat û xezeba Xwedê bû bi ser me da girt, barî, barî û hê jî dibare. Ew ê rewşa me çawa be, Kerem Beg? Rewşa me!?

Li benda bersivê nema. Carekê din axifî û got:

- Mêvan tî û birçî ne. Mêvan di sir û seqemê da mane û betilîne. Hûn niha rûniştîne û bi rehetîya xwe bin. Ez ê herim ji we ra nan û avê hazir bikim û çayê bidim ser. Berîya ku hûn werin min di tendûrê da nan pehtibû, hê germ e.

Rabû û berê xwe da kulînê. Di mêvanxanê da bilî zarîna şer-



www.arsivakurdi.org

vanê nexweş wekî din deng nebû. Nalîna wî, bibû dengê bêdengîyê. Kerem Begê Qolaxasî, ji xwe ra cixareyekê pêçabû. Jê mizek du miz girt şûnda jî avêt û ji cîyê xwe rabû, çû û li ber serê Navdarê leheng çok da. Enîya wî bi xwêdana sar bû. Bi paçê paqij ji alîyekî va xwêdana wî girt û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Wel, wel, wel! Tu dibêjî qey di germa havînê da tirpan kişandiye û ketiye vî halî. Leheng, di xwêdanê da bûye av, av! Serma girtiye, lê pir û pir jî pîs girtiye. Xwe cemidandiye.

Deng lê kir û got:

- Navdar! Ka hela serê xwe rake, lo. Serê xwe rake û qet ne hema wiha gotinek du gotinan bike, heyran. Qet nizanim ka çima tu wiha dikî. Rabe, ji xwe ra tiştekî bixwe û vexwe. Navdar û bikeve vî halî!?

Ew, bi êşa canê xwe bû û wî ne bersiv da ne jî tu yê bibêjî bila hema wiha gotinek du gotinan bike kir. Haya wî ji dinyayê nebû. Kerem Begê Qolaxasî bi qasî qederekê li ber serê wî ma. Pişt ra? Pişta ra jî rabû, hat û li cîyê xwe yê berê rûnişt. Rûnişt şûnda jî li çekdaran vegerîya û got:

- Me ji Çiyayê Qertewînê da rê û em hatin. Seyr û ecêba Xwedê ye ku di rê da em rastê kesekî nehatin. Bi texmîna min çekdarên Alayîyê xwe li alîyê Deşta Lîzê va girtine, yan jî berê xwe dane Çiyayê Bilêcanê û çûne! Na, sedî sed nikarim tiştekî wiha bibêjim, yê min jî hema wiha texmîn…

Di kefika destê xwe da simbêlê xwe ediland û carekê din hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftinê û got:

- Xanima malê jî wek me hem bi qisawet û hem jî xemgîn e. Xemgîn e, ji ber ku ne tenê Xalid Begê mêrê wê, lê ji vê malê du xortên li ber mirad jî bi bavê xwe ra berê xwe dane sengeran û li qada şer in. Roj, roja mirin û mayînê ye. Piştî nan û avê divê êdî em jî rabin û bi rê bikevin. Rewşa şervanê nexweş? Rewşa wî jî li ber çav e û ew nikare bi me ra were. Rewşa wî li jor ba-



www.arsivakurdi.org

bokê Xwedê û li jêr jî êdî maye li ser jina çê, Kilê. Ez jî baş û baş dizanim ku çi ji destê wê hatibe ji şervanê nexweş texsîr nake û ew ê bike. Ew ê li vir be. Berîya ku em ê bi rê bikevin û biçin jî çi ku îcab kiriye ez ê ji wê ra bibêjim. Qet tu şik nîne ku çi ji destê wê hatibe nabêje na û dike...

Ji cixareya pêçayî mizek girt û dû ra jî hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftinê û got:

- Birayên delal, bi hemû qirêjîya xwe şer berdewam e û hê bi dawî nebûye. Wek çawa ewrên reş û tarî bi ser çiyayekî ra bigire û zeft bike, bi wî awayî berê xwe dane me û axa vî welatî zeft kirine. Ji we her kî ku nexwastiye berê xwe bide sengeran û şer bike, dikare berê xwe bide êla xwe û vegere. Biryar biryara we ye.

Rastî ew e ku hevoka xwe ya dawîyê bi zanebûn, mexsûs kiribû. Derî vebû û li pêşî bi sênîya destê xwe Hesen û li pey wî jî Kilê, bi selika nan, firaq û folan xuya kirin û derbasê hundir bûn. Sifreya ku anîbûn danîn û di pey ra jî Hesen û amojina xwe, dîsa bi hev ra derketin û berên xwe dan anîna xwarinê. Pir derbas nebû jî hatin û di pey ra? Di pey ra jî jina çê, li mêvanên malê vegerîya û wiha got:

- Gelî camêran, mêvanên ezîz! Hûn ê li qisûra min mazûvanê mêze nekin. Di hazirîyê da êdî her çi ku hebûye, min wek xwarin anî û da ber we. Hêvî dikim ku bi ya dilê we be. Min bizanibûya hûn dimînin û ecele nakin min ji we ra kavir jî serjêdikir û gîsk jî, lê Kerem Beg û bihêle? Na, ne dihêle ne jî dixwaze bimîne. Teqeze dike û nahêle meriv bi ya dilê xwe tiştekî amade bike û bide ber we mêvanên ezîz. Xwezika we ewqas lez nekira, lê! De fermo, rabin û ji xwe ra derbasê ser sifrê bibin û nanê xwe bixwin...

Wek qatix jî li ser sênîyê tewaş, toraq, penîr û di du sehenan da jî hingivê şanan hebû. Kilê, hêk jî qelandibû û di tasan da qelî

jî dabû ber wan. Di sifrê da wekî din mast jî hebû, rûnê teze û pîvaz jî. Piştî xwarin û vexwarinê bi qasî ku rawestin, rawestîyan û di pey ra jî rabûn. Di rabûnê da jî xatirê xwe ji jina çê xwastin, duayên xwe ji wê girtin û bi wî awayî derketin.

Wê mazûvanê, ji tevan ra wiha got:

- Ji we re oxira xêrê û rîya we vekirî be. Xwedê, bi we ra be, Xwedê…

Kerem Beg, yekser bi lehengan ra derneket û bi wê ra û di hundir da ma. Ji pirsan pirs jî rewşa Navdarê leheng bû. Li wê canikê vegerîya û got:

- Kilê! Ji bona xwarin û vexarinê dibêjim mala te ava û tu yê derd nebînî. Bi rastî tiştê ku min dixwast ez ê ji te ra bibêjim jî, ne ev bûn. Hemû çekdaran xatirê xwe ji te xwast û çûn, ma yek. Ew jî vê gavê di nav cî û nivînan da û bi zarîna xwe ye. Em ê berê xwe bidin sengeran û herin, li pey xwe jî em ê wî bihêlin. Rewşa wî xirab e. Na, rewşa wî ne rewş e. Xort, ewladê te ye û ez ê wî teslîmê te bikim. Di her tengavîyê da hêvîyek heye, Kilê. Divê em jî hêvîya xwe wenda nekin û her bi hêvî bin. Kilê! Şervanê nexweş bi navê xwe Navdar e, Navdarê Kurd. Heke ew hat ser hemdê xwe û baş bû tu yê berê wî bidî Kêranlixê û bişînî mala Apê Silêman, Silêmanê Ehmed. Li wir jî bi qasî ku maye jixwe dimîne. Belê, bila here Kêranlixê. Heke Ferzende Beg li mal bûye bi wî ra û nebûye jî bi yekî din ra bila berê xwe bide Gimgimê û here cem Xalid Begê Cibrî…

Di vir da axaftina xwe birî, çû ba Navdar, lihêfa wî rakir û di enîya wî da maç kir. Deng ji Navdar nedihat. Pişt ra jî ber bi Kilê gavek avêt û bi wê gavê ra jî axifî û got:

- De bi xatirê te canikê, Kilê. Ji me ra duayên xwe bike û şervanê nexweş jî babokê te ye…

Jina çê, bersiva Kerem Begê da û got:

- Oxira xêrê be, Kerem Beg! Xwedê bi we ra be, Xwedê. Rîya

www.arsivakurdi.org

we vekirî û bextê we jî bi we ra... Di derbarê vî xortî da jî bila tu meraqa te nebe. Bi bavê xwe ra du xortên min li qada şer in û xortê sê sêyan jî şervanê nexweş e. Ewlad ewlad e, Kerem Beg. Şirhelal jî hene û şîrheram jî. Ger Navdarê leheng şîrhelal nebûya bi te ra berê xwe nedida sengeran û ji bona ax û azadîya welatê xwe şer nedikir. Ji vîya rûmettir ka îcar çi heye, Kerem Beg? Çi heye ku ez ê çi bibêjim. Ew jî wek ewladê min yên niha li serê çiyan e. De kerem bike, Kerem Beg. Kerem bike û bila leheng li benda te nemînin.

Kerem Beg, derket û wê jî da pey. Kilê, di destên xwe da misîn girtibû û bi wî awayî derketibû. Ava misînê li pey wan rijand û got:

- Xwedê, alîkarê we be, Xwedê. Xizirê Kal, bi we ra be û we neêşîne. Ji we ra oxira xêrê û rîya we vekirî be...

Çekdarên roja oxirmê giran, berê xwe dabûn Deşta Lîzê. Heta ku ew ji ber çavan dûr bikevin, Kilê li derva ma û ji wan ra dua kir. Ew çûn û jina çê jî zivirî û berê xwe da mal.

Li Şerwanşêxê lê kiribû hûrik hûrik berf dibarî.

* * *

*Piştî tarîyê ronahî ye.*

Piştî çûyîna çekdaran, Kilê bi hesreteke kûr û xemgînîya dil berê xwe da mêvanxanê û derbasê hundir bû. Di hewlîyê da hat û çû, ji ber xwe va axifî û got:

- Ax Xalid, ax!...

Ji kûr va û bi axîna dilekî peritî gotinên janî ji dev û lêvên wê pekiyabûn. Çawa bi gotinên janî neaxife û çawa xemgîn nebe? Ne tenê malxuyê wê, lê her du xortên wê yên li ber mirad jî bi bavê xwe ra berê xwe dabû sengeran û çûbûn qada şer. Ka îcar

www.arsivakurdi.org

çi wextê ew neketibûn bîra wê ku niha jî nekevin? Bişev ku serê xwe bida ser balgîyê jî dihatin bîra wê û di berbangê da jî... Kilê, bi gotina 'ax, Xalid ax!...' jî nema. Carekê din ji kûr va kir axîn û got:

- Ax, dayîk bi gorî Şemsedîn û Nusredînê min, ax! Lo, lawo! Hesreta min kûr û êşa vî dilê min jî dijwar e. Min pir û pir bîrîya we kiriye. We wetrê ez nizanim. Ez jî dizanim ku hûn hem hêvîyek ji hêvîya ber vî dilî hem jî hûn pêşeroja vî welatî ne. Bi hesreta vî dilî li benda we me. Werin, lê bi xêr û xweşî berê xwe bidin min û werin. Werin, lê bi wê bejn û bal, kena dev û lêvan bidin rê, xwe li min porkurê, min kezebreş û min dilsotîyê bigirin û werin!...

Di hewlîyê da zêde nema û derbasê hundir bû. Bi çûyîna şervanan mêvanxane xalî û Navdar jî di nav cî û nivînan da hê bi wê nalîn û zarîna xwe bû. Dema ku kuxik jî pêşkarê wî dibû û dikuxîya, te digot qey niha difetise. Jina çê, derbasê hundir bibû. Di derbasbûnê da wekî ardû jî ji hewlîya pêş çend telt sergîn û ji leganan jî leganek temîz û paqij bi xwe ra anibû. Ji sergînan çend telt û hinek jî êzing kir sobê û ji ser sobê jî misîna avê hilda, bir û di leganê da vala kir. Piştra jî berê xwe da xanîyê malê, derket û çû. Bi ser çûyîna wê ra pir derbas nebû û îcar jî bi tas û sabûn, paçên temîz û paqij ji derî va xuyakir û hat. Ê de car heye meriv ji xwe ra rûdine û bêhnek dide xwe. Kilê û rûne? Na. Li mêvanxanê hat û çû, te digot qey teqezeya wê heye û naxwaze dereng bimîne. Di encamê da berê xwe da Navdarê leheng, ne li ber serê wî, lê li ber lingan cî girt, çok da erdê û rûnişt. Belê, rûnişt û di pey ra jî bi goşê lihêfê va girt, ji ser lingan hilda û da alîyekî. Bala xwe da goreyên wî û te ji goreyên wî ra jî nedigot gore ne, helisî û peritî bûn. Dil ku dilê Kilê ye, ê de bila ne jan bide ne jî xemgîn bibe!? Dest avêt goreyên lingan, jê derxistin û di pey ra jî girtin û ber bi derî va avêtin. Kilê, ji jinan jineka çê, din-



www.arsivakurdi.org

yadîtî û hestewar bû. Ji alîyekî va hêsirên çavan barandin û girîya, ji alîyekî va jî xwe bi xwe axifî û axifî. Wek çawa şalûl û bilbil berê xwe bidin avên çem û kanîyan, gul û çîçegên çiya û banîyan per bidin hev û di pey ra jî bixwînin bi wî awayî xwend û xwend. Hêsirên çavan barand û xwend. Xwend, lê ji kul û kesera vî dilê min û te ra lorand û xwend.

Belê, wele hem girîya hem lorand hem jî xwend û got:

- Wax, wax, wax ku wax! Bav û birayê min, ka çi bi te hatiye û çima tu wisa dinalî û dikalî? Ka hela ji xwe ra serê xwe rake û qurtek avê vebixwe. Gelo ka çima tu qet deng naki? Ka hela ji kerema xwe ra çavên xwe veke û gotineke du gotinan ji min porkurê ra bike. Lo, lawo! Ka hela çavên xwe veke û bibêje, birçî me û ji min ra kerîyekî nan û tasek avê bîne. Bibêje, bêhal im û ji min ra derman peyda bike û bîne. Bibêje, min ji te dermanê êş û janê xwastibû û ji kû peyda dikî bike û ji min ra bîne. De rabe, bavê mino. Rabe û wiha bêdengî qet nabe. De rabe, berxê mino. Rabe û rabe!...

Navdar û rabe? Na, ranebû. Legana ku bi xwe ra anîbû ji ber xwe va hilda û kir bin lingên wî. Ling, yê lehengekî ji lehengên vî welatî bû, welatê ku hê bi miradê xwe şa nebibû. Lingên nexweşê xwe sabûn kirin, şûştin û di pey ra jî bi piştemala xwe va ziwa kirin û lihêf kişand ser. Di pey ra? Di pey ra jî rabû, çû ji ber pencerê giloka hirîyê û teşîya xwe girt û anî. Di mebestê da jî dixwast li ber serê wî rûne, heta ku ew çavên xwe veke ji xwe ra teşîyê birêse. Navdarê leheng û bihêle? Na, nehişt. Ji ber zarîn û zivîn, nalîn û kalînek wisa ka kî dikarî rûne, daku ew jî rûne...

Lehengê delal, di xwêdanê da bibû av. Ê de şewat e û şewat jî şewata dil e. Te ku karîye tu yê ji xwe ra were rûne. Kilê û hedûr? Na, nekarî rûne. Rabû û di pey ra jî paçê ku bi xwe ra anîbû di avê da şil kir, guvaşt û pê xwêdana enîya wî girt û paqij kir. Hedûr li wê wenda bû. Tengezar û bêhnteng bû. Di wê nav-

beynê da derî vebû û ji derî va Hesenê Hesenî xuya kir. Nêzikê amojina xwe bû, bi rêz û giranî axifî û got:

- Amojin, min ka û gîya kir afirên ga û çêlekan û niha jî bi destûra te dixwazim berê xwe bidim mal û biçim. Qey tu bi xû û xuseyeta dayîka min nizanî, amojin. Bila hatin û çûyîna min ne di wextê da û bi derengî be, tu dibêjî qey niha radibe û xwe dixwe. Tu nabêjî çi, herim yan na?

Malîvana malê, bi wê dilşewatîya xwe axifî û got:

- Wîîî, ez bi qurbana te bim, bavê amojina xwe! Hesenê min, helbet tu dikarî herî. Here, lê dema ku te karê xwe qedand û da hev jî carekê din tu yê berê xwe bidî min û werî. Na, Hesenê min. Na, bê te nabe…

Xwêdena ku li ser enîya wî kom bibû, bi paçê destê xwe va girt, paqij kir û dû ra jî hat ser axaftina xwe ya berê. Bi moralekî xirab axifî û got:

- Na, Hesenê min. Na, tu car bê te nabe. Li benda te me û tu yê werî. Di mal da nexweş heye û nikarim ji ber sere wî rabim û di derekê da herim. Here, lê rewşa amojina xwe jî li ber çav bigire û bi wî awayî here…

Kilê berîya ku Hesenê wê ji mêvanxanê derbikeve û biçe bi destên wî va girt, guvaşt, herdu sûretên wî maç kir û bi wî awayî şand û bi rê kir. Hesen jî xwar bû, çû destên wê û got:

- Baş e, amojin! Min ku karê xwê da hev şûnda carekê din berê xwe didim amojina xwe û têm. De niha jî bi destûra te…

Di pey ra jî derket, berê xwe da mal û çû. Nalîn û kalîna vî egîdî jî her ku diçû zêde dibû. Tu yê werî çi bikî ku li gundê kambax jî ne Hekîmê Loqman, ne pîr ne jî rayber… Mixabin, doktor jî nebû û derman jî. Ka îca vê dayîkê, dayîka dilşewat dikarî çi bikra? Di vê berf û baran, sar û sermayê da dikarî berê xwe bida kî û di kû da biçûya?

Bêçare bû, Kilê. Bilî hêsirên çavan tiştê ku ji dest were, nebû.

Li derva berf û di hundir da jî hêsirên wê yên janî bûn, dibarîn. Qederekê bi wê xemgînî û êşa dilê xwe ma û di pey ra? Di pey ra jî ji cîyê xwe rabû, çû û ji sandiqê cotek goreyên rîs derxistin, anîn û li ber serê wî danîn. Na, tenê bi wê anîna xwe jî nema. Goreyên ku ji lingên wî derxistibûn û ber bi derî va avêtibûn, ji erdê hildan û di pey ra jî ji mêvanxanê derket û çû. Di derketinê da jî berê xwe dabû xanîyê malê û di mebestê da jî xwastibû ji nav cil û bergên herdu xortan di qeysa wî da şal û şapik, çekbend û wek lixwekirin jî êdî her çi ku hebe bigire û bîne. Anî jî. Ne qatek, lê du qat bi hev ra... Qeys bû û qeys jî nedihat zanîn. Kincên ku bi xwe ra anibûn li ber serê wî da ser hev û danîn. Kincên wî yên kevn û peritî jî rakirin, birin û avêtin. Her bi wê hatin û çûyina xwe bû, Kilê. Ne tenê bi hatin û çûyîn jî... Her bi gilî û qazin û gotinên xwe bû. Hundir ne sar bû. Lê dîsa jî wê, ji leganê çend telt sergîn û çend jî qot girt, avêtin sobeyê û tev dan. Zivistan bû û zû tarî dibû.

Tarîya êvarê xwe dabû rûyê erdê. Tarî ye, ku giran bû bi xwe ra qisawetan jî tîne û xem û xemginîyê jî. Kilê, ne xerîbê tarîyên şevan bû. Li vî welatî şev û ji şevan girantir nekevin!

Şev in û ma hindik di şeven wisa giran da li ber serê zarokên xwe yên hûrik lorandibû û pêra jî hênijîbû? Bi qasî xwe dît û bi qasî xwe jî jîya. Bila şev ji şevan girantir û tarîtir bikevin, ne xem e. Lê bila xem û xemxurî, bila qisawet û tengezarî berê xwe nedin merîyan û li merîyan bar nebin; diêşîne, diperitîne û çîrke bi çîrke merîyan dihêre û tîne xwarê. Şev, ku li merîyan herimîn meriv nikare bi rehetî serê xwe bide ser balgîyê û çavên xwe bide hev. Ji kûr va dilê rezîl dizare, ne emanê dide ne jî dihêle tu yê ji xwe ra pelûyên çavan bidî hev.

Kilê, ji jinan jineka dinyaditî, xaraw û bi ezmûnî bû. Ax, de dema ku dil bi tengavî û ne rehet bûyê tu yê xaraw bî çi û nebî çi! Bêhedûr bû, Kilê. Li ser pîyan bû, dihat û diçû. Ji hatinê bigire

www.arsivakurdi.org

heta niha tu yê bibêjî bila şervanê nexweş tiştekî bixwe û vexwe, nebû. Feqîrê min, tî û birçî û di nav cî û nivînan da jî her bi zarîn û zivîna xwe bû. Belê, tî û birçî û bi zarîn û zivîn...

Ê de tu, tu be û tu yê ji vê rewşa wî ra neyê negirî. Hişmenda Hesenan, di zelûlîya odê da gavek du gav avêt û di pey ra jî çû li ber pacê sekinî, destên xwe kir paşila xwe û qederekê li barîna berfê mêze kir. Hundir di tarîyê da bû. Ji ber pacê du çira hildan vêxistin û yeka xwe bir li ber serê şervanê nexweş û ya din jî li ser sandiqê danî. Ji vî hundirî ra ronahî hindik bû. Ê de bila be, ji tunebûnê çêtir û vê gavê îdare dikir. Qey di mal da lembe nebûn? Hebûn, lê vê gavê nexwastibû vêxîne. Ne tenê şervanê nexweş, lê ew bi xwe jî tî û birçî bû. Ji alîyekî va di malê da bila mêvanên te û ji alîyekî va jî di nav cî û nivînan da bi nalîn û kalîna xwe nexweşek te hebe û di gewrîya te da jî kerîyekî nan û qurtek av here xwarê? Na! Berîya ku Kerem Beg, xatirê xwe ji wê bixwaze û here, bi wê ra axifîbû. Di axaftina xwe da jî wiha gotibû:

- Her bi hêvî be, Kilê. Li ber xwe bide û tu jî dizanî ku tu car tarî wek xwe namîne û ji ber ku piştî her tarî û tengavîyê xêr û xweşî û ronahî ye. Çer diki bike, lê her bi hêvî be. Bi hêvî...

Erê, wî wer gotibû û ê de tu were ji Kilê ra bibêje. Jina çê, pir û pir bêhnteng bû. Êvarek ji êvarên Serhedê bû, êvarek reştarî. Kilê, di vê êvarê da berê xwe da pencerê, çû û ji bo qederekê li barîna berfê mêze kir. Ba û bager bû û te digot qey tofan rabûye. Di hewşê da bi navê titik û mitikan êdî her çi ku hebe dabû ber xwe, di vir da wê da kaş û berkaş dikir, dianî û dibir.

Xwe bi xwe axifî û got:

- Ba û bager, berf û baran e. Ka îcar Kilê dikare çi bike? Çi ku hebûye wa ye daye ber xwe, tîne û dibe. Ê de heta jê hatiye bila ji xwe ra bîne û bibe. Wey, wey, wey!... Çawa jî girtiye û bi xwe ra qiloz hewa dike! Kilê! Heke tu bi xwe jî derkevî derva qet na-

bêje na û te jî digire, dide ber xwe û qilozê hewa dike. Ji xwe ra here rûne û qet nelive. Ê de ba û bahoz û tîpî ye. Dema ku da ber xwe jî radike û dibe. Na! Na, ne bipirsê ne jî bibêje, ka çima rakir û bi xwe ra bir?

Di hewşê da du dar hebûn û ji wan yek dara sêvê û yek jî bî bû. Kilê, çavên xwe li guçîlên her du daran girtibû û ji xwe ra lê mêze dikir. Ji alîyekî va mêze dikir û ji alîyekî va jî berê xwe dabû zarokatîya her du xortên malê; Şemsedîn û Nusredîn.

Xem û xîyal in û di wan xem û xîyalên borî da meriv ji xwe dûr û dûr dibe. Di wê gavê da? Di wê gavê da Kilê, qet û qet nedixwast ji wan xem û xîyalên xwe yên rengîn dûr bibe. Nedixwast, lêbelê ji nişka va qirçînî bi guçîlên dara bîyê ket û di vî ba û bahozê da şikîya. Erê, wele! Wele, hem şikîya hem jî li sêvderê xist. Wek çawa gurrîn bi ewran bikeve, birûsk vebide û bişîrqîne bi wî awayî deng veda. Bi wê şîrqînîyê va Kilê, li cîyê xwe hilceniqî û ji xem û xîyalên xwe yên rengîn dûr bû.

Belê, hem ji xem û xîyalên xwe yên rengîn bû û hem jî xwe bi xwe axifî û got:

- Wey, Xwedê Xwedê!... Ka îcar çi sûc û cezayê min porkurê heye ku tu ewqas li min hatî xezebê. Çima tu ewqas bi hêrs û bi xezeb î? Bes e, bes!... Êş û elem, derd û kul nemane berê xwe nedin min porkurê, min nezanê, min pêrîşan û min belengazê... Ji alîyekî va şer, ji alîyekî va aqûbeta hezkirîyên min yên li ber vî dilî û di ser da jî niha ba û bahoza ku te rakiriye!... Qet gunehê te bi merîyan nayê, Xwedê. Rewa ye, gelo? Rewa ye!…

Çi bibêje? Ji xwe ra vegerîya û çû li şûna xwe ya berê rûnişt. Di vê êvara Şêrwanşêxê da ji alîyekî va ewtina kûçikan û ji alîyekî va jî vîzevîza ba û bahozê bû. Deng û rengê şevê ev bûn û bi vîya ra jî zarîn û zivîna vî egîdî, egîdê ku hê nehatibû ser hemdê xwe. Hema wiha li ber serê Navdarê leheng pişta xwe da dîwarê odê û wek çawa pepûgek li ser xirb û xirabeyan per bide

hev û bixwîne bi wî awayî di dilê xwe da xwend û xwend. Çavên xwe dan hev, lê na. Kilê û xew? Dudilî bû, nêwerî deng li şervanê nexweş bike. Ji kêleka xwe va dest avêt gilokê, giloka hirîyê û xwast dest bi hunandinê bike û bihunîne, lê... Na, ew jî nebû û di wê gavê da nekarî. Nebû, ji ber ku nexweşê wê ji ber xwe va axifîbû.

Axaftinek şildimbildim û ji axaftinên wî jî te nedikarî tiştekî fahm bikira. Giloka ku di destên xwe da girtibû, danî. Danî şûnda jî serê xwe kir nav her du destên xwe, çavên xwe li şervanê nexweş girt û guh da nalîn û kalîna wî. Çiqas dixwast ji derdê wî ra bibe derman. Lê ka çawa!? Çi ji dest dihat û ka wê dikarî çi bikira? Hekîmek nebû û nedikarî berê xwe bida. Ji alîyekî va li şervanê nexweş mêze kir û ji alîyekî va jî axifî. Axifî û yekem got:

- Wey, la li min ê! Wey la ku wey la...

Dû ra? Dû ra jî hêsirên çavên xwe bi pêştemala xwe ziwa kirin û got:

- Ger ku Xalidê apê te niha li vir bûya!? Gunehê wî bi te dihat û dilê wî jan dida. Nedihîşt tu wiha bi nalîn û kalîna xwe bî. Heke Xalidê apê te li vir bûya!? Radibû berê xwe dida tewlê û ji tewlê hespê kihêl dikişand, bi zîn û hefsar dikir û nedigot ba û bagêr, berf û baran e û te dibir ser tabîban û ji derdê te ra dibû derman. Ger apê te, Apê Xalid li vir bûya!...

Nekarî biaxife. Gotin di gewrîya wê da bibûn girêk û nediherikîn. Bistekî bêdeng ma. Hêsirên ku ji çavan kiribûn xwarê birin û di dilê xwe da barandin. Belê, wele hem barandin û hem jî got:

- Ax, lo lawo!... Lo, lawo çi bikim ku bextê te reş e. Bextê te ku reş nebûya apê te niha li mal bû. Çarenûsa te xirab û rewşa te jî li ber çav e. Çi bibêjim, berxo? Çi?

Ne bi paçê paqij, lê îcarê jî xwêdana enîya wî bi peştimala xwe va girt û paqij kir. Kî dizane belkî jî di wê gavê da ne haya wê ji wê ne jî ji paçê paqij û ava leganê hebû. Di wê navbeynê da bû teqûreqa derîyê pêşîn.



www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

Ji cîyê xwe rabû, pê ra jî axifî û xwe bi xwe got:

- Çi ecêba Xwedê ye. Ecêb e, lê çi ecêb!... Ji alîyekî va ba û bahoz, ji alîyekî va zarîn û zivîna vî lehengî û niha jî bûye teqûreqa derî. Hela hela, hela hela! Xwedê bi xêr bike, Xwedê.

Erê, ji Hesenê xwe ra gotibû were. Gotibû, lê negotibû tu yê di tarîyê da berê xwe bidî min û werî. Ji cîyê xwe rabû û di pey ra jî berê xwe da sandiqa mala bavanî, qerema wê vekir. Li alîyê rastê û di çavîyekê da zêr û zîv, morî û mircan û karîbarên jinan hebûn, dest lê negerand û ji sandiqê buxçikek derxist. Kilê, bi teqeze bû. Ji wê buxçikê şeşagirek derxist, di destê xwe da bir û anî, lê nihêrî. Guleyên ku derxistibû ajot ber xizneyê, pê ra jî berê xwe da derîyê pêşîn û çû.

Li paş derî sekinî û bi dengekî bilind axifî û got:

- Lo, lawo! Ka hela bibêje tu kî yî? Tu kî yî û di vê şeva tarî da ji min porkurê çi dixazî?

Pirs e, ku te pirsa xwe kir bersiv jî tê. Ji alîyê wî alî bersiv hat. Xwedîyê deng axifî û got:

- Amojin! Ez im, ez! Ez, Hesenê te...

Kilê, bi coş bû. Jê ra derî vekir û got:

- Wîîî, min bi gorî! Dêmeg, tu yî û tu hatî yî! Lo, lawo! Ne min ji te ra gotibû te ku karê xwe da hev, were. Heta niha kar dimîne? Ba û bahoz e û ser da jî tengûtarî ye. Ka îcar bi te xêr e ku te di vî tarî, ba û bagêrê da berê xwe daye min û tu hatîyî? Xêr e, bav û birayê amojina xwe?

Hesen, di pûkê da wenda bibû. Ji Hesen ra te nedigot Hesen e, lê te digot qey kalê gaxanê ye. Li amojina xwe, jina çê vegerîya û got:

- Dayîka min ji min ra got, ka hela rabe û here. Here, amojina te niha bi serê xwe û tenê ye. Rewşa wê bipirse, lawo. Hem rewşa wê bipirse û hem jî rewşa şervanê nexweş. Dîya min xemgîn bû. Bi xwe jî dixwast were, lê nekarî. Nekarî, ji ber ku der-

www.arsivakurdi.org

gûşa wê nexweş e. Belê, dergûşa hûrik û birayê min yê piçûk...

Hesenê Hesenî, di destên xwe da tasek girtibû. Tasa xwe ber bi amojina xwe va girt û pê ra jî got:

- Amojin, dîya min zad çêkiribû. Kir vê tasê, da min û got bibe û bide amojina xwe. Min jî girt û anî.

Kilê, ji destê Hesenê xwe tasa zad wergirt û pê ra jî got:

- Ê de derbasê hundir be, Hesenê min. Derbas be û di hewlîyê da nemîne. Ez dibêjim tu were îşev neçe û li mala apê xwe bimîne. Ji ber ku hem tarî, hem derengî û hem jî ba û bahoz e. Tu ronahîya her du çavên amojina xwe yî, Hesenê min. Bê te nabe...

Delalê wê, li wê vegerand û got:

- Amojin, wele min pir û pir dixwast, lê de dayîka min e. Tu bi xûyê wê dizanî û meraq dike. Min bi rê kir û ji min ra jî got: Lawo, tu yê nebî dereng bimînî, ha! Te ku zad da amojina xwe, tu yê nesekinî û zû werî. Dergûşa hûrik jî pir digîrî, amojin. Îcar ez ê neçim qet dibe? Terim, lê sibê jî ji zûkî va radibim, têm û di hatinê da jî amojina xwe dibînim. De şeva te xweş û Xwedê rehetîyê bide te, amojin...

Kilê, zêde heter nekir. Tenê got:

- E de baş e, bavê mino. Madem ku nikarî tiştê ku amojina te lê zêde bike nîne. Dêmeg wer îcab dike, bav û bira. Ê de wê çaxê here û dereng nemîne, min bi qurban. Here, lê ji dayîka xwe ra jî silavên min bibêje. Ax, de rewşa mêvanê min jî wek berê ye, bav û bira! Vê gavê di rewşa wî da tu guhartinek nîne, her bi zarîn û zivîna xwe ye...

Axaftina xwe qedand, ji pişt derî va cakêtek ji cakêtên Xalid Begê mêrê xwe girt, avêt nav milê wî guvaşt û bi rê kir. Hesenî spasîya amojina xwe kir û got:

- Şev şad, bîmîne di xêr û xweşîyê da...

Ew çû, Kilê jî vegerîya odê û hat cem nexweşê xwe. Di hatinê

www.arsivakurdi.org

da? Di hatinê da jî dîsa li ber serê wî çok da, demançeya ku hê di destê xwe da girtibû, danî ser sandiqê û destmalek avet ser. Di pey ra jî pişta xwe da dîwar û ji bo qederekê xwast çavên xwe bide hev, lê... Xem in, dema ku te xemên xwe dabe ber serê xwe tu yê çavên xwe bidî hev çi û nedî çi. Xem û xîyalan nehişt. Xalid Begê malxuyê wê, wek xem û xîyalek ji ber çavên wê ra hat û derbas bû, li pey wî jî Şemsedîn û birayê xwe... Di wê gavê da wê qet nedixwast çavên xwe vebike, lê yê ku bi zarîn bû, zarîya û nehîşt.

Çavên xwe vekir, xwe bi xwe jî axifî û got:

- Na, ew ne Xalid bû. Xalid û were? Di şer da ye û nikare. Ger ku ew nede rê û neyê ne Şemsedîn tê ne jî Nusredînê min. Her du jî lawên bavê xwe ne û tu car terka bavê xwe nakin. Şemsedîn û terka heval û hogirên xwe bike. Na, ew jî nake û Nusredîn jî. Ax hatiye binpêkirin. Welat hatiye zeftkirin û xwîn rijîyaye. Her sê jî nayên, nikarin Alayîya xwe terk bikin û werin. Kilê! Bîlasebeb gumreşîyan neke. Yê te xem û xîyalak bû, hat û derbas bû. Ax û ax!...

Jina çê û negirî? Girîya. Kilê, ji bêkesan ra jî girîyabû û ji nexweş û birîndaran ra jî. Xêrxwaz bû. Alîkar û hestewar bû. Ger ku girîyabe, ji ber wê xêrxwazî û hestewarîya xwe girîyaye.

Pişt ra li nexweşê xwe vegerîya û got:

- De rabe, bavê mino. Rabe û êdî bes e! Te kezeba min kerî kir û dilê min peritand. Lo, lawo! Ma qet gunehê te bi min nayê!? Ma tu nizanî ji min porkurê ra bêdengî mirin e. Rabe ku bikaribim ji te pirsan bikim. Heke tu rabî ez ê ji te êla te, dayîka te, bav û birayên te, gundê te û hezkirîya ber dilê te ji te bipirsim. De çavên xwe veke ku ez ji te bipirsim ka tu kî yî û ji kû yî…

Di ronahîya çirayê da du dilop hêsrên janî ji çavên wê barîn û di pey ra jî bi ser sûretên wê ra girtin û hatin xwarê.

Hat ser axaftina xwe ya berê û xwe bi xwe got:

- Berxo, ka hela bibêje dayîka te sax e yan na? Heke sax e, li kû ye? Hûn çend bira û xwişk in? Ax dilo, rebeno dilo! Te êdî çî dît û çi nedît…

Ji Navdar û deng were? Na. Çavên xwe li ronahîya çirayê girt û got:

- Wêran ez im, malim xirab! Kî dizane niha dayîka wî ya reben li kû ye? Li kû û bi wê histûxwarîya xwe li ber kîjan dîwarî ye? Ew jî wek min dayîk e. Wek min bi hesret, xemgîn û dilêş e. Hêsirên hemû dayîkan wek hev in, birînên wan jî. Jê ra peyv nîne tu yê bikî. Dilê wê dayîkê, dayîka vî lewendî jî wek yê min hem bi şewat hem jî bi kul û keser e. Ji êşa dilî ra derman û hebe? Na, nîne. Nîne û hebe jî kew lê nayê... Hesret e, hesret ku kûr bû çav li rîyan diqerime, diqerime û diqerime. Îro jî nehat û belkî sibê dide rê û tê; sibê, dusibe û sêsibe... Ka bibêje, Kilê. Tu bi Xwedê dikî tu yê bibêjî, di kîjan hevokê da hêvî naçilmise?

Li dewsa xwe ma, ranebû. Di tasê da Hesen, jê ra xwarin anîbû. Na, ne jê xwar ne jî tam kir.

Dîsa hat ser axaftina xwe ya berê, ji ber xwe va axifî û got:

- Leheng, nexweş e. Nexweş nikarin bersivên pirsan bidin. Heke bidin jî ji dil nadin. Dev ji pêsîra te berdidim û ji te napirsim, leheng. Feqîyê Teyran, ku zimanzan e û bi zimanê hemû teyr û tilûran dizane. Ji te napirsim û berê xwe didim wî. Bi şalûl û bilbilan ra axifîye, bi zimanê wan dizane ku bi wan ra axifîye. Bilî wî ka kî heye û kî dikare bi teyr û tilûran ra biaxife? Na, li vê dinyayê ji wî şarezatir kesek nîne. Feqî, merivekî tigihêştî û kamil e. Bi ezmûnî ye, derd û kulan dizane. Merivekî dinyadîtî û bi emrekî dagirtî ye, Feqî. Kul û derd, xem û keder li pey xwe hiştine. Seyda ye, Feqî. Li ser derd û kulan, meraq û şayîyan ne hindik, lê pir û pir axifîye. Feqî ye û Feqî, bi dilekî safîyane dikare peyvan bi kar bîne û pêşkêş bike. Ew, Feqî ye. Feqî û peyvan biêşîne? Na, naêşîne û serda jî wek şîr û şekir lihev tîne. Ew, Feqî

ye. Feqî, merivekî zimanzan û rihsipî ye. Ji êvarê bigire heta berbangê dikare biaxife. Ka îcar çi nîne ku neke babet û li ser neaxife? Babet ku babeta wî be, qet tu şik nîne ku ji ber xwe va dibêje û dixemlîne. Babetên Feqî, reng bi reng in: li ser per û baskên ku ranagirin pê bifirî, xemgînîyên ku meriv nikare di peyvan de bîne ziman û bibêje, hesretên ku li merîyan bêhndiçikînin, hêlînên ku li ber bayê dikevin û tarûmar dibin, pî û baskên ku nikarin ragirin, hêvîyên ku diçilmisin û bi carekê vedimirin, evînên ku li çol û çiyan dixînin û nikarî pê îfleh bibî, bêxtên reş û şin û şayî, bûkên ku mirad negirtine û bi ser mala bavê da vedigerin û û... Babetên wî cûre bi cûre ne. Şev in û şevên Xwedê naqedin. Xort û qîzên li ber miradan bila li hev bicivin û Feqî jî berê xwe nede wan û nebe mêvanê şêvê… Bêguman tê. Tê û di hatinê da jî ji wan qîzan ra dibêje:

*Nalîna teyr û tilûran kalîna çeng û bilûran*
*Xulxulê di qesr û qisûran bulbulê xoşxan im ez*
*Bulbulim daîm dixwînim ez yeqîn ez te bibînim*
*Dîn dibim sewda dimînim serxoş û sekran im ez*

Kilê, di xem û xîyalên xwe yên kûr da bibû rêwî. Li ber serê nexweşê mala bavê xwe bi zarîna dil bû. Bi hesreta mêr û zarokên xwe bû. Ji wan xem û xîyalên xwe dûr bû, lê ji Feqî dûr nebû, ji Feqîyê Teyran. Xemgîn bû, Kilê. Ji Feqîyê Teyran du çarîne xwendin û got:

*Bêhiş kirim zulfê di reş*
*Biskê sîyah, bîhnê di xweş*
*Ey duxterê, çapik bi meş*
*Wêran ezim, malim xirab*

*Bêk’êf kirim zilfê di reş*
*Biskê sîyah, zilfêd qemer*

*Eşq û muhbeta min li ser*
*Wêran ezim, malim xirab…*

Xwendina xwe qedand, lê bi nalîna şervanê nexweş jî helbestvanê Kurd Nalî hat bîra wê. Çavên xwe li valayîya mêvanxanê girt û di xem û xîyalên malxuyê xwe da got:

*Eger ez nemirim ve carê bê te*
*Şert be naçim heta vê jêrê bê te*

*Hinavê min xalîye, mîna ney dinale*
*Hewareke çi pire, hewarê bê te…*

Şev nîvî bibû. Wek çawa meriv li ber pêlên behran bikeve, were û here Kilê jî, di xem û xîyalên hezkirîyên xwe da hatibû û çûbû. Çiqas qisawet û xemginî hebûne bi hev ra berê xwe dabûn wê û li ser singê gewr per dabûn hev.

Xwe bi xwe hênijî û pê ra jî got:

- Xalid, îşev nehat. Şemsedîn û Nusredîn jî nehatin. Belkî, sibê tên. Sibê ku nebe, dusibe û sêsibe…Belkî jî Xalid, di berbangê da derdikeve û tê. Şev e, tarîye û di tarîyê da hatin bi zehmetî ye. Tê, lê miheqeq tê. Tê, lê nizanim ka êdî çi wextê berê xwe dide min û tê!?

Carekê din pelûyên çavên xwe dan hev û di xem û xîyalên kûr da rê girt û bû rêwî. Di dilê peritî da zarîn bi xwe xistibû. Di vê şeva tarî da hevokek birîndar ji dev û lêvên wê pekîya û bû para demê. Ji dil va zarîya û got:

- Hey hewar û hewara Xwedê!...

Bi vê gotinê jî nema. Her du xortên malê, ji ber çavên wê ra wek xem û xîyalek hatin û derbas bûn. Dîsa ji dil kir zarîn û got:

- Ax lo, lo lawo! Lo, lawo! Dilê dayîka we hewara vî gazîyê...

* * *

*Herfa ku me gotî nexşê hûr e, lê meqsed û maneya wê kûr e!*

**Ehmedê Xanî**

Di wê malê da, di mala Xalid Begê Hesenî da ji duh êvarê bigire heta destê sibê çira netemirîbûn. Ne wê canikê karîbû pelûyên çavan bide hev û razê, ne jî nexweşê nav cî û nivînan, dawî li zarîn û zivîna xwe anîbû. Di ser nexweşîya wî ra roj û nîvek derbas bibû, lê ne çavên xwe vekiribûn ne jî gotibû ez jî heme. Di ser da jî tî û birçî bû. Di gewrîya wî da ne çopek nan ne jî qurtek av çûbû xwarê. Xwezî ji xêra Xwedê ra ne zêde, lê hema wiha ji bo carekê çavên xwe vekira û bigota 'heyran, ez li kû me û çima li vir im?...' Ew jî bes bû, lê… Na, ne çavên xwe vekiribûn ne jî ji pirsan pirsek wisa ji xwe û wê canikê kiribû. Hê bi wê xwêdana enîyê û êşa canê xwe bû. Ka îcar vê mehrûmê dikarî jê ra çi bikra? Ji destê wê çi ku hatibe, kiribû. Di wê şevê da, di şeva ba û bahozê da jê ra duayên xwe jî kiribû û hêsirên çavan jî barandibû? Wek çawa pepûgek ji pepûgên kavil û kolxaneyan li ser kevir û zinaran per bide hev û bixwîne, bi wî awayî negotibû na; xwendibû, xwendibû û xwendibû... Kilê, ji jinan jineka çê û xaraw bû. Ma ji wê hestewarîya wê ra îcar gotin hebûn ku te yê bikira?

Kilê diltenik bû. Ka îcar ji kî û kê ra wê hêsirên çavan nebarandibû? Roj hat ji sêwîyên ber dar û dîwran ra û roj jî hat ji teyr û tilûrên perşikestî ra kir hewar û gazî û hêsirên çavan barandin. Ger Kilê ji jinan jineka dilpak û hestewar nebûya di wê şevê da, di şeva ba û bagêrê da ne berê xwe dida Nalî ne jî berê xwe dida Feqîyê Teyran û ji wan malik û çarîne dixwendin. Ji kul û kesera vî dilê min û te ra wek çawa xezalek li pey karxezela xwe bikeve û bikalîne bi wî awayî kalîyabû. Helbet hesirên çavan in û car heye meriv ji xwe ra dibarîne. Dibarîne, lê de meriv wekî wê jî nake û nabarîne. Îşê aqilan e!? Tu rabe ji kûrahîya şevê bi-

gire heta destê sibê, hem bigirî, hem bixwîne û hem jî malik li xwe bişewitîne. Ê de lome û gazin jê nedibû û ew jî jinan jineka wisa bû. Mala wê li perê gund bû. Haya delal û dîlberên vî gundî û ji hebûna şervanê nexweş û nebe? Haya wan jê hebû, bihîztibûn û ji ber wê yekê jî bi meraqek berê xwe dabûn mala wê û hatibûn. Çawa neyên? Yên wan jî yan mêr, yan dergîstî yan jî kurap û pismamek li sengeran û di qada şer da bûn. Ê de meraq e û ji ber wê yekê jî car heye meriv radibe berê xwe dide filankes û bêvankesê û ji xwe ra tere. Di çûyînê da? Di çûyînê da jî pirs ku hebin pirsên xwe dike ku nebûne jî rûdine û qederekê ji xwe ra diaxife, dide û distîne. Şervan, şervanê vî welatî û qet tu şik nîne ku Kilê jî dayîkek ji dayîkên wan egîd, mêrxas, lewend û xweşmêran bû. Ji şênîyên vî gundî her kî berê xwe dabe wê û hatibe ne destvala, lê yan bi cotek gore, yan ji tiftikê hunandî bi cotek lepik, yan jî bi kum û kolos û papaxekî berê xwe dabûn wê û hatibûn. Di her axaftinê da nebe jî di hinek axaftinan da pirs jî hene û bersiv jî. Delal û dîlberên Şerwanşêxê, ne ji kêf û şayîyê, lê ji hesret û kovana dilê min û te ra ji wê canikê pirsên xwe kiribûn: Kile! Şervanê nexweş kî ye û ji kû ye? Di şer da birîndar bûye yan, serma girtiye û pê nexweş ketiye? Heke birîndar e, li kû derê û çi wextê birîndar bûye? Şervan, ji kîjan Alayîyê ye? Gelo tu têkilîya vî şervanî bi mêrxasên êla me, Êla Hesenan ra hebûye yan na? Şervan, çend salî ye? Heke hat ser hemdê xwe carekê din berê xwe dide sengeran û tere yan na? Ê erê, wey! Pirs in û meriv pirsên xwe dike û wan jî kiribû. Bersiv? Bersiva ku Kilê bida, nebû. Ka îcar feqîra min dikarî çi bigota? Na, wê bersiva pirsan nedabû. Nedabû, lê di şûna bersivê da jî wê wiha gotibû:

- Ez bi heyrana we me! Çima we bi xwe ra lepik, kum û kolos, papax û hwd. girtiye û anîye? Hûn jî dizanin ku pêdivîya me, pedivîya vê malê bi tiştên wisa nîne. Lê dîsa jî ez dibêjim, mala we

hemûyan ava û hûn her û her hebin. Xwedê, bila tu car êşê neke para we û hezkirîyên we. Ê helbet, helbet ez jî dizanim ku ji dilê we hatiye. Ji dil hatiye û we jî girtiye û bi xwe ra anîye.

Ew Hesenî bûn. Di rojên şîn û şayîyêda li gel hev û alîkarê hev bûn. Ji maqulîya Kilê ra û gotin? Na, nebû. Jina çê, çê ye. Di mala xwe da jî çê û di gund û bajarê xwe da jî. Her tişt di nava esil û esas da ye, ji esil û esas hatibû û li gor azînê jî ne tiştekî xerîb û ecêb bû. Kilê, ji jinan jineka destvekirî, xêrxwaz û timî alikarê der û cîranên xwe bû. Her çi ku wek dîyarî hatibe û yan jî, di malê da wek zêdeyî hebûye digirt û dida belengaz, feqîr û hêjaran. Ronahîya esrê dabû rûyê dîwarê bi xalî û xalîçe, bibirq û dibiriqand. Rojên zivistanê kin û zû tarî dibû. Tarî jî nîne ku nebe tirsa şevan û neyê li ser singan rûnene. Ka kî dixwast bibe şev daku ew jî bixwaze? Şev ji wê ra qisawet bû, xem û xemxwarî... Di şevên wê da hesret hebû. Di şevên wê da girî, hêsirên çavan, gil û gazin, hewar û gazî, êş û elem û bi têra xwe hebûn û hebûn. Ka îcar wekî din çi hebe? Ma ne bes bûn? Li ber serê nexweşê mala bavê xwe rûniştibû û wek her gavî dîsa bi xem û xemxwarî û qisawetên xwe bû, Kilê.

Şervanê nexweş, di nav cî û nivînan da hat û çû, di pey ra jî kir axîn û got:

- Ke ke ke Kerem Beg!... Ke ke rem...

Di wê gavê da Kilê, teşîya ku di destên xwe da girtibû danî û ji cîyê xwe rabû. Ji ber xwe va jî axifî û got:

- Xwedê, bila bi xêr bike. Xwedê! Ê de şikir ji vê gavê ra. Şikir ku way ji dev û lêvên vî lehengî gotinek pekîya…

Pişt ra jî li şervanê nexweş vegerîya û bi wî ra axifî. Bi dengekî êş û êşdarî axifî û got:

- De rabe, bavê mino! Rabe, ewqas kufîn bes e. Ev çî nisûbetî ye, bi ser te da hatiye û bûye konek ji konên reş bi ser te da vegirtiye? Ê de rabe, tu hem tî hem jî birçî yî. Heke xwarinê nax-

wazî jî qet ne ji xwe ra qurtek avê vexe…

Dît, bersiv nîne dengê xwe ji berê zêdetir bilind kir û got:

- Hela hela, ê de tu were li min û vî mêrxasî! Mêrxas û kufîn!? Di nav cî û nivînan da egîd û nalîn? Na, nebû. Nebû, bi serê heft bavê min û te be, ku hem jî qet û qet nebû…

Dû ra xwe bi xwe kir miremir û got:

- Ax, de wexta ku nebûye jî, nabe! Tu yê li çokên xwe bixînî jî nabe û bigîrî jî!

Bi ser gotinên wê ra pir derbas nebû şervanê nexweş, ji nişka va qilozê ser xwe bû. Belê, qiloz bû û yekem bi ser xwe ra li kêranên odê û di pey ra jî ber bi xanima malê mêze kir û bi wê ra hat çav çavan. Ji tiştekî fahm nekir û tu mane neda. Her tişt ji wî ra xerîb bû; kêranên li banê jî, balgîyên rengîn yên li ser kulavên xorasanî û xanima ku niha li ber serê wî bû jî... Bel bel li wê mêze kiribû. Ka îcar wî dikarî çi wate bida xwe û vî halî? Çi îşê wî di vê odê da, di nav van cî û nivînan da hebû? Li kû bû? Ev jinik jî kê û çima li ber serê wî bû? Çima ne li serê çiyan bû, lê di vê odê da û di nav cî û nivînan da!? Bi dengekî nizm axifî û got:

- Kerem Beg, Kerem Beg!

Zêde neaxifî. Pirs jî nekir. Serê xwe kir nav her du destên xwe, her du enîşkên xwe da ser çokên di bin orxanê da û bi wî awayî ma. Heta niha Kilê û bikene? Na. Lê vê carê kenîya û got:

- Weeey, mala Xwedê ava! Ê de hela serê xwe rake, lo. Serê xwe rake û tu ne li cîyekî xerîb î, lê tu li mala xwe û bi dayîka xwe ra yî.

Rabû, balîfek ji wan balîfên rengîn yên ku li ser sekûyan bûn, anî û da ber pişta wî. Şervanê nexweş, xwe bi xwe axifî û got:

- Ka Kerem Beg? Çima xuya nake?

Pirsî, lê bi zelalîya axaftinê pirsî. Peyv ne kerîbûn û mebest jî ne şêlû... Bi alîkarîya Kilê li wir bû û di pey ra jî pişta xwe da balifê. Serê wî bi êş, bêhal û nedikarî çavên xwe veke. Gewrîya

wî ziwa bibû. Neaxifî, lêbelê li ser hev kuxîya. Ji ber wê mîrata kuxikê jî reng avêt û hema bi carekê sor û mor bû. Carekê din serê xwe rakir, li hundirê odê, li sekûya pêşber û balifên rengîn mêze kir. Dora axaftinê hatibû wê.

Berîya ku ew rabe û ji mêvanxanê derkeve axifî û got:

- Dem ne ew dem e ku ez ji xwe ra rûnim û bi te ra biaxifim. Na! Ne niha, lê ez ê paşê biaxifim. Nexweş jî tu yî, tî û birçî jî dîsa tu… Ne hindik, lê roj û nîvek bi ser hatina te ra derbas bûye. Koranî di çavên min da were, koranî. Tu hem tî hem jî birçî yî. Hela tu pişta xwe bide vê balgîyê heta ku ez hatime.

Di pişt ra jî rabû û ji mêvanxanê derket. Navdar, di rewşa xwe da kesirîbû. Erê, herçiqas çavên xwe veke jî bêhal û bêmecal bû. Nedizanî ka ev çi bela ye di ser wî da hatiye. Ji cîyê xwe livîya û xwast rabe, lê!? Na, nekarî. Li pel û potên xwe gerîya, nedît. Pişta xwe da balifê, bistekî çavên xwe dan hev û xwe bi xwe fikirî. Bi çirkînîya derî va çavên xwe vekirin. Di sênîyê da jê ra xwarin hatibû.

Bi hişmendîya xwe Kilê, li şervanê nexweş vegerîya û got:

- De rabe, bavê mino. Rabe û ji xwe ra kerîyekî nan bixwe. Heta tu nexwî û venexwî tu nikarî rabî ser xwe. Bixwe ku bila xwîn li te bikele.

Sênîya ku di destên xwe da girtibû danî kêleka wî.

Navdarê leheng, ji alîyekî va madeyê xwe kir û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Dayê, mala te ava. Tu ji Xwedê bawer bike ku madeyê min qet nagire û nikarim tiştekî bixwim. Heke min bikarîbûya qey min digot, na? Bila vê gavê bimîne. Ne niha, lê ez ê paşê bixwim.

Kilê, bi wê dilşewatîya xwe axifî û got:

- Min bîlasebeb ji te ra xwarin neanîye. Min anî ku tu bixwî. Îcar tu yê rabî wisa bikî qet dibe?

Mêze kir ne xema nexweş e, hers bû. Dengê xwe bilind kir û

got:

- Kuro, lawo! Lawo, tu li belayê xwe digerî, hi! Ne min ji te ra got, bixwe û vexwe ku bila xwîn li te bikele û tu bikaribî rabî ser xwe. Lê tu ji gotin û motinan fahm nakî. Eha, ji niha û şûnda min çi gotibe, ew e. Bûne du roj ku li ber serê te min xwe xwar, hem digîrim hem jî hêsirên çavan dibarinim. Haya te jê nîne û tu çi zanî. Wey, la li min rebenê, min pepûgê. Ax, de tu were li min û vî şervanî. Wey la ku wey la!...

Dev ji şervanê nexweş berda û îcar jî wê, berê xwe da Xwedê. Ji alîyekî va destê xwe vekir û ji alîyekî va jî ber bi jor mêze kir û got:

- Ez jî qet nizanim ka tu dawa çi li min dikî, Xwedêyo? Îcar te bi xwe jî nedît! Li ber serê vî evdalî geh bûm xezalek ji xezalên Çiyayê Bilêcanê û kalîyam, geh bûm pepûgek ji pepûgên xirb û xirabeyan û min ji kul û kesera vî dilî ra xwend û xwend. Qey ev jî qedera min e ku serî li min rebenê, min porkur û min hejarê digerîne.

Kilê û nebêje? Got, lê hem berê xwe da lehengê nexweş hem jî berê xwe da Xwedê û got. Ewqas gilî û gazin û gotin ne bîlasebeb bûn. Şervanê nexweş, dît ku nexwe nabe. Ji ser sênîyê kevçîya şimşat girt û pê mast xwar. Mast jî mastek tirş û sar bû. Du roj in ku tiştekî nexwaribû. Herçiqas dilê wî lihev bikeve jî bi qasê ku bikare bixwe, xwar.

Piştî xwarinê jî li xanima malê vegerîya û got:

- Dayê, ez li pel û potên xwe digerim, lêbelê nabînim û nizanim ka te li kû derê daniye. Ji kerema xwe tu dikarî şal û şapikê min bînî û bidî min. Herwiha, ji bo vê xwarinê jî dibêjim spas û mala te ava.

Pêyva 'dayê' li wê xweş hatibû. Kenîya û got:

- Ha, wiha! Ne bi rik û rikdarî, lêbelê her bi gotinên xwe be. Dizanim nexweşî ye û dilê merîyan jî naxwaze tiştekî bixwe. Lê di-

bêjim ji xwe ra tam bike û hêdî hêdî bixwe. Noşîcan be, noşîcan...

Hinek ji hingiv û parikî jî ji toza lîmonê kiribi nav ava germ û di tasê da tevda bû. Ber bi Navdarê leheng girt, da û pê ra jî got:

- Te got, kinc. Îcar tu yê wan kincan çi bikî? Tu dev ji kinc û mincan berde û bi kêfa xwe be, heta ku hatî ser hemdê xwe. Leheng, baş guh bide min. Çi wextê ku min ji te ra gotiye, rabe tu jî wê çaxê radibî û pel û potên xwe li xwe dikî. Xweş li xwe binêre, ji ber ku tu hê nexweş î.

Çawa îcab bike meriv wisa dibêje û wê jî wisa got. Em ê werin nexweşê nav cî û nivînan, Navdarê leheng? Ê de yê wî jî ger ku rik nebe ka îcar çi bû? Li xanima malê ferz kiribû û wek çawa teyrê tûtî eynî peyvê li ser hev dubare bike û bibêje, bi wî awayî digot; ka kincên min û ji kerema xwe ra şal û şapikê min bide min, şal û şapik? Şal û şapik û şal şapik...

Xanima xaraw, ji pel û potên her du xortên malê du qat anibû û li ber serê wî danîbû. Belê, du qat anîbû, ji ber ku nedihat zanîn ka kîjan qat di qeysê da ye...

Hêrs bû. Du qat bi hev ra rakir, da ser çongên wî û pê ra jî got:

- Eha, ji te ra pel û pot! De bigire û li xwe bike. Madem pir dixwazî, ê de fermo...

Navdarê leheng, li pel û potên li ser çokên xwe mêze kir, lê... Na, ne yên wî bûn. Bi şermokî axifî û got:

- Ev ne yên min in û…

Kilê, axaftina wî birî. Xwe di nav axaftinê ra kir û got:

- Heyran, ji pel û potê te ra min nedikarî ez ê bibêjim, pel û pot in. Lime lime bibûn. Peritîbûn û loma jî min rakir û avêt. Pêdivî ye, ku dema pêdivî jî pê nebûye meriv radike û diavêje. Du xortên malê û her du jî niha li qada şer in û bi bavê xwe ra ne. Ê de êdî kîjan qat di qeysa te da bûye tu yê wê qatê bigirî û li xwe bikî, lê ne niha...

Ka îcar Navdarê leheng, dikarî çi bigota? Serê xwe li ber xwe tewand û got:

- Çi bibêjim, dayê. Mala te hezar carî ava û spas.

Piştî van axaftinan xanima delal, ji cîyê xwe rabû û ji mêvanxanê derket.

Navdarê leheng, dudilî bû. Ger ku ji nav nivînan derbiketa û rabûya wê qebûl nedikir û riza nedida. Mayîna nav cî û nivînan jî acizîya dilê wî bû, nedixwast lihêfê bikişine ser xwe, çavên xwe bide hev û xwe tê da dirêj bike.

Di mejîyê xwe da bir û anî, di encamê da biryar da û di dilê xwe da got, ê de bila wekî te be, dayê. Hatin û çûyîna wê ne bîlasebeb bû. Li alîyê malê, ji bo şervanê nexweş av dabû ser. Dixwast bila ji xwe ra avê li xwe bike û xwe bişoyê.

Di serşokê da legan û di leganê da jî tas û hesk, sabûn û lûfik danîbû. Ji bo ku piştî şûştinê xwe pê ziwa bike desmaleke mezin li rûyê dîwar, bi bizmar va dar da kiribû. Ji bo ku temîz li xwe bike ji wê kiras û derpêyên paqij û temîz derxistibûn û li cîyê serşokê danîbû ser kursî.

Piştî demekê hat û di hatinê da jî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Li alîyê malê min ji bo yê te av dabû ser. Tu bi xwêdan î, leheng. Ez nizanim, lê encax Xwedê dizane ka çi wextê te av li xwe kiriye...

Ê de bila Navdar qise bike û bibêje, na. Dengê xwe nekir, lê di dilê xwe da jî got, yaw ev çi bû hat serê min!... Deng bikim, dilê wê ji min dimîne ku nebêjim jî!? Kilê, nedixwast leheng rabe û xwe bicemidîne. Ji bona ku di hatin û çûyînê da li xwe bike, qapûtek ji qapûtên mêrê xwe anî û da.

Belê, da û pê ra jî got:

- Heta cîyê serşokê biavêje nav milê xwe û di hatinê da jî dîsa. Teze ji nexweşîyê rabûyî û xwe necemidîne. Ez ê li hew-

lîyê û li benda te bim. Ê de rabe. Di rabûnê da jî wek lixwekirin her çi ku min li ber serê te daniye, bigire û bi xwe ra bîne.

Serşok li alîyê malê bû. Li ser kuçikan, di bêroşê da ava kelî û li ber leganê jî dû elb hebûn, yek vala û yek jî bi ava sar bû. Tê da hem alava agir û hem jî çirayek piçûk dişixulî. Belê, cîyekî piçûk. Nexweşê xwe bir li serşokê danî û got:

- Tu rîya mêvanxanê dizanî. Avê li xwe bike, xwe bişo û bi vê desmalê jî xwe ziwa bike. Kiras û derpê jî li ser kûrsî û du qat şal şapik jî li cem te ne. Li xwe diki û êdî kîjan di qeysa te da bûye. De bi îzna te...

Dikarî jê ra çi bigota? Wek çawa meriv ji zarokekî hûrik ra bibêje û wî temî bike, jê ra biaxife û rê nîşanê wî bide bi wî awayî axifîbû. Ew ku derket şûnda jî serşok ji şervanê nexweş ra ma. Navdarê Kurd, di zû da xwe neşûştibû. Qilêra canê wî, bi heft qalib sabûnan û temîz bibe!?

* * *

*Her kes bi qasî êşa canê xwe bextewar e.*

Navdarê Kurd, bi şal û şapikek xakî derbasê mêvanxanê bû.

Dema çavên Kilê li qata pel û potên lixwekirî ket, ji alîyekî va şa bû ji alîyekî va jî xemgîn. Şa bibû, ji ber ku şervanê nexweş ji lixwekirina kevn û peritî xilas bibû û niha jî xwedîyê qatek cil û bergên sipehî bû, hem jî tam û temamî di qeysê da. Xemgîn bibû, ji ber ku şal û şapikê ku li bejn û balê disekinî yê egîdê wê bû, yê Şemsedîn. Deng nekir, lê di dilê xwe da jî girîya.

Ji cîyê xwe livîya, pê ra jî axifî û got:

- Xwedê te bistirîne, Xwedê bistirîne, Xwedê! Xwedê bi te ra be. Bila serfîrazî û serbilindîyê bike para te û wekî din jî êdî her çi miradê te ku hebe, hasil bike!...

Di pey ra? Di pey ra jî axaftina xwe domand û wiha got:

- Ê de kerem bike. Kerem bike û were li ber tîhna sobê rûne. Rûne û ji xwe ra îskanek çayê vebixwe. Ha, leheng! Tu yê ji bîr nekî ku cîyê hingiv lê bûye meriv berê xwe nade şekir û wî nake çayê. Heke te xwastiye tu ji toza lîmonê jî dikarî bikî nav çaya xwe û tev bidî…

Ji alîyekî va rûniştin û bi hev ra çay vexwarin, ji alîyekî va jî di vir da wê da axifîn. Pişt ra jî Kilê, ji kûr va axîn kişand û dest bi axaftinê kir. Ax, de ka îcar çi wextê wê axîn nekişandiye ku niha jî nekişîne.

Li pey wê axînê jî axifî û got:

- Sal û zeman, dem û dewran Xwedê bila rihê merîyan bigire, lê bila merîyan neke xulam û xizmetkarê tirk, ecem û ereban. Helbet, helbet ne tenê yên wan jî, lê her kî ku neyartîya vî welatî kiriye û hê jî dike. Neyar, neyar e. Dixwaze bi navê xwe bila ew ûris, dixwaze ermenî, dixwaze bila fransiz û înglîz be, ka îcar çi firq dike. Ji xelkê ra xulam û xizmetkarî zor e. Xulamtî malwêranî ye. Xulamtî tunebûn e, berxo. Lehengo, lehengê delal! Tu ji mêvanan mêvanekî ezîz û ji şervanan jî şervanekî hêja yî. Mêr xulamê mala xwe û mêrxas jî xulamê alaya xwe ne. Kerem Begê Qolaxasî, lê xist û çû. Çû, lê berîya ku biçe jî di derbarê te da agahî da min û bi wî awayî çû. Çû, lêbelê te li jor li benda Xwedê û li jêr jî teslîmê min mehrûmê kir û bi wî awayî da rê û çû. Çû, lê bi dilekî baristanî berê xwe da qada şer û çû. Tu egîdek jî egîdên vî welatî yî. Welat, bi mêr û mêrxasên xwe heye. Ji bo azadîya welatê xwe divê meriv li berxwe bide û li ser vê axê, axa pîroz zefteka neyarên xwe bişikîne û nehêle. Ji bo miletên mazlûm nîrê koletîyê nirxek giran e. Na, nê tê kişandin tu yê bikişînî ne jî tê qebûlkirin qebûl bikî. Heta ku neyê şikandin jî meriv nikare li ser axa xwe qala azadî, serbilindî û serfîrazîyê bike. Ne bîlasebeb, lê ji ber wê yekê ye ku te berê xwe daye sengeran û di şer da yî. Her du berxê min Şemsedîn û Nusredîn jî niha li

qada şer û bi bavê xwe ra ne. Rîya ku we daye ber xwe rîyeke pîroz e. Welatê merîyan ji merîyan ra sî û sitar, rehm û can e. Kesên biaqil, esilzade û xwezan naxwazin di nav lepên neyarên xwe da bimînin û tarûmar bibin. Bi esaleta xwe ya bilind kurd û bindestîyê qebûl bikin? Na, nebûye û ew ê nebe jî. Tiştê ku ez dizanim û dikarim bibêjim jî ev e, bi mêr û mêrxasîya xwe em kurd ji zilm û zordarî, zordestîyê ra ne serî ditewînin ne jî em dixwazin xulamtîya xelkê qebûl bikin û bipejirînin. Ez bi hêvî me, berxo. Heta ku xortê wek we hebin pêşeroja vî miletî tu car di tarîyê da namîne. Namîne, ji ber ku hûn hene. Êla me, êla Hesenan, bi tevayîya mêr û mêrxasên xwe va rabûn ser pîyan, berê xwe dan sengeran û li qada şer in. Ji êla me mêr û mêrxas, egîd û lewend neman berê xwe nedin sengeran. Ka îcar kî neçûye ku ez ê qalê nekim û nebêjim: Xalid Begê malxuyê min, Şemsedin û Nusredîn, Fetullah Beg, Sertîf (Bavê Lalo) Beg, Ferzende Beg, Çavreş, Zahir, Şemsedînê Lewend, Balê, Delal Beg, Sêvdînê Fetullah Begê, Qulî, ji Dîynûgê Beşîrê Xanzo, Evdilbaqî û êdî ji xwe ra navan lê zêde bike bibêje û bibêje... Ax hatiye zeftkirîn, xwîn rijîyaye. Ji vê yekê ra bêdengî nedibû. Gund û bajar neman vala nebin. Êha, tu jî dibînî ku di vê malê da zarok û zêçek nemaye û nîne. Ê de hela bipirse û bibêje ka di kû da çûne û çima nînin? Ê de tu were ji vî halê min ra ne bigirî ne jî hêsirên çavan bibarîne. Xalidê apê te, berîya ku berê xwe bide sengeran û here, berê zarok zêçên vê malê da Dêrika Çiyayê Mazî, bir û li wir bi cî kir. Dixwast ez jî herim, lê min nexwast û riza neda. Çi îşê min li Dêrika Çiyayê Mazî ketiye? Na, min riza neda û neçûm. Bila hêwîyên min bi zarok û zeçên xwe ra herin, lê ez nikarim. Ne dikarim ne jî dixwazim ji vê axê, axa Şêrwanşêxê dûr bikevim…

Bi pêştimala xwe va çavên xwe paqij kirin şûnda jî hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftinê û di axaftina xwe da jî wiha got:

- Erê, herçiqas Kilê carînan bi dilekî xemgîn be jî, lê bi wê berxwedan û mêrxasîya we jî hem serbilind hem jî bextewar e. Qet tu şik nîne ku xwepêşandan, berxwedan û qehremanîya we cîyê şanezî û pesinandinê ye. Egîd jî hûn û mêrxas û lewend jî dîsa hûn bi xwe ne. Em dayîk in, dilê me dayîkan jî her bi jan, kul û keder e. Em ê çi bikin ku bextê me reş e. Çi bibêjim berxo, çi!? Ne kêm ne zêde her kes bi qasî êşa canê xwe bextewar e...

Navbeynek da axaftina xwe, di pey ra jî derê sobê vekir û çend êzing avêt. Carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Kerem Beg, maqulê mêran e. Kerem Beg, peyayê roja oxirmê giran e. Berîya ku xatirê xwe ji min bixwaze û here, li min vegerîya û got 'Kilê, Navdarê leheng teslîmê te dikim. Ew, nexweş e. Nexweş nikarîn berê xwe bidin sengeran û li hember neyarên xwe şer bikin. Roj roja mirin û mayînê ye. Em nikarin li vir û li benda wî bin. Heke şervanê nexweş hat ser hemdê xwe û baş bû, bi yekî ra berê wî bide Kêranlixê û bişîne mala Apê Silêman, Silêmanê Ehmed. Bila qederekê li wê derê bimîne. Ez ne bawer im Ferzende Beg li mal be. Di rojekê wiha da Ferzende Beg û li mal be!? Na, ne îşê aqilan e. Hat ser zimanê min û min jî wer got. Ê de çi zanim hesabê malê û bazarê ye…Xwezika niha li mal bûya. Heke li malbûya, qet tu şik nîne ku bi Navdarê Kurd ra berê xwe dida Gimgimê û diçûn ba Xalid Beg, Xalid Begê Cibrî. Ger ew nebûye jî Apê Silêman, bi yekî din ra jî dikare wî bişîne. Bila here, lê bila miheqeq here... Ez nizanim, lê encax Xwedê dizane ka Apê Silêman jî li mal e yan na? Kî dizane belkî niha ew jî li sengeran û di qada şer da ye?

Kilê, bi axaftin û guhdarvanê wê jî bi coş û kelecan bû. Çawa bi coş û kelecan nebe? Di axaftinên wê da navê Xalid Begê Cibrî derbas bibû. Ne di destê wî da bû. Heke di destê wî da bûya nedigot na û niha radibû. Radibû û di rabûnê da jî çek û sîleh hildida û berê xwe dida Kêranlixê. Ji wir? Ji wir jî xwe li Gimgimê

va digirt, nedisekinî û wek ji teyran teyrekî çawa bifire, difirîya û diçû. Kilê, ji bo bîstekî bêdeng ma û di wê navbeynê da şervanê nexweş, axifî. Ji wê pirsî û got:

- Ji nav cî û nivînan rabûme nebûme li mawizera xwe digerim. Lê digerim, lê tu dibêjî qey erd qelişîye û tê da wenda bûye. Nikarim bibînim. Ji kerema xwe ra tu dikarî bînî û bidî min?

Kilê, xwe di nav axaftinê ra kir û got:

- Xêr e? Teze te çavên xwe vekirine, ji nav cî û nîvînan rabûyî û ji min jî mawzer dixwazî. Ez di şûna te da bim li cîyê xwe rûdinim û dengê xwe jî dibirim. Herhalde tu dixwazî hema mawizerê hildî û rabî. Çi wextê ku min ji te ra gotiye, rîya te vekirî û ji te ra oxira xêrê be, teze wê çaxê tu dikarî mawîzera xwe hildî û bibî rêwî. Di vî warî da axaftin qedîyaye û naxwazim carekê din tu yê vê babatê vekî. Nizanim ka çima tu ewqas bi rik î?

Di rewşeke wisa nazik da Kilê û dengê xwe bilind neke? Çawa, şervanê nexweş ku wisa tevbigere qey Kilê ji vê yekê ra bêdeng dimîne? Na, hem dengê xwe bilind dike hem jî hêrs dibe. Kilê, tu car nedixwast bi gotineke xwe bibe sedemek ji sedemên êşa dilê yekî. Ê de xwazîya şervanê nexweş jî ne îşê aqilan bû, heyran! Tu hem rabe ser pîyan, hem mawzerê bixwaze û hem jî tu dawa çûyînê bike!? Kilê, hêrs bibû. Ji ber wê yekê jî rabû û ji mêvanxanê derket. Derketina wê jî dihat wê wateyê ku madem tu ewqas dixwazî rabî û herî, ê de fermo û kesî pêşîya te negirtiye. Erê, hem bi hêrs rabibû hem jî di wê rabûnê da êdî her çi ku hatibe ser zimanê wê gotibû.

Bi dengekî bilind wiha gotibû:

- Ji bo Xwedê, ê de hela tu were li min û vî şervanî, şervanê nexweş çi dibêje? ‘Ez li mawîzera xwe digerim, lê nikarim bibînim. Ji kerema xwe ra tu dikarî ji min ra mawîzera min bînî û bidî min...’ Mawîzerê bîne û bidê! Bidê ku bila biavêje milê xwe û di vê berf û baranê da berê xwe bide Kêranlixê. Mawzerê bîne bide



www.arsivakurdi.org

wî ku bila ji wir jî berê xwe bide Gimgimê û here. Na, tu dibejî qey nexweş ne ew e, lê... Îşê aqilan e? Teze tu were ji nav cî û nivînan rabe û dawa çûyînê bike. Teze tu were çavên xwe veke, rabe ser pîyan û serda jî tu avê li xwe bike û derbikeve rêwîtîyê. Ji min mawizerê dixwaze dawa çûyînê dike... Kilê, ê de tu tu be, lê tu hêrs nebe, ne bibêje ne jî bîne û bibe. Ê erê, wey! Nabêjim nabe û naqewime. Dibe, lê bi ewqasî jî zêde ye û nabe...

Carekê din hat ser axaftina xwe ya berê, lê bar kir û got:

- Na, bavo! Na, qet îşê aqilan e!? Kî dikare gotin û xwazîyên wiha bêwate qebûl bike ku ez jî bikaribim. Kerem Beg, li min rebenê vedigere û dibêje li jor babokê Xwedê û li jêr jî teslîmê te ye û ew jî ji vê axaftinê tiştekî fahm neke. Rewa ye ku tu yê rabî û bi van gotinên xwe yên eşkeva dilê min porkurê biêşînî. Berîya ku meriv rabibe biryarê bide hebkî difikire. Axaftin jî wisa ne. Berîya ku meriv diaxife divê bifikire û wisa biaxife ku rê nede xeta û xeletîyan. Nebe sedemek ji sedemên dilêşîyê. Ka ew fahm û ka ew aqil!? Şev û rêwîtî! Nexweşî û rêwîtî! Di berf û baran, ba û bahozê da û rêwîtî!? Di vê sar û sermayê da û rêwîtî!...

Eha, piştî ewqas gotinan jî wê, derîyê mêvanxanê bi hêrs dabû cî, derketibû û çûbû. Kilê, ku ewqas hêrs bibe, dengê xwe bilind bike û biaxife ka îcar şervanê nexweş dikarî jê ra çi bigota?!... Dengê xwe birîbû û pê ra jî kûrsîyê xwe ber bi tîhna sobeyê kişandibû. Na, li ser hêrs û şîretên vê canikê tiştên ku wî bigota, nebû. Di mêvanxanê da bi serê xwe bû. Canê wî rehet û êşa wî jî vê gavê ne zêde bû. Bi ser çûyîna Kilê ra qederekê derbas bibû. Derî vebû ji derî va xuya kir û hat. Di hatina wê da şervanê nexweş, ji cîyê xwe livîya û pê ra jî rabû ser xwe.

Kilê, bi dengekî xas û kubar axifî û got:

- Xwedê ji te razî be, rûne û bi rehetîya xwe be...

Li ser sênîya destê wê da demlika çayê, îskan, tasa şekir û hingiv hebû. Navdar, ji destên wê sênî wergirt û danî. Kilê, li

dewsa xwe ya berê rûnişt. Rûnişt şûnda jî ji xwe û wî ra çay dagirt, bi serê kevçîyê ji tasê hinek hingiv girt, kir pîyanê û tevda.

Pişt ra jî li şervanê nexweş vegerîya û got:

- Ê de tu vê îskanê ji ser sênîyê bigire û ji xwe ra çayê vexwe. Ez hêvî dikim ku di singê te da bi navê belxemê tiştekî nehêle. Ê te dîtîye tu çawa jî dikuxî, heyran. Serda jî tu rabûyî dawa çûyînê dikî û...

Di pey ra jî Kilê, cikek (serîyek) şekir avêt pîyana ber xwe, bi kevçîya destê xwe tevda û tê da heland. Ê de hêrs e û ew jî wek xwe namîne.

Kilê, dest bi axaftinê kir û got:

- Teze ji nav cî û nîvînan derketîyî. Hê bi nexweşîya xwe yî û bi tam û temamî nehatîyî ser hemdê xwe. Mal mala te ye. Lê wisa xuya dike ku tu xwe li mala xwe nahesibînî. Ev jî min diêşîne.

Ji îskanê qurtek çay vexwar û dû ra jî hat ser axaftina xwe ya berê. Ber bi şervanê nexweş mêze kir, axifî û wiha got:

- Tu tiştekî nîne ku di rojekê da çareser bibe. Rêyên dûr û dirêj bi gavek piçûk dest pê dikin. Bi sebir be, berxo. Bi sebir...

Gotinên ku şervanê nexweş bikira, nebû. Ji ber xwe va îskana çayê hilda û got:

- Mala te hezar carî ava be. Dizanim min tu êşandî, lê bila Xwedê te neêşîne...

* * *

*Gotina xweş bihara dilan e.*

Di ser nexweşîya wî ra çar roj û nîvek derbas bibûn, hê bi tam û temamî nehatibû ser hemdê xwe, lê dema ku te jê dipirsî jî ji te ra bersiva wî hazir bû.

Nedigot hê nexweş im, lê digot:

- Şikir ji Xwedê ra di warê tenduristîyê da tu pirs û pirsgirêkek min nîne û nemaye. Wek dendikê sîrê me. Belê, wek dendikê sîrê…

Erê, wer digot. Digot, lê ev rastî ne rastîya wî bû. Hal û ehwalê wî eyan û beyan li ber çavan bû û rastî jî çi bûye, ew e. Ji ber vê nexweşîyê nebûya lehengê delal, ne ji heval û hogirên xwe diqetîya ne jî ji qada şer dûr diket. Heke te ji dilê wî bipirsîya, ne dil ne jî mejîyê wî bi hev ra tiştekî wisa qebûl dikir; tu şervan be, lê tu rabe qada şer biterikîne û ji neyarên xwe ra bihêle! Aqil vîya qebûl bike jî wijdan û qebûl bike!? Na. Kerem Begê Qolaxasî, berê xwe dabû sengeran û çûbû. Berîya ku bide rê û here jî, telîmata xwe dabû û ji ber wê yekê jî lehengê delal, ne eware û şerpeze bû. Bi navê Xalid Begê Cibrî (Mîrê Zirav) beşera wî xweş, rê û rêgeha wî jî ji wî ra belî û kifş bibû. Ji wî ra nav ne navekî xerîb bû. Di nav axaftinên Kerem Begê da ne carekê, lê pir û pir caran derbas bibû. Herwiha, telîmeta ku Kerem Begê dabû Kilê jî dihat wê wateyê ku herçiqas ew ji heval û hogirên xwe dûr ketibe jî di encamê da ji qada şer dûr neketibû. Erê, car heye meriv li ber xwe dikeve, lê wek Navdar jî nedibû meriv bike. Heke ji vê jina çê nebûya niha wî di zû da dabû rê û çûbû. Di encamê da te dikarî bigota ku jê ra rê û rêgeh vebibû û lehengê delal, yekem diçû Kêranlixê mala Apê Silêman û ji wir jî berê xwe dida Gimgimê...

Şervanê delal, di berbangê da û bi azana dikan ra şîyar bû. Hundirê mêvanxanê di tarîyê da bû, lê bila be. Ji nav cî û nivînan derket û rabû ser xwe. Bi coş û kelecan bû. Yekem kincên xwe li xwe kirin û di pey ra jî rahîşt qata nivînan rakir, bir û li kuncikê mêvanxanê da ser hev. Pişt ra jî li ber sobê çok da erdê û xwelîya wê vala kir. Mazûvanê, hê berê xwe nedabû vî alîyê û nehatibû. Rabû, xwelîya ku ji sobê vala kiribe di mengelê da bir û li hewlîya pêş danî. Di vegerê da jî bi xwe ra wek ardû hinek

êzing, çend telt jî sergîn anî û pê sobeya xwe vêxist û dada.

Dû ra? Dû ra jî derket derva û xwast di hewşê da ji xwe ra çend gavan biavêje, here û were. Avêt jî. Hat û çû, lê de hişkayî û sar bû. Ricif ketibû dilê wî. Zivirî û xwast derbasê hundir bibe. A di wê gavê da jî bi jina çê û maqula vî gundî ra hat çav çavan. Kilê, destên xwe kiribûn newqa xwe û li ser şimûgê sekinîbû.

Dema ku hatin çav çavan jî wê, silava rojê da û got:

- Sibeha te bi xêr, Navdar. Sibeha te bi xêr, lê dibînim di vê berbangê da, di vê sar û sermayê da bêyî sako û qapût derketîyî derva! Hela hela, hela hela! Bavê mino, ma wisa dibe? Di vê sar û sermayê da, di vê hişkayîyê da îcar dibe ku meriv wekî te bike, hi!? Bê pel û pot û derva!? Na, wele. Wele, ez jî qet nizanim ku ka tu dawa çi dikî û ji min rebenê çi dixwazî? Wax, wax, wax ku wax!... Ne difikire, ne dibêje teze ji nav cî û nîvînan derketime, ne jî haya wî ji nexweşîya wî heye. Ma wisa jî dibe? Dibe gelo!?

Ji alîyekî va li dorhêla xwe mêze kir û ji alîyekî va jî axaftina xwe domand. Belê, axaftina xwe domand û got:

- Ne ku ez dibêjim, leheng. Ê de gotin gotina bav û kalan e, heyran. Gotin jî gotineke çi xweş, çi xweş! Yê neke bi ya mezinan wê lê werin şaxên bizinan: Yê negot û kir, şêr e. Yê got û kir, mêr e. Yê got û nekir jî ez nabêjim, lê ji xwe ra tu bibêje...

Kenîya, bi wê ra Navdar jî kenîya û derbasê hundir bûn. Di derbasbûnê da Kilê, dît sobe bi tîna xwe û hundir jî germ e.

Li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Mala te lehengî ava. Dibînim te vêxistina sobê jî li ser min nehiştiye û bi xwe tîjî kiriye û dadaye. Hundir germ e û ez jî ji vê xizmeta te razî û kêfxweş im…

Piştî van gotinan jî rahişt nivînên qatkirî û xwast rabike û bibe. Navdarê leheng, rê neda û nehîşt. Bi rêz û rêzdarî axifî û got:

- Ji kerema xwe ka xwe wiha bide alîyekî, ez dixwazim rakim

û bibim!

Kilê, bersiv da û got:

- Ê de baş e. Her hebî.

Navdarê leheng, ji jina çê pir û pir şîret girtibû. Ji ber wê yekê jî nedixwast hema wiha çavên xwe bigire, li peyvan biqelibe û rê bide xeta û xeletîyan.

Ê de biryar jî biryar bû û dixwast îro xatirê xwe ji wê bixwaze û di pey ra jî berê xwe bide Kêranlixê û bibe rêwî. Na, hê negotibû. Negotibû, lê piştê taştê dixwast bibêje. Pirs? Pirs jî çawa û bi çi şiklî? Ne havîn û bihar bû û te bi kêfa dilê xwe berê xwe bida wî gundî û biçûya. Rê jî xerîb bû û bi xwe jî. Pirs ne tenê ev bû jî. Pirsa duyem ji vê pirsê jî girantir bû: “Dayê, di vê berf û baranê da ez dixwazim berê xwe bidim mala Apê Silêman û îro bi rê bikevim. Gelo ka tu qet çi difikirî û dibêjî çi!?” Eha, em ê bibêjin ku Kilê got, na! Îcar wî yê çi bigota? Dema ku wê li te ferz kir û got; na, tu ferîşteh bî jî tu nikarî pêsîra xwe ji destê wê bigirî û xilas bikî. Ya herî baş ew e ku meriv ji xwe ra rûne û dengê xwe bibire. Ji vê pirsê ra, bersiv? Bersiv jî mabû li ser text û bext. Hewl dabû, piştî rakirina textê taştê gotina xwe bike û jê destûra rêwîtîyê bixwaze. Rê û rêgeh û çûyîn jî dîsa bi serê xwe pirs û pirsgirêk bûn. Heke biçûya jî ne peyatî, lê siwarî dida rê û diçû. Gelo hesp an jî, hespan dikarî bi rehetî rê bigirta? Tevdîr û tedarîk, rê û rêwîtî û hwd... Xerîbê rîya Kêranlixê bû û rê jî ne hindik rê bû, bi texmînî dora panzdeh kîlometreyan bû. Û belkî jî zêde û zêdetir. Erê, ji Dîynugê berê xwe dabû vî alîyê û hatibûn, di hatinê da jî ku nexweş nebûya bala xwe dida rê, lê? Niha jî li ber tîna sobê pal dabû û pê ra jî serê xwe kiribû nav her du destên xwe û xwe bi xwe bû.

Bi dengê Kilê ra ji cîyê xwe qilda û rabû ser xwe. Ew rabû û Kilê jî axifî û got:

- Na, qurban! Na, ranebe û ji xwe ra bi rehetîya xwe be.

Textê xwarinê danî û di pey ra jî li ber çok da. Dû ra jî li lehengê tevlihev vegerîya û got:

- De fermo, leheng! Fermo, di pêş da were û em ê bi hev ra taştê bikin. Min got taştê, lêbelê ez ê bibêjim xurînî... Ê de fermo.

Piştî xwarinê Navdarê leheng, para va kişîya û pê ra jî got:

- Min kêm kir û bila Xwedê zêde bike. Spas û mala te rêzdarê ava...

Dem e, tê û dibihure. Êdî dixwast jê ra bibêje, lê dudilî bû. Xwe komê serh hev kir û yekem got:

- Dayê!...

Kilê, bersiv da û got:

- Fermo, guhdar im. Ka dîsa tu dixwazî çi bibêjî? Tu dixwazî ji me ra kilama Dewrêşê Evdî bistrêyî yan, tu dixwazî li ser Kela Dimdimê gotinê bikî û biaxifî?

Navdarê leheng, kenîya û got:

- Na, ne ew ne jî ew. Rastî ev e ku dilê min bi tirs e. Axaftin? Axaftinên min jî divê ku ne bi ya dilê te be. Heger destûra te hebe dixwazim îro xatirê xwe ji te bixwazim û berê xwe bidim Kêranlixê. Yê min ji te dayîkê tîka ye.

Zêde dirêj nekir û pê ra jî xwe da bêdengîyê. Kilê? Kilê, qet bawer nedikir ku di vê rojê da, di roja qîyametê da ew ê rabe û bibêje ez êdî rêwî me û dixwazim bi rê bikevim. Li gor Kilê gotinên wî gotinên bêwext û nedibû wî wisa hewl bida û wisa jî bigota, lê? Ê de wê bi xwe jî nedikarî bigota ‘erê’ û ‘na.’ Ji ber ku ne carekê, lê pir caran jê ra gotibû, dem ne dema çûyînê ye û bimîne…

Xwe da bêdengîyê û di dilê xwe da jî wê, wiha got:

- Kuro, lawo! Ka îcar ez ê ji te ra çi bibêjim, hi!? Çi bibêjim ku dilê te evdalî ji min nemîne. Helbet, dizanim. Dizanim, gotina xweş bihara dilan e, lê dil û di rewşeke wisa xirab da çûyîna te qebûl bike? Yê te jî dil e û yê min jî. Yê min ne carekê, lê pir û



www.arsivakurdi.org

pir caran dax bûye û jan dide. Yê min jan daye, lê bila yê we egîdan, yê we xortên li ber mirad jan nede. Hêrs bûm, min berê xwe da te û şîret li te kir. Bi peyvan min berê xwe dabû te û te pê xaşandibû. Na, êdî naxwazim te bi gotinên xwe biêşînim. Naxwazim bibêjim, tu dîn bûyî û te aqilê xwe bi nan û penîr xwarîye. Na, nikarim bibêjim. Nikarim…

Erê, di dilê xwe da wê wiha got, lê nedibû bi dengî bersiva wî nede. Ji ber ku jê destûr hatibû xwastin. Ber bi wî serê xwe rakir û bi xemgînî got:

- Belê, leheng! Ma ez ê çî bibêjim, heyran! Te biryara xwe daye û bilêta xwe birîye. Tu çiya ez çiya û golik ma bêgîya... Ji min ra çi maye û ez ê çi bibijim? Ne fahm ne hedûr e. Nikarim xwe bidim ber pozê te û rê li ber te bigrim. Sê gidî hene li vê dine; ew ê bin hukmê jinê, ewê li hevrazîya dikişînê titûnê û ewê ku diçe rîyek bi tenê...

Nexwast zêde biaxife. Dengê xwe birî, rabû û bi xemgînî ji mêvanxanê derket. Derket û di mebestê da jî dixwast jê ra hevalekî bibîne û peyda bike. Kilê bi xwe jî dizanî ku Navdarê leheng, bê heval nikare berê xwe bide Kêranlixê û here. Ji alîyekî va berê xwe dabû nav gund û ji alîyakî va jî xwe bi xwe diaxifî û digot, ka îcar kî heye û ez ê ji xwe ra berê xwe bidim kî û ji kî ra bibêjim.

Gavên wê berê wê dabûn mala Hesen, Hesenê Hesenî. Di vî gundî da ka îca kî hebû ku wê yê berê xwe bida? Na, nebû. Tenê kal hebûn û kal jî êdî li ber rehma Xwedê bûn. Yek Hesen hebû. Gelo ka îcar wî dikarî bida pêş û Navdarê leheng bi xwe ra bibira?

Hesen, li berderî bû. Dema ku çavê wî li amojina wî ket rabû û got:

- Wey, amojina min hatiye! Tu ser seran û ser çavan ra hatiyî, amojine. De fermo, derbas be.

Ew bi axaftin bûn û di wê navbeynê da dayîka Hesen, ji derî va xuya kir û hat. Ber bi Kilê gavek avêt û got:

- Tu bixêr hatî. Ê de li ser lingan nemîne û derbasê hundir bibe, dayê.

Kilê, bersiv da û got:

- Bûkê, mala te ava be. Qet dema min nîne ku ez derbasê hundir bibim. Li mal mêvan û ez jî li vir im. Mêvanê min dixwaze sibê bibe rewî û biçe, Kêranlixê. Min pir got nere, lê? Biryar daye û ew ê biçe. Diçe, lê bi serê xwe jî ne bawerim ew ê bikare. Xerîb e û rê nizane. Eha, ji ber vê yekê hatim û dixwazim bila Hesenê min, kincê xwe li xwe bike, ser û guhên xwe germ girê bide û bi hazirîya rêwîtîyê jî sibê di wextê da berê xwe bide amojina xwe û were. Kambax be, li vî gundi kavil bilî Hesenê min jî wekî din kesekî nîne ku berê xwe bidim û jê ra bibêjim…

Dayîka Hesen, ji jinan jineka reben û belengaz bû. Ka îcar wê dikarî ji Kilê ra çi bigota? Ne 'erê' bersiv bû û ne jî 'na'. Ji ber xwe va axifî û got:

- Îcar Hesenê min dikare mêvanê te heta Keranlixê bibe û vegere? Hesen, Hesen!...

Piştî van gotinên xwe? Piştî van gotinan jî ji Kilê pirsî û got:

- Eha, ez ê bibêjim da pêş wî û bir! Mêvan pê ra ye û ne xem e, lê îcar veger!? Di vê berf û baran, sar û sermayê da îcar Hesenê min dikare bi tena serê xwe vegere? Ez qurbana wî serî bav keçel û dê gurî!?

Kilê û dilê wê nexwîne? Pirsa wê bersivand û wiha got:

- Belê, ez dê wê pisgirêkê jî çareser bikim û di vî warî da bila qet tu şik û fikara te jê nebe, bûkê. Ez ê hem mêvanê xwe temî bikim hem jî ez ê Hesenê xwe. Apê Silêman û Hesenê min bi tena serê xwe bişîne? Na. Na, di vî warî da ne tu xemgîn bibe ne jî meraq bike. Ez jî dizanim ku Hesenê min di vegerê da nikare bi tena serê xwe were. Ê de niha bi xatirê te û mêvanê min

di mal da bi serê xwe ye…

Gavek avêt û pê ra jî vegerîya û got:

- Bûkê! Heke Xwedê bibêje erê, rêwîtî sibê ye…

* * *

*Tirsonek gelekî caran dimrin berî mirinê,*
*wêrek carekê tam dikin ji mirinê…*

Dotira rojê bû, roja rêwîtîyê. Şewqa rojê dabû Çiyayê Zirangê û ji dûr va çîlspî dibiriqand û diçirûsî. Ezman çîksayî û hewa sar bû.

Navdarê leheng, wek her gavê dîsa di eynî wextê da şîyar bibû û niha jî li benda hevalê xwe bû, hevalê rê. Pir derbas nebû ew jî hat. Kilê? Kilê, zû va rabibû. Erê, rabibû û di rabûnê da jî derbasê mêvanxanê nebibû, lê berê xwe dabû tewleyê... Çima? Ji ber ku roj roja rêwîtîyê û mêvanê wî diçû. Rêwîtî ye û nabe tu hespan amade nekî. Ji bo hespan jî pêwistî bi zîn û binzîn, gem hevsar û hwd hebû. Piştî demekê jî hat û derbasê mêvanxanê bû.

Silav da mêvanê xwe, xêrhatin li Hesenê xwe kir û ji bo xurînîyê jî carekê din derbasê alîyê malê bû. Hundir germ bû. Werhasil, dem e û dem jî bi xwarin û vexwarin û di axaftinan da derbas bibû.

Kilê, li mêvanê xwe vegerîya û got:

- Fermo, leheng. De rabe! Rabe, dem hatiye û tu jî êdî rêwîyê rîya dûr î!...

Piştî vê gotinê jî, ji pişt derî qapûtêk ji qapûtên Xalid Begê mêrê xwe hilda û da Navdar.

Da, pê ra jî axifî û got:

- Ka de tu yê vê qapûtê han bigire û li xwe bike! Li xwe bike, ji ber ku rîya te dûr e û serda jî hişkayî ye. Naxwazim tu yê ca-

rekê din xwe bicemidînî û pê nexweş bikevî. Ax, lê de ka îcar çi ji destên min tê?

Li goşê mêvanxanê sandiqek hebû. Berê xwe da wê sandiqê, vekir û jê du cot lepikên tiftik derxistin. Lepik, ji bo van her du rêwîyan bûn. Berîya ku derbasê mêvanxanê bibe jî li alîyê malê ji bo herduyan hem xurînî amade kiribû û hem jî ji bo rêwîtîyê, nan û toraq, qelî kiribû tûrikek rengîn û danîbû hewlîyê.

Çû ji hewlîyê anî, da Hesen û got:

- Hesenê min, tê da xwarin heye. Min ji bo rêwîtîyê amade kiriye û di rabûnê da tu yê ji bîr nekî, ha!

Dor hatibû modolîya bazinzer. Anî, da û got:

- Lehengo, lehengê delal! Xwedê bi te ra be û te lewendî pê şerpeze neke. Fermo, modolîya ku tu lê digerîyayî, te dixwast tu yî hildî û bidî rê...

Di destê xwe da cotek lepik û tizbîyek kehrîbar girtibû. Qederekê di destê xwe da bir û anî, lê nihêrî. Di pey ra jî ber bi Navdar girt û got:

- Navdar! Tizbîya ku min di destê xwe da girtiye, ya Xalid Begê malxuyê min e. Apê te û Xalid Begê Cibrî, dostên qedîm in. Ger te dît, di dîtinê da tu yê jê ra hem silavên min bibêjî hem jî li gel silavan tu yê vê tizbîyê bidîyê...

Bi hev ra derketin derva û yekem ji tewlê hespê xwe kişandin, bi zîn û hevsar kirin û dû ra? Dû ra jî Navdarê leheng, ber bi wê gavek du ga avêt. Hem xwar bû û çû destan, hem jî axifî û got:

- Li ber min pir û pir xizmeta te heye. Li ber serê min nexweşî hêsirên çavên te dayîkê hene. Li ber serê min xemgînî, hezkirin û dilşewatîya te canikê heye. Ji destê te dayîkê, min nan û av xwar û vexwar. Û herwiha, di xêrê da min duayên te dayîkê jî wergirt. Dem e, hatiye û ji te xatirê xwe dixwazim. Çi xeta û qisûrek min hebûye dibêjim tu yê min bibexşînî û heqê xwe jî li

min helal bikî. Dixwazim biaxifim, lê? Qismet û nesîb e, nayê zanîn. Piştî vî şerî, şerê xwînî ku Xwedê lê bîne û bibêje erê, berê xwe didim Şêrwanşêxê û carekê din têm û dibim mêvanê dayîka xwe. Belê, rêwîti ye û dibêjim de bi xatirê te. Heqe xwe li min helal bike û bila duayên te bi me ra be...

Bi wê dilşewatî û esaleta xwe jina çê Kilê, axifî. Li Navdarê leheng vegerand û got:

- Dibêjim wekîlê silavan û oxira xêrê. Helbet, çûyîn nîne bi vegera xwe nebe. Here bi bextê xwe here. Here û bi xêr û xweşî vegere. Bila bextê te bi te ra be. Roj in, tên û derbas dibin. Êş jî derbas dibin, qal û qir jî. Tu tiştek nîne ku her wekî xwe bimîne. Mal mala te ye, berxê min. Te çi wextê xwastiye tu dikarî berê xwe bidî mala xwe û werî. Bi hêvîya wan rojên xweş û gêş. Dilê me dayîkan pir û pir êş girtiye û em dixwazin bila êdî dawî lê were. Ê de baş e, ji we herduyan ra oxira xêrê û rîya we vekirî be. Li hespên xwe siwar bibin û dereng nemînin. Bi xêr û xweşî biçin. Bi xêr û xweşî…

Dû ra ber bi Hesen çû û got:

- Bavê mino, ji te ra jî oxira xêrê. Di vegerê da? Di vegerê da jî ji te berxê min ra tu astengî çênabe û di vî warî da bila dilê te evdalî rehet be. Ji Apê Silêman û Asya Xanimê ra silavên min bibêjin. Ha! Ji Apê Silêman ra jî bibêjin, di vegera Hesenê min da bila wî bi peyayekî ra bike rêwî û bi wî awayî bişîne…

Belê, ji wî ra jî wer got û di pey ra jî hembêz kir û maç kir. Di axaftina xwe ya herî dawîyê da jî Kilê, dîsa bi dilekî xemgîn bû. Çavên xwe paqij kirin, pê ra jî axifî û got:

- Ez bi qurbana canê we, riwîyan! De li hespên xwe siwar bibin û bi rê bikevin. Ji we ra oxira xêrê û rîya we vekirî be…

Carekê din li Navadarê leheng vegerîya û got:

- Leheng! Tu yê tu car ji bîrnekî ku tirsonek gelekî caran dim-



www.arsivakurdi.org

rin berî mirinê û wêrek jî carekê tahm dikin ji mirinê. Çê be çê bixebite, mêr be mêr bisekine…

Rêwîtî bû. Li hespên xwe siwar bûn û di pey ra jî berê xwe dan Kêranlixê, gundê Silêmanê Ehmed. Qehremanek ji qehremanên vî welatî berê xwe dabû mala giregirekî kurd û diçû. Ew, mêrxasek ji mêrxasên roja oxirmê giran bû. Di vê berf û baranê da hespên wan ne bi lez, lê bi çûyîneke avarte bûn. Ew ji ber çavan dûr ketin û wenda bûn, li pey wan jî bi xemginîya xwe ji jinan jineka çê û birûmet ma. Li Şêrwanşêxê, dilê wê bi hewar û gazî bû. Li Şêrwanşêxê, çavên wê di hêsiran da dagirtî û dilê wê bi kul û keser bû. Li derva bû û nedixwast derbasî hundir bibe. Kes nîne bi navê xwe nebe, yê her kesî navek heye. Helbet, yê wê jî navek wê hebû. Lê kesî wê bi navê wê yê rasteqîn neanî ziman û bang li wê nekir. Her kesî jê ra got 'Kilê...' Kilê, bi wê navê xwe yê rasteqîn jî 'Kewê' bû. Belê, Kewê...

* * *

*Dengê xwe neke, nelive*
*nere-neyê, mêzê neke*
*ka bihar e an ne bihar*
*nebêje*
*ji dûr va dengê mirinê tê*
*mirin e, bavê xwe nas nake*
*mirin reng bi reng e*
*tenê şîn û girî yek e*

Hesp jî wekî siwarên xwe ji Şêrwanşêxê derketibûn rê. Rêwîtî ye, lê de rêwîtîyek wisa jî bila serê xwe bixwe. Di vê berf û baranê da tu rabe bi hespan bide rê û here. Na, ne îşê aqilan, lê



www.arsivakurdi.org

îşê Navdarê Kurd bû. Qey Kilê lava nekiribû. Îcar jê ra hindik gotibû, ‘nere lawo, nere!?’ Ba û bahozê ne rê hîştibû ne jî newal û neqebek. Rê û dirb girtî, kaş û kendal di bin berfê da wenda û yê ku niha dabû pêş û diçû jî Hesen bû, Hesenê Hesenî. Diçûn, lê carê carekê jî ji rê û rêçê dipekîyan, cardin dihatin ser rêça berê, car din û car din... Te ku karîye ê de tu yê were ji xwe ra bi rehetî rê bigire û here. Di vê rêwîtîyê da ne carekê, le sê çar car hespên wan li şepeyên devê rê qelîbîn û tê da çûn xwarê. Ji şepeyek xilas bibûn û vê carê Navdarê leheng derbasê pêş bû. Di zengûyê da pahnî li hespê xwe xist û xwast çûyîna wî sererast bike, lê hesp û here? Tewişî û nekarî. Ne hindik, lê epey rê hatibûn. Ji vê mij û dûmanê te nedikarî pêşîya xwe bidîta.

Navdarê leheng, li hevalê xwe vegerîya û got:

- Hesen, xwezîka niha gundekî li me xuya bikra û me berê xwe bida wir û bêhnek bida xwe. Lo, de ji vê mij û dûmanê jî ne gund xuya dikin ne jî rê...

Hesenê Hesenî, bersiva wî da û got:

- Apo, ê de ka ez ê çi bibêjim. Em ji Mele Mistefa, Kuştîyan û ji ber Hesê ra derbas bûn. Kevirreş, Qicik, Nordin gişkî li pişt me man û ger ku te xwastîye em dikarin li Mêrge Xanimê bêhnek bidin xwe. Em ê herin mala Apê Qulî û Apê Qulî jî ne xerîb e...

Navdar, bersiva wî da û got:

- Baş e, Hesen. Em ê wisa bikin. Em ê herin mala apê te Qulî. Ez nas nakim, lê tu nas dikî.

Havîn bûya ne hewceyê rawestinê bû. Bihar û payîz bûya, dîsa ne hewce bû ku te ji yekî rêgeh pirs bikira, lê mîrat be zivistan bû û zivistan jî zivistana Serheda xopan... Rê û rêgeh ji Hesenê Hesenî ra ne xerîb bûn. Berîya vî şerê gemar, Hesen bi bavê xwe ra pir caran hatibû van gundan. Bavê wî bezirganî dikir, birê kavir û hogeçan dikirî û difrot. Ê de zivistan bû, ne karê

her mêrxasî bû ku di rojekê wiha da derkeve rê û di derekê da biçe. Di çûyîneke wisa da hespê Navdar, ji rê derket, şemitî û teqlomeqlo çû. Ew li alîyekî ma û hesp jî li alîyekî. Ew ji cîyê xwe rabû. Ew rabû, lê hesp? Na. Di rabûnê da jî dest avêt gem û hevsarê, kişand û kişand. Hespê wî jî cad kir û wî jî. Lê, nebû. Ser û cendek ji hev dûr ketibûn. Mirin ji wî rewşê çêtir bû. Anî bir, kir û nekir hesp ranebû. Li ser kêlekê ketibû û diperpitî.

Navdar, zîn danî û li Hesen vegerîya û jê ra wiha got:

- Hesencan, tu bide rê û li pey xwe jî hespê xwe bikişîne. Tu here, lê ez ê gavek şûnda xwe bigihînim te...

Xortê delal Hesen ji wî dûr bû şûnda wî rahişt çaplîya xwe. Belê, rahişt çaplîyê, gule ajot ber xizneyê û di pey ra jî ber bi serê hespî va girt û pêli tetikê kir. Bi wê teqînê va xwîn pijiqî. Teyr û tilûrên ku tekotûk mabûn bi teqîna sîleh va per vekirin û firîyan.

Ji ber zinarê devê rê du kevroşkên zikbelek xuya kirin, revîyan û ji ber çav dûr bûn. Hilmek germ bi ser berfê ra girtibû û radibû. Navdar ji cîyê xwe rabû û di pey ra jî da du Hesen û meşîya. Piştî demekê jî derbasê wî gundî bûn, gundê ku behsa wê kiribûn. Qederekê lê man û rawestîyan. Di rabûnê da jî hespê Hesen, teslîmê mala apê Qulî kirin û li wir hiştin. Di vegerê da Hesen dê bi xwe ra bigirta û bibira.

Ji Hesen ra jî wiha gotibû:

- Hesen! Ez bi heyrana te me, Hesen! Di vegerê da tu yê hespê apê Xalid ji bîr nekî û bi xwe ra bibî. Bibe, lê dema ku te teslîmê Kilê kir û da jî tu yê qala hespê din nekî. Di qismetê da ku vegera min hebe ez ê jê ra qal bikim û bibêjim. Temam, Hesen! Tu nebêjî, lê ez ê wê bibêjim. Bila hespê te jî vê gavê li mala Apê te yê Qulî be û di vegerê da bi xwe ra digirî û dibî.

Li gor gotina xwedîyê malê Apê Qulî, Kêranlix ne dûr û bi pe-

yatî nîv demjimêr yan hebû yan nebû. Xatirê xwe ji mazûvan xwastin û di pey ra jî rabûn.

Rê ye, ku biçî diqede. Nêzikê gund bibûn. Bi hatina her du rêwîyan ewtîn bi kûçikan ketibû. Navdarê leheng û havalê xwe derbasî gund bûn û berê xwe dan qonaxek. Qonax? Qonax jî qonaxa Silêmanê Ehmed, bavê Ferzende bû.

www.arsivakurdi.org

# V

*Ka mîrek û xan û xwedan*
*Ka çadir û konê vedan*
*Zozanê Kardox û Medan*
*Ka padîşahê Serhedan*
**Ehmedê Xanî**

Di destê wê da teşî derîyê pêş vekir, ber bi hewlîyê gavek du gav avet û di pey ra jî li dorhêla xwe mêze kir. Di wê mêzekirinê da dît, du rêwîyan berê xwe dane qonaxê û pêda pêda tên. Di wê gavê da ji pişt diwarê xanî du kûçikên reş xuya bûn, reyan û di pey ra jî berê xwe dan wan her du xerîban.

Jina maqul bi hêrs qêrîya ser kûçikan û got:

- Hoşt kûçikno, hoooşt!… Ê de hela tu were li min û van kelpan mêze bike, ha! Bila ji evdan evdekî Xwedê berê xwe nede vê malê û neyê, hema bi carekê diewtin û xwe lê digrin...

Ji alîyekî va ber bi xerîban bi lez çû û ji alîyekî va jî deng li kûçikan kir, lê bi hêrs û qîrîn... Belê, deng lê kir û got:

- Qero û Qolo! Niha min ji we ra çi got, hi! Ne min got, vegerin! Vegerin û zêde acizîyê nedin! Kûç, kûç, kûç...

Li ser banga wê canikê ji wan her du kûçikan yek vegerîya û di vegerê da jî hat li ber wê sekinî, boça xwe rakir ser pişta xwe û li wirê jî rasto-çepo hejand. Dît, kûçikê din hîn direye û dilezîne, îcar jî xwarê erdê bû, ji berfê gogek çêkir û ber bi wî kelbî va avêt. Her du rêwî hatin û di pey ra jî nêzikê wê bûn.

Navdarê leheng, bi coş û kelecan silava Xwedê da û got:

- Ev dem û hemû demên te xweş û êvara te bi xêr be, dayê…

Di pêşwazîyê da jina çê, silava wî wergirt û di pey ra jî bi esa-

letek bilind lê vegerand. Belê, lê vegerand û yekem got:

- Xêr silameeet, bavê mino! Xêr silamet û hûn her du jî bi xêr hatine, ser seran û ser çavan ra…

Ê de bila di wê gavê da çavên Hesenê Hesenî li amojinê bikeve, lê bila bi coş û kelecan berê xwe nede wê û neçe, dibe? Na. Diçe, lê hem jî bi lez û bez, bi kêfxweşî berê xwe dide wê û diçe. Di çûyînê da jî Hesenê Hesenî, xwar bû çû destê wê, maç kir û di pey ra jî da ser enîya xwe. Em ê werin ser babeta jina çê? Jina çê li kê derê dibe bila bibe hem bi dilekî baristanî û hem jî çê ye.

Ji alîyekî va wê destê xwe da ser milê Hesene Hesenî, pê şa bû ji alîyekî va jî axifî û got:

- Temen dirêj be, berxê mino. Xwedê te bihêle, lawo. Tu yê tu car derd û êş nebînî, bav û bira. Tu her û her bijî, delalê min. Her û her!...

Helbet bi van gotinên xwe jî nema, hem Hesenê xwe guvaşt û hem jî maç kir. Dû ra? Dû ra jî li mêvanê xwe yê din vegerîya û wek çawa meriv bi tam û temamî silavê nedabe û di nivî da hîştibe, bi wî awayî axifî. Ji dil û can gotinên xwe kir û got:

- Mêvano, mêvanê ezîz! Dubare tu ser seran û ser çavan ra hatiyî. Ê de fermo, heyran! Fermo, li ser pîyan nemîne û derbasê qonaxê bibe. Sar e û ewqas daweşandin jî bes e. Ê de derbas bibe û derbas bibe. Ma îcar ne bes e?

Li hewşê bûn û Navdarê leheng, dixwast qapûtê xwe ji pûkê, pûka berfê daweşîne û bi wî awayî derbasî qonaxê bibe. Ji ber deng û qisedanên derva derî vebû û ji derî va camêrekî di bejnê da bilind xuya kir. Camêr jî, camêrekî wek tayê rihanê zirav, bi şal û şapik, li serî kolos û bi simbêlek dirêj û badayî bû.

Li xanima xaraw vegerîya, bi dengekî xas û muxlîs axifî û got:

- Asya Xanim, ka çima tu rê nadî mêvanan? Rê bide, bila di

vê sar û sermayê da zêde li ser pîyan nemînin û ji xwe ra derbasê hundir bibin, ezbenî.

Camêrê bi ezamet, li ser şêmûgê û bi meraqên çavan bû. Ji alîyekî va simbêlê xwe ediland, ji alîyekî va jî axiftina xwe domand û wiha got:

- Wisa xuya dike mêvanên ezîz ji rîyek dûr û dirêj berê xwe dane me û hatine. Hatine, lê ser seran û ser çavan ra hatine. Xanim, ê de hela xwe wiha bide alîyekî û rê bide, heyran. Rê bide bila ji xwe ra derbas bibin.

Dêmeg, jina çê bi wî navê xwe, Asya Xanim bû. Xanima xaraw, lê vegerand, bi dengekî zelal û vekirî axifî û got:

- Lo! Ji bona Xwedê ka hela bibêje min tu dawa çi dikî? Ê de wisa jî nabe, ha! Ma tu nabînî? Min ne carekê, lê min dubare kir û li ser hev got: Bavê mino! Ê de li ser pîyan nemîne û ji xwe ra derbas bibe. Derbas bibe û derbas bibe, lê!? Erê, min got. Got, lê de wisa xuya dike ku gotinên min mehrûmê pere nekirîne. Ez jî dizanim ku sir û serma ye, berf û baran e. Ez jî dizanim ku hewa sar û ji rîyek dûr hatine. Ê de camêr jî camêr e, her bi ya xwe ye û guh nade merîyan. Eha, way min ya xwe got û çû! Dor dora te ye û tu bibêje, Silêman Beg. Tu bibêje...

Dêmeg, camêrê bi ezamet jî bilî Silêman Beg, Silêmanê Ehmed ne kesekî din bû. Ê de Apê Silêman jî ku ev camêrê delal bi xwe be, îcar meriv berê xwe nade wî û nare destên wî? Çawa, helbet tere. Yekem Navdarê leheng û di pey ra jî Hesenê Hesenî xwar bûn û bi rêz û rêzdarî çûn destên wî.

Apê Silêman, li ser pîyan xêrhatina xwe dubare kir û bi kurtî got:

- Hûn bi xêr hatine, ser seran û ser çavan ra. Ser çavan ra, ezîzên min...

Ne mêvan derbasê hundir bibûn ne jî wê hişmendê dawî li axaftinên xwe anîbû. Çawa neaxife û çawa nebêje!?

www.arsivakurdi.org

Bi zarekî xweşik axifî û got:

- Hesenê min, hê tifilek ji tifilan û odaxek yanzde-duwanzdeh salî ye. Ew li ber fêrbûnê ye û divê hê gelek û gelekî tiştan ji min û te û wî hîn bibe. Ez nizanim ka çima mêvanê din ewqas bi rik e? Bavê mino, bi pûka berfê ne hewlî diherime ne jî xanî. Silêman Beg jî, hema wiha bîlasebeb berê xwe dide merîyan û gotinê dike. Ax, de çi zanim ew jî wer dixwaze. Dixwaze pel û potên xwe ji pûkê daweşîne û bi pîr û pakî derbasê mêvanxanê bibe.

Ma îcar wê yê çi bigota? Têkilî ye û meriv diaxife, gotinê dike û dibêje. Di encamê da ewqas axaftin ku bête kirin îcar meriv li derva û li ser pîyan dimîne? Na, namîne û derbas dibe. Derbasê hundir bûn. Ji rîyek dûr hatibûn û di ser da jî di sir û sermayê da mabûn. Hundir germ û li ber sobê ji xaniman xanimeka bedew, rûniştibû.

Bi hatina mêvanan ji cîyê xwe rabû, pê ra jî axifî û got:

- Mêvano, mêvanên ezîz! Hûn bi xêr hatine û ser çavan ra. Sar û serma ye û ê de fermo. Fermo, li ber sobê cîyê xwe bigirin û rûnin, heta ku min ji we ra balîf û doşeg anîye.

Asya Xanim, bi mêvanan ra derbasê odê bibû, oda mêvanan. Li wê dîlberê vegerîya û got:

- Besra! Dayîka min Besra, hê ku xezûrê te nehatiye, ji kerema xwe ra berê xwe bide alîyê malê û ji mêvanên ezîz ra doşek û balgîyan bîne. De min bi qurban, parikî bi lez…

Besra Xanim ji mêvanxanê derket û pê ra jî xwe li alîyê malê va girt û çû. Çû, lê pir derbas nebû jî bi qata doşek û lihêfan va derket û hat. Apê Silêman, berîya ku ew were derbasê mêvanxanê bibû û hê li ser pîyan bû. Doşek û lihêfên ku wê bi xwe ra anîbû, jê girt û li ser kulavên xoresanî danî û raxist. Pişt ra? Pişt ra jî li mêvanê xwe vegerîya û got:

- Fermo, de derbas be. Derbasê ser doşegê bibe, tu ji rîyek

dûr hatiyî û westîyayî. Fermo, ezîzê min! Fermo…

Besra û xwesûya xwe bi hatina Silêman Beg, ji mêvanxanê derketin û derbasê alîyê malê bûn. Besra Xanim, bûka Asya Xanimê û hevpara Ferzende beg bû. Di rojekê wiha da Ferzende beg û li mal be!? Na, ne li mal bû. Di zû da rahîştibû çek û sîleh, bi mêr û mêrxasên êla xwe va berê xwe dabû qada şer û li sengeran bû.

Ka îcar kê berê xwe nedabû qada şer ku ew jî nede; xortên Qerecanîyan, Malbatîyan, Seyîdan, Batkan, Şêxkîyan, Tirokeyîyan û hwd. Eha, apê Silêman? Apê Silêman bi xwe jî çûbû. Çûbû lê ji ber hinek sedeman jî berê xwe dabû mal, vegerîyabû û hatibû. Ê de apê Silêman jî, apê Silêman bû. Ger ku lingek wî li sengeran bûya yeka wî jî di nav êl û eşîrê da û li vî gundî bû. Erê, niha li mal bû. Li mal bû, lê ev jî nedihat wê wateyê ku carekê din xwe li enîya şer nagire û naçe.

Cî girt û rûnişt şûnda li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Birazî! Tu hatî, lê tu ser seran û ser çavan ra hatî. Tu bi Xwedê dikî ku tu yê bi rehetîya xwe bî û rehet rûnî...

Di wê navbeynê da Asya Xanim derbasê mêvanxanê bû. Ew derbas bû û Silêman Beg jî axifî.

Belê, bi dengekî zelal û vekirî axifî û got:

- Xanim, mêvanên me niha birçî ne. Ger şîva te hazir e bîne, em ê sifrê daynin û camêr bila ji xwe ra şîva xwe bixwin.

Gotinên xwe kir û pê re jî nêzikê sobê bû. Asya Xanim, ji jinan jineka çê, maqul, bi ewqasî jî bi esalet û giranîya xwe bû.

Bi wê hişmendîya xwe li Silêman Begê malxuyê xwe vegerîya û wiha got:

- Ê de di qismetê da çi ku hebe meriv wê dixwe, Silêman. Min feqîra Xwedê ku bizanîya mêvan tên, min xwarinek din lê zêde dikir û dida ber, lê! Jixwe berîya ku mêvan derkevin û werin min

şîva xwe hazir kiribû. Ger tu ji min bipirsî ez dibêjim em ê ecele nekin, bila hinek bêhna xwe bigirin û dû ra jî şiv... Ez wisa difikirim, lê de ji xwe ra ew dizanin. Wan çawa xwastîye bila wek wan be.

Asya Xanim, ji êla Sîpkan û qîza hecî Ûsiv Paşayê Sipkî bû. Jin bû, lê çi jin. Ji maqulan maqul û ji bedewan jî bedewek bêqisûr... Her bi esalet û giranîya xwe bû, Asya Xanim. Di mêzekirinê da tiştê ku yekem bala merîyan dikişand lixwekirin û girêdana wê bû. Asya Xanim, bi fistanekê gulgulî û kofîka sere xwe bû. Di rengê zer û spî da piştekek bi reşî lêbû. Ji mêvanxanê derket û çû şûnda jî Silêman Beg, li mêvanê xwe vegerîya. Helbet, dema ku di malê da mêvanek hebe meriv bêdeng namîne û diaxife. Pirs ku hebe pirsan jê dike. Ku nebe jî di vir da wê da diaxife û heta gihîştt derekê. Ê erê, wey! Azîn ku çi bûye ew e.

Ber bi Navdarê leheng mêze kir, yekem jê pirsî û got:

- Êêê de ka hela bibêjê, birazî. Bibêje ka tu kî yî, ji kû têyî û di mebestê da dixwazî bi kû da biçî?

Simbêlê xwe di kefika destê xwe da ediland û carekê din hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftinê û got:

- Ê de ji azînê ye û divê yekem merîv ji mêvanê xwe navê wî bipirse. Ez ê jî wisa bikim. Birazî, navê te bi xêr?

Pirsî û pê ra jî kenîya. Bersiv? Bersiv jî mabû li ser mêvan. Mêvanê delal, bersiva apê Silêman da û got:

- Apo! Navê min Navdar e, Navdarê Kurd. Hevalê min? Hevalê min jî Hesenê Hesenî ye û ji Şêrwanşêxê ye. Xwedê jê razî be, ji min ra bû hevalê rê û em bi hev ra hatin.

Silêman Beg, giregirekî ji giregirên vî welatî bû. Mezinek ji mezinên êla Hesenan û begek jî ji begên Torinan... Ji camêran jî camêrekî esilzade bû, apê Silêman. Belê, serokeşîrê êla Hesenan û malbat jî malbatek malmezin. Dest ji simbêlê xwe berda û yekem got:

- Belê…

Dû ra? Dû ra jî axaftina xwe domand û got:

- Ser seran û ser çavan ra, Navdar. Nav jî navekî çiqas xweş û çiqas jî xweş e: Navdarê Kurd. Navdar! Tu bi vî navê xwe yê şirîn her û her bijî! Her û her…

Silêman Beg, li pey van gotinên xwe yên gewre îcar jî li Hesenê Hesenî vegerîya. Ji alîyekî va bi wî ra ket têkilîyê û ji alîyekî va jî jê pirsî û got:

- Hesenê min! Tu bi xêr hatî, bav û bira. Ka hela bibêje tu qet çawa yî, lo? Wek hewadîs li gundê we ka qet çi heye û çi?...

Jê pirsî, lê nexwast axaftina xwe dirêj bigire. Yê wî hema wiha ji peywendîyan pêwendîyek şexsî bû. Haya Silêman Beg û ji gund û bajaran nebe? Wî bi xwe jî baş û baş dizanî ku li gund û bajaran ka qet çi heye û çi nîne. Na! Silêman Beg, ne xerîbê rewşa welatê xwe bû. Ê de meraq bû û di meraqê da jî bi navê xwe ne Hesen, lê zêdetir mêvanê din hebû. Berîya ku ji Navdarê Kurd pirsên xwe bike, ji berîka xwe kîsê titûnê derxist û ji xwe ra cixareyekê pêça. Pêça şûnda jî kîsê titûnê ber bi Navdarê leheng va girt û got:

- Ê de fermo, birazî. Fermo, ku cixarekêşî, ji xwe ra cixareyekê bipêçe…

Navdar, bersiva apê Silêman da û got:

- Na, Apo! Gelekî spas û mala cenabê te ava, nakişînim.

Navdar û cixarê nekişîne! Dikişand, lêbelê li vir nedibû û nedihat hesabê wî. Li hemberê giregirekî û cixare kişandin? Na. Em ê werin, Apê Silêman. Apê Silêman, hê bi wê meraqa xwe bû. Cixareya ku di destê xwe da girtibû vêxist, jê mizek girt û dûyê wê di ser xwe da ber da. Pişt ra jî li mêvanê xwe vegerîya û got:

- Birazî, ê de pirs e. Ez ê carekê din vê pirsa xwe ji te camêrî

bikim. Kî yî, ji kû têyî û dixwazî bi kû va biçî?

Navdarê Kurd, ji rîyek dûr hatibû û zor jî betilîbû. Berîya ku bersiva pirsan bide di dilê xwe da axifî û xwe bi xwe wiha got:

- Apo, Apê Silêman! Ka îcar tu yê van pirsên xwe ji min belengazê Xwedê nekî nabe? Tu jî dibînî ku ji rêwitîyê hatime, rewşa min ne rewş û pir û pir jî qefilîme. Ji kerema xwe ra ka hela bisekine bila hema wiha parikî bêhn were ber pozê min û dû ra! Pirs in û pirs jî narevin. Ê de temam Apo, temam. Ez ê bersiva te camêrî bidim. Îcar qet dibe ez bersiva apê xwe nedim? Na! Helbet, pirs in û pirs jî bêbersiv nînin. Erê, herçiqas bersiva pirsan giranî bide merîyan jî pirs pirs in û bersiv jî bersiv...

Tu bibêje bila Xwedê bi xêr bike. Ji kûr va bêhnek da xwe û yekem got:

- Apocan!...

Di pey ra jî wî, lingek xwe ber bi xwe va kişand û bi wî awayî hat ser axaftina xwe ya berê. Belê, hat ser axaftinê û pêra jî got:

- Apo, berîya ku berê xwe bidim vî gundi û werim, li Şêrwanşêxê û di mala Apê Xalid da mêvan bûm. Bi alîkarîya Hesenê Hesenî jî îro min berê xwe da vî alîyê û hatim. Ger nebêjim qet nabe. Bi taybetî pir û pir silavên xanima Xalid Begê Hesenî ji cenabê te û amojina min ra hebû.

Apê Silêman, ji cixarê mizek girt û dûyê wê di ser simbêlê xwe da berda. Di pey ra jî xwe di nav axaftinê ra kir û got:

- Silavên Kewê ser seran û ser çavan ra. Xwedê jê razî be. Qet çawa ye? Hêvî dikim ku baş û rehet be...

Piştî gotinên apo carekê din hat ser axaftinê. Kuxîya û pê ra jî got:

- Apo! Ji ber nexweşîya xwe tam û temamî çar roj û nîvek di mala wê dayîkê da mam. Gor gotinên wê di nav cî û nivînan da

her bi zarîn û zivîna xwe bûme. Piştî çend rojan hatim ser hemdê xwe, lê ew jî di saya wê da. Ez deyndarê wê dayîkê me û çi bibêjim hindik e. Li ber min ked û xizmeta wê heye û ez nikarim ji bîr bikim. Hema êdî çi ku ji destê wê hatibe, negotiye na û kirîye. Na, nabe meriv qala camêr û canikên wisa neke û neyne ziman. Ez ê werim, dayîkên me kurdan. Dayîkên me kurdan hemû wek hev in, Apo. Dilê wan bi êş, çavên wan jî di hêsiran da dagirtî ye û ji rewşa wan ra û peyv? Na, nîne.

Heke dest û lingê merîyan hêdî hêdî germ bibin, beşera merîyan jî pêda pêda xweş dibe. Bi beşerek xweşik axaftina xwe domand û got:

- Apo! Wele, ez jî nizanim ka ez ê ji kû va dest pê bikim û çawa bibêjim. Wek hûn jî dizanin mesele hem kûr e, hem jî hûr... Ji Apê xwe ra bibêjim, li Çiyayê Qertewînê bi Kerem Begê Qolaxasî ra bûm. Mixabin em her du jî ji Alayîyê pekîyabûn û ji heval û hogirên xwe jî dûr ketibûn. Di vir da naxwazim pir kûr herim û di pey ra jî serê Apê xwe pê biêşînim. Lê dîsa jî qet nabe ku ez ê nebêjim. Li wî çiyayî, li Çiyayê Qertewînê Kerem Begê Qolaxasî, destana mêr û mêrxasîyê nivisî. Belê, destan... Ê de dibêjin dinya dor bi dor e, Apo. Madem dor bi dor e, roj ku hat dor tê gayê bore. Yên ku jîyana şênîyên vî welatî heram kiribûn, di dorê da bûn û dor jî hatibû wan. Mêrxasê ku li wan teresan hatibû xezebê û Çiyayê Qertewînê ji wan ra kiribû gor û gorîstan, bilî Kerem Begê Qolaxasî wekî din jî ne tu kesekî bû. Di encamê da, Apo? Di encamê da jî naxwazim axaftina xwe dirêj û dirêj bigirim û bikim wek çorosa Elîyê Evdal. Em du tayê bi tenê bûn û du jî martilîyên me û me li hember wan bêbavan bi serkeftî şer kir û di pey ra jî xatirê xwe ji wî çiyayê qedirzan xwast, ji ser Alyarê ra me berê xwe da Dîynugê û di mala Seydayê Mele Mistefayê Keverîyî da bêhnek da xwe û ji wir jî me berê xwe da

Şêrwanşêxê. Lê mixabin, Apo! Di roja oxirmê giran da Navdarê Kurd û nexweş bikeve!? Ez ê çi bikim ku nexweşîyê berê xwe da min û min ji Kerem Beg û mêrxasên din veqetand. Nehîşt bi wan ra berê xwe bidim qada şer û biçim. Eha, ev bûye çend roj ku ne haya min ji çiftexasê mêran Kerem Beg ne jî ji heval û hogirin din heye. Di nav cî û nîvînan da bûm û haya min ji çûyîna tu çekdarî nebû, pê xemgîn im. Belê, xemgîn im, lê pir û pir jî xemgîn! Piştî wê nexweşîyê êdî her çi ku bûye û qewimîye min ji wê dayîkê bihîzt, ji dayîka Şemsedîn û Nusredîn. Nizanim ka niha Kerem Beg li kû ye, çi dike û çawa ye. Na, haya min jê nîne û nizanim?

Navdarê Kurd, serpêhatîyên xwe bi Apê Silêman ra parva kiribû. Apê Silêman, bi guhdarîya xwe bû. Nexwastibû xwe di nav axaftinê ra bike û gotininê wî bibire. Jê pirsî bû û ger ku îcab kiriye carekê din jê dipirsî. Na! Jê nepirsî, lê tenê got:

- Belê, lehengo. Lehengê xemgîn, guhdar im…

Û derbas bû. Navdarê Kurd, di dilê xwe da kenîya û xwe bi xwe wiha got:

- Li Çiyayê Qertewînê û li cem Kerem Begê Qolaxasî egîdek ji egîdan û bi navê xwe jî ez, Navdarê Kurd bûm. Li Şêrwanşêxê? Li Şêrwanşêxê jî her bi wê zarîn û zîvîna xwe bûm. Bilêvkirina nas û dostan? Bilêvkirina wan jî ez; 'şervanê nexweş' bûm. Li vir, li Kêranlixê û di mala Apê Silêman da jî bilêvkirina wî;'lehengê xemgîn' im... Kî dizane ka li Gimgimê û li cem Mîrê Zirav, bi navê xwe êdî ez kî me?

Lehengê xemgîn, piştî 'belê'ya Apê Silêman carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Ji Apê xwe ra bibêjim, berîya ku Kerem Beg bi rê bikeve û biçe, li xanima Apê Xalid vedigere û jê ra wiha dibêje "Kilê! Ez vî lehengî nexweş, li jor babokê Xwedê û li jêr jî teslîmê te dikim. Dema ku baş bû û hat ser hemdê xwe tu yê berê wî bidî Kêran-

lixê û bişînî mala Apê Silêman. Îhtimal e û îhtimal jî nayên zanîn. Heke Ferzende Beg li gund û amade bûye bi hev ra bila berê xwe bidin Gimgimê û herin cem Xalid Begê Cibrî. Ferzende Beg û di roja oxirmê giran da li mal be? Na, tu îhtimalê nadim. Eha, wê çaxê jî bila Apê Silêman bi xwe biryarê bide. Bila biryarê bide, lê bila miheqeq û miheqeq bi yekî ra bike heval, berê wî bide Gimgimê.' Apo! A ji ber wê yekê jî min berê xwe da vir û ez hatim…

Axaftina xwe birî û bêdeng ma. Em ê werin, Apê Silêman? Apê Silêman, qederekê xwe bi xwe ponijî, simbêlên xwe di nav tilî û pêçîyên xwe da bir û anîn û deng nekir. Ê de piştî bêdengîyê jî deng e. Di wê gavê da Apê Silêman, bû dengê bêdengîyê û got:

- Birazî, roj ne rojên asayî ne. Tu bi xwe jî dizanî ku ji alîyekî va ax hatiye zeftkirin û ji alîyekî va jî jîyan nemaye biserûbin, tarûmar nebe. Helbet tawanbarî û kavilî ne qeder e. Na, ne qeder e, lê bûye para me. Li her çar alîyên welatê min şer e, şer jî berdewam û hê sar nebûye. Egîd di şer da ne, şer jî şerekî qevçil û xwînî ye. Tu jî dizanî ku di rewşeke wisa da ji egîdan ra bêdengî mirin e. Li çiya û banîyên welatê min hela hela mêr û mêrxasan e, li ber xwe didin û ew ê bidin jî. Berxwedan jîyan e. Ji vê yekê ra xîret lazim e û bilî wê jî ne tu rê, ne jî çare ye. Birazî! Her çi ku ji me hatibe xwastin me kiriye û em ê bikin jî. Ji êla me, êla Hesenan mêr û mêrxasek nîne li qada şer nebe. Egîd di dîlanê da ne û dîlan jî berdewam e...

Berîya ku vê axaftina xwe bidomîne ji îskanê qurtek çay vexwar û wisa axifî. Apê Silêman, çaya xwe kitleme vedixwar û tu car şekir di îskanê da nediheland. Piştî vexwarina qurtek çayê carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Belê, ez ê werim Ferzende. Tu nizanî, lê ez ê ji ezîzê xwe

www.arsivakurdi.org

ra wiha bibêjim. Li kê derê şerek hebe Ferzende jî li wir e. Xwedê neke, Ferzende û ji şer dûr bîmîne? Na, nebûye û wê nebe jî. Şer bi wî gurr dibe û dîsa bi wî radiweste, diqede û safî dibe. Di rojeka wekî roja oxirmê giran da Ferzende Beg û li mal be? Na, ne îşê aqilan e. Ferzende, li qada şer e. Ez nizanim, lê encax Xwedê dizane ka çi demê vedigere û tê, yan jî!? Qismet e ku hatibe, em ê xwazîya te egîdî li ber çav bigirin, li ser rawestin û bifikirin.

Derî vebû û bi wê bedewîya xwe yekem bûka malê Besra û li pey wê jî xwesûya wê Asya Xanim derbasî hundir bûn. Xwarina mêvanan anîbûn û di destê bûkê da sênîyêk mezin hebû. Asya Xanim jî, bi selika nan û vexwarinê va hatibû. Silêman Beg, ji destan xwarin û vexwarin girt û li ser sifrê danî. Di pey ra jî li mêvanên xwe vegerîya û got:

- De fermo, ezîzê min. Fermo, derbasê ser sifrê bibin. Ji xwe ra şîva xwe bixwin û bila xwarina we sar nebe…

Bi xwe jî derbasê ser sifrê bû, cî girt û rûnişt. Besra Xanim, ji jinan jineka çê, delal û xwezanek bû. Bi reng û rû bû. Rind jî ew û bedew jî dîsa ew bi xwe bû.

Dît, xwesûya wê hê cî negirtîye, lê vegerîya û got:

- Dayê, ka çima tu hê li ser pîyan î? Mêvan ne xerîb in û ji malê ne. Rûne. Rûne û li gel Hesenê xwe ji xwe ra şîva xwe bixwe…

Ne tenê bûkê, lê lehengê xemgîn jî got, Apê Silêman û Hesenê Hesenî jî. Piştî van axaftinan Besra xanim, ji mêvanxanê derket û derbasê xanîyê malê bû. Asya Xanim? Asya Xanim, bila ji jinan jineka xaraw û çê be, lê bila di malê da ne bi biryar ne jî bi giranîya xwe be? Ew, dîya Ferzende Begê bû. Ew, stûnek ji stûna vê malê bû. Asya Xanim, bi mezinan ra mezin û bi piçûkan ra jî piçûk bû. Jina xaraw, hem xwedîyê biryar hem jî siwarê

hespê xwe bû. Bi nav û nîşana xwe ew, Asya Xanim bû. Jin bû, lê çi jin. Ji maqulan maqul û ji bedewan jî bedewek. Ew, qîza Hecî Ûsiv Paşayê Sipkî û hevpara Silêman Beg bû. Asya Xanim, ji alîyê bavê da jî malmezin û ji alîyê mêr da jî dîsa malmezinek bû. Her kî berê xwe dabe vê malê û hatibe, dixwaze bila mîr û mîrek û dixwaze bila şah û paşa be, Asya Xanim û di wê civakê da cîyê xwe negire û beşdar nebe? Şêr şêr bû, çi jin û çi mêr. Meriv bi xwe rûmetê nade xwe, lê xelk dide merîyan. Jina çê, her bi wê rûmet û aselata xwe bû. Li ber sifrê cî girt û bi mêvanên xwe ra rûnişt. Ji jinan jineka dilşewat bû, Asya Xanim.

Li Hesenê Hesenî mêze kir, pê ra jî di dilê xwe da axifî û wiha got:

- Hesenê min, guneh e. Hesenê min ji me ra pêşeroj e. Hêvîyek ji hêvîyên welatî ye, Hesen. Di vê berf û baran, sar û sermayê da daye rê û hatiye. Ew, xezneya vî dilî ye. Mala apê wî hem mala wî hem jî navnîşana wî bi xwe ye. Hesenê min, bi dilekî baristanî berê xwe daye amojina xwe û hatiye...

Di pey ra jî dengê xwe bilind kir û bi wî awayî axifî. Ji dil û can, bi zarek xweşik axifî û got:

- Wîîî, amojin bi gorî! Ji ber teqûreqê îcar di serê merîyan da hiş dimîne. Koranî di çavên amojinê da were, koranî! Ne min Hesenê xwe guvaşt, ne bêhn kir, ne jî min firsend dît ku pê şa bim û jê hez bikim. Ê de rabe, bav û bira! Rabe û were cem amojina xwe, min bi qurban. Were li kêleka amojina xwe cî bigire û em ê bi hev ra nanê xwe bixwin. De rabe...

Hesen, xortekî ture û her bi rêz û rêzdarîya xwe bû. Heta ku te jê tiştekî nepirsîya bêdeng bû, nediaxifî û her bi guhdarîya xwe bû. Erê, herçiqas ew hê tifil û di temenê xwe da mezin nebe jî lawikekî biaqil û bêqisûr bû. Rabû, hat cem amojina xwe û di pey ra jî kêleka xwe da kêleka wê. Ha, şîva îşev!? Şîva îşev jî di tasan da êxnî, di sênîyek mezin da savar û li ser savarê jî serûpê

hebû. Ê helbet, bê pîvaz nabe û ew jî hebûn. Xwarin e, ku merîyan têr xwar şûnda jî êdî li ser sifrê namîne, gotinê dike û xwe şûnva dikişine.

Şîva xwe xwaribûn. Lehengê xemgîn, ji ser sifrê rabû, pê ra jî axifî û got:

- Me kêm kir, Xwedê zêde bike! Mala we ava…

Ne Apê Silêman, lê Asya Xanimê bersiv da. Di bersiva xwe da jî wê, wiha got:

- Mêvanê ezîz, gotinek ji gotinên pêşîyan e. Pêşîyên me wiha dibêjin:'Nan bide nandaran, deyn bide deyndaran, lê rû nede bêwar û neyaran…' Ez ê jî ji mêvanê xwe yê ezîz ra wiha bibêjim; noşîcan, helal û xweş be. Şîva me ev bû û ez hevî dikim ku bi ya dilê te bûye.

Bûka malê Besra, ne li mêvanxanê û li alîyê malê bû. Li wê derê jî wê, hem ava çay dabû ser hem jî ji mêvanê xwe ra wek şîranî, helîse çêkiribû û dixwast piştî şîvê bide ber wan. Kel di ser avê da hatibû. Rabû çaya xwe dem kir, di sênîyê da îskan û şîranîya ku çêkiribû anî û di mêvanxanê da li ber xezûrê xwe danî. Di pey ra jî wê, ji destên xezûrê xwe textê sifrê hilda û bi xwe ra bir.

Apê Silêman, çar îskan bi çayê va dagirt û pê ra jî got:

- Navdar, Hesen û Asya Xanim! Ê de fermo. Fermo, pêş va werin. Mala bûka min Besrayê, ava be. Di vê sar û sermayê da şîranî û were bîra merîyan!? Dîlbera mala bavê min, ji me ra hem çay daye ser hem jî şîranî çêkirîye. Çû, ne amade ye ku jê ra çayekê dagirim û bidim ber...

Şîranî ye, dixwî û ew jî diqede. Dor hatibû çayê û li gel çayê jî suhbet û laqirdîyan...

Jina çê, wê hişmendê dest bi axaftinê kir û yekem got:

- Dizanim Hesenê min, ji rîyeke dûr û dirêj berê xwe daye amojina xwe û hatiye. Belê, wele pir û pir jî westîyaye. Hê ku

derbasê nav cî û nîvînan nebûye dixwazim jê ra çîrokek bibêjim, çiroka qijika reş û kevokê. Eha, piştî vê çîrokê jî bila here û ji xwe ra raze.

Di wê navbeynê da Besra Xanim hat û di hatinê da jî derbasê mêvanxanê bû û li ber sobê, li kêleka xwesûya xwe cî girt û çok da erdê.

Asya Xanim, piştî hatina bûkê carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Heseno, lawo! Xelk û alem e, dibêjin. Bila bibêjin. Tu guh nede wan, lê tu guh bide amojina xwe. Te bi kêfxweşî berê xwe daye min û tu hatî, lê tu yê destvala neçî. Pirs e, ji merîyan tê kirin: Tu çûyî û te her çi ku xwarîye û vexwarîye bila li te helal û xweş be. Tu ji me ra xwarin û vexwarina xwe nebêje, lê tu ji me ra bibêje ka te li wê derê qet çi dît, çi bihîzt û amojina te Asya Xanimê ji te ra qet çi got? Hesenê min! Bi navê Elî Çawiş, camêrekî tere leşkerîyê û sê sal dimîne. Dema vedigere û tê jî çiqas zarok zêçên gund hebûne tên û lê kom dibin. Ê de ji edet e, Hesenê min. Her kî ji xerîbîyê hatibe, di berika xwe da yan bi şekirê nebat û yan jî bi findiq û fistiqek hatiye. Ê de ew jî destvala hatiye û jê pirsîne, te ji me ra qet çi anîye, Elî? Elî, bersivek çawa bide rind e? Dibêje, min ji we ra aqil anîye, aqil. Eha, Hesenê min! Ger ji te pirsîn tu jî ji wan ra bibêje, min ji we ra aqil anîye, aqil... Eha, dû ra jî ji xwe ra dengê xwe bibire û xwe bide alîyekî...

Guhdar û nekenin? Hemû bi hev ra kenîyan û Hesenê Hesenî jî bi wan ra. Piştî van ken û laqirdîyan Asya Xanim, carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Hesenê min! Netew nîne bi ziman, çand û hunera xwe nebe. Em jî wek her netewî bi çîrok, destan, kilam û gotinên xwe ne. Çand û hunera her miletî bi wî miletî xweş e û herwiha, yê me jî

bi me. Gotin nîne serê gotinê nebire, Hesenê min. Di vê çîrokê da? Di vê çîrokê da jî gotina herî xas û xweş ev e û nebêjî nabe: Her teyr bi refê xwe ra difire. Erê, her teyr bi refê xwe ra... Ê de tu were vîya ji qijika reş ra bibêje. Em dibêjin qijik, lêbelê li hinek deveran jî jê ra dibêjin qirik. Ne pir giring e, ha qijik bûye û ha qirik. Qijik jî qijik e, ha! Bi gilî û gazinan vekişîyaye kuncikê xwe, ne dixwaze qise bike, ne bi yekî ra bilîze ne jî û ne jî... Ax, hema wiha tenê di kesayetîya xwe da xeydok be jî ne pirs û pirsgirêk e. Ne ji xwe û wê hebûna xwe razîye, ne jî kesî begem dike. Na, Hesenê min! Na, ne evîndarê dengê xwe ye, ne jî heyrana wî reng û meşa xwe... Werhasil, bihar e û berf nemaye li gulîyê darê. Radibe ji refê xwe vediqete û di pey ra jî berê xwe dide warê kevokan. Em dibêjin kevok, lê de hinek kes jî hene dibêjin gogerçîn. Ê de ev jî dewlemendîya zimanê me kurdan bi xwe ye, Hesenê min. Qijik mala te mîrat be, qijik! Ma tu nizanî dema ku meriv ji refê xwe biqete ka çi tê serê merîyan, çi diqewime û çi derdikeve pêşîya merîyan? Ê de carekê biryar daye û ew ê here.

Per vedike, difire û berê xwe dide welatê kevokan. De here ku tu axa yî! Pir û hindik ez ê bibêjim di heft rojan da çûye û xwe gîhandiye wî warî, tu jî bibêje di roja heştan da... Rêwîtî bê westan nîne û meriv diweste. Li ser zinarekî mezin per dide hev û pê ra jî li dorhêla xwe mêze dike. Ê de bihar e, ji kul û kesera vî dilê min û te ra xweş û xweş bihar e. Ji evdalê xwe ra bibêjim, xwişîna avên çem û kanîyan e, ji bin kevir û zinaran diherike û dixulxule. Ê de mêzekirin e, qurban. Di wê mezekirinê da ka îcar çi bîbîne rind e!? Dibêne, li rastê kevokek perspî tê û tere. Wey, kevok! Kevok, bila mala te kovokê bişewite. Ew çi rindî û çi bedewî ye, wiha!? Ê erê, wey! Nebêje, nabe! Dibe. Dibe, lê de bi ewqasî rindî û bedewî jî zêdeye û nabe. Xwedê çêkiriye, lê bi rindî û marîfet, bi fahm û feraset…Deng jî, reng û meş jî hebûna

Xwedê ne. Xwedê ji xwe daye wê, çêkirîye û neqiş bi neqiş jî xemilandiye. Ê de hela tu were li min û vî rengî, reng jî reng e. Tu dibêjî qey berfa belanên Çiyayê Xamirpêtê ye, ji dûr va çîlspî dibiriqîne, şewle dide û diçirûse. Xwedêyo, tu deng didî ma tu bi ewqasî rind û xweşik, didî? Ê erê, Hesenê min. Erê, herçiqas hatibe gotin 'sewt, sewta qaz û qulingan e…' jî tu ji dengê kevokê ra nikarî bibêjî, xirab e. Ê de bavê mino, dema ku kevoka perspî tê û tere û dimeşe jî tu dibêjî qey malmîrat li ser lingekî direqise, tê û tere. Ji wê meş, hatin û çûyîna wê ra gotin û hebe? Na, bavê mino! Na, nîne. Çi gotin û çi hal. Ez ê werim qijika reş? Ê ne min got, ne ji rengê xwe qayîl e û ne jî ji deng û meşa xwe. Ji xwe û wê hebûna xwe ne razî û aciz e. Bîlasebeb ranebûye û terk î dîyar nekirîye. Veger? Na, nîne.

Ji ber xwe va îskana çayê hilda, jê qurtek vexwar û carekê din hat ser axaftina xwe ya berê. Mala haziran ava be, her kes bi guhdarîya xwe bû. Her kes bi guhdarîya xwe bû û Apê Silêman jî, hem bi guhdarî hem jî bi peyvên xwe bû. Carînan digot "Wel, wel, wel û carînan jî, de here ku here!..." Belê, her kes bi guhdarîya xwe bû û Hesen? Hesen jî geh bi coş û kelecan, geh bi ken û meraq...

Xanima xaraw, hat ser axaftinê û got:

- Çîrok e, Hesenê min. Erê, çîrok e, lê di her çîrokê da jî aqil û fahmek, rastîyek heye. Hewl daye û hatiye, jê veger nîne. Biryar biryar e, poşmanîya dawîyê jî pere nake. Ji Hesenê xwe ra bibêjim, heke tîr ji kevanê carek derket êdî şûnda nayê. Danê sibê ye. Li rast û bestan ba bayê şerq û xerbê ye, dilîlîne. Welato, tu bişewitî xulin û xûşina avên çem û kanîyan e. Bihar e, lê xweş bihar, ax dilê min yo yo, dilê min yo. Di bihara rengîn da li ser zinarê bilind per daye hev û xwe bi xwe jî difikire û dibêje: Tu bibêje bila kambax be, kambax! Çi ku biçe ji vî emrê merîyan

diçe, emrê ku ji xwe tu xêr û mirad nedîtîye. Ê de hela tu were li min û rindîya vê kevokê. Wel, wel, wel çawa jî xwe li ba dike, çawa jî di vir da wê da tê û tere. Xwedê daye, lê neqiş bi neqiş daye. Ji deng û reng û meşa wê ra gotin nîne meriv bike, gotin. Ê de hela tu were li min û rindîya vê kafirbavê mêze bike. Wey, ku wey! Qijikê, qijika reşik! Ê de hela tu were li vê rindîyê mêze bike, lê ne hesûdîyan bike, ne bibêje ne jî pê biteqe. Meşa min ne meş e, çindik bi çindik. Rengê min ne reng e, reşik. Dengê min!? Dengê min jî ne wek yê qaz û qulingan e; here gak û were gak… Xwedêyo, ez ji kesî ra nabêjim, lê ji te ra dibêjim. Yê ku min afirandîye jî tu yî û yê ku rihê min bigire û bistîne jî dîsa tu. Ka çima te rindîyek wek rindîya vê kevokê nekiriye para min, lê çi ku hebûye te daye wê. Ax, de çi zanim wisa hatime û ez ê wisa jî biçim. Ji ber ku ev rastî rastîya min e. Di dilê xwe da jî bi xemgînî dilorîne û dibêje:

*Ax, lê lê dayê, rebenê dayê*
*Te digot yolê min digot yolê*
*Quling ninim herim çolê*
*Ordeg ninim herim golê…*

Asya xanimê ji ber xwe va îskana vala hilda, ber bi malxuyê xwe va girt û pê ra jî got:

- Ka hela ji kerema xwe ra tu dikarî ji min ra çayekê din dagirî. Ne tenê ji min ra, lê ji vê dîlbera min ra jî…

Ne girêdayîyê vê babetê, lê ji ber xwe va xwend û got:

*Hemd û sena û şukranî*
*Ji bo Xaliqê rehmanî*
*Ku fesahat û beyan daye*
*Lîsanî, lîsan jî daye insanî…*



www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

Berîya ku were ser babetê jî di derbarê vê çarînê da, çarîna Ehmedê Xanî da axifî. Axifî û bi kurtî wiha got:

- Kesê ku zimanê xwe ji bîr bike, welatê xwe jî wenda dike…Ziman wekî zêrê zer e, hem li mal hem li der e. Tim bi wî peyv û xeber, da ew nebe derbeder. Ger bi wî nedim xeber ew dibe lal û kerr...

Herhal ji ber axaftinê qirik lê ziwa bibû. Qurtek çay vexwar û bi wî awayî axifî. Di axaftina xwe da jî wê, wiha got:

- Ê de qijik e, Hesenê min. Qijik û nebêje? Dibêje, xwezika bila per û baskên min jî, deng û meşa min jî wek yê vê kevokê bûna. Bi wê axaftinên xwe tu dibêjî qey aqil û hişê xwe wenda kiriye. Her bi virevir û pitepit e; ax xwezika û wax xwezika!... Di wê gavê da êdî her çi ku hatiye aqilê wî nayê zanîn, lê per vedike, difire û tere. Tere, lê bi ser çûyîna wî ra jî pir derbas nabe îcar bi rengekî lewitî, reş û spî vedigere û tê. Wîîî, îcar ew jî çi ye Xwedêyo!? Agir bi mala te bikeve, qijik! Tu nabêjî çûye di boyaxa spî da xwe gevizandiye û bi wî awayî hatiye. Ê erê, wey! Sosret, lê çi sosret!... Ax, de îcar bi wê kiryara xwe bimîne jî dîsa ne mesele ye!? Na, qijik û bi yek kiryarek bimîne? Bi wê boyaxa xwe ya nîv ziwa, difire. Difire, tere û di paş kevoka perspî da per dide hev. Kevok çawa meşîyaye wek wê dimeşe. Dengê wê teqlîd dike û dixwaze wek wê deng bike. Kevoka perspî, lê vedigere û dibêje “Dibînim te daye pey min, tê û diçî. Ka hela bibêje min, îcar te xêr e? Çima direqisî, tê û terî? Min tiştekî ji vê hatin û çûyîna te fahm nekir û di mebestê da jî nizanim ka tu dixwazî çi bikî?! ”Qijik bi coş û kelecan e, lê vedigerîne û dibêje “Rind jî tu û delal jî dîsa tu bi xwe yî. Dengê te, rengê te, hatin û çûyîna te pir û pir li min xweş tê û ez jî dixwazim bibim wek te.” Bersiva ku qijika reş daye wê, li wê xweş nayê û madê xwe dike. Lêbelê bêbersiv jî nahêle û jê ra wiha dibêje “Wey, xwelî li serê te! Ê de

hela tu were li min û vê ecêba Xwedê. Çûye xwe di boyaxê da gevizandîye, xwe lewitandîye û hatiye. Hatiye min teqlîd dike. Çi eceba Xwedê ye, ji deng û reng û meşa xwe jî ne razî û aciz e. Hela hela, hela hela! Çi sosret çi sosret!... Qey tu nizanî her kes bi rengê xwe, deng û meşa xwe rind û delal e. Wek xwe bimîne, wek xwe!..."

Asya Xanimê çîroka xwe got û qedand. Asya Xanim hostayê gotinên bedew bû. Digot, lê xweş digot. Digot, lê ji dil û can digot. Babetên wê reng bi reng, axaftinên wê bi hewes û te tu car nedixwast dawî lê were.

Çîroka xwe qedand şûnda bi Hesenê xwe ra hembêz anî û got:

- Yê min amojinê çîrokek bû, berxo. Tê da aqil û fahm û tê da peyamek hebû. Lo, lawo bila her tişt bi aqil û fahm, rêz û ihtiram be, wekî din jî hema tu sax û em jî xizmetkar. Rind û xirabî îzafî ne. Her kes bi hebûna xwe rind e. Bes, bila tê da rêz û giranî, maqulî û esalet hebe. Wek din? Wek din jî her kes bi fikr û raman û dîtinên xwe...

Çar kesan guh dabûn wê û piştî axaftina wê jî dîsa wan her çaran ji dil û can jê ra got:

- Spas û mala te rêzdarê hezar û hezar carî ava...

* * *

*Evîn sozek e, evîn bîranînek e*
*carekê tê dayin, nayê jibîrkirin*
*ji bîr neke...*

Besra Xanim?

Besra Xanim, derbasê ber pacê bibû, lêbelê ji xwe jî dûr û dûr... Te digot qey ne li mêvanxanê ye. Bi hesret bû, ji nişka va



www.arsivakurdi.org

Ferzende Beg hatibû bîra wê û barê wê giran kiribû. Demsal zivistan û lêkiribû baran dibarî. Ger li derva bibare îcar di hundir da nabare? Helbet, dibare. Dibare, lê hem jî bi xişim û xezeb lêdike û dibare. Tu dua bike û bibêje Xwedêyo, bila berê xwe nede Besrayê. Besra Xanim, guneh e. Bila di ser wê da negire û nebare. Di wê baranê da îcar çi nîne, çi?... Tê da hesret, tê da xemgînî, tê da evîn, tê da êş û êşdarî, tê da hêsirên çavan, tê da hewar û gazî û ji xwe ra êdî lê zêde bike, bibêje û bibêje. Xemgîn bû, Besra. Xemginîya wê li wê bibû ba û bahoz û dabû ber xwe. Qisawetên wê li wê giran bibûn. Di hestê xwe da birîndar bû, Besra. Bêhn lê çikîyayî û tê da reng û rû nemabû. Kişîyabû eyarê xwe, bêdeng û bêseda bû. Xemgîn bû, Besra. Xemginî nîne bi merîyan nede gotin. Nedikarî rabibe ser pîyan û wê derdê xwe ji her kesî ra bibêje. Jê ra derfet û îmkan nebû. A ji ber wê yekê jî wê, di dilê xwe da got û got.

Ji alîyekî va hêsirên çavan barand û ji alîyekî va jî got:

*Hûrik hûrik berf dibare, li derva*
*bêwaxt ketim, dizarim û dinalim*
*şevên min reştarî ne, xewn li min kerî*
*ji demê ra deyndar ketim*
*Ferzende!*

*Di rihê min da ba û bager*
*li kêleka min dayîka te*
*deyaxa dilê min, evîna bavê te*
*ka tu li ku yî, li benda te me*
*Ferzende!*

Li mêvanxanê bû. Li gel xezûr, xwesî û mêvanên xwe bû. Bi dengekî bilind nedikarî biaxife û derdê xwe ji her kesî ra bibêje. Her çi ku bibêje di dilê xwe da got, wê. Guhê wê li axaftinan bû,

lê ka îcar dil? Dil bi kul û bi keser bû. Dil bi hesret bû, bi hesreta Ferzende Beg. Di mêvanxanê da du lembe dişixulîn. Her du lembe jî nêzikê mêvanan bûn û Besra Xanim, ji ronahîyê pîçek dûr bû. Di vê êvarê da, di êvara Xwedê da ji alîyekî va lê kiribû berf dibarî, ji alîyekî va jî bi wê vîzevîza xwe ba û bahoz bû. Derva ku bi vîzevîza bayê be, dil û bêdengî? Na, nebû. Hest e, dike gujîn û dide gotin. Ji kul û kesera dilê min û te ra Besrayê wiha got:

- Ax, Ferzende! Ferzende, ka bibêje tu li kû yî? Tu li deştê yî yan li çiya û banîyan? Ji te dipirsim, Ferzende. Ka çima te bi destê min porkurê va negirt û bi xwe ra nebîr? Ez Besra me, Besra. Ez hevpara mêrê çê me. Heke te bixwasta te çek jî dida min û rext jî, lê te neda. Pirs e, Ferzende. Îcar ez ê vê pirsa xwe ji te nekim, dibe!? Na, nabe. Bi serê heft bavê min û te be, nabe û nabe. Ka bibêje, îcar bawerîya te bi min nedihat ku te min porkurê li vir hişt û bi tena serê xwe çûyî? Ma îcar ew ne tu bûyî te digot, şêr şêr e çi jin û çi mêr e. Madem ku rastî ev e û wisa ye, ka îcar çima te ez li vir hîştim, çima? Te dikarî min jî bi xwe ra bigirta û bibira, lê te nebir…

Ji çavên reşbelek dilopên hêsiran barî, bi kefika destê xwe paqij kir.

Dil e, dil ku çi bibêje ew e, got:

- Deyax li min vemirîye, di hesreta te da mirî me, li min vegere û zû were. Bi evîna vî dilî, bi wê soz û qirara xwe xweşmêrî berê xwe bide min û were. Di tunebûna te da xemgîn jî ez im, bêwar û bêhêvî jî. Jîyan li min wenda ye, reben ez im malim xirab. Di tunebûna te da? Di tunebûna te da ji min ra dem wenda û hêvî çilmisîye. Her bi kalîn û dikalim, wek çawa dêxezalek serî bide ser karika xwe. Gotin gotina te ye û te digot, di her karekî da serkeftin hêvîya her mirovekî ye. Di tunebûna te da kar û hêvî? Na.

Dîtin, dîtina te xweşmêrî ye. Tu vê gotinê dikî û dibêjî, tu: Mirin xweş e bi mêr û mêrxasîyê. Bila be, qebûlê min. Lê ez ê werim çi bikim ku bê te nabe, bê te nabe, bê te nabe. Tu roj î, Ferzende. Tu nebî dilê min di tarîyê da dimîne. Yê ku ronahîyê bide vî dilî jî tu û yê ku di tarîyê da bihêle jî. Min di tarîyê da nehêle, Ferzende; nehêle, nehêle, nehêle… Ez gul im, gula te me. Ez ku gul bim tu jî av î, hewa yî… Bê te nabe, bê te nabe, bê te nabe! Li hespê xwe siwar bibe, li hespê Eznawir. Rake ser pîyan, bi bayê bezê va berê xwe bide min û were. Tu mêrek bi sed mêran î, Ferzende. Dixwaze bila berf û baran, ba û bahoz û dixwaze bila şîlî û şilope be, hewar û gazî ku hat li cîyê xwe namînî; ax de were, de were, de were!... Tu mêrxasê roja oxirmê giran, siwarê hespê Eznawir û xwedîyê çaplîya piçûk î, Ferzende. Li benda te me, zû were. Ma ez nizanim. Ez jî dizanim ku tu astengî nîne pêşî li te xweşmêrî bigire û rê nede te. Hespê xwe tijî bike û di pey ra jî xwe li min porkurê bigire û zû were. Hespê te hespekî resen e, rîya malê jî dizane û hezkirinê jî. Ji destê min av vexwarîye û min nas dike. Berê wî bide vî gundê kavil, bibezîne û di kef û xwêdanê da bihêle; ax de were, de were, de were!... Dizanim ba û bagêr e. Dizanim seqem e û ba tê ji baranê xirabtir e. Ne karê her mêrxasî ye di rojekê wisa da bide rê û derbikeve rêwîtîyê. Tu Ferzende yî, Ferzende. Xwe li çiya û banîyan, deşt û zozan, mêrg û zevîyan bigire û nebêje ba û bagêr, berf û baran e; de were, de were, de were!...

Destê xwe ber bi serê xwe bir, yekem kofîka serê xwe sererast kir û di pey ra? Di pey ra jî bi dizîka va hesirên çavên xwe bi serê laçikê va paqij kir.

Dil û nebêje? Dibêje. Dibêje, lê wek avên çem û kanîyan çawa biherike bi wî awayî dibêje.

Ma îcar wê çi negot ku tu yê nebêjî, got:

- Ferzende! Li benda te me, li benda te. Qonaxa bavê te, qonaxa giregir û xanedanan e. Yek biçe yek tê û tu car vala namîne. Di tunebûna te da? Di tunebûna te da ne qesr qesr e, ne jî qonax qonax. Bêhn li min çikîyaye û zû were. Bi hesreta te me, Ferzende. Hespê xwe ji ser Çiyayê Bilêcanê ra bifetilîne, ji newal û neqeban derbas bike, di pey ra jî berê xwe bide Deşta Lîzê, nesekine û zû were; de were, de were, de were!...

Dilopên hêsiran, hêsirên janî wek barana biharê bi ser sûretên wê yên qerqaş da girtibûn, gêr dibûn û dihatin xwarê. Çavên xwe ziwa kirin, lê nekarî şewata dilê xwe vemirîne. Nekarî dawî li axaftinên xwe bîne, got:

- Bibexişîne, Ferzende. Min bibexişîn e. Şev li min giran û hedûr li min wenda ye...

Li ber pacê rûniştîbû, Besra Xanim. Çavên wê li pûka berfê bû, pûka ku li ber pencerê bi qasî du tilîkan bilind, şewle dabû dibiriqî. Bi nişka va hate bîra wê û got:

- Na, Ferzende!... Na, te hespê xwe bi xwe ra nebiriye. Hespê te li vir e, di tewlê da û li ser alif e. Min av jî da û ceh jî…

Ji êşa dilê wê ra derman nebû. Dermanê dilê wê li çiya û banîyan, li sengeran û li qada şer bû, di şerê azadîyê da.

Kir axîn û di dilê xwe da got:

- Ax, felek!... Felek, çima te bi min wiha kir? Çima te berê xwe da min porkurê û konê min ji nav konan rakir. Çima te ji min ra neyartî kir, çima?

Tiştê ku wê dizanî, êş û keder bû. Xemgînî û qisawet bûn. Li gel wê kêf û hewes, nebû. Ji alîyekî va bi axaftina dil û ji alîyekî va jî bi guhdarîya xwe bû. Asya Xanim û haya wê ji bûka wê nebe? Çawa, bûka wê ronahîya her du çavên wê bû. Bûka wê, gula vê malê û dîlbera vî gundî bû. Wê bi xwe jî baş û baş dizanî ku dema bûka wê kişîyabe kuncikê xwe ji xwe dûr û dûr e, timî

xemgîn û bi hesret e.

Eha, di rewşeke wisa da berê xwe dida wê, diçû li kêleka wê çok dida erdê, bi wê ra dişêwirî, diaxifî, kêf û moral dida. Di navbeyna wê û bûkê da têkilîyeke xweş û germ hebû. Na, te ji bo herduyan tu car nedikarî bigota, bûk bêziman û xwesû jî bêîman e. Di vê malê da bûk bûk û xwesû jî xwesû bû. Bûka wê, hebûna wê bû.

Asya Xanim, êşa dilê wê wek êşa dilê xwe û bextewarîya wê jî dîsa wek bextewarîya xwe dizanî. Ji jinan jineka pêkhatî bû, Asya Xanim. Ji cîyê xwe rabû, çû li kêleka wê çok da erdê û rûnişt. Di pey ra? Di pey ra jî li bûka xwe vegerîya, bi dengekî nizm axifî û got:

- Ka de tu were li min û li vî dilî! Îro di dîdara dîlberê da ji min gazinan dike, li min dihêre gilî. Xwezî min dîlber bidîta, di çax û benga xwe da. Em biketana nav kêf û henek û laqirdîyan û di şevên kanûnên dirêj da me hevdu di xwêdanê da bihîşta. Min dîlbera xwe bikira wek berxa guraxwarî, biavêta vî alî û bibira wî milî...

* * *

*Ramanên xweş, axaftinên xweş, kirdarên xweş.*

Silêman Beg, bi mêvanê xwe ra mijul bû, bi lehengê xemgîn ra. Yekem ji ber xwe va îskana çayê rakir, jê qurtek vexwar û dû ra? Dû ra jî dest bi axaftinê kir û di axaftinên xwe da wiha got:

- Birazî, tu jî wek min dizanî ku em ji qewman qewmekî kevn û dîrokî ne. Rûmet, mêr û mêrxasî, cîwanmêrî, mêvanperwerî, esalet, kevneşopî û hema êdî tu bibêje, ev hemû kelepor ji bav û kalên me maye, ew ê wisa jî bimîne. Li ber van neyarên bêbav

Kurd û serî bitewinîn? Na, me tu car serî netewandiye û em ê netewînin jî. Ez vîya wer dizanim û wer jî dibêjim. Ax, de tu yê werî çi bikî ku êş rê nade me, êş! Mixabin, êş rê nade ku em ê bi miradê xwe şa bibin. Êşa me êşekê dijwar e. Derman bibêjî derman nîne û tu yê bibêjî bila jê ra kew hebe, kew nîne. Tu yê bibêjî, çima? Ji ber ku xelk û alem bûne xwedîyê tac û text, em jî mane bê par û bê dewlet. Ê helbet, ne bêsedem e. Pirsgirêkên vî miletî ne li derva û di hundir da ne. Wek xisûmet, bêtifaqî, cudeyatîya ol û zavan, neyartîya êl û eşîran, berjewendîyên malbatî û hwd. Li gel me rihê netewetîyê kêm e, birazî. Belê, rihê netewitîyê... Heke meriv li ser qanûnên ku ji merîyan hatine xwastin neyê cem hev, bi hev ra kar û xebatê neke ne dikare hêvîyê bide ne jî dikare rê bigire û pêşerojê ava bike. Bêtifaqî, derdê serê derdan e. Werhasil, ji êşan jî êşeke giran û bêderman e. Heke tifaqa te nebûye tu yê ji min ra ne qala pêşerojê bikî ne jî tu were ji min ra qala jîyanek birûmet... Maleke bitifaq, ji êleke bêtifaq çêtir e. Bila axa wî zanayî xenî xenî û rehma Êzdanê Dilovan lê be. Ez qala Ehmedê Xanî dikim, birazî. Êş e û ew jî êşa vî dilî tîne ziman û dibêje. Belê, di rêzikên helbesta xwe da ew, ji me ra wiha dibêje:

*Taseke ji ava zelal nadim bi Hewza Kewserê*
*Levhatina Qesra Şêrîn, jê nabînim tu meferê*
*Piştî roja me bû tarî mirin xweş e ji emberê...*

Piştî xwendina van rêzikan carekê din hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Belê, birazîyê ezîz! Tu jî dibînî ku zanayê mezin ji peymana Qesra Şêrîn pir û pir aciz e. Aciz e, ji ber ku di navbeyna Dewleta Osmanî û Eceman da axa welatê wî hatiye dabeşkirin, zarîn û zivîn bi dilê axê ketiye. Jan e, meriv car heye jana dilê xwe li

rêzikan bar dike û car jî heye di kilamek du kilaman da tîne ziman û dibêje. Rastî ye û meriv naxwaze ew rastî di tarîyê da bimîne. Birazî! Rastî ev e ku heta meriv nebe xwedîyê tac û text ne zilm û zordarî diqede, ne cewr û cefa, ne jî îlet û zîlet!...

Silêman Beg, bi mêvanê xwe ra û Asya Xanim jî, vê gavê bi bûka xwe ra têkildar û mijul bû. Asya Xanim, keça tovrindan û ji hişmendan jî hişmendeka çê û bêqisûr bû, wek malxuyê xwe jî zana û xwedîgotin...

Belê, em ê li Silêman Beg, Silêmanê Ehmed vegerin. Silêman Beg, di her warî da xwedîyê zanistîyeka berfireh bû. Haya wî ji çand û huner û dîrokê hebû, dîroka wî. Dema ku diaxifî jî di axaftinên xwe da timî cî dida çîrok, gotinên pêşîyan, rêzikên helbestan, bi tam û temamî dixemiland û bi wî awayî pêşkêş dikir û digot. Ê de ji edet û toreyan dihat; di malê da bila bûk hebe, bûk jî rabe û bi xezûrê xwe ra qise bike? Na, nebû. Qise jî nebû, bi wan ra xwarin û vexwarin jî. Di mala Apê Silêman da? Di mala wî da ev edet, bi rengekî din hebû, digot:

- Xwarin û vexwarin pêdivîya însan e. Axaftin jî wisa ye. Nabêjim neaxifin, venexwin û qise nekin. Qise bikin, xwarin û vexwarin jî bila li we helal û xweş be. Ji bo min? Ji bo min ya herî girîng ew e ku divê meriv bi rêz û giranî rabe û rûne, qise bike, bi edetên civaka xwe tevbigere, were û here. Dibêjim: Ramanên xweş, axaftinên xweş û kirdarên xweş û hew...

Xwedê kêmanîya Apê Silêman nede. Di mala wî da gotin gotin û kiryar jî kiryar bûn. Di xû û xusyetên xwe da jî yek ji yeki çêtir bû. Belê, Asya Xanim? Asya Xanim, ji malxuyê xwe kêmtir nebû û ji jinan jineka çê, xêrxwaz û bi xîret bû. Di şîn û şahîyan da Asya Xanim û bi navê xwe nebe û cî negire? Ger xwazginî be, di xwazgînîyan da bi nav û nîşan û rola xwe bû. Roj jî dihat te didît Asya Xanim, siwarê hespê xwe ye. Di jîyana kurdan da

hesp û cîyên xwe negirin? Cîyek girîng digirtin û rola xwe dilîstin. Kurdên bêhesp, bêwar û şerpeze bûn. Di dawetan da kul jî hebû û cirîd jî. Di van lîstikan da çavê siwaran timî li ser wê û li wê digerîya. Di berevanîyê da bila ji wan hespan hespek kul were, lê bila bêxelat bimîne? Na, ne ji edet bû. Siwarê hespê kulhatî, xeleta xwe ji destên wê xarawê, werdigirt. Xelat? Xelat jî di piranîyê da temezîyek ji temezîyên kawe bi rîsî pêsîr bûn. Bi wê nav û nîşana xwe Asya Xanim, navekî giran û qedr û qîmeta wê di her malê da hebû. Ka îcar dilê kîjan dayîkê bi xemgînîya xwe nebû ku yê wê jî nebe? Ji vê malê wê, berê çiftexasê meran dabû qada şer û bi rê kiribû. Besra Xanim, hedûra ber dilê wê û hebûnek ji hebûna vê malê bû. Bi hev ra dikenîyan, bi hev ra digirîyan, şîn û şayîya wan bi hev ra bû. Niha jî li nik wê çok dabû erdê û rûniştibû. Jina tovrind, ji çayê qurtek vexar û dû ra? Dû ra jî ji dev û lêvên wê du rêzikên helbestekê pekîyan. Ji ber xwe va wê wiha got:

*Hê di ber Qal û Belayê belkî ev alem nebû*
*Çerx û dewran, dewrî gerdûn, kumbedî mîna nebû...*

Li mêvanxanê qederekê bû bêdengî û ne Apê Silêman, ne Asya Xanim ne jî kesekî din axifî. Ê de Apê Silêman jî Apê Silêman bû û yê wî qet nedihat zanîn. Car hebû dawî li axaftinên xwe nedianî û car jî hebû te didît bêdeng û bêseda ye. Erê, qederekê bêdeng dima, lê de ew jî tiştekî demî bû û carekê din li axaftinê vedigerîya û gotinên xwe dikir. Em ê werin lehengê xemgîn? Leheng, ji mêvanan wek mêvanekî rêzdar hatibû pêşwazîkirin û niha jî di mala malmezinekî kurd da bi kêf û rehetîya xwe bû. Ger ku pirsek jê bihata kirin qet tu şik nîne ku diaxifî, lê pirs nebûn. Cîyê ku Apê Silêman û amojina Asya jî lê bûne jixwe ji wî ra ya herî baş û balkêş, bêdengî bû. Piştî demekê dîsa Apê

Silêman bû dengê bêdengîyê û got:

- Birazî! Pirs e, lê pirs jî li bersiva xwe digere. Gelo ka me çiqas ji fikr û ramanên Ehmedê Xanî îlham girtiye û em pê pijîyane? Di dil û mejîyê me da ka çiqas bi cî bû ye? Haya me çiqas ji wî heye û em wî nas dikin? Hezar rehme li gora wî be, dibêje:

*Ger dê hebûya me padişahek*
*Laîq bidîya Xwedê kulahek*

*Rûm û Ereb û Ecem temamî*
*Hem'yan ji me ra dikir xulamî*

*Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet*
*Tehsîl-i dikir me ilm û hîkmet*

Ez ê werim bersiva pirsê? Bersiva pirsê di rêzikên vê helbestê da ye û ne hewceyê gotinên min e ku ez ê lê zêde bikim û bibêjim. Ev helbest jî helbestek dirêj e, lê min parek jê xwend. Helwest û wateya vê helbestê ji me ra vekirî û zelal e…

Apê Silêman, cixarekêş bû. Dema ku çay vedixwar timî destê wî diçû kîsikê titûnê. Cixareya xwe pêça, vexist, jê mizek girt şûnda vegerîya ser axaftinê û got:

- Îşev bûm gotarbêj û axifim. Şikir, hem bûm gotarbêj û axifîm, hem jî bûm helbestvan û min helbest xwend. Ê de dor bi dor e, heyran. Piştî şîvê yê ku axaftina xwe kir û ji dorê derket, Asya Xanim bû. Bi çîroka xwe wê, dilê Hesenê xwe şa kir. Dibêjim, mala te canikê ava, Asya Xanim. Ez ê werim bûka xwe. Dîlbera mala bavê min, Besra? Besra, gula vê malê ye û wê jî ji me ra xizmetek bêhempa kir û spasdar im. Şev dirêj û mebest jî vekirî ye. Ma ne wisa ye, lehengê xemgîn? Barê giran li ser her du milan û di vê malê da, mêvan jî tê da kesê ku bibêje, dor ne dora

min e û ez ne di dorê da me, nîne û nabe jî. Dor hatiye mêvan û mêvanê ezîz jî divê ji me ra kilamek bistre. Ma ne wisa ye, Heseno?

Di kesayetîya xwe da Navdar, însanekî şermok bû. Wek çawa jûjîyek bikişe postê xwe bi wî awayî xwe komê ser hev kiribû. Çawa xwe komê ser hev neke? Çavê hemûyan li ser wî bû, wî jî xwe dabû bêdengîyê û îcar heta çi wextê? Bêdengî û çare be? Na. Dît nabe, li Apê Silêman vegerîya û got:

- Ax, Apo!... Dibêjim xwezîka min jî wek cenabê te û amojina xwe bikaribûya helbestek bixwenda, yan jî, çîrok û destan û tiştekî din bigota, lê!? Cîyê ku amojina min û cenabê te lê bûne nikarim gotinê bikim û herwiha, guhdarîkirin jî ji min ra xezne ye. Ji vê hebûnê û bêparî? Na, naxwazim.

Ê yanî, tu bibêje bila xwedê şermokîyê nede û neke para merîyan. Eha, dema ku da jî meriv wek vî lehengî, lehengê xemgîn diaxife. Yê ku bersiva wî jî da, ne Apê Silêman lê xwesûya Besrayê, Asya Xanim bi xwe bû.

Belê, bersiva lehengê xemgîn da û wiha got:

- Mala te ava be, qurban. Tu xortek ji xortên vî welatî yî û li pêşîya te jî roj hene ji rojan xweştir in. Dibêjim temen dirêj be, temen dirêj. Me her çi ku dîtibe, dît û ji vê ditînê jî dîtin hebe çi û nebe çi…Dilê me dayîkan pir û pir êş û jan girtiye. Ê de Xwedê mezin e. Rewş ku rewş e, bila ew rewşa me bibîne. Bi hêvîya rojên şad û bextewar, mêvano. Her û her bijî. Her û her…

Gotinên xwe kir û pê ra jî ber çavên xwe paqij kir. Dû ra dîsa hat ser axaftina xwe ya berê û got:

- Jîyan e, jîyan jî ne bi yek rengî ye. Li alîyekî wê şîn be, yek jî şayî ye. Xwedê bila şayîyê bike para me xêrxwazan û me jê bêpar neke. Ne min got jîyan e, tê û derbas dibe. Ez ê werim vê bêdengîya te? Bêdengîya te delalî qet û qet nayê hesabe me.

Apê te, ji te kilamek xwast. Ne tenê ji bo xwe, lê wî ji bo me tevan xwast. Ji bo min, ji bo bûka min û ji bo Hesenê min. Nabe tu yê xwazîya me hemûyan li ber çav negirî û me bişikênî? Na, ne bawer im. Ê de kilama xwe amade bike û em hemû li benda te ne.

Kevir di cîyê xwe da giran e. Li wî hatibû ferzkirin û jê reva wî jî nebû. Ê erê, wey! Gotinek ji gotinên kurdan bû, fira mirîşkê heta kadînê. Bi dengekî nizm axifî û got:

- Hûn ji min bawer bikin ku dengê min jî eynî wek dengê wî qijika reş e. Ger xweş bûya jixwe min nedigot na û min ê ji we ra bigota û bistira, lê…

De êdî jê ra naz jî nemabû ku xwe bida nazê. Na, nemabû. Her du destên xwe ber bi guhên xwe birin, gewrîya xwe paqij kir û yekem got "*Hahîîî hî hîîî!...*" Dû ra jî dest bi kilamê kir û stira. Bi dengekî zelal û xweşik stira û got:

*Xozandaxê lê lê lê ber topê ye*
*De kalmastê birano ji bextê min ra li ber topê ye*
*Heyla di binyê da zarezara pezkûvyê ye*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

*Wey di binyê da zarezara pezkûvyê ye*
*Herçî gava hûn ê pirsa Qeymezê Êzdî ji min dikin*
*De îro sê roj û şev e, li Xozandaxa xopan li ser kanyê ye*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

*Xozandaxê lê lê lê gelî birano li berwera*
*De kalmastê temaşe kin, bextê min ra li berwara*
*De îro sê roj û sê şev e, tê da têye nalenala birîndara*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*



www.arsivakurdi.org

Ger ew wisa bi dengekî bilind û xweşik bistre îcar Apê Silêman û Asya Xanim bêdeng dimînin? Na. Her duyan bi hev ra dengê xwe bilind kirin û gotin:

- Tew, tew, tew!... Wey, tu her hebî û her!... Wey, ez bi qurbana wî dengî, deng!... Dengê te li hûzbara vî dinyayî her û her hebe. Her û her!...

Lehengê xemgîn, kilama xwe domand û got:

*De tê da têye nalenala birîndara*
*Herçî gava hûn ê pirsa Qeymezê Êzdî ji min dikin,*
*De îro sê roj e bi duwanzde xortê eşîrê va xwey maye ber koleka dara*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

*Xozandaxê lê lê gelî birano li ber ferîka*
*Bi rojê xewa me nayê ji destê mîratê van wawika*
*Xelkê li orta meydana Xozandaxê winda kiriye bi tekan û tûka*
*Min porkura Xwedê winda kiriye Qeymezê Êzdî*
*Xortê xweyî gundê ber ferîka*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

Bi vê kilamê ra yê ku herî zêde lorand, Asya Xanim bû. Hem bi kilamê ra hem jî li pey kilamê wê gotina xwe kir û kir. Bi berdawamî wê, tim û timî got:

- Xwezî bi wî dilî, bi wî dilî… Xwedê bi te ra be, law. Mala te ava û siheta te xweş be, berxo. Sihetxweş, her çi miradê te hebe tu bi wê miradê xwe şa bî…

Besra Xanim? Besra Xanim û bi vê kilamê ra xemgîn nebe? Xemgîn û bi hêsirên çavan bû. Kilam e, bi deng û meqam meri-



www.arsivakurdi.org
www.arsivakurdi.org

van bi xwe ra digire û dibe zozan bi zozan, war bi war digerîne... Kilam e, esrînî dide. Yê Besrayê xem û xîyal û xemgînî bûn. Ji ber çavên wê ra yê ku dihat û diçû jî bi bejn û bala xwe, Ferzende Beg bû. Lehengê xemgîn, bi vê kilama xwe beşera tevan xweş kiribû û dilê wan helandibû. Dengî wî jî xweş bû, gotinên stiranê û meqam jî. Helbet, deng û awaz ku xweş be, ka îcar kî pê xweş nîne ku ap û amojin û bûk jî pê xweş nebin? Apê Silêman û bi lehengê xemgîn ra tewinê nede û nebêje 'ha hîîî…' dibe? Na, bê wî nedibû. Hem tewin da hem jî çiqas gotinên xweş û giranbiha hebûn ji wî ra kirin û gotin. Hem got û hem jî pesnê wî da. Berîya ku bistre jî ger yekî bigota, ji ser dengê Navdarê leheng ra deng nîne, kesî bawer nedikir. Werhasil, di encamê da te dikarî bigota ku pir û hindik ew jî bi qasî xwe dengbêj bû. Na, ne tenê dengbêj jî; hem dengbêj, hem çekdar hem jî di mala Apê Silêman da ji lehengan lehengekî 'xemgîn bû.' Kilama xwe dewam kir û got:

*Xozandaxê lê lê lê gelî birano wê li mil e*
*Ava Qemesyana şewitî bi ser me da girtiye tê, xulexul e*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

*Ava Qemesyana şewitî bi ser me da girtiye tê, xulexul e*
*Xelkê li orta meydana Xozandaxê winda kiriye bi tekan û tûka*
*Min porkura Xwedê winda kiriye Qeymezê Êzdî, siwarê hespê qule*
*Ax dilêm yar yar, dilêm yar yar*
*Ax dilêm yar yar, dilêm sîyaro*

Stira, kilama xwe qedand û di pey ra jî xwe da alîyekî. Ê ne gotin gotina Apê Silêman bi xwe bû û digot, dor bi dor e û kes ni-



www.arsivakurdi.org

kare bibêje, ez ne di dorê da me û ji min ra çi... Dor hatibû wî, êdî Xwedê dizanî ka wî yê çi bogota. Yê ku kilam jê xwastibû jî bi xwe û yê ku ji xanima xwe ra rê vekiribû jî disa ew bi xwe bû. Ger ku wî rê venekira ka îcar Asya Xanimê, ewqas li wî ferz dikir û digot, ka de kilama xwe amade bike û ji me ra kilam û kilam…

Apê Silêman, bi çarînek Ehmedê Xanî li lehengê xemgîn vegerîya û got:

*Hoşîyar bî, da nekî umre xwe asil telef*
*Ku nedaye faîde mal, genc û ewlad û xelef*
*Macerayê Xidrî, dîwarê yetimî bû selef*
*Vî zemanî her kesek mî'marê diwarê xwe ye…*

Apê Silêman axiftina xwe dewam kir, got:

- Birazî! Te îşev bi wî dengî, bi wî meqamî û gotinên kilamê dilê me peritand, dilê ku timî bi pêt û şewat e. Hest e û kes nikare bibêje naperite. Hest jî diperite û dil jî. Belê, wele! Wele, dil jî disoje û kezeb jî… Te ne tenê berê xwe da min, lê te berê xwe da me tevan û xwazîya me bi cî anî. Mala te ava û tu her bijî, ezîzê min. Kilamek lîrîk, heta bibêjî xweş û bibandor bû. Xwedê bi te ra be, berxê min. Xwedê…

Li pey axaftinên wî jî Asya Xanimê, berê xwe da lehengê xemgîn û axifî. Asya Xanim û her bi wê dilşewatîya xwe nebe? Na, ne tenê bi vê kilamê ra jî, lê ew her daîm dilşewat bû. Bi dilekî baristanî axifî û got:

- Gavek berê Silêmanê apê te, axifî. Tu ji Xwedê bawer bike ku te îşev dilê me tevan heland. Gotinên kilamê jî xweş û bi ya dilê me bû, deng û meqam jî. Me bi heyr û hijmekar guhdarîya te evdalî kir. Tu bi wî dengê xwe her û her hebî. Kilamek bi şewat bû. Te dilê me hewand û Xwedê jî bila dilê te evdalî bihewîne. Hela ji xwe ra hinekî raweste. Raweste, lê hê şev dirêj e...

www.arsivakurdi.org

Bi hevoka wê ya herî dawîyê ka îcar kî nekenîya? Ap jî kenîya û bûk jî. Ê erê, wey! Navdar bi xwe jî. Asya Xanim, piştî ken û henekan ne bi dengekî bilind, lê ji ber xwe va û bi dengekî nizm axifî û got: “Çi bikim ku qewî kesad e bazar, nînin ji qumaşî ra xerîdar!…”

Stirabû û ji guhdaran jî wî spasîya xwe wergirtibû. Ka îcar di wê gavê da ji wî bextewartir? Na! Kesekî, nebû. Nedibû neaxife û gotinê neke.

Li Asya Xanimê vegerîya, bi dengekî kubar axifî û got:

- Dayê, li min bibore! Na, wele! Wele, ez hê jî bi tam û temamî nehatime ser hemdê xwe. Di bandora nexweşîyê da me û ji ber wê yekê jî dengê min ne bi ya dilê min bû. Ji bo gotinên we jî dibêjim spas û mala we ava be.

Axaftin nîne bi xwe ra axaftinê neyne. Piştî axaftinên wê jî Apê Silêman ket dorê. Ji alîyekî va kenîya û ji alîyekî va jî axifî û got:

- Xanim! Heke tu ji min bipirsî ez dibêjim ji me ra şansê herî mezin, hatina vî lehengî bi xwe ye. Ez jî wek te dibêjim mala wî ava. Bi hatina xwe hem mala me şên kir hem jî bi wê stirana xwe dilê me... Xwedê kêmanîya leheng nede. Dil û bi hatina wî şa nebe? Şa ye, hem şa hem jî paşa. Ez dibêjim tu were em ê îşev zêde zorê nedin mêvanê xwe. Xanim, çer hebe rojên Xwedê zêde ne û naqedin. Ger îro nebe sibê, sibê jî nebe dusibe û sêsibe û çarsibe jî heye... Helbet, ji me ra distre. Dema ku stira jî bi dengê wî şev û di şevê da jî dil reng digire û dixemile. Lehengê delal, îro sibê mêvan e û roja sisyan? Roja sisîyan jî ne xerîb û ji malê ye. Li vir e û zû bi zû jî nare. Ma ne wiha ye, birazî?

Pêwistî bi axaftinê hebû û nedibû bersivê nede. Li Apê Silêman vegerîya û got:

- Apo! Heke Xwedê bibêje erê, ne sibê, lê ez dixwazim di dotira rojê da bibim rêwî û herim. Ez ê biçim, lê çûyîna Hesen jî dimîne li ser cenabê te. Ger bi yekî ra bibe rêwî û here pirs jî namîne û pirsgirêk jî...

Apê Silêman, nerazîbûna xwe anî ziman. Nerazîbûna xwe anî ziman û got:

- Hela hela! Na, qet nebû. Ma îcar tiştekî wisa dibe? Birazî, wele nebû. Min digot qey tu çend rojan li gel me dimînî û dû ra terî. Lê ez dibînim wa te biryar daye û roja xwe jî kifş kirîye. Çima te biryarek wisa daye, nizanim. Lê ez dibêjim tu yê ecele nekî baş dibe. Ez ê werim Hesenê xwe. Na! Di vî warî da tu pirsgirêk nîne û çênabe jî. Bila ne Hesenê min xemgîn bibe ne jî bila dayîka wî meraq bike. Helbet, Hesenê xwe dişînim û hem jî bi peyakî çeleng ra…

Apê Silêman, li ser biryara çûyînê gotina xwe kir û axifî. Tenê ew jî neaxifî. Di vî warî da Asya Xanim jî axifî û wê jî gotina xwe kir. Di vê axaftina xwe da wê, çi got? Çi bibêje, got:

- Bavê mino! Ka hela bibêje îcar bi te xêr e ku tu dibêjî ez nasekinim û terim? Ez jî wek apê te difikirim. Mal mala te ye û tu jî ne xerîbî. Bi hatina te em kêfxweş in. Bi çûyîna te? Bi çûyîna te jî em dilêş û ne razî ne. Teze te berê xwe daye me û tu hatî. Gavekê berê te bi xwe got, dengê min ne baş e, ji ber ku hê bi tam û temamî nehatime ser hemdê xwe. Ez jî wek apê te difikirim û dibêjim, lez neke. Çi wextê ku tu baş bûyî wê çaxê em jî ji te ra dibêjin oxira xêrê û rîya te vekirî be.

Ê de wê jî wer got. Navdarê leheng, li ser gotinên wê axifî û got:

- Dayê, dibêjim mala te û apê min ava. Na, di vê malê da xwe wek xerîbekî nabînim, rehet û bi kêfa xwe me. Gavek berê Apê min jî anî ziman û got ku roj ne rojên asayî ne. Rast e, roj ne rojên asayî ne. Lêbelê roj rojên mirin û mayînê ne. Nabe ez ê ji

van rojan ra lawaz bimînim. Min dixwast ez ê bi Ferzende Beg ra berê xwe bidim Gimgimê û biçim. Hatin û nehatina wî jî vê gavê ne dîyar e. Na, nayê zanîn. Ji ber vê yekê jî ez dibêjim ger meriv di waxtê da here baştir e. Na, naxwazim dereng bimînim...

Apê Silêman, li ser axaftin û xwazîyên wî qederekê xwe bi xwe fikirî. Pişt ra jî li wî vegerîya, axifî û got:

- Birazî, biryar biryar e. Erê, herçiqas dilê me bi çûyîna te razî nebe jî, helwesta te pîroz û biryara te jî watedar e. Dibêjim Xwedê bi te ra be, hela bila rojek du roj derbas bibin, em ê bibînin û gotinê bikin. Kurdê bêhesp, bêper û bêbask e. Di çûyînê da hesp heye. Heval? Li ser heval jî ez ê bifikirim û ji bo te yekî peyda bikim...

Xulekî du xulekan bêdeng ma û pişt ra? Pişt ra jî vegerîya ser axaftina xwe ya berê û got:

- Xalid Begê Cibrî, ji dostan dostekî qedîm e. Ne tenê dost, lê mêrxasek ji mêrxasên vî welatî û kesekî zana û pispor e. Xwedê bi wî ra be. Ew şeref û namûsa welatê xwe ye. Li welatê min şer sar nebûye û egîd jî hê di govendê da ne. Mirovên çê, bi tenê ji bona xwe najîn. Ew, berpirsîyarê hemû pêkhatîyên jîyanê ne. Yên ku bimînin li ser vî erdî em û yên ku bi vî derdî bimirin jî ew in.

Li welatê qedîm tawanbarî, zilm û zordarî hebû. Nîrê dagirkerîyê nîrekî giran bû. Nedihat kişandin te yê bikişanda, nedihat qebûl kirin te yê qebûl bikra. Li mêvanxanê du lembe, di hewlîyê da jî çirayek hebû û dişxulî. Li derva sar û seqem, di hundir da jî tîna sobê û germîya mirovahîyê hebû. Amojina Asya û bûka xwe bi hev ra rabibûn û çûbûn alîyê malê. Silêman Beg, ji bûka xwe pir û pir hez dikir û dema ku deng li wê bikra jî, digot: “Delala mala bavê min...’’ û li pey jî gotina ku dixwast bike, dikir. Besra Xanim, ji dîlberan dîlbereke bêqisûr û ji jinan jineka dilte-

nik, xêrxwaz û xwezanek bû. Wek xwesûya xwe ew jî ji êla Sîpkan bû. Piştî demekê Besra Xanim, bi xwesûya xwe ra derbasê mêvanxanê bû.

Apê Silêman, li wê vegerîya û got:

- Delala mala bavê min, mêvan û Hesenê min ji rîyeke dûr hatine. Westîyane. Divê êdî ew jî rabin û ji xwe ra razin. Nivînan bînin û em ê rabixînin.

Gotina xwe kir, di pey ra jî rabû. Di rabûnê da jî ber bi Navdarê leheng mêze kir, pê ra jî axifî û got:

- Ê de fermo, rabe! Rabe, em ê bi hev ra ji bo bîstekî derkevin derva û ji xwe ra hewayê bigirin.

Dû ra jî li Hesenê Hesenî vegerîya û bi wî ra axifî. Jê pirsî û got:

- Hesenê min! Gelo tu jî dixazî bi me ra werî yan na?

Hesenê Hesenî, bersiva apê xwe da û got:

- Na, Apo! Naxwazim. Ez dixwazim bi amojina xwe ra bimînim…

Piştî van axaftinan jî Apê Silêman û Navdarê Kurd bi hev ra derketin derva. Bûk û xwesûyê bi hev ra nivîn anîbûn, li ser kulavên xoresanî danîbûn û raxistibûn. Besra Xanim û vala bisekine? Na. Nivînên xwe raxist şûnda jî berê xwe da hewlîya pêşin, çû û di leganê da hinek êzing û çend telt jî sergîn anî û kir sobê. Li derva hewa sar û xumexuma baranê bû, dibarî. Asya Xanim, bi Hesenê xwe ra li ber sobê bû. Besra Xanim? Derbasê ber pacê bibû û bi xem û xîyalên xwe bû. Di şeva ba û bagerê da ji alîyekî va li barana berfê mêze kir û ji alîyekî va jî hêsirên çavan barand. Bi hatina xezûrê xwe jî ji ber pacê dûr bû. Apê Silêman, derbasî hundir bû, lê bi axaftin derbas bû. Li xanima xwe vegerîya û got:

- Errrik, bavo! Sar e, lê çer sar. Tu dibêjî qey tofan rabûye. Ba

û bager, berf û baran e. Lehengê xemgîn jî rabûye dibêje destûrê bidin min, ez dixwazim bibim rêwî û herim. De here! Here, te ku karîye qet nesekine, di vî ba û bahozê da bide rê û here. Ba dike, tu dibêjî niha qelaxa sergînan bi xwe ra digire û qilozê hewa dike. Na, bawo! Çi navbeyn û çi hal. Serhed e, Serhed! Baran û navbeynê bide. De rabe, xanim! Rabe, bila mêvan derbasê ser nivînên xwe bibin û ji xwe ra razin...

Asya û Besra Xanim, bi hev ra rabûn. Di rabûnê da jî herduyan bi hev ra got:

- De şeva we ma xweş û Xwedê rehetîyê bide we…

Piştî xanim û bûka xwe Ape Silêman axifî û wî jî got:

- De şeva we şad û Xwedê rehetîyê bide we, ezîzên min…

Du qat nivîn li ser sekûyan hatibûn raxistin, qatek ji bo lehengê xemgîn û yek jî ji bo Hesenê Hesenî bû. Li derva guveguva bayê bû. Te digot qey dengê fîtikê ye, li sivdera qonaxa Apê Silêman dizîve. Hundir germ û ew jî bêhal û betilîbûn. Derbasê nav nivînan bûn.

Hesenê Hesenî, li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Apo, de şeva te xweş, Xwedê rehetîyê bide te. Xewa min tê, pir û pir jî westîyame…

Di nav nivînan da li hêla çepê zivirî û di pey ra jî çavên xwe dan hev. Navdarê leheng, ji cîyê xwe rabû û di pey ra jî pifê her du lembeyan kir û vemirand. Ket nav nivînan, lihêfa xwe kişand ser xwe û demekê di nav nivînan da hat û çû, qilqilî. Li gundê Kêranlixê û di mala giregirekî kurd da bû. Li derva? Li derva ji alîyekî va dengê ba û bagêrê û ji alîyekî va jî ewtîna kûçikan bû. Di şevekê wisa da wî lingên xwe dirêj kirin û çavên xwe dan hev.

* * *

www.arsivakurdi.org



Li tenîşta qonaxê tewle û di tewlê da jî li ser afiran cotek ga, du çêlek û ji cisnê Eznawir jî çar hesp hebûn. Na, qet nebêje! Hesp bûn, lê çi hesp çi hesp, resen û yek jî ji yekî çêtir. Hema wiha li ser destê rastê û di kuncikê tarî da du tar û li ser taran jî heft-heşt mirîşk, du sê varik û çend jî ji dîkên gerze hebûn. Zelalîya sibê bû. Lehengê xemgîn, bi azana dîkan ra çavên xwe vekirin û şîyar bû. Na, di nav nivînan da nehat û neçû, zêde nema. Çer şîyar bû, wer jî rabû. Yekem kincên xwe li xwe kir û dû ra jî berê xwe da hewlîya pêş, çû û di vegerê da jî bi xwe ra wekî ardû çend telt sergin, du sê qot û hinek jî darên hişk anîn. Ne tenê ardû, lê bi xwe ra mengela xwelîyê û bêrek piçûk jî anîbû. Li ber sobê çok da, bi wê bêrikê xwelîya sobê vala kir û di pey ra? Di pey ra jî soba xwe tijî kir û vêxist. Ji alîyê malê kesê ku berê xwe bide mêvanxanê û were, hê nebû. Dixwast nivînên xwe jî qat bike û bide ser hev. Ber bi nivînan mêze kir û bi Hesenê Hesenî ra hate çav çavan û dît, ew jî şîyar bûye. Kenîya û got:

- Sibeha te bi xêr û roja te şad, xortê delal. Dibînim te jî çavên xwe vekirine û şîyar bûyî. Eha, ez bi azana dîkan ra şîyar bûm. Ka îcar tu? Xuya ye tu jî bi teqûreq, hatin û çûyîna min. Ma ne wisa ye?

Ji ber sobê rabû, di pey ra jî ber bi pacê va çû û vekir. Tenîya destên xwe bi pûka berfê va paqij kir û dû ra jî hat, nivînên xwe qat kirin û li ser sekûyê dan ser hev. Hesen, şîyar bibû. Lêbelê vê gavê di nav cî û nivînan da û bi kêfa xwe bû. Na, nêta wî û rabûnê nebû. Navdarê leheng, qatê nivînan dabû ser hev û li ser kulav jî tenê balgîya ku îşev serê xwe danîbû ser, mabû. Xwar

bû û xwast hilde, bide ser qata nivînan û di wê gavê da jî derî vebû û ji derî va bi wê esalet û ezameta xwe Apê Silêman xuya kir û derbasê hundir bû. Di bejnê da yekî bilind û ji camêran jî camêrekî pozberan bû, Apê Silêman.

Yekem di kefika destê xwe da simbêlê edîland û di pey ra jî axifî û got:

- Roj beyanî, ezîzên min. Roj beyanî û sibeha we bi xêr. Dibînim ji lehengan yek rabûye û yek jî hê di nav cî û nivînan da bi kêfa xwe ye. Ê erê, wey! Helbet, Hesenê min bi xwe jî leheng e. Ew, lehengê ba û bahozê, rîya dûr û dirêj e. Lo Heseno, Hesen can! Ger tu bi ya min dikî, tu ne dilivî ne jî radibî. Derva sar e, lê çer sar. Di vî ba û bager, sar û sermayê da meriv ne dixwaze derkeve derva ne jî di vir da wê da here û were. Di êvara Xwedê da dest pê kiriye û hê jî bi wê guveguva xwe ye, guv û guv û guv!... Na, bavo! Ne dizane bisekine ne jî tu yê bibêjî bila hema wiha navbeynek bide, dide. Ê de ba û baran e, bira. Ba û baran jî ba û barana Serhedê…

Hesenê Hesenî, bi hatina Apê Silêman xwast ji cîyê xwe bilive û rabe, lê!? Na, ne pêkan bû. Nedikarî rabe, ji ber ku feqîrê min di nav cî û nivînan da tazîrût û tenê bi derpêyên xwe yên reş bû. Ê de te ku karîye tu were rabe. Apê Silêman, texmîn kir, lê dengê xwe nekir û tiştekî negot.

Bi dengekî xas û muxlîs axifî û got:

- Hesenê min! Ez nizanim gelo ka tu îşev ji ber guvîna vî ba û bahozê baş raza yî yan na?

Xortê delal, di nav nivînan da bû. Lihêfa xwe ber bi singê xwe va kişand, pê ra jî axifî û got:

- Belê, Apo! Îşev razam, lê xweş û xweş jî razam. Apo! Dibêjin, xew û mirin wek hev û yek e. Heta sibê razam û qet şîyar nebûm. Ger ji apê Navdar nebûya hê jî di xew da bûm...

Apê Silêman, piştî van axaftinan îcar jî li lehengê xemgîn vegerîya û bi wî ra axifî. Belê, bi wî ra axifî û got:

- Birazî! Xanimên malê rabûne û ji we ra xurînîyê hazir dikin. Hundir germ û hûn jî bi kêfa xwe ne. Ji xwe ra rûnin û bi rehetîya xwe bin. Hinek şixulê malê heye û nabe ez ê nedim hev. Alifê terş e, paqijkirin e, qut e û werhasil... Kar e û kar jî divêt were kirin. Berê xulam û xizmetkar hebûn, lê niha ew jî nînin. Tu yê bibêjî bila şerê qirêj hema wiha tiştekî li ser pîyan bihêle, nehişt û mala xelkê xirab kir. Ji du xulaman yekî bi Ferzende ra berê xwe da qada şer û yek jî nexweş û di nav cî û nivînanda ye. Ezoyê xulam, nexweş nebûya dihat karê malê dikir, lê... De vê gavê bi xatirê we û bi kêfa xwe bin...

Navdarê leheng, piştî van gotinan ji cîyê xwe livîya û rabû. Belê, rabû û got:

- Apo! Ma îca wiha dibe? Tu ji me ra dibêjî, rûnin û bi kêfa xwe bin. Eha, Hesen bila bi kêfa xwe be, ser seran û ser çavan ra. Îcar ez û kêf? Na, wele! Wele, qet nebû û nabe jî. Min dixwast tu yê ji min ra bibêjî; Navdar! De rabe û bi min ra were! Were bibe alîkarê min, lê te negot. Ka îcar em ji çi rojê ra ne, Apo? Kar û barê malê ye û ji bo kar û bare malê jî ne hewceyê destûrê ye. Na, ne hewceyê destûrêye ku ez ê ji cenabê te bixwazim. De kerem bike, Apo. Kerem bike, bide pêş û em ê bi hev ra berê xwe bidin tewlê û herin. Wek kar êdî her çi ku hebe bi tevayîya xwe li ser min e, ger paqijî bûye paqijî û alif jî bûye alif... Ne tenê ew jî, Apo. Hema êdi her çi şixul ku hebe, tu yê bibêjî…

Wek çawa meriv xortekî ji xortên malê be, bi wî awayî axifî û got. Apê Silêman, hem bi destê xwe îşaret da, hem jî axifî û got:

- Na! Rûne, ji ber ku tu mêvan î. Mêvan û kar û barê malê bike!? Na, birazî! Na, ji xwe ra rûne û bi kêfa xwe be.

Navdar û rûne? Na, rûnenişt û ser da jî pir bi heter bû. Dît, pir



www.arsivakurdi.org

dixwaze bi wî ra were, lê vegerand û got:

- Çi bibêjim, heyran. Madem tu ewqas bi heter û pir jî dixwazî, ê de fermo. Fermo, bide pey min û em ê bi hev ra herin.

Apê Silêman, da pêş û bi hev ra berê xwe dan tewlê.

Ew çûn û hema wiha li pey çûyîna wan jî Asya Xanim û bûka xwe bi hev ra derbasê mêvanxanê bûn. Berîya ku ew werin Hesenê Hesenî, rabibû û di pey ra jî şal û şapikê xwe li xwe kiribû. Niha? Niha jî li ber tîna sobê û bi kêfa xwe bû. Amojina wî Asya Xanim, dema ku derbasê mêvanxanê bûn, bi wî ra hembêz anîn, guvaştin û maç kirin. Besra Xanim? Besra Xanim, wek her gavî dîsa bi wê zerafet û bedewîya xwe bû. Te digot qey hîva çarde rimî ye, ji bedewîya wê ra gotin nebû te bikira. Bi fistanêk rengîn û kofîka serê xwe bû. Laçika wê, laçikek dor bi morî bû. Di nav guşîyên morîyan da cî bi cî pûlikên zîvîn hebûn û diçûrisîn... Çer hat û derbasê hundir bû hema rahişt qata nivînan, rakir û bi xwe ra bir alîyê malê. Asya Xanim û vala bimîne? Na. Rahîşt teşîyê, di pey ra jî da junîyên xwe û li bakir. Bi ser çûyîna wê ra pir derbas nebû bi demlika çayê va derket û hat. Demlika ku bi xwe ra anîbû, danî ser sobê û di pey ra jî bi Hesenê xwe ra ketin nav henek û laqirdîyan.

* * *

*Çêlikê şêran jî şêr in*

Di tewlê da Navdarê Kurd, wek pêlewanek rahîşt karê malê, rê neda û nehîşt Apê Silêman dest biavêje tu tiştekî. Alifê terş da, ji paş derê tewlê saqol girt û pê paqijî kir. Dû ra jî her çi ku dabe ber hev kir sepetê, bir li ser bêderê vala kir û vegerîya. Kar e, dikî û diqede. Ji tewlê derketin û di pey ra jî berê xwe dan kanîka



www.arsivakurdi.org

berderî, dest û rûyê xwe şûştin û bi pîr û pakî derbasê mêvanxanê bûn. Bûka malê, ji wan ra sifre danîbû. Bi hev ra derbasê ser sifreyê bûn û di pey ra jî dest bi xurînîya xwe kirin. Danê sibê û ji rojan jî rojekê zelal û vekirî bû.

Apê Silêman li xanima xwe vegerîya û got:

- Asya Xanim! Wek çawa tu jî dizanî mêvanê me carekê hewl daye û dibêje ez ê herim û herim. Ê de pêwistî ye û pêwistî jî bi xortekî çeleng heye. Mêvanê ezîz û bi serê xwe here? Na, nikare. Dixwazim niha bi wî ra berê xwe bidim nav gund û mêze bikim ka hela ji boyê sibê dikarim yekî peyda bikim yan na? Ê de Apê Silêman e. Dema ku dest bi pêçana cixareyê dikir jî ne yek, lê hema wiha li ser hev çar pênc cixare dipêça û dikir kîsikê titûnê.

Ji wan pêçayîyên xwe yek vêxist, dû ra jî hat ser axaftinê û wiha got:

- Xanim, ê de qismet e û qismet jî nayê zanîn. Ez dibêjim tu yê were em ê ji êla me, êla Hesenan keçikek bedew bidin vî lehengî, belkî dimîne, ecele nake û naçe. Te got çi?

Ê de Apê Silêman û henekan neke? Gotina xwe kir û pê ra jî bû tîqetîqa wî û kenîya. Asya Xanim, nekenîya! Na, nekenîya, lê axifî û got:

- Çi niyet û çi qismet, Silêman. Helbet, mirad e û çi miradê wî hebe bila Xwedê bike. Ji Xwedê hêvî dikim ku ji dîlberan dîlberek şîrhelal û çê yê bibe para wî…

Piştî van ken û henekan Apê Silêman, rabû û bi mêvanê xwe ra derket. Hema wiha li ser destê çepê, du sed-sê sed metre ji mala apo dûr dangî û di dangî da jî xortekî çeleng hebû û berê xwe dan wî. Apê Silêman? Apê Silêman, vê gavê bêdeng û ne bi axaftin bû. Wisa xuya dikir ku xwe bi xwe mijul e. Di destê wî da çogan û berê wî jî li dangî bû. Nêzikê dangê bibûn.



www.arsivakurdi.org

Deng li xortê çeleng kir û got:

- Balîîî, Balî!... Kuro, ca hela were. Were law, were...

Belê, gazî lê kir û li benda hatina wî ma. Balî, bi dengê apê xwe ra, hat. Hat, lêbelê bi lez û bez, bi kêfxweşî berê xwe da wî û hat. Ji xortan xortekî tenik û rûbixwirî bû, Balî.

Çer hat wer jî xwar bû û çû destê apê xwe, maç kir û got:

- Apo, tu ser serê min û ser çavên min ra hatî. Ê de kerem bike, em ê bi hev ra herin mal. Qet nabe ku tu û mêvanê xwe hûn ê wiha li ser pîyan bimînin.

Di pey ra jî bi gavek ber bi Navdarê leheng, çû. Dest da, xêr hatin lê kir û got:

- Bira! Tu jî bi xêr hatî, ser seran û ser çavan ra. Hevî dikim tu yê baş û rehet bî...

Apê Silêman, di destê xwe da çoganek girtibû. Serê çoganê xwe di berfê da çik kir, anî û bir, pê ra jî axifî. Belê, axifî û yekem got:

- Balî!...

Dû ra qapûtê xwe li ser xwe daweşand û carekê din hat ser axaftinê. Di axaftina xwe da Apê Silêman, çi got? Çi bibêje, got:

- Xortê ku tu li ba min dibînî, mêvan e. Mêvanê min, şervanek ji şervanên vî welatî ye û bi navê xwe jî Navdar e, Navdarê Kurd. Mêvanê delal, sibê rêwî ye û diçe Gimgimê. Balî! Li vî gundî kavil ji te çêtir û egîdtir? Na, nîne. Balîyê min, çêlikê şêran jî şêr in. Dibêjim sibê çek hilde, bi wê hazirîya xwe dereng nemîne û zû were. Hesp? Hespê ku tu pê biçî niha di tewla apê te da û li ser afir e. Here mal hazirîya xwe bike û sibê jî zû were. Ser xêrê sibê tu jî bi vî şervanî ra rêwî yî, rêwîyê rîya Gimgimê...

Balî, di balê da xortekî esmer bû. Di bejnê da? Di bejnê da jî hema hema bi qasî bejna Navdar bilind û xoretekî bi dest û pê bû. Bi rêz û giranî bersiva Apê Silêman da û got:

- Biryar biryara apê min e û dibêjim ser seran û ser çavan ra. Apê min çawa birêk dîtibe, ew e. Gotina ku di vî warî da ez bikim nîne. Xizmet e, û ji vê xizmetê ra jî tim û timî amade me.

Apê Silêman, di erênîyê da serê xwe hejand û di pey ra? Di pey ra jî bi kurtî axifî û got:

- Baş e, birazî. De bi xatirê te û heta sibê...

Berîya ku Apê Silêman vegere û here, axifî û got:

- Apo, wele qet nebû û nabe. Ê de fermo, Apo! Fermo, em ê herin mal ji xwe ra şûşeyek çay vexwin û dû ra herin. Apo...

Dem e, ku nebûye nikarî. Apo, lê vegerand û got:

- Na, birazî. Na, spas û mala te ava. Dem nîne û nikarim zêde bimînim. Ne min got, mêvanê min sibê rêwî ye û divê em jî ji bo wî tevdîr û tedarîka rê bibînin. Dema ku tu çûyî mal, hazirîya xwe bike û ji dayîka xwe ra jî silavên min bibêje...

Xatir xwast û di pey ra jî zivirî û bi mêvanê xwe ra berê xwe da mal.

Balî? Balî, ji dê û bavê yek bû, bê xwişk û bê bira bû. Ji ber wê yekê jî Apê Silêman, destûr nedabû wî û nehîştibû ew ê beşdarê refê şervanan bibe û berê xwe bide sengeran. Bila meriv ji dê û bavê xwe yek be, Apê Silêman jî bila Apê Silêman be û rabe rê bide urt qelandin û ocaxkorbûne? Na, ne ji şanê mirovahîyê bû ne jî di sekn û esaleta apo da cîyê tiştekî wisa hebû. Bi wê delalîya xwe Balî, ronahîya her du çavên dayîka xwe bû. Roj e, hatibû û êdî ew jî rêwîyek ji rêwîyên rîyan û cîgirek ji cigirên qada şervanîyê bû. Apê Silêman, di axaftina xwe da qala Xalid Begê Cibrî jî kiribû. Navê Xalid Begê Cibrî ji wî ra ne navekî xerîb bû. Ne cara yekem, lê pir û pir caran bavê wî di suhbetên xwe da qala vî navî kiribû û wî jî guh dabû. Bi coş û kelecan bû. Ji ber ku firsendên ku pir caran bi destê merîyan nakevin, bi dest xistibû. Êdî ew jî wek emsalên xwe rêwîyek ji rê-

wîyên rê û dirban bû. Berê xwe da mal û çû. Çû, lê bi tevlihevî çû. Apê Silêman, wek çawa meriv mizgînîyê bide yekî, bi wî awayî berê xwe dabû wî û hatibû. Wî jî niha berê xwe dabû dayîka xwe û diçû. Ka îcar wî ji wê dayîkê ra dikarî çi bigota? Wî bi xwe jî dizanî ku gotinên wî ji dayîka wî ya reben ra hem êş û azar, hem kul û keder hem jî ji wê ra sedemek ji sedemên xem û xemgînîyê ye. Dema gihişt mal, bi dayîka xwe ra hembêz anî, kenîya û pê ra axifî.

Pêda pêda hat ser axaftinê û yekem jê ra wiha got:

- Yadê!...

Piştî peyva 'yadê' jî êdî her çi ku ji dayîka xwe ra bibêje, bû wek gule û li sing û hestê wê ket. Nedixwast guh bide axaftinên lawê xwe, lê da. Nedixwast gotinên wî bibihîze, lê bihîzt. Guhê wê li lawê wê bû û dilê wê? Te digot qey dilê wê jî bûye pêlên Behra Wanê û li zinar û kendalên devê avê dide û vedikişe. Girîya, lê hêsirên çavên xwe veşart û bi wî awayî girîya. Balî, ji wê dayîkê ra çi got? Çi bibêje? Apê Silêman, ji wî ra çi gotibe wî jî ji dayîka xwe ra got.

Dizanî çi bibêje êş e, lê dema ku negota jî nedibû, got:

- Dayê, bîstekî berê Apê Silêman, bi mêvanekî xwe ra hat ba min û bi taybetî silavên wî ji te ra hebûn.

Porkura dayîka wî? Dayîka wî ji jinan jineka dilşewat û hestewar bû. Lê vegerand û got:

- Xêr e!? Îcar Apê Silêman ji boyê çi hatibû, Balî? Lo, lawo heta berderî hatiye îcar merîv jê ra nabêje, fermo. Meriv nabêje, kerem bike û derbas bibe. Îcar çima te neda peşîya apê xwe û bi xwe ra neanî? Ax lawo, ax! Îcar meriv apê xwe û mêvanê wî li derva dihêle!? Rewa ye, lawo. Qet rewa ye? Wax, wax, wax ku!...

Ê erê, wey! Heta vir baş û tu pirsgirêkek nebû. Wî bi xwe jî di-

zanî ku dayîka wî bi çûyîna wî razî nîne. Ê de biryarek hatibû girtin û destûrek hatibû dayîn. Biryar biryara Apê Silêman û mor jî dîsa mora wî bi xwe bû. Li dayîka xwe mêze kir, pê ra jî axifî û jê ra wiha got:

- Dayê, ez ê werim hatina apê xwe, Apê Silêman? Ji bo min hatibû. Mêvanê wî sibê rêwî yê û tere Gimgimê. Erê, tere. Tere, lê feqîrê min ne rê dizane ne jî qible. Divê yek hebe û bi wî ra here. Apê min, ji bo min hatibû û ji min ra jî wî, wiha got: Balî! Ez ê çi bikim ku li vî gundi, gundê kavilbûyî bilî te û egîd? Na, nîne. Ku hebûya jixwe min berê xwe dida û ji yekî ra digot û dişand. Here hazirîya xwe bike û sibê jî zû were. Ez ji te çêtir û egîdtir jî wekî din tu kesî nas nakim. Apê Silêman, qala bavê min jî kir. Di axaftina xwe da wî wiha got:'Balîyê min, qet tu şik nine ku çêlikê şêran jî şêr in.' Eha, mesele ev bû, dayê…Erê, sibê radibim û diçim. Veger? Na, nizanim û di niha da jî nikarim tiştekî bibêjim. Tu bi xwe jî dizanî ku li gund kesekî nîne û nemaye. Ez nerim ka îcar kî heye û kî dikare bi wî ra here?

Reben bû, dayik. Bêkes û bêxwedî bû. Mêrê wê li qada şer bû û niha jî lawê wê, kerîyekî ji cegera wê dibû rêwîyê rîya azadîyê û diçû. Ka îcar belengaza min dikarî çi bigota? Qey jê ra gotin hebû? Ger heba ne bi gotina min û te, lê ji kul û kesera dilê xwe ra digot, digot û digot...

Hêsirên çavên xwe ji Balîyê xwe veşartin û barandin. Dilê wê bi jan bû, axifî û got:

- Li ser xêrê be, bavê mino. Li ser xêrê! Xwedê bi te ra be, berxê mino. Xwedê! Bexto, tu vekirî bî. Bexto! Şîrê ku te ji min mêtîye li te helal û xweş be, helal û xweş…

Di axaftina xwe da Balî, jê ra negotibû:

*Ez xortê kurd im pir bi navûdeng*
*Wa min hil girtiye bombe û tiving*
*Ez ê herim şer, ez ê herim ceng*

*Ger ku nezivirîm daye tu megrî*
*Dayîka min û te tev Kurdistane*
*Em ê wê xelaskin ji bin destane*
*Ger venegerim ew bo me şan e*
*Ger ku şehîd bim dayê tu megrî*

Balî û bila rabe ji dayîka xwe ra gotineke wisa bike? Na, nekiribû û nedixwast bike jî. Ma meriv bi gotinên xwe yên tûj radibe dilê dayîka xwe dax dike? Na. Dilê dayîka xwe dax nekiribû û ji wê ra jî wiha gotibû:

- Dayê! Pêwîstî bi xortekî çeleng heye û ew xort jî ez im. Ma îcar dibe meriv bi mêvanê apê xwe ra nere û wî heta Gimgimê nebe? Apê min, ne hema wiha bîlasebeb, lê ji bo vê yekê berê xwe dabû min û hatibû…

Dayîk û ji gotinên wî fahm neke? Çavo tu yê nebînî, dilo tu yê nexwînî? Wê porkurê bi xwe jî dizanî ku Balîyê wê, berê xwe dide qada şer û ji wê jî dûr û dûr diçe. Helbet, bi jana dilê xwe bû. Roj rojeke reş û agahî jî ne bi ya dilê wê bû. Qey wê bi xwe jî nedizanî ku roj hene bi şîn û girî ne, roj jî hene bi şêng û şahî... Ma îcar ew nebû roja ku wê ji delalê xwe ra negota, roj tê tu jî bi miradê xwe şa dibî, berxo. Miradê te delalî miradê min e. Ez hem bi te şad hem jî bextewar im. Lawo, Xwedê bila miradê te bi ya dilê te bike, bi ya dil…Ez bi hêvîya wan rojan im. Bila werin, lê bila bi xêr û xweşî...

Roj nebû wê dayîkê, dayîka Balî di xêrê da duayên xwe nekira. Ax, lê de îcar niha!? Niha jî rewşa wê li ber çav bû û dilê wê? Ji dilê wê ra jî tu bibêje. Na, ne hewceyê gotinê bû ku te yê ji dilê wê ra bikra. Bi dilekî janî axifî û xwe bi xwe got:

- Dêmeg, rastîyek ji rastîyan bûye. Dara miradê û bi xwazîyan şîn bibe? Na. Dêmeg, jîyan her bi vir û derewên xwe û tê da tu rastîyek nebûye. Dêmeg, şer jî hebûye û tê da mirin û mayîn jî. Şer nahêle mirad bigirî. Ger bihîşta Balîyê min jî ji xwe mirad di-

girt û dilê min mehrûmê jî. Dêmeg, hêvî jî diçilmise û xwazî jî. Ax de çi zanim, berxo! Dêmeg, ceger e û ceger jî diperite…

Balîyê wê, gotinên xwe kiribû û di pey ra jî berê xwe dabû pez û çûbû dangî. Dayîka wê, jinika dilperitî di mal da bû. Ji alîyekî va wê ji xwe ra got û got, ji alîyekî va jî berê xwe da sandiqa bûkanî û tiştên ku ji bo rojên şad û bextewarî berhev kiribû û dabû ser hev, derxist. Ji sandiqê? Ji sandiqê wê cotek lepik, du cot goreyên rîs, çoxek zerik, cemedanek rengîn, cotek ji solên bavê wî yên kevn, bi şaxên kesk û zer pêşgîrek sorik derxist û da alîyekî. Pişt ra jî rabû, çû ji stûnê tûrikê ku bi destên xwe çêkiribû hilda û anî. Her çi ku derxistibe û danîbe alîyekî ji ber xwe va yekoyek girt, maç kir û di pey ra jî kir tûrikê rengîn. Dayîka dil bi kul, tûrikê Balîyê xwe danî ber stûnê şûnda jî rabû, legena hevîr anî û tê da hevîr stra. Dixwast tendûrê dade û ji wî û hevalê wî ra jo bo rêwîtîyê kadeyan bipije. Dil bi kulê, çend caran bi devê kevçîyê ji rûnê kele girt û kir nav ard. Dû ra? Dû ra jî taseke şîr lê zêde kir û hevîrê xwe stra. Belê, yê wê hazirîya rêwêtîyê bû. Ji berxê xwe ra çi bikira hindik bû. Na, ne bi zor, lê her tişt bi dor e: Çû ji derva dar anî û pê tendura xwe dada, ji ber stêr tîrik hilda û bir şûşt, textê xwe danî, girik vekir û û... Ax, sibeh! Sibeh tu qet zelal nebî! Ger tu zelal bûyî jî tu yê nebî para vê dayîkê. Ax, lê de tu yê werî çi bikî ku sibeh jî hebû û zelalîya wê jî. Balî, bi zelalîya sibê ra rêwî bû. Diçû, lê hatin û nehatina wî jî ne wek zelalîya serê sibehê bû, ne kifş ne jî bellî. Veger? Ax, veger! Ji bo vê dayîkê û hemû dayîkên kurdan bibe mizgînîya xêrê û dilê wan pê şa bike.

Xwe bi xwe axifî û got:

- Na, Balîyê min naçe dawetê. Wek bavê xwe berê xwe dide qada şer û diçe sengeran. Balîyê min, bi tiving e. Balîyê min, bi rext û fîşeng e. Balîyê min, diçe şer. Şer jî nayê zanîn û bext jî…

* * *

Apê Silêman, bi mêvanê xwe ra vegerîyabû mal. Di hatinê da derbasê mêvanxanê nebû û çer hatibe wer jî derbasê kadînê bû. Ê de rêwîtî ye, heyran. Ji bo rêwîtîyê jî pêwistî bi çi hebe meriv amade dike, datîne koşekî û di roja çûyînê da jî carekê din ranabe û lê nagere. Pirs e, ka îcar pêdîvî bi çi û çi hebû? Heke peyatîbûye pêdivî bi hebana nan, şiv û çoyê destan hebû. Dema ku siwarî bûye jî pêdivî bi zîn û binzîn, gem, hefsar û hwd heye. Apê Silêman, ji bo rêwitîyê êdî pêwistî bi çi hebe amade kir, ji bona sibê danî koşekî û di pey ra jî derbasê mêvanxanê bû. Li ber tîna sobê hate xwarê şûnda jî bi lehengê xemgîn ra axifî. Ê de pel û pot in, pel û pot jî nînin bala merîyan nekişînin.

Apê Silêman li bûka xwe vegerîya û got:

- Besra, dîlbera mala bavê min! Ka hela ji kerema xwe rabe û ji min ra çekbendek du çekbendên Ferzende Begê bîne. Yê min mezin in û ne di qeysa vî lehengî da ne. Ne bawerim jê ra bibin. Zivistan e û sar e. Ne bê çekbend ne jî bê sako dibe. Rê jî rîyek dûr û dirêj e û Xwedê hafiz...

Besra Xanim, ji kêleka xwesûya xwe rabû, di pey ra jî berê xwe da xanîyê malê û çû. Çû, lê pir derbas nebû jî bi du çekbendan derket û hat.

Apê Silêman, ji destên wê çekbendên ku wê bi xwe ra anîbû wergirt û di pey ra jî li lehengê xemgîn vegerîya. Belê, li wî vegerîya û wiha got:

- Xorto, xortê delal! Ka hela tu van her du çekbendên ku bûka min ji bo te anîne bigire, bibe û li xwe bike. Li xwe bike û bicêribîne, ka êdî kîjan di qeysa te da ye. Te wetrê ez bi xû û xisûsîyetê te nizanim, ez jî dizanim ku tu yê bibêjî pêdîvîya min pê nîne û mala we ava. Eha, ez jî dibêjim; ê erê, lo! Pêdivîya te û bi pel û pot û lixwekirinê hebe!? Na, nîne! Bila qerf û henek li alî-

yekî, tu wek dîyarî jî dikarî qebûl bikî. Ji şal û şapikê te evdalî ra gotin nîne û jê ra nabêjim xirab in. Zivistan e, sar û serma ye, bê çekbend, kiras û sako jî nabe. Çekbend, di bin sakoyên merîyan da wek astar e, merîyan germ digire, ji sar û sermayê diparize. Bigire, ez ne wek Asya Xanimê bêhnfireh im û pir zû hêrs dibim, heyran...

Lehengê xemgîn, xwe komê ser hev kir û got:

- Apo! Ez jî nizanim ku ka çima îcab dike. Heke ji destê cenabê te wernegirim dil dimîne ku bigirim jî...

Ê de dem jî êdî ne dema naz û tîzan bû. Berîya ku here di hewlîyê da li xwe bike û were axifî û got:

- Ez spasdarê we hemûyan im û bi taybetî jî dibêjim mala te ava, Besra Xanim. Dîyarîye û ji dîyarîyê ra jî nikarim bibêjim, na.

Apê Silêman, kenîya û got:

- Wey, ez bi heyrana te xortî! Di şûna te da bim, dev ji spasî û mipasîyan berdidim, dibim li xwe dikim, têm û dû ra jî dibêjim, spas û mala te û te û te ava…

Navdarê leheng, bir li xwe kir û hat. Di qeysê da bû. Çekbend, di rengê xwe da spî û ji tiftikê hatibû hunandin.

Dem di axaftin, ken û henekan da derbas bibû û êdî tarîya êvarê xwe dabû rûyê erdê. Asya Xanim, li tenîşta mêrê xwe çok dabû erdê û bi giloka hirîyê va mijûl bû.

Apê Silêman, li xanima xwe vegerîya niqurçand û got:

- Xanim! Dîlbera mala bavê min, dîyarîya xwe anî û da. Eha, tew tu berê xwe nadî min û ji min ra nabêjî Silêman, ê de rabe û dor dora te ye. Erê, wele! Wele, dor hatiye min, lê haya min ji min nîne. Wey, mala minê!... Xanim, ê de hela ji kerema xwe ra rabe û ji min ra tu wê tûrikê, ‘tûrikê mêr û mêrxasîyê’ bigire û bîne. Dor bi dor e û bila dora min biqede. Sibê? Sibê jî Xwedê kerîm e, dor dora te ye û tu nikarî jê birevî…

Asya Xanim, hem kebanî hem jî stûna vê malê bû. Dema ku Apê Silêman, hewl bida û dest biavita kar û barekî heta ji wê nepirsîya, fikr û ramanên wê negirta ne radihişt kar ne jî dikir. Jina xaraw, giloka hirîyê danî kêlekê, rabû û di rabûnê da jî wek bûka xwe berê xwe da alîyê malê û çû. Çûyîn e ku meriv çû, tê jî.

Pir derbas nebû Asya Xanim, bi tûr û xurcikek derket û hat. Apê Silêman, ji cîyê xwe rabû, ber bi xanima xwe va çû, ji destên wê tûrikê ku xwastibû bîne; girt, anî û li ber xwe danî. Xwesûya Besrayê, cî girt û rûnişt şûnda jî ji xurcikê rengîn cotek goreyên ris derxistin. Ber bi Navdarê leheng avêtin û pê ra jî got:

- Ka hela bigire û li pê bike. Yên ku di lingên te da ne jî derxîne, bide me û em ê bişon, berxo.

Navdar û bibêje, na? Na! Nedikarî, ji ber ku di vê malê da, di mala Apê Silêman da ‘na’, nebû. Çekbendek li xwe kiribû û ya din jî li ser kulav û li kêleka wî bû. Asya Xanimê, ji ser kulav girt, kir xurcikê rengîn û danî ber xwe. Ev xurcik jî xurcikê rêwîtîyê bû û ji boyê wî anîbû, ji bo rêwîtîya sibê. Di destên xwe da paketek pêçayî jî girtibû, venekir. Na! Venekir, lê axifî û wiha got:

- Ê de bi navê xwe dîyarî, dîyarî ne. Dîyarî tu car ne li bihayê xwe ne jî li erzanîya xwe mêze dikin. Rengê xwe jî ji hezkirinê werdigirin, ji hezkirina dil. Bila ji dil be, lê bila qet jî bi qasê serê derzîyê piçûk û bi qasê serê kevçîyê jî misqalek be. Qedr û qîmet e û tu bibêje bila Xwedê me ji vê hebûnê bêpar neke. Dîyarî? Dîyarî, ji dilê merîyan çi ku hatibe, ew e. Pakêta ku min niha di destê xwe da girtiye, ne ji boyê te ye. Tu vîya bi silavên min û apê xwe bide, Xalid Begê Cibrî. Ew ê di vê xurcikê da be. Ser xêrê, sibê ku bi rêketî û çûyî, digirî û bi xwe ra dibî...

Apê Silêman? Apê Silêman jî, dema ku xanima wî bi lehengê xemgîn ra axifîbû ji tûrikê mêrxasîyê çar şeşagir derxistibû û li ber xwe danîbû. Piştî axaftinên xanima xwe jî îcar wî dest bi

www.arsivakurdi.org

axaftinê kir. Çi got? Apê Silêman e, çi ku îcab kiribe wê dibêje.

Belê, çi ku îcab kiribe wê dibêje û di axaftina xwe da jî wiha got:

- Birazî! Ne tenê Silêmanê Ehmed, lê em hemû kurd ji sê tiştan pir û pir hez dikin. Ji wan yek, jin e. Jin rûmet e. Jin jîyan e û bê wê nabe. Jina çê serbilindîya mêrê xwe ye. Jina xirab? Jina xirab jî kul û derd e; ne tê kuştin bikujî ne jî tê berdan, tu yê wê berdî. Jina kotî mirina mêr e. Werhasil, em ê bibêjin jin e û jin dizane. Jin heye meriv pê şad û bextewar e, jin jî heye meriv pê rezîl û rûswa ye. Gotin e û hatiye kirin. Tilîya xwe ramede her qulê wê tu yê por û poşman bibî…

Ji wan ra çay hatibû. Apê Silêman, ji îskanê qurtek çay vexwar û dû ra jî hat ser axaftinê. Belê, axaftina xwe domand û wiha got:

- Bi giringîya xwe jin, a yekem bû. A duwem? A duwem jî sîleh e, birazî. Em kurd in. Bê çek û sîleh? Na. Na, ji ber ku neyar pir in û bi têra xwe hene. Ji zilm û zordarîyê divê em ê xwe biparizin. Mixabin, bilî çek û sîleh jî wek din ne tu rê ne jî tu çare ye…Ez ê ji te ra qala neyaran nekim. Qalê nakim, ji ber ku tu ji min çêtir dizanî ka ew, kî û kî ne?

Apo, carekê din dest avêt kîs û dest bi pêçanê kir. Titûna wî titûna Mûşê bû. Ta bi ta û di rengê xwe da jî wek şimayê zerik bû. Pêça şûnda jî ber bi xanima xwe va girt û got:

- Ka hela ji kerema xwe ra tu vê cixareya min bigire, bi çika arê va vêxe û bide min, Asya.

Ji cixarê mizek du miz girt şûnda carekê din hat ser axaftinê. Belê, hat ser axaftinê û got:

- Ê erê, wey! Ew berê bû, berê. Ço û şiv jî hebûn, tîr û kevan, şûr û xençer jî. Nabêjim nînin û hê jî hene. Hene, lê pêda pêda jî bazara mêrxasîyê radibin û dewsa xwe didin cûre cûre çek û

www.arsivakurdi.org

sîlehan. Cîyê ku top û tiving lê hebin ka îcar kî guh dide şûr û xencer, tîr û kevanan? Na. Heta îro me bi xençera bav û kalan xwe parastîye. Çek û silehên niha? Çek û silehên niha jî pir çeşîtdar in û meriv tew nikare wan bi nav bike. Birazî! Ka hela tu ji van her çaran yekî hilbijêre. Te kîjan ku begem kirîbe ew ya te ye. Fermo, bigire û bila ji min wek dîyarî be…

Navdar, bêdeng û bêqerar bû. Dît ku ji erdê hilnade dengê xwe bilind kir û got:

- Birazî! Bila guhê te yê rastê ji bo gotinên xweşik vekirî û guhê te yê çepê jî bila ji bo gotinên xirab timî kerr û girtî be. Niha tu bi wê guhê xwe yê rastê guh bide apê xwe, ka apê te ji te ra çi dibêje. Ez dizanim û haya min ji çaplî û xencera te heye. Mesele hebûn yan tunebûna wan nîne. Yê min dîyarîye û tu ji dîyarîyê ra nikarî bibêjî, na. Nayê zanîn, divê ku rojekê pêdivîya te pê hebe. Di wê rojê da jî tu min bi bîr tînî. Rahêle û ji erdê yekî hilde…

Niyeta Navdar û hildanê nebû. Apê Silêman bi xwe ji nav wan şeşagiran yek hilda. Di destê xwe da bir û anî, pê ra jî axifî û got:

- Li gel me kurdan dibêjin sîleh namûs e, namûsa mêr û mêrxasîyê. Tu jî ji şervanan şervanekî kurd û bi xîret î. Ê de baş e. Dibînim tu bi xwe ranahêlî û nagirî, te li ser min hiştiye û divê ez ji bo te yekî hilbijêrim û wek dîyarî bidim te. Eha, fermo!... Dibêjim yadîgar ji min û parastin jî ji Xwedê be. Navdarê Kurd! Tu di roja oxirmê giran da vê demançê û di rojên xweş û geş da jî min bi bîr bîne...

Navdar, ji destê Apê Silêman dîyarîya ku hatiye dayîn, wergirt.  Wergirt şûnda jî rabû, bi rêz û giranî çû destê wî û got:

- Apo! Qet nizanim ka ez ê çi bibêjim. Mixabin, car heye meriv nikare gotinan peyda bike û bibêje, ji min ra gotin wenda û ziman

jî li min kilît e. Tu dibêjî qey îro roja jidayîkbûna min e û min li ser hev dîyarî ji we, wergirt. Helbet, ji hezkirinê ye. Spasdar im û dibêjim mala we hemûyan ava…

Apê Silêman, bi kurtî bersiv da û got:

- Spas xweş û tu her bijî, berxo…

Navdarê leheng, di vê malê da, di mala Apê Silêman da ne wek mêvan, lê wek xortekî ji xortên malê be, qebûl dîtibû.

Em ê werin bûka malê, Besra Xanimê. Bûka malê, li ser xwazîya xezûrê xwe di sênîyê da xwarinek anîbû û li ber wan danîbû. Na! Ne wek şîv, lê berîya şîvê û li ser xwazîya xezûr. Xwarin çi be, hema wiha di du sihanan da hinek penîr, kevçikî du kevçî hingîv, di du tasan da mast û kerîyekî du kerî jî nan...

Apê Silêman, ji mastê tirş du kevçî xwar, di pêy ra jî axifî û got:

- Birazî, tu ji xortan xortekî ezeb û bi serê xwe yî. Nebêje, na û di xem û xeyalê her xortekî da evînek heye. Bûk li ser hespê ye kes nizane ka qismetê kê ye. Ez dibêjim tu were qet fedî neke. Na, fedî neke û ji apê xwe ra tu navê wê dîlberê bibêje; apo, bi heyran. Mafê te heye tu yê nebêjî jî. Ji ber ku ew dîlber, dîlbera te ye. We dil daye hev û ji hev hezkiriye, ji kî ra çi. Bes, min xwastibû hema tenê navê wê ji te bipirsim...

Amojina Asyayê xwe di nav axaftinê ra kir û got:

- Ê de bes e, Silêman. Bes e, ha! Lo, bihêle mevanê ezîz bila bi rehetîya xwe be, wey!... Em hemû jî dizanin ku jina baş yar û war e, ya xirab jî gurê har e.

Ev pirs ne tenê îro, lê duh jî ji wî hatibû kirin. A jixwe ji ber wê yekê bû Asya Xanimê, xwe di nav axaftinê ra kiribû.

Di pirsên wiha da Navdar û bi şermokîya xwe nebe? Zêdetir. Ê de pirs pirsa Apê Silêman bû û bersiv jî bibû belayê serê wî. Navdarê leheng, bi pirsa Apê Silêman sor û mor bibû. Ka îcar wî

yê bersivek çawa bida Apê Silêman û çi bigota? Na, nav neda.

Yekem xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da got:

- Na, Navdar! Na, bêdengîya te ne ya xêrê ye. Ji bo te ya herî baş ew e ku tu yê bersiva pirsê bidî û di pey ra jî xwe bidî alîyekî.

Pişt ra? Pişt ra li Apê Silêman vegerîya û got:

- Apo! Wele, bîle û tîle her çêlek tê dotin, ê de her peyv jî nayê gotin. Ka îcar ez ê ji apê xwe ra çi bibêjim?

Apê Silêman, bi bersiva wî kenîya. Dît, bersiv nîne dev jê berda. Di pey ra jî li xanima xwe vegerîya û got:

- Xanim! Tu dizanî ka çima min babetek wisa vekir û li ser axifim?

Asya Xanimê bersiv da û got:

- Ê de ez çi zanim, Silêman. Tiştê ku ez dizanim te duh jî pirsek wiha ji wî kiribû, lê? Ez dibêjim tu were pirsên wiha ji mêvanê ezîz neke û bila pê aciz nebe. Naxwazim dilê wî ji min û te bimîne.

Apê Silêman axifî. Axifî û di axaftina xwe da jî wî wiha got:

- Na, êdî ez naxwazim bi van pirsên xwe acizîyê bidim wî. Lê ez dixwazim sozek bidim û tu jî bibêje bila li ser xêrê be. Xanim, ger ku şer qediya û bi dawî bû, di niha da ez soz didim wî û dibêjim, bila daweta te lawikî li ser min be. Her çi xerc û mesref hebe bila bi tevayîya xwe li ser ser min û her du çavên min be…

Li ser gotina mêrê xwe Asya Xanim û neaxife? Erê, wey! Bê axaftin nabe, axifî û got:

- Eha, tu ji min ra wiha bibêje ku ez jî bikaribim ji te camêrî ra bibêjim, mala te ava. Wele, te got, lê te xweş û xweş jî got. Ez jî wek te difikirim û wek te jî dibêjim. Ê de li ser xêrê be.

Apê Silêman, ji dil û can gotinên xwe kiribûn û herwiha, xanima wî jî. Apê Silêman, berîya ku li ser evînê axaftinê bike di axaftinek xwe da wî qala çend navan kiribû û ji wan navan yek

jî Evdilbaqî bû. Ê de nav e û nav jî nîne bala merîyan nekişîne. Navdarê leheng, xwast bi pirsa xwe hem di derbarê wî da agahîyê bistîne hem jî rengê vê babetê biguharîne.

Ji Apê Silêman pirsî û got:

- Apo, ez ji êla we zêde kesî nas nakim. Êla Hesenan ji min ra êlek xerîb e. Ger di pirskirina min da xeletî hebe, bibexşîn e. Bîstekî berê di axaftinên xwe da cenabê te qala gelekî navan kiribû û ji wan navan yek jî, Evdilbaqî bû. Bala min kişand û dixwazim ji cenabê te bipirsim, Evdilbaqî kî ye?

Apê Silêman, kenîya û got:

- Lo!... Ê de dema ku ez ji te pirsek bikim tu timî xwe didî kerr û lalîyê. Bersiv û were? Na. Ê de dema ku dilê te xwastiye jî tu her bi wan pirsên xwe yî…

Tu bibêje bila Xwedê kêmanîya Apê Silêman nede û Apê Silêman jî, apek wisa bû. Axifî û got:

- Helbet tu dikarî bipirsî û di pirskirina te ezîzî da jî tu kêmanî nîne. Yên min qerf û henekin, û bi her kesî ra jî nakim. Min ji te xortî hez kir û dibêjim Xwedê bi te ra be. Tu pêşeroja vî miletî yî û em bi te serbilind in. Car heye henek û rastî bi hev ra ne. Car jî heye henek bi henekîya xwe dimîne û rastî jî bi rastîya xwe. Te wetrê ez nizanim. Ez jî dizanim ku her çêlek tê dotin, lê her gotin nayê gotin. Na, ji min ra ne tiştekî xerîb e. Ez jî dizanim ka çima û ji ber çi sedemê bû te nekarî tu yê bersiva wê pirsa min bidî. Te bersiva min neda, lê ez ê bersiva pirsa te evdalî bidim. Evdilbaqî kî ye? Evdilbaqî, birazîyê min e. Belê, birazîyê min û kurê Mehmed Emîn Begê ye. Mehmed Emînê kurê Sofî Begê. Sofî Beg û Dewrêş Beg jî bira ne. Na, em ji hev ne dûr, pismam û lezimên hev in. Ew, du bira ne û ji wan yek Şefîq Beg e û yek jî Evdilbaqî ye. Ez ji herduyan jî razî me û bila Xwedê ji wan razî be. Evdilbaqî, li gundê Şêboyê dimîne. Bi kurtî dikarim bibêjim ku ji

vê êla me, ji êla Hesenan mêr û mêrxasek nemaye ku beşdarî vî şerî nebe.

Axaftin in, û bi axaftinan ra jî dem dibihure. Apê Silêman, li demjimêra xwe mêze kir û got:

- Eha, dem hatiye û divê ez ê carekê din berê xwe bidim tewlê. Ê de rabe, Navdar! Rabe, ger ku nebêjim dîsa tu yê bixeyîdî û bibêjî, negot. Werhasil, alif e, terş û mal e û xulam jî ne amede û nexweş e...

Gotinên xwe kirin û rabûn. Derbasê tewlê bûn û êdî her çi ku îcab kiriye meriv wê dike û diqedîne. Navdarê Kurd, piştî dayîna alif li ber hespekî sekinî û pê ra jî mist da.

Apê Silêman, hat cem wî û got:

- Hespê ku tu niha jê hez dikî bi navê xwe, Eznawir e. Eznawir, hespê Ferzende ye. Hespên ku niha li vir û di tewlê da tu dibînî jî gişkî ji cinsê vî hespî ne. Hesp in û hesp jî nînin li ber xwe nekevin. Hespê Eznawir, bi çûyîna siwarê xwe xemgîn e. Hesp, siwarê xwe nas dike û Eznawir jî, Ferzende. Ma ne wiha ye, Eznawir?

Gotina xwe kir û bi Navdar ra derbasî alîyê din bû. Belê, derbasî alîyê din bûn û li ber canîyekî sekinîn. Apê Silêman, li singê wî da û got:

- Ka hela bibêje min tu çawa yî, Şamran?

Di pey ra? Di pey ra jî Apê Silêman, ji ser tar dîk û varikek girt, kir bin çengê xwe û bi hev ra ji tewlê derketin.

Apê Silêman, li derva xwe bi xwe axifî û di dilê xwe da jî wiha got:

- Jîyan e. Tê û derbas dibe. Rûmet dimîne, mêr û mêrxasî, xêrxwazî û hezkirin… Malê dinê qilêra destan e û li vê dinê jî ew dimîne. Fikr e, ez ê fikrê xwe ji Asya Xanimê ra vekim û bibêjim, ka hela ew çi dibêje.

Pişt ra jî ji berika xwe kêrek derxist, da destê Navdar û got:

- Fermo, Navdar. Eha, ji te ra kêr, ji te ra dîk û ji te ra varik.

Navdarê leheng, yekem dîkê gerze û di pey ra jî varika ku Apê Silêman di destê xwe da girtibû, danî erdê û serjêkir.

Dû ra? Dû ra jî bi hev ra derbasê mêvanxanê bûn. Dem e, tê û dibihure. Lehengê xemgîn, bi berbangê ra rêwîyê rîyek dûr û dirêj bû. Malbata Apê Silêman, rêwîtîya sibê li ber çav girt û piştî xwarin û vexwarinê zêde di mêvanxanê da neman. Nivînên wî hatibûn danîn û raxistin. Lehengê xemgîn, di mala Apê Silêman da sere xwe danî ser balgîyê, lihêfa xwe kişand ser xwe û di xem û xîyalên kûr da çavên xwe dan hev. Xwedê dizane ka êdî çi demê ew bi xew va çû û raza...

Belê, li pêşîya wî rîyek dûr û di xem û xîyalên wî da jî bi navê xwe Mîrê Zirav hebû. Di zelalîya sibehê da Navdar, xwe li wî û navê wî yê ezîz digirt û diçû.

* * *

*Tu tişt bêsedem nîne.*

Lê kiribû hûrik hûrik berf dibarî.

Lehengê xemgîn zû va rabibû. Hesenê Hesenî di xew da û Balî jî, hê berê xwe nedabû mala Apê Silêman û nehatibû. Wek roja berê dîsa nivînên xwe qat kirin û rakirin, dar û gunî anîn û pê sobe vêxist û dada. Werhasil, bi coş û kelecan bû. Tîna sobê dabû hundir û hey diçû germ dibû. Bi ser rabûna wî ra pir derbas nebibû Apê Silêman ji derî va xuya kir û derbasê hundir bû.

Bi dengekî xas û xweşik axifî û got:

- Wey, malava! Ma xew neketiye çavên te evadalî ku tu ewqas zû rabûyî? Bi te xêr e, lo!? Dibêjim bi sebr be, bi sebir... Ji bîr

neke ku her tişt bi sebr û deyax e. Bi hedûr be. Bi hedûr kar û xebat diçe serî. Gotin gotineke Romîyan e û ew dibêjin “Ecele îşe şeytan karışır!’ Îş û kar e, û nabe meriv ecele bike. Ger te ecele kir, îş tu car sererast naçe?

Apê Silêman hê bi axaftin bû. Derî vebû û ji derî va Balî xuya kir û derbas bû. Li milê wî tûr û di destê wî da jî çaplîya wî hebû. Silav da û di pey ra jî xwar bû û çû destê Apê Silêman.

Apê Silêman destekî xwe da ser milê wî û pê ra jî axifî û got:

- Balîyê min, tu bi xêr hatî. Ê de tu wê tûrik û sîlehê xwe dayne û di pey ra jî derbasê ber sobê bibe. Rûne, bi hevalê xwe ra bişêwire, qise bike heta ku ez hatime…

Balî, cî girt û rûnişt şûnda jî bi Navdar ra axifî. Li ser çi? Li ser çi be, rê û rêgeh e dikî babet û li ser diaxifî. Berf û baran e û herwiha, ger ku ew jî nebûye tu ya bêdeng dimînî û ya jî di vir da wê da ji xwe ra diaxifî. Her du jî li ber tîhna sobê û bi axaftin bûn. Di wê navbeynê da derî vebû û îcar jî Apê Silêman û Asya Xanim bi hev ra derbasê hundir bûn. Bi hatina herduyan Navdar jî ji cîyê xwe rabû û Balî jî. Di rabûnê da Balî, ber bi amojina xwe gavek avêt û di pey ra jî xwar bû çû destên wê. Amojinê jî, her du çavên wî maç kir û got:

- Tu bi xêr hatî û berxwedar bî, Balîyê min. Here cî bigire û ji xwe ra rûne, min bi gorî.

Dû ra jî li Navdarê leheng vegerîya û got:

- Roja te şad, Navdarê min! Çawa yî? Hêvî dikim ku tu yê xweş razabî…

Asya Xanim, ne tenê dayîka zarokên xwe bû, lê di eynî wextê da jî bi wê dilşewatîya xwe ew, dayîka neçar, bêwar û belengazan bû. Ew bi axaftin bûn û di wê navbeynê da Besra Xanim jî, hat. Hat, lê bi sênîya destê xwe û taşteya mêvanên xwe va hat. Apê Silêman, sênîya xwarinê ji destê bûka xwe wergirt û danî.

Di hatinê da Balî, ji dayîka xwe xatir xwastibû, lê nehiştibû bi wî ra were.

Ka îcar derd û kulên dinyalikê ji pêsîra kîjan dayikê ketibû ku ji pêsîra wê jî bikeve. Nan û ava xwe xwaribûn. Rabibûn ser pîyan û êdî dem dema rêwîtîyê bû. Belê, rêwî di rîya xwe da. Ne bihar bû, lê dem ew dem bû. Di xatirxwastinê da herçiqas Navdarê leheng, ji Asya Xanim, Besra û Hesenê Hesenî ra bibêje ‘derva sar e û dernekevin’ jî ji vê malê û Hesen jî tê da her kes bi wî û Balî ra derketibûn derva û guh nedabûn gotinên wî.

Li derva jî Navdarê leheng, yekem berê xwe da Bûka malê Besra Xanimê û got:

- Ji bo xizmeta te dibêjim mala te ava, xwengê. Tu her bijî, bextewar bî û de bi xatirê te...

Basra Xanimê bersiva wî da û got:

- Ji te ra oxira xêrê û rîya te vekirîbe, birako. Oxira xêrê...

Pişt ra jî berê xwe da Hesen, maç kir û got:

- Bimîne di xêr û xweşîyê da û bi xatirê te, Hesen.

Apê Silêman, berîya xatirxwastinê derbasê tewlê bibû û di tewlê da jî du hesp amade kiribûn, bi zîn û hevsar û beleme...

Bi hespek hat, hespê ku anîbû da Asya Xanimê û got:

- Xanim, ka hela ji kerema xwe ra tu bi hefsarê serê hespî va bigire û ez ê herim ji tewlê hespê din jî bikişînim û bînim...

Da û çû. Pir derbas nebû hespê din anî û di anînê da jî da, Balî.

Navdarê leheng, dixwast yekem here cem Asya Xanimê û ji wê xatir bixwaze, lê di destê wê da hefsarê hesp hebû. A ji ber wê yekê jî çû cem Apê Silêman. Xwar bû çû destan, jê xatir xwast û got:

- Apo, dîsa xitimîme. Gotin di gewrîya min da bûne girêk û naherikin. Ez jî qet nizanim ka ez ê ji apê xwe ra çi bibêjim. Ez

bextewar im ku hatime mala apê xwe, bûme mêvan û min wî naskiriye. Min we nas kir ji we hemûyan hez kir. Heqê xwe li min helal bike, Apo. Bi xatirê te...

Apê Silêman, destê xwe da ser milê wî û wiha got:

- Belê, dem ku hat meriv xatirê xwe ji nas û dostan, ji hezkirîyên xwe dixwaze. Dixwaze, lê bi zehmetî ye. Navdar! Dibêjim bila Xwedê ji merîyan ra yar be, lê bila qet jî şûrê merîyan ji dar be. Mêr be, mêr bisekine. Çê be çê bixebite. Rê rîya mirinê be jî tu her li pêş be. Ji te ra oxira xêrê û wekîlê silavan, birazî. Mala min mala te ye, çi wextê ku te xwast tu wê çaxê berê xwe bide apê xwe û were. De here cem amojina xwe û ew li benda te ye...

Navdarê leheng berê xwe da Asya Xanimê û çû cem wê. Çer çû û wer jî xwarbû, çû destên wê û got:

- Dayê, tu ne tenê dayîka Ferzende Beg, lê tu dayîka min î jî. Tu hem ji dayîkan dayîkek dilşewat hem jî tu ji dayîkan dayîkek xêrxwaz û birûmet î. Hatime cem te û dixwazim ji te helalî bixazim. Heqê xwe li min helal bike û bila duayên te jî timî bi me ra bin. Dayê, wek çawa mirov here dawetê bi wî awayî tu min bi rê bike. De bi xatirê te…

Na, dirêj û dirêj nekarî biaxife. Asya Xanimê lê vegerand û got:

- Duh êvarê apê te di axaftinên xwe da qala sê tiştan kiribû. Belê, qala sê tiştan kiribû, lê ji wan tiştan yekî jî bi nav nekiribû û ji îro ra hîştibû. Ji wan her sêyan yek jin, yek sîleh û yek jî hesp be; hesp bi gem û hefsar e, mêr jî bi soz û biryar... Hespê ku tu dibînî bi navê xwe, Şamran e. Şamran, dîyarîya min û di oxira te da ye, fermo.

Hefsarê hespê Şamran da destê wî, lê axaftina xwe jî domand. Di axaftina xwe da wiha got:

- Meriv bi nasan digihî xasan. Ez dayîkek ji dayîka mêrxas û



www.arsivakurdi.org

egîdan im. Min egîdên xwe ji bo roja oxirmê giran anîn dinê, xwedî kirin û şîr da wan. Ez bi wan egîdan bextewar im û ji wan yek jî tu yî. Yek tu û yek jî xortê ku niha li wir disekine.

Di vir da axaftina xwe birî û gazîyê Balî kir. Gazîyê wî kir û got:

- Min bi qurban, ka hela were û ji me dûr nesekine. Dûr nesekine, ji ber ku hûn her du jî lawê min in. Were cem dayîka xwe.

Balî hat û wê jî axaftina xwe domand. Belê, axaftina xwe domand û got:

- Ez bi hebûna mêrxasên vî welatî hem şad hem jî bextewarim. Mêrxas hûn, têgihîştî û zana jî dîsa hûn bi xwe ne. Navê min, Asya ye. Asya, ji we razîye û bila Xwedê ji we razî be. Di zagona min da şîrhelalî ew e ku meriv li hember neheqî, zilm û zordarîyê ne bêdeng, lê her bi sekin û xiret be. Mêr bin û mêr bisekinin. Dem e, û hûn her du jî egîdên roja oxirmê giran û rêwîyên rê ne. Rîya ku we daye ber xwe rîyeke pîroz e. Belê, helwesta we pîroz û çûyîna we jî bi wate ye. Gotineke ji gotinên bav û kalan e. Heta pozê merîyan neşewite meriv nabe mêr. Yê we? Yê we ne carekê, lê pir û pir caran şewitiye. Rîya we vekirî û bextê we bi we ra be. Bi hizira qenc û dilê paqij, mirov digihêje her miradekî. Wekîlê silavan û oxira xêrê…

Bi van gotinên xwe Asya Xanim û bigîre? Na, hêsirên çavan nebarand. Di dil da? Di dil da jî ez û te nizanin, lê encax Xwedê dizane.

Hemû li gel hev û bi hev ra bûn. Rêwîtî bû. Apê Silêman, li Balîyê pismamê xwe vegerîya û got:

- Balî! Ji te ra oxira xêrê û bextê te her bi te ra be... Hêvî dikim tu yê bi xêr û xweşî biçî û disa bi xêr û xweşî jî li me vegerî. Roj, ne roja xemgînîyê ye. Şer dawet e, daweta lewendan... Tirsonek û şer? Na. Egîd diçin şer û şer ji wan ra rîya avê ye. Ji bîr

neke, tu Hesenî yî. Tu Hesenî yî û kurê bavê xwe yî. Ne min ji te ra gotibû, çêlikê şêran jî şêr in. Xelk me bi ciwanmêrîya me nas dike û herwiha, em ê wer jî bimînin. Berxê min! Ji te ra oxira xêrê û gotinên apê xwe ji bîr neke.

Îca jî berê xwe da herduyan û bi wî awayî axifî. Ji her duyan ra jî wiha got:

- Serkeftin, serkeftin, serkeftin!... Rê talûke ye û di rê da miqateyê xwe bin… Ji we ra oxira xêrê û wekîlê silavan. De li hespên xwe siwar bibin û bi rê bikevin. Bextê we vekirî be, egîdno…

Bi egîdîya xwe her du jî şêrên vî welatî bûn. Her du jî mêrxasên roja oxirmê giran bûn. Li hespên xwe siwar bûn, lingên xwe kirin zengoyan û bi rê ketin. Yek siwarê hespê Şamran û yê din jî hevalê wî û siwarê hespê xwe bû. Zengo li hespan dan û gotin:

- De bi xatirê we û heqê xwe li me helal bikin…

Hemûyan ji wan ra dest hejand. Besra Xanim, bi Hesenê Hesenî ra derbasê hundir bibû. Li derva Asya Xanim û Apê Silêman mabûn. Ji lehengan Balî dabû pêş û Navdar jî li pey wî bû. Berê xwe dabûn Gimgimê û diçûn şer. Axa welatê wan hatibû zeftkirin û jê ra bêdengî mirin bû. Ji Kêranlixê derbas bibûn û siwarê hespê Şamran, bi sê carînan deng veda û got:

- Azadî, azadî, azadî!...

www.arsivakurdi.org
www.arsivakurdi.org



Demsal payîz e û em jî li vî çiyayî û li çolê ne. Pirs ne sar û serma ye, lê rê! Di vê tarîyê da, di tarîya şevê da rê li ber me wenda û çûyîn jî bi zehmetî ye. Dema ku çav pêşîya xwe nebînin lome ji lingan nayê kirin ku meriv bike. Dil dilan nas bike çav jî çavan, lê ka... Li vî çiyayî, çiyayê qedirzan çav ji çavan ra xerîb ketiye. Heke tu ji min bipirsî, ez dibêjim mayîna me ya vir ji çûyînê çêtir e. Hela hela, qey tu dibêjî ez nezan im. Ez jî dizanim ku dema meriv bide rê û here, rê li ber merîyan dihele; dixwaze bila berf û baran û dixwaze bila ba û bahoz be. Na! Ne hindik, lê em gelek û gelekî rê hatine. Ê yanî! Şûşar, Tekman û Xinûs li kû û Gimgima xopan li kû? Ezîzê min, ê de rêwîtî ye û rêwîtî jî nîne merîyan newestîne. Ji rîya vî çiyayî ra jî meriv nikare bibêje rê ye. Asê ye û merîyan ditevizîne...

roşna
ISBN: 978-605-74847-3-4
9 786057 484734

WELÎ SEBRÎ YAR Û MIRAD - I
roşna

www.arsivakurdi.org
www.arsivakurdi.org